

# KELÎLE Û DÎMNE

FEYLESÛFÊ HINDÎ

BEYDEBA



WERGERANDIN

MIHEMED EBDO ELÎ

**PIRTÛKA**  
**KELÎLE Û DÎMNE**  
**YA FEYLESÛFÊ HINDÎ BEYDEBA**

\*\*\*

WERGERANDIN JI FARISÎ  
**ROZBE KURÊ DADEWÊ**  
(EBDELLA KURÊ MUQEFFE')

\*\*\*

WERGERANDIN JI EREBÎ  
**Dr. MIHEMED EBDO ELÎ**

\*\*\*



## Pêşkêşî

Dema ku wergerandin derbasî jiyana zimên nebe, tucarî pêşvebirin, geşedan û jiyana wî di hin waran de pêşve naçe, ji ber ku di riya wergerandinê re vejandinek di jiyana zimên de pêl dide, nemaze ji aliyê têrm û peyvên ve.

Ji aliyekî din ve, di riya wergerandinê re zanîn, wêje, kultûr, hemû cureyên zargotinê, raman û danûstandinên civakî yên miletan têne naskirin. Ji ber wê jî milletên ku serweriya xwe bi xwe dikin û bûne xwedî dewlet wan pir ji zû ve bendewarî bi wergerandinê kirine, û ji bo wê sazî ava kirine.

Rast e, gelê Kurd ta niha bê dewlet û sazî maye, û bi hemû şêwe û rêbazan şerê hebûna wî ji aliyê xêrnexwezan ve tê kirin, lê tucarî tevgera ronakbîriya gelê Kurd nehatiye rawestandî. Li her demekê û li gor derfetan hin kesayetên ku xemxwarê zimên, wêje û hemû warên jiyana gelê Kurd in derketine û li gor kanebûn û zanebûna xwe xebatên hêja û berçav kirine, û hîn jî tevgera ronakbîriyê roj bi roj pirtir gol vedide. Belê... wergerandina Pirtûka Kelîle û Dîmne bi zimanê Kurdî ji aliyê lêkolîner û zimanzan Dr. Mihemed Ebdo Elî ve seranser dikeve xizmeta tevgera ronakbîriya gelê Kurd.

Pirtûka Kelîle û Dîmne ji aliyê mijarên xwe ve, mîna gulistaneke ji hişmendî, pend û şîret, sinc, haydariya ji xopandinê, dadmendî, çêkarî, necêkariyê ye, û carina jî bi şêwakî pêkenokî li ser zimanê ajalan hatiye nivîsandin. Ev pirtûk belkî cara yekem e ku bi zimanê kurdî hatiye wergerandin, û bêguman ev karekî pir hêja û pîroz e... Pir girîng û nirxdar e... Gelek payebilind û sûdar e.

Birastî; dema ku berî çapkirinê min ev pirtûk xwend çikdanên ronakbîriyê ji hemû aliyan ve şewq vadan. Ne tenê ji aliyê naveroka wê a pir dewlemend û bi sûd ve, lê belê ew bi zimanekî pir zelal, resen û bi têrm û peyvên kurmançî yên ku hemahema li ber windabûnê bûn têr û dagirtî ye. Tiştê baş jî ew e, ku hemû têrm û peyvên ku belkî ji xwendevanên pirtûkê re nû an ne nas bin, li dawîya her rûpelekê hatine şirovekirin û wateya wan hatiye danasîn. Mirov dikare bibêje ku ferhengokeke biçûk di pirtûkê de heye. Bêguman ev jî ne ji valahiyê hatiye, ew ji dewlemendiya zimanewaniya wergêr yê ku ji dehsalan de bi zimanê kurdî mijûl e, û gelek berhemên wî, nemaze di warê lêkolîneriyê de hene, hatiye.

Belê... Ji hemû aliyan ve xwendina vê pirtûkê pir sûdar û girîng e.

***Merwan Berekat***  
***Efrîn: 24.02.2017.***

## Pêşgotin

Rêberê Yûnanî ê navdar Iskenderê Mekdonî/Duqoçî (356-323)B.Z, li sala 326an B.Z. gihîşt welatê Hindê û kire bin destlata xwe; û gava ku rewşa wê jê re durust bû, wî peyak ji peyayên xwe li ser kire destlatdar û ji wir çû. Lê piştî demekê, hindistaniyan ew mirova ji ser textê qeraltiyê danîn, neviyekî ji resena qeralên xwe, jê re digotin Debşelîm vebjartin û li şûna wî kirin qeral.

Li serdema qeral Debşelîm, ango berî niha bi derdora 2300 salî, nasik û feylesûfê bi navê Beydeba li Hindistanê hebû, Beydeba li ser daxwaza qeral Debşelîm pirtûka ((Kelîle û Dîmne)) bi zimanê hîndî (sensikrîtiya kevin= Hîndo-Ewropî) nivîsand, û navê wê ê hîndî ê resen ((PENTŞATENTRA)) -Belkî bîngeha wê bêjeyê ``Pend û Şîret``- bû, lêkir. Di pirtûkê de zanîn, felsefe, perwerde, sincî, serpêhatî, siyaset, karûbarên qeralan û taqeya xwe a taybet jî di jîyanê de, li ser zimanê lawiran got û li ser rûpelên pirtûkê danî.

Piştî derdora 800 salî, qeralê Sasaniyan Kîsra Enûşêrwanê Yekemîn kurê Qubad (501-579)Z, pir ji felsefe û zanîna hez dikir, ji bo bidestxistina wê pirtûkê radibe bijîşkê bi navê Berzewê dişîne Hindistanê, ew jî wê werdigerîne zimanê Pehlewî (Farişiya Kevin) û ji qeral Enûşêrwan re tîne welatê Faris.

Li serdema xelîfeyê ebbasî Ebu Cefer El Mensûr (95-158)G/(714-775)Z. mirovê `Ecem ê bi navê Rozbeh kurê Dadewêh (di hin jêderan de: Rozbêh kurê Dazûwêh) ku bi (Ebdela kurê Muqefe`) hatiye nasîn, pirtûkê ji zimanê farisî

wergeraniyee zimanê erebî. Piştî wê serdemê, destnivîsên pirtûkê ên bi zimanê hindî û farisî winda dibin û namînin. Tenê destnivîsa Erebi di nava xelkê de dimîne, û bi wê rengî, hemî wergerên ku paşê derketine, ji pirtûka bi zimanê erebî hatine birin.

Pirtûka ku feylesûf Beydeba nivîsandî bû, ji çarede deriyan pêk dihat. Lê paşê çar deriyên din lê hatine zêdekirin; deriyê yekem û duyem ji danîna Behnûd kurê Sehwan ku bi navê (Elî kurê Şahê Farisî) tê nasîn in, wê sedema ku Beydeba ev pirtûka ji qeral Debşelîm re danî bû, û çûna bijîşk Berzewê a hindistanê ji bo bidestxistina pirtûkê hewaldaye. Deriyê sisyan jî ji danîna Rozbeh kurê Dadewêh ye, wê jî tiştin ji raman û hizra xwe tê de danîne. Deriyê çaran jî, ji danîna wezîrê farisî Buzergumehir e, wê jî li ser jiyana û karê bijîşk Berzewê nivîsandiyê, û li ser daxwaza wê û qerêl li pêş deriyê ((Şêr û Gê)) daniye.

Li gora pêzanên payebilind, û wekî ku me jî di nava pirtûkê de nas kir û dît, dema ku Ibin El Muqefe` pirtûk wergerandiyê, gelek tişt û nêrînên xwe ên taybet xistine nava rûpelên pirtûkê, û gelek regez û bîrûbaweriyên ola îslamî jî di nava hizra û ramanên pirtûka hindî a resen PENTŞATENTRA de danîne; wek têgehên seza û perû, cîhan û dawîroj, ol û pêxember, rêwresim, têgeh û baweriyên ola îslamê ku di nava rûpelên pirtûkê de xuya dibin, û ta navê pirtûkê jî guhertiye û kiriye ((Kelîle û Dîmne)). Belkî ji ber wê jî, zanyarê zimanê erebî Mihemed Kurd Elî dibêje, ku pirtûk bûye ya Ibin El Muqefe`.

Ango mirov kane bêje, ku çanda hemî gelên Rojhilata Navîn di pirtûkê de hene, bi taybetî jî hindî, farisî û Îslamî.

Roja îro, pirtûka Kelîle û Dîmne ji kelepûra cîhanî tê jmartin, loma jî ew ji bo piraniya zimanên zindî hatiye wergerandin.

Gava ku me jî niyaz kir, ku vê pirtûkê wergerînin zimanê Kurdî, me ne bihîsti bû ku wergera wê bi zimanê kurdî/kurmancî heye, lê piştî em baş pê de çûn, me bihîst ku wergereke wê li Bakurê Kurdistanê hatiye çapkirin; lê mixabin ew bi dest me ne ket. Lê di gel wê yekê, dost û hevalên bendewar ji me re gotin, nexem e ku bêtirî wergerekê ji pirtûkekê re hebe; herwiha li ser wê rêgezê min karê xwe berdewam kir.

Me di wergerandinê de sê çapên erebî yên pirtûka ((Kelîle û Dîmne)) raberî hev kirin û ferhengek jî bi kar aniye:

1. Çapa pirtûkê ya ji pêkanîn û ravekirina Mihemed Îbrahîm Selîm- pirtûtxana Ibin Sîna ya çap û belavkirinê- Qahîra- 1991.
2. Çapa ku di melpera (( El Mîşkat El Îslamiye)) de hatiye belavkirin.
3. Çapa Rojname Tişrîn a Sûrî, bi alîkariya UNESCO - 2006.
4. Çapa duyem 2014, ji pêkanîna Ebdilrehîm Ehmed Qemhiye- weşanxana Mihrat Bo Zanistê- Sûrye- Hums.
5. Ferhenga ((El Mu`cem El Wesît)), Erebi-Erebî.

Wekî ku em zanin, wergerandin kar û barekî ne hêsan e, nemaze jî eger pirtûk berî hezar salî, ji zimanê farişî hati be wergerandin, û me jî ji zimanê erebî werdigerîne zimanê kurdî. Mîna ku em zanin jî, her du zimanên erebî û kurdî ne ji yek malbatê ne, ango ji aliyê kokûbinyat û rêzmên de ji hev dûr in; ew jî dikin ku wergerandin hinekî dijwartir be, û beramberkirina hevokan bi hev re ne rast û durust be. Lê belê



em bawer dikin, ku wergera me wê pir nêzîkî rastiya deqa erebî be, ji aliyê wate, mebest û ramanê ve jî ji çarçewa deqa erebî derneketibe.

Me di wergerandinê de, pala xwe da ser sê rêgezên bingehîn:

1. Me tiştên li pirtûkê zêde ne kir, tişt ji ba xwe ne xistê û ne jî guhert.
2. Me tiştên jê kêm jî ne kir.
3. Ta ji me hat me hewilda, ku werger bi zimanekî sivik û têgihîştî be, û xwendina wê bi xwendevavan hêsan be.

4- Ji bo bilêvkirina rast a hin bêjeyan, me ji dêvla du tîpên Erebi tîpek û şandikek bi kar anî: ` = ع . h = ح .

5- Em di rêzman û vekîtê de li ser şopa Mîr Celadet Bedirxan çûne.

Em spasiya hêjayên ku bi xwendin û têbînên vekîtê alikariya me kirine, wek: Her du xanim Gulistan Awaz, Nazdar Hesên, Mistefa Henan û Merwan Berekat.

**Dr. Mihemed Ebdo Elî ... Efrîn.. 31/1/2017z/2628k.**

## Deriyê Pêşeka<sup>1</sup> Pirtûkê

Behnûd kurê Sehwan, ku bi Elî kurê Şahê Farisî tê nasîn, ev pirtûka pêşkêş kiriye. Tê de, sedema ku feylesûfê Hindistanê Beydeba serokê Berahîmiyan<sup>2</sup> ev pirtûka ji Debşelîm qeralê Hindistanê re amade kiriye, bi ((Kelîle û Dîmne)) bi nav kiriye û sedema ku li ser zimanê ajal<sup>3</sup> û balindeyan daniye hewal daye. Wî bi wê şêweyê, xwastiye mebesta nivîsarên xwe ji xelkê sade<sup>4</sup> veşêre, ta ku negihê kesên pîs û qelaş<sup>5</sup>. Xwastiye çavkaniyên hişmendî, huner û rindiyê paqij bimînin û werin parastin; çinkî, ev pirtûk ji feylesûf re perwerdehî ye, ji hizra<sup>6</sup> wî re vekiriye, ji hezkiriyên wê re rewşenbîrkerin e û ji dilxwazên wê re jî serbilindî ye.

Wî sedema ku qeralê<sup>7</sup> Faris Kisrayê Enûşêrwan lawê Qibad lawê Fêrûz, serokê bijîşkên xwe Berzewê ji bo

---

<sup>1</sup>.Pêşek: Pêşgotin.

<sup>2</sup>.Berahîme: Jêder dibêjin ew ji mirovekî bi navê Berahem/Berahîm/berahim hatiye. Wan olbaweran, pêxember rast ne didîtin û digotin ew ne li gora hiş ne gengaz e ku bibe. Û ditîn ku tiştê ji her tiştêkî mezintir çûndina li dû mirovzadekî ye, ewê ku mîna me dixwe û vedixwe û dibînin ku seredana maleke taybet, û gera li dorê, avêtina keviran, tazîkirin û tiştên din jî.. li tersî pîrsa hişdariyê ne.

<sup>3</sup>.Ajal: Lawir, dewar, heywan..

<sup>4</sup>.Sade: Xwerû, بسيط، عادي، عامة الناس

<sup>5</sup>.Qelaş: Mirovê nerind û xinan, لنيم

<sup>6</sup>.Hizr: Fikir, raman.

<sup>7</sup>.Qeral: Keşe, Şah ملك

pirtûka “Kelîle û Dîmne” şandiye welatê Hindê tê de xuya kiriye. Dayê nasîn jî, ku çawa dema Berzewê derbas Hindistanê bûye û bi saya xweşxûtiya<sup>1</sup> xwe xwe daye hezkirin, ta ku mirovê çû bû ba wî, bi şevê û bi dizî ev pirtûka û pirtûkên zaniyarên Hindistanê ji kewara<sup>2</sup> Qerêl derxistine û destnivîs kirine.

Wî serpêhatiya<sup>3</sup> çûna Berzewê jî ya qeraltiya<sup>4</sup> Hindistanê ji bo destnivîskirina vê pirtûkê bi bîr aniye. Tê de xuya kiriye, ku çiqas pêwîst e pirtûk bi şeweyekî hûrnêrînî bê xwendin û vekolan<sup>5</sup>, li naveroka gotinên wê were nihêrîn, tekeze kiriye jî, eger ne wilo be, mebest jê ne tê wergirtin.

D nivîsê de hatiye jî, ku Berzewê bi xwe li xwendina pirtûkê a bideng amade bûye. Sedema ku Buzrcumhur deriyekî taybet bi navê ((Deriyê Berzewêyê Bijîşk)) daniye, tê de ji destpêka jiyan û jidayîkbûna wî de û ra gihîştîye pileya perwerdekariyê<sup>6</sup>, ji hişmendiyê<sup>7</sup> hez kiriye û di nava wê de hatiye nas kirin, hewal daye, û li pêş "Deriyê Şêr û Ga" ku despêka pirtûkê ye, daniye.

---

1.Xweşxû: Xwedî sinciya pak, لطيف

2.Kewara: Xezîne.

3.Serpêhatî: Tiştê ku bi serê yekî hatiye , vê re bûye û dîtiye, serbor.

4.Qeraltî: Keşewar, welatê ku keşe lê destlatdar re مملكة

5.Vekolan: Lêkolîn بحث، دراسة

6. Perwerdekarî: Karê perwerdekirinê dike, تربية وتاديب

7.Hişmendî: Hişdariya bi taqe الحكمة

## Egera<sup>1</sup> Danîna Pirtûkê

Elî Kurê Şahê Farisî gotiye: Sedema ku feylesûf Beydeba ji qeralê Hindistanê Debşelîm re pirtûka Kelîle û Dîmne daniye, ev bû:

Piştî Iskenderê Duqoçî<sup>2</sup> ê Romî, qeralên hemî herêmên Rojava şikandin, bi ser qeralên<sup>3</sup> Rojhilat ên Faris û bilî wan de jî çû, şerê yên ku di rûyê wî de sekinîn û yên bi ser wî de hatin kir, dostaniya qeralên Faris ên asta yekem, ku dostaniya wî xwastin jî kir, bi wî şêweyê ew bi wan re bi ser ket, û yên dijîtiya wî jî dikirin têk birin, ên şerê wî jî dikirin şikandin û ji hev belav û perçe kirin.

Piştî wê, ew berve welatê Çînê çû. Wî li ser riya xwe ji qeralê Hindistanê xwast, ku bikeve bin dest, ferman û destladariya<sup>4</sup> wî û bibe ji xelkê<sup>5</sup> wî. Lê li wê demê, qeralekî xwedî qîret, bihêz û taqê<sup>6</sup> li Hindistanê hebû, jê re For<sup>7</sup> digotin. Dema For bihîst, ku Duqoçî bi ser de tê, wî karê xwe kir, xwe ji şer re amade kir, xelkê herêmên derdora xwe civandin û biryar da, ku berevaniyê ji ber welatê xwe ve bike û xwe di Duqoçî bide. Ji bo wê yekê,

---

<sup>1</sup>.Eger: Sedem, sebe, ûşt..

<sup>2</sup>.Duqoçî: Du qoç, Zûl Qernên.

<sup>3</sup>.Qeral: Melêk.

<sup>4</sup>.Destlatdarî: Hukum, sulte.

<sup>5</sup>.Xelik: Gel, millet, komek û civateke mezin ji mirovan.

<sup>6</sup>.Taqe: Tecrîbe.

<sup>7</sup>.For: Navê vî qeralî di hin çapan de (Forik, Fewrik, Fewr) jî hatiye, em dibînin ev nava mîna bêjeya (fort, fors) a kurdî ye, ew jî bi wateya (hêz û xwepesnandinê) tê.

wî di demeke kin de hêza xwe û filên cengê amade kirin, cinawir, şêrên kuştar<sup>1</sup> û pêtayî<sup>2</sup>, hespên zengikirî<sup>3</sup>, şûrên tûj û rumên vebrûstî<sup>4</sup> amade kirin.

Li wê gavê, dema ku Duqoçî ji Forê hindî ve nêzîk bû, û bihîst ku hespên mîna tariya şevê amade kirine, û nas kir jî, ku ew ta wê demê hîn rastî qeralekî mîna wî ne hatiye; wê hîngê, Duqoçî tirsî eger di pevçûnê de bilezîne, kêmanî çêbibe û tê de bi ser nekeve.

Duqoçî mirovekî pêlanger<sup>5</sup>, dibarecî<sup>6</sup>, karzan<sup>7</sup> û xwedî taqe bû. Wî nas kir, gerek e nelezîne û fêlbaziyê bike. Rabû xendekek li dora leşkerên xwe kola, û ramî<sup>8</sup> da ku çare û çareseriyekê ji rewşa xwe re bibîne û çawa kani be zora dijminê xwe bibe.

Wî rabû bextzan<sup>9</sup> wesandin û ew ferman kirin ku rojeke lêhatî jê re binasin û vebjêrin, da ku tê de şerê qeralê Hindistanê bike, tê de bi serkeve û dilşad bibe. Herweha ew jî di wê yekê de xebitîn.

---

1.Kuştar: Yê ku kuştinê dike.

2.Pêtayî: Şerûd û çalak.

3.Zengî: Beşek ji zîna hespê ye, cihê ku lingê siwêr dikevê.

4. Vebrûstin: Birqandin.

5. Pêlanger: Xwedî pêlan.

6.Dibarecî: Kulehcî, hîlebaz, fêlbaz صاحب حيلة.

7.Karzan: Baş bi karan zane.

8.Ramî:Fikirî.

9.Bextzan: Yên ku betxan dixwînin û pêzanin.

Li wê çaxê, gava ku Duqoçî di bajarekî re derbas dibû, ji her pîşeyekê<sup>1</sup> pîşekarên<sup>2</sup> navdartir bi xwe re radikirin û dibirin. Di wê rewşê de, qîretî û hişmendiya Duqoçî kirin ku ew ji wan pîşezanan re pêşniyar bike, da ku hespine Baqirî<sup>3</sup>, bila hundirên wan vala bin, û peykerên<sup>4</sup> mirovan li ser piştê wan bin, çêkin. Bila hesp li ser girgirkan<sup>5</sup> bêne siwarkirin, û eger hatin têvedan, bila bi lez biçin. Wî ferman da jî, eger karê xwe bi dawî kirin, bila hundirê wan tijî neft<sup>6</sup> û kirkût<sup>7</sup> bikin, cilan lêkin, wan li pêş li ber rêza leşkerên navîn rawestînin; û kengî ku her du hêz gihane hev, ewê êgir berdin wan siwaran. Eger fîl xertûmên xwe li wan siwarên baqirî ên germkirî balînin, wê jê bicefilin<sup>8</sup> û ji meydanê birevin.

Wî ferman da pîşesazan jî, da ku dikarê xwe de bilezînin û zû kuta bikin; ew jî tê de xebitîn û lezandin. Li wê çaxê encama bextzanan jî nêzîk bû bû. Duqoçî rabû dîsa şandeyên xwe ji For re şandin û jê xwast, ku têkeve bin şor û dewleta wî. Lê wî bersiveke nakirinê e hişk da, mîna bersiva kesê ku ji bo şerkirinê bi biryar be. Dema ku

---

1. Pîşe: xwedî kar û pêşe مهنة.

2. Pîşekar, pîşezan: Xwedan pîşe û sin`et.

3. Baqir: نحاس.

4. Peyker: Pûtê kevirî ku bi destan hatiye çêkirin.

5. Girgirk: Loqên biçûk.

6. Neft: Pêtrol.

7. Kurkût: Kibrît.

8. Bicefilin: ji nişkaviyekê bitirsîn û birevin.

Duçoçî birdariya<sup>1</sup> wî nas kir, ew bi hemî amadekariyên xwe bi ser de çû, For jî rabû fîl dane pêş. Li wê çaxê, peyayên Duçoçî ew hesp li gel peykerên siwarên baqirî ên germ têvedan, fîl jî bi ser wan de hatin û xertûmên xwe lê alandin, û dema bi tîna<sup>2</sup> siwarên baqirî hestewer<sup>3</sup> bûn, siwar ji ser pişta xwe avêtin, bi lingên xwe pê li wan kirin, zivirîn û revîn, û raste kê jî hatin pê li wan kirin û li tiştêkî ne sekinîn. Wê hîngê For û leşkerên wî jî ji hev perçe bûn, leşkerên Iskender dan dû wan û ew bi koman kuştin.

Iskender bang kir û got: Qeralê Hindistanê! Derkeve pêş me, xelk û çekên xwe biparêze û wan majo ser wêrankirinê. Çinkî, ne ji mêrantiyê ye ku qeral leşkerên xwe bide kuştinê û têvede ser tiştên ne durust. Gerek e wan bi mal û henasa<sup>4</sup> xwe biparêze û berevaniyê dibere de bike. Leşkerên xwe bihêle û dakeve meydanê, kê ji me ê din şikand, ewê bextewer û serkeftû bibe.

Gava ku For ew gotina ji Duçoçî bihîst, xwast bi ser de here û xwe tê bide, û guman kir ev fersenda wî ye. Wê hîngê Iskender jî derket şergehê<sup>5</sup>, û herweha bi katan<sup>6</sup> li ser pişta hespên xwe li ber hev dan, lê yekî fersend li ê din ne dît, û pevçûna wan berdewam bû.

---

<sup>1</sup>.Birdar: Xwedî vîn, biryar û helwest حازم.

<sup>2</sup>.Tîn: Pileya germahiyê.

<sup>3</sup>.Hestewer bûn: Pê hesîn.

<sup>4</sup>.Henas: Nefs نفس.

<sup>5</sup>.Şergeh: Meydana şer.

<sup>6</sup>.Kat: Katjmêr, si`et.

Gava ku Iskender çare û fersend li neyarê xwe ne dît, bi dengekî bilind li leşkerên xwe kir qîrî, xak û leşker pê hejyan. Wê hîngê, For guman kir, ku pêlanek li nav leşkerên wî digere û li paş xwe nêrî, lê li wê katê, Duqoçî fersend dît û derbek lê da li ser zînê<sup>1</sup> xwar kir, derbeke din jî gihandê, ji ser hespê gêr kir. Gava ku Hindiyan dît çî bi serê qeralê wan hat, wan ajote ser Iskender û şerekî dijwar ji bo mirinê vê re kirin.

Pîştî Iskender di şer de bi serket, sozê danûstandineke rind da hindiyan, Xwedê jî ew ji wî re kirin pişgir. Herwiha wî destê xwe danî ser welatê wan, peyakî ji pêbawerên<sup>2</sup> xwe jî li ser wan kire qeral, bi xwe jî li Hindistanê rûnişt.

Gava rewşa Hindistanê ewle bû û şora wan kir yek. Iskernder, ew peyayê<sup>3</sup> xwe li ser destlatdariya wan hîşt, ji Hindistanê derket û berê xwe da armanca xwe.

Gava Duqoçî bi leşkerên xwe ve ji Hindistanê dût ketin. Hindistanî hatin guhertin, guhdariya mirovê ku li ser wan hati bû danîn ne kirin û gotin ew ji siyasetê re nabe. Kesên payedar<sup>4</sup> û gelê sade jî qayîl ne bûn ku mirovekî ne ji wan û ne ji xelkê welatê wan li ser wan bibe destladar, nemaze jî wî herdem ew kêr didîtin û biçûk dikirin. Herweha, wan li hev kir ku peyakî ji zaroyên qeralên xwe

---

<sup>1</sup>.Zîn: Cil yan kurtanê hespan ji bo siwarbûnê.

<sup>2</sup>.Pêbawer: Bawerî pê dibe.

<sup>3</sup>.Peya: Mêr, mirov.

<sup>4</sup>.Payedar: Xwedî paye, pile û radeya civakî.



li ser xwe bikin qeral. Rabûn mirovê ku Iskender li ser wan danî bû ji ser têxt rakirin, û qeralekî ji xelkê xwe, navê wî Debşelîm bû, vebjartin, û li şûnê danîn.

Gava ku rewş ji Debşelîm re serast bû, qeraltî jê re durust bû, ew bi xwe jî kesekî bextewer, serkeftî û serfiraz bû, û dît ku bû xwedî arzî<sup>1</sup> û destlat, wî bi çavekî biçûk li xelkê nihêrî, ew êşandin, rewşa wan wêran kir, û eger setemkarî<sup>2</sup> nekira kêfxweş ne dibû. Herwiha, danûstandina wî bi xelkê re pir pîs bû xelkê qeraltiyê jê pir bi tirs bûn û demek ji serdema wî bi wî rengî derbas bû.

Li serdema qeral Debşelîm, mirovekî feylesûf ji Berahîmiyan hebû, ew mirovekî sincîpak<sup>3</sup> û hişmend bû, bi rindiya xwe dihat nasîn û cihê lêvegera karûbarên xelkê bû, navê wî Beydeba bû. Gava ku Beydeba setemkariya qerêl li ser xelkê dît, ew li çarekê gerî da ku qerêl ji rewşa ku tê de bû derxe û vegeerîn ser riya dadwerî û mafparêziyê. Ji bo wê yekê, wî şagirtên xwe civandin û ji wan re got: Win nizanin ji bo çi dixawzim bi we rawêjim<sup>4</sup>. Bila win zani bin, ez pir di rewşa qeral Debşelîm de ramîm. Win jî dibînin ew çawa û çiqas ji dadmendiyê dûr ketiye, şerxwaz û bedkar bûye û pêwendiya wî bi xelkê re ne baş bûye. Me jî ne ji bo van tiştan xwe perwerde kiriye,

---

<sup>1</sup>.Arzî: Milk.

<sup>2</sup>.Setem: Zulm.

<sup>3</sup>.Sincîpak: Fadêl, xwedî sinciyên pak û zelal.

<sup>4</sup>.Birawêjim: Bişewirim, şewir

eger ev tişt ji qeralan derkevin, li ser me dibe sepan<sup>1</sup>, ku em wan vegeînin ser riya çêxwazî û dadweriyê. Kînga me ew erka<sup>2</sup> pişguh kir û guh ne dayê, wê hîngê tiştên ne rind wê bigihên me, tiştên xirab jî wê werin serê me. Emê di dilê nezanan de ji wan nezantir bin, di çavên wan de jî nizimtir bibin! Bi nêrîna min, em ji welêt bar nakin. Lê li gor hişmendî û erkên me, em nikanin qerêl jî li ser bedkarî û riya xirab bihêlin û ji bo wî tişteki nekin. Lê belê, em ji bilî bi zimanê xwe nikanin tişteki vê re bikin jî. Eger em alîkariya kesine din jî bixwazin, dîsa em ne tayê<sup>3</sup> wî ne. Eger haydar bibe jî ku em li dijî karûbarên wî ne, û sinciyên wî xirab dibînin, wê hîngê dawiya me wê li ser destên wî be.

Belkî win zani bin, gava şêr, seg, mar û ga razî dibin li ser xweşikbûna warekî û jiyana wî a xweşik bi hev re bijîn, ew bi wê yekê xwe dixapînin. Gerek e ji qîreta<sup>4</sup> feylesûf be, ku herdem ji bo parastina henasa xwe ji nerindiyê hadar be, û ji çûna wê li dû tiştên qedexkirî xwe biparêze û jê netirse jî, wê hîngê dost û hevalên wî jî wê jê hez bikin û lê bicivin.

Min bihîstiye, ku feylesûfekî ji şagirtê xwe re nivîsandiye û wiha gotiye: Yê ku dostaniya mirovên çepel

---

<sup>1</sup>.Sepan: Li ser mirov neçare, ferz, فرض

<sup>2</sup>.Erk: Stubarî, واجب

<sup>3</sup>.Ta: Hempa, wek wî, germahiya nexweşiyê.

<sup>4</sup>.Qîret: Kela dilê mirov, ku tişteki baş bike.

dike û dibe hevalê wan, ew mîna rêwiyê deriyayê<sup>1</sup> ye, eger ji noqbûnê<sup>2</sup> xelas bibe ji tirsê xelas nabe; eger xwe da nava mirinê û cihên tirsdar, wê hîngê ew ji kerên ku lawirine bê derûn in tê jimartin. Ji ber ku, ji xwezaya lawiran û sirûştta wan e, tiştên ku jê re bi sûd in, nas bikin, û ji tiştên ku jê re ziyandar in jî xwe biparêzin. Çinkî me ne dîtiye ku ew xwe dajon ser tiştên ku mirina wan tê de heye. Eger ew bi ser warekî buveh<sup>3</sup> de jî çûn, ew bi taybetiya xwezaya xwe ya ku li ser hatine afrandin, û ji bo ku xwe biparêzin, jê direvin û dûr dikevin. Min jî win ji bo vî tiştî civandine, çinkî win malbata min in, û cihê veşarte<sup>4</sup> û cîgeha zanîna min in. Ez bi we xurt dibim û piştta xwe didim we. Çinkî ewê ku tenê bi henasa xwe re be, û herdem nêrîna xwe tenê dibîne, eger ji bo çî be jî, ew kesekî windayî ye, û pişgirên wî tunene. Lê mirovê hişmend, kane bi hişdariya xwe, bigihê tiştê ku mirov nikare bi hesp û leşkeran bigihê.

• **Mînaka<sup>5</sup> Fîl û Tîtî**

Dibêjin, cihekî vexwarina avê hebû, fîlekî diçû av jê vedixwar. Tûpek geya jî li ser riya fîl bû, tîtiyekî<sup>6</sup> ji xwe re kiri bû malik û hêk di bin de kiri bûn. Rojekê mîna hercar,

---

1:Derya: بحر

2.Noqbûn: Fetisandina di bin avê de.

3.Buvehî: Xeter, tirs.

4.Veşarte: Tiştên veşartî, nehên, ne diayr, ne xuya.

5.Mînak: Nimûne, مثال.

6.Tîtî: Tilûrekî biçûk e.

fîl çû ser avê, û li ser riya xwe pê li malika tîtî kir, hêkên wê şikandin û çêlikên wê kuştin. Gava ku ew bela tîtî bi ser de hat, wê zanî ku ew karê fîl e, ne ye kesekî din e!. Ew rabû firî û çû li ser serê wî venûşt, dagirî û got: Ey filê qeral, te çima hêkên min pelaxtin, çêlikên min kuştin û ez jî li warê te me? Ma ji ber ku tu min biçûk û kêmbînî te wilo kir?! Fîl got: Wî kir ku ez wî tiştî bikim! Wê hîngê, tîtî ew berda, çû ba civata tilûran<sup>1</sup> û giliyê tiştê ku ji fîl gihîştî bûyê kire ber wan, wan jî jê re got: Em tilûr in, em kanin çî bi filê gewre bikin!? Wê bi qertel û qirikan re got: Ez dixwazim win bi min re herin ba wî, her du çavên wî birjînin û ezê paşê çareke din jê re bibînim! Wan jê re erê kir, û çûn ba fîl, çavên wî nikil kirin ta her du rijandin. Wê hîngê, fîl riya xwarin û vexwarina xwe dervedixist, tenê bi xertûmê xwe radihişte tiştê ku li dora wî hebû û dixwar! Gava tîtî rewşa wî wilo dît, ew hat ser cowikeke<sup>2</sup> avê ku beqine pir tê de hebûn, û giliyê tiştê ku ji fîl dîti bû kire ber wan.

Beqan got: Em kanin çî bi filê gewre bikin, û emê çawa pê kani bin? Got: Ez dixwazim win bi min re herin ber kortalekê<sup>3</sup> ku ji fîl ve nêzîk e, dengê xwe bilind bikin û qirecirê çêkin, eger ew dengê we bibihîse, wê guman bike ku av li wir heye, û dê were ser kortalê û têwer be. Beqan jî daxwaza wê re erê kir, li ber kortalê kom bûn û bang

---

<sup>1</sup>.Tilûr:balinde, طير

<sup>2</sup>.Cowik: Goleke avê ye biçûk.

<sup>3</sup>.Kortal: Korteke fereh û kûr.

kirin, wê hîngê, fîl dengê beqan bihîst, tîbûnê jî ew westandi bû, û rabû çû ta di kortalê werbû û li binê wê ket. Wê hîngê, tîtî hat di ser serê wî re firî û got: Ey zordarê ku bi hêza xwe pozbilind û min jî ne tişt dibîne, te laşê min ê biçûk û dibara min a mezin, li ber laşê te ê gewre û qîreta te a biçûk çawa dît !?

Win jî şagirtên min, bila heryek ji we nêrîna xwe diyar bike. Wan hemiyan got: Ey feylesûfê me ê hêja, û hişmendê dadmend, tu pêşengê me yî û taca serê me yî, ma nêrîna me li ber nêrîna te, û têgihîştina me li ber têgihîştina te wê çi be? Lê belê wekî ku em zanin, avceniya bi tîmsahan<sup>1</sup> re buvehî û bêhişî ye, û sûc jî yê ku derbas ba wan dibe ye. Ewê ku jehrê ji diranên mar derxe, da ku li ser xwe taqe bike û daqurtîne, ew bi xwe belayê tîne serê xwe, û sûc jî ne ya mar e! Kî kete daristana şêr, ew ji hêrişa wî ewle nabe. Qeralê me jî belayan ew ne tirsandiye, û serpêhatîyan perwerde ne kiriye. Eger tiştê ku jê hez neke tu jê re bêjî, em nikanin ji ber hêrsa wî û kiryarên wî ên bed li ser te bi ewle bin. Gava tiştê ku ew jê hez nake tu bidî rûyê wî, tirsê me dê ji hêrs û destdirêjiya wî mezin li ser te be.

Hişmend Beydeba got: Bi serê min be, we got û we rind got, kesê xwedî nêrîn û biryar, bi yên ji asta xwe bilintir, û ji yên ji asta xwe nizimtir jî radiwêje. Çinkî, nêrîna kesane têre mirovê payebilind nake, ne jî xelkê sade<sup>2</sup> sûtê jê

---

<sup>1</sup>.Tîmsah: Ajalekî bejavî ye û goşt-xwar e, li ber çeman dijî.

<sup>2</sup>.Sade: Xwerû, ne têkel, بسيط.

werdigre. Biryara min ew e, ku ez herim qeral Debşelîm bibînîm. Min gotina we jî bihîst, şorindiya<sup>1</sup> we ji min re û dilşwatiya we jî ji bo min, xuya bû! Lê belê min nêrîna xwe got û biryara xwe stand. Winê gotina min li ba qerêl û bersivên min jî jê re bibihîsin. Lê eger we bihîst ez ji ba wî derketim, werin li ba min bicivin. Herwiha, ew Rabû şagirtên xwe verêkirin, wan jî xweşî jê re xwast û ji ba wî derketin.

Piştî, Beydeba rojek ji bo derbasbûna ba qerêl vebjart, û dema ku ew çaxa hat, wî kurkê taybet ê Berahîmiyan li xwe kir, berê xwe da deriyê qerêl, li berdevkê wî pirsî, xwe pê da naskirin, silav lê kir û jê re got: Ez mirovek im, navê min Beydeba ye. Min ji bo şîretekê xwe li qerêl girtiye. Wê hîngê, berdevkê qerêl yekser derbas ba qerêl bû û jê re got: Mirovekî ji Berahîmiyan jê re dibêjin Beydeba hatiye ber deriyê te û dibêje şîretek ji qerêl re li ba wî heye. Qerêl rê dayê, derbas ba wî bû, li ber destên wî sekinî, xwe jê re xwar kir, daket ser çokan û xwe rast kir û bêdeng sekinî. Qeral Debşelîm di bêdengiya wî de ramî, û got: Ez guman dikim vî mirovî ji bo du tiştan xwe li me girtiye û hatiye; yan ji bo tiştêkî ye ku pê rewşa xwe çareser bike, yan jî tiştêkî hatiye serê wî û pê nikare. Paşê di dilê xwe de got: Eger rindiya qeralan li ser xelkê qeraltiyê hebe, lê rindiya hişmendan di hişweriya qeralan de mezintir e. Çinkî hişmend bi zanîne ji qeralan dewlemendtir in, lê qeral bi peran ji hişmendan

---

<sup>1</sup>.Şorindî: نصيحة

dewlemendtir nabin! Min dîtiye, ku zanîn û şermdarî<sup>1</sup> bi hev re ne, mîna du yara ne, ji hev cuda nabin; kînga rojekê hevdu winda kirin, eger yek çû, ê din jî qaserî li ser dixeyîde, ew jî naxwaze li dû wî bimîne. Kî ji hişmendan jî fedî neke, wan rûmetdar neke, çêkariya wan li ser bilî wan nas neke û wan ji helwestên xirab û ji barê kêmaniyan neparêze, ew dibe mîna yê ku hiş ji dest çûye, jiyana xwe ji dest daye, setemkarî li hişmendan kiriye û mafê wan xwariye. Wê gavê ew ji nezanan tê jimartin!

Pişt re qerêl serê xwe rakir û ji Beydeba re got: Ey Beydeba, ez li te dinêrim tu bêdeng mayî, pêdviya xwe nabêjî û mebesta xwe jî hewalnadî; min di dilê xwe de got: Tiştê ku ew bêdeng kiriye, belkî tirsek e, yan jî sergêjyî e ew girtiye. Loma jî, ez di sekinandina te a dirêj de ramîm û min got: Ne ji sinciya Beydeba ye, bê ku tiştek hebe were ba me, çinkî ew ji baştirîn xelkê serdema xwe ye. Kanî em sedema derbasbûna wî li ba min jê bipirsin. Eger zordariyek gihîştibê, ez ê pêştir im ku bi destê wî bigrim, wî rûmetdar bikim, bigihînim daxwaza wî û serefiraz bikim. Eger mebesta wî tiştek ji tiştên cîhanê be, ezê ferman bikim û bi tiştê ku jê hez dike qayîl<sup>2</sup> bikim. Eger ji bo karûbarên qeraltiyê be, û ji bo tiştên ku gerek e qeral neke û pê de neçe be, ezê li asta sezaya wî binêrim. Digel ez zanim jî ku yekî mîna te, wê dil negire xwe têxe rewşa pirsên qeralan. LÊ eger tiştek ji pirsên xelkê be jî, û

---

<sup>1</sup>.Şermdarî: Fedîbûn, حياء.

<sup>2</sup>.Qayîl: Razî

dixwaze ez haya xwe bidimê, ezê lê binêrim û nas bikim çî ye. Ji ber ku hişmend ji bilî çêxwaziyê doza tiştêkî din nakin, nezan jî tersî wê destnîşan dikin. Min jî ji bo axaftinê rê da te.

Gava Beydeba gotina qerêl bihîst, tirs ji ser çû, dilê wî xweş bû, xwe xwar kir, jê re daket ser çokan, paşê rabû serxwe, li nava destên wî sekinî û jê re got: Tiştê destpêkê ku ez bêjim, ez pirsra Xweda dikim ku qeral her hebe û qeraltiya wî her berdewam be. Çinkî qerêl bi vê yekê ciyek da min, ew ji min û ji hemî zanyarên ku li dû min werin re rûmetek e. Ewê ta dawiya demê li ba hişmendan bi bîr were. Paşê, wî berê xwe da qerêl, jê bi hêvî bû, bi tiştê ku jê dît û bihîst şa bû û got:

Qerêl bi camêrî û rindiya xwe ez dilxwaş kirim. Tiştê hiştiye ku ez derbas ba wî bibim, tirsaxaftina bi wî re bipejrînim û gotina xwe bikim, şîretek e, min ew ji wî re hilaniye. Qeral jî zane, ew ji erkên hişmedan e jî, ku min tu kêmanî di erkên xwe de di tenga rêberê xwe re ne kiriye. Eger wî rê da gotinên min û ji min têgihîşt, ew hêjayî wê şîretê ye, eger guh ne dayê jî, wê hîngê tiştê ku min dixwast bêjim, min got, û wilo ezê ji loma ku dê bigihê min xelas bibim!

Qerêl got: Ey Beydeba, tu çî dixwazî bêje, ez li te guhdar im, bala min li te ye, tiştê ku li ba te heye ta



dawiyê bêje, dilê xwe vala bike, ezê ji te bibihîsim û bi qasî ku hêja be, te pê perû<sup>1</sup> jî bikim.

Beydeba got: Min dît, tiştên herî hêja li cîhanê, ku ji nav hemî jîndaran tenê bûne ji taybetmendiyên mirov, çar in: Hişmendî, narînî<sup>2</sup>, hiş û dadmendî.

Zanîn, perwerde û balferehî dikevin bin navê hişmendiyê.

Baldirêjî, bînferehî û rûmetdarî dikevin bin navê hiş.

Şerm, camêrî, henaspêrêzî<sup>3</sup> û enîhilmiştî<sup>4</sup> dikevin nav deriyê narîniyê.

Rastgoyî, çêkarî, xwepayîn<sup>5</sup> û sincîpakî<sup>6</sup> jî dikevin bin navê dadmendiyê.

Ev in tiştên qenc, dijberên wan jî bedkarî ne. Kînga ev tiştina li ba mirovekî sergihayî<sup>7</sup> bûn, eger roziyê<sup>8</sup> Xwedê ji bo wî kêr be jî, dîsa nabe sedem ku ew ji jiyana xwe ne bextewar be, dawiya wî jî wê baş be, û ra eger ji bo rewşa ku tê de ye bextewar ne bû jî, ew poşman nabe. Eger felekê<sup>9</sup> arziya wî jî guhert, ew li ser wê kovan<sup>1</sup> nabe û li ber bûyêrn<sup>2</sup> ne baş jî nabihite<sup>3</sup>.

---

1.Perû: Ceza, مكافأة، جزاء.

2. Narîn: Dawpak, bi namûs, عفيف.

3.Henaspêrêzî: Parastina henasê, nefsê صيانة النفس.

4.Enîhilmiştî: Serbilind الأنفة.

5.Xwepayîn: Reftara xwe bipê û bipolarêze صيانة النفس.

6.Sincîpakî: Sinciyên pak حسن الخلق.

7.Sergihayî: Temam.

8.Rozî: Rizq.

9.Felek: Qeder.

Hişmendî samanek<sup>4</sup> e, bi mezaxtinê<sup>5</sup> xelas nabe, sermiyanek<sup>6</sup> e bidawî nabe, cil e kevin nabe, û xweşiyek e dema wê bi dawî nabe. Eger min bi xwe li nav destên qerêl, dest bi dengkirinê ne kir, ew tenê ji ber rûmet û berzûbilindiya<sup>7</sup> wî ye. Bi rastî jî qeral hêja ne ku tirsdar bin; nemaze ewê di payedariya qeralê me de be, û tu jî ji qeralên berî xwe payedartir î.

Ji berê de zanyaran gotiye: Bêdeng bimîne, ji ber ku ewlehî<sup>8</sup> tê de heye. Xwe ji gotinên vala biparêze, ji ber ku encama wê poşmanî ye. Hatiye gotin jî, çar zanyar li encûmena qeralekî gihîştin hev, qerêl ji wan re got: Heryek şorekê bike, bila ji kokûbinyata perwerdê be. Yekî got: Çêtirîn sinciya zaniyaran bêdengî ye. Yê duyem got: Tiştê ji mirov re sûdartir ew e, ku bi xwe payedariya xwe zani be. Yê sêyem got: Sûdartir tişt ji mirov re, li ser tiştê ku têkliya xwe pê tunebe deng neke. Yê çarem jî got: Vehestirîn tişt ji mirov re, xwe bispêre<sup>9</sup> felekê.

---

1.Kovan: Xemgîn.

2.Bûyer:Tiştêkî ku bûye:

3.Bihitîn: Matbûn دهشة.

4.Saman: Kenz كنز، ثروة.

5.Mezaxtin: Xerckirin.

6.Sermiyan: Mal، xezîne ثروة.

7.Berzûbilind: Payebilind.

8.Ewlehî: Tenahî، bêtirs أمن.

9.Bispêre: Xwe radest bike.

Li demekê qeralên ji herêmên Çîn, Hind, Faris û Romê civiyan û gotin: Gerek e heryek ji me gotinekê bike, da li ser navê wî ta dawiya serdeman bimîne.

Qeralê **Çînê** got: Ez kanim ji ber tiştê ku min ne gotiye, ji yê min gotiye ve pêtir berevaniyê bikim.

Qeralê **Hindê** got: Ez ji yê ku şorê dike mat dimînim. Çinkî, eger ew ji bo wî bin, sûdê jê nabîne, û eger li ser wî bin, wî têk dibin.

Qeralê **Faris** got: Eger min gotin kir, ez dibim yê wê, û eger min ne got, ew dibe ya min.

Qeralê **Romê** jî got: Li ser tiştê ku min ne gotiye hîç poşman ne bûme, lê li ser gotinên ku min kirine pir poşman bûme.

Li ba qeralan, bêdengî ji dengkirina ku sûd jê ne tê çêtir e. Ziman jî tiştê hêjatir e, ku mirov xwe dide ber siya wî û xwe pê diparêze. Lê belê qeral -Xwedê serdema wî dirêj bike- gava rê da min û hîşt ku ez baxivim, gerek e ber û encama axaftina min ji wî re bin, ne yê min bin û berî min ew sûdê jê wergire. Çinkî encam û mebesta gotina min ji wî re ye, sûd û rûmeta wê dê li wî vegere. Ew gotina ku li ser min bû bû erk û sepan<sup>1</sup> ez pêk tînim û ji ser xwe radikim û dibêjim.

Ey qeral: Tu di payedariya bav û bapîrên xwe ên hêzdar de yî. Ewên ku berî te kişwar<sup>2</sup> damezrandine, ji te re

---

<sup>1</sup> .Erk û sepan: Tiştê ku dibe sepan û ferz واجب وفرض

<sup>2</sup> .Kişwar(warê keşe – keşewar- kişwar), qeraltî.

bingeh danîne, kela û keloşk ava kirin, welat durust kirine û leşker ajotine. Di temenê xwe de, pêdviyên destlatê kom kirin. Serdema wan dirêj bû, çek û rext pir kiri bûn û serdemine dirêj di şahî û xweşiyê de jiyabûn. Wan tiştan kirin ku ew navekî çê wergirin, spasiyê bi dest bixin. Digel qeraltiya mezin jî ku di destê wan de bû, serxoşiya hêzdariya ku tê de bûn, lê wan bi rindî bi karmendên xwe re didan û distandin, ji karbidestên xwe re dilfere bûn û di destlata xwe de xwedî reftara<sup>1</sup> baş bûn. Ey qeralê bextewer ku stêrka bextê wî hilhatiye, xak, war, arzî û payedariya bav û bapîrên te û hebûna wan bi te maye; tu niha di nava arziya ku bi te maye de rûniştî, sermiyan û leşker jî bi te mane. Lê belê ji bo wan hemî tiştan, wek ji te dihat xwastin tu pê ranebûyî, li bervajî wê, tu pir zordariyê dikî, destdirêjî û pozbilindiyê li xelkê dikî, di reftareke bed<sup>2</sup> de diçî û kiryarên giran ji te dertên.

Gerek e, û ji te tê xwastin, ku tu di rêya pêşewên<sup>3</sup> xwe de herî, şopa qeralên berî xwe bajoyî, li dû rindiyên ji te re hîştine bimeşî û tiştên tê de riswatî digihê te û nerindiyên wan gihîştine te, berdî. Baş li xelkê xwe binêrî, rêçikên çêxwaziyên ku bila li pey te bimînin, û rindiyên tu pê serbilind bibî şanî wan bidî. Da ku bîranîna te jî li dû te bimîne û bi rindiyên xwe serbilind bibî. Ew tiştina pir ewlehiyê diparêzin û dihêlin durustî berdewam bibe. Çinkî

---

<sup>1</sup>.Reftar: Şeweya kesane a danûstandina mirov, Silûk.

<sup>2</sup>.Bed: Nebaş سِيء.

<sup>3</sup>.Pêşew: Yên pêş, yên berê û destpêkê طليعة، اسلاف.

tenê nezanê pozbilind di karûbarên xwe de dibitre<sup>1</sup> û li dû dilxwaziyên xwe dimeşe. Lê belê xwedanê vîn<sup>2</sup> û hişdariyê, destlata xwe bi sernermî û dilgermiyê bi rê ve dibe. Qeralo! Bibihîse min çi ji te re got, bila ew li te giran ne tê; min deng kir ne ji bo ku tu tiştêkî bidî min, yan rindiyekê bi min bikî, ez wek şîretkarekî<sup>3</sup> ku dilê xwe li ser te ye, hatime ba te.

Gava Beydeba gotina xwe bi dawî kir û şîretên xwe gotin, qeral dilteng bû, vê re di bersivê de giran kir, ew biçûk kir û got: Te gotinek got û tiştêk li pêş min kir, min bawer ne dikir ku kesek ji xelkê qeraltiya min, mîna wê li pêş min bike; çawa, li gel payenizmiya te, te kanî bikira? Nemaze<sup>4</sup> jî naza<sup>5</sup> te li me nabe, û tu mirovekî bêhêzî jî?! Bi hatina te li ba min, û çawa te zimanê xwe li ser min dirêj kir û sînore xwe derbas kir, ez pir bihitîm! Ez ji sezakirineke giran kêmtir ji te re nabînim, da ku tu û bilî te pê perwerde bibin, û bibe serpêhatî<sup>6</sup> û amojkirinek<sup>7</sup> ji kesên bigihên encûmenên qeralan, û bixwazin armancên xwe pêk bînin.

---

<sup>1</sup>.Bitirîn: Têr û tijî bûye û kes pê nikane.

<sup>2</sup>.Vîn: إرادة.

<sup>3</sup>.Şîret: Nesîhet.

<sup>4</sup>.Nemaze: Bi taybetî, خاصة

<sup>5</sup>.Naz: delalî, xatir, minet..

<sup>6</sup>Serpêhatî: Tiştê bi serê mera hatiye.

<sup>7</sup>.Amojkirin: Fêrkirin li ser tiştên rind إرشاد.

Paşê qerêl ferman da, da Beydeba were kuştin û xaçkirin<sup>1</sup>. Lê dema ku ferman da û ew birin, qeral di fermana xwe de ramî û jê vegeî, lê ferman da, ku wî têxin girtûgehê û merbend<sup>2</sup> bikin. Dema ku Beydeba hate zîndankirin, qerêl wesande dû şagirt û herkesê ku lê diciviya, lê belê ew hemî revîn, bi welatan ketin û xwe bi giravên deryan parastin. Beydeba jî demekê di zîndanê de ma, qeral lê ne pirsî, ne jî guh dayê, û kesekî nikarî li ba wî çêrê jî biba.

---

<sup>1</sup>.Xaçkirin: Li ser selîb were kuştin.

<sup>2</sup>.Merbend: Qeyd قيد.

## Rûmetkirina Beydeba

Rewşa Beydeba wilo ma, ta şevêkê ji şevan, xew ji çavên qerêl revî. Wî bala xwe da ezmên, di çerxa felekê<sup>1</sup> û di liva hesaran<sup>2</sup> de pûnijî û kûr tê de ramî. Wê hîngê xwast li ser tiştêkî ji rewşa çerxûfelekê bipirse, loma jî Beydeba hate bîra wî, li tiştê ku pê re goti bû ramî û li biryara xwe li derbara wî poşman bû.

Wî di dilê xwe de got: Min tiştê ne baş bi vî feylesûfî kir, mafê wî winda kir, û hêrsbûna min a bi lez ez ajotim ser wê yekê. Zanyaran gotiye: Gerek e çar tişt di qeralan de tunebin: **Hêrs**: Ew ji tiştên ne baş û giring e, û lê ne tê borîn. **Miqrisî**: Ew jî ji ber ku xwediyê wê destfere<sup>3</sup> ye. **Vir û derew**: Ji ber ku kesek nikare ji xwediyê wan ve nêzîk bibe; tundûtûjî di hevpeyvînê de, ta qelaştî<sup>4</sup> jî ne bi qaserî wê ye. Çawa mirovekî ku şîretek li min kir, û tu tişt zêde ne got, min rabû ew zînanan kir, li bervajî tiştê rind ku hêjayî wî bû min pê kir, û li tersî rindiya gerek bû min bikira min bedseza kir. Gerek e sezaya wî ne wiha ba; ji erka min bû, min gotina wî bibihîsta û li gor şora wî biçûma.

Qerêl di wê katê de rabû hinek şandin da ku Beydeba ji zîndanê derxin û wînin. Gava ku ew hat û li nav destên wî amade bû, jê re got: Ey Beydeba! Mebesta tiştê ku te bi

---

<sup>1</sup>Çerxa felekê: دور وحكم القدر

<sup>2</sup>.Hesar: Kewkeb.

<sup>3</sup>.Destfereh: Dewlemend, rewşbaş ميسور الحال.

<sup>4</sup>.Qelaş: leîm, sefîh, kesê kêr û xinan.

min re goti bû, ma ne ne ew bû ku tu pê qîreta min kêm bikî, û nêrîna min di jiyana min de bêçare û lawaz xuya bikî? Beydeba jê re got: Ey qeralê hişdar, çêxwaz, rastgo û diltenik! Min tenê ji bo durustkirina te û xelkê te û berdewamiya destlata te tu bi wan tiştan agahdar kirî.

Qerêl jê re got: Hemî gotina ku te berê goti bû, careke din ji min re bêje. Tîpekê jê mehêle û dîsa bêje. Herweha Beydeba gotina xwe dubare kir, qerêl jî lê guhdar kir, û her tiştek jê dibihîst, bi tiştekî ku di destê wî de bû zemînê vedida. Paşê Debşelîm serê xwe li Beydeba rakir, ew ferman kir ku rûne û jê re got: Ey Beydeba, min gotina te xweş dît û li dilê min xweş hat; ezê li tiştên ku te şanî min dan binêrim û wek te xwast bikim. Paşê ferman da, bendên<sup>1</sup> wî hatin vekirin, ji cilên xwe jî lêkirin û bi dilxwaşî pêşwaziya wî kir. Beydeba jî got: Ey qeral! Di ew tiştên biçûk de ku min ji te re gotin, durustkarî ji yên mîna te re tê de heye. Qerêl got: Ey hişmendê sincîpak<sup>2</sup>, te rast got, min jî ji vê encûmena xwe de, tu li ser hemî deverên qeraltiya xwe danî û kirî desladarê wan.

Beydeba jê re got: Qeralo! Ji bo vî tiştî li min bibore, ez bê te nikanim wê serast bikim. Qerêl jî rabû lêborîna wî pejirand û jê gerî. Lê gava ku Beydeba ji ba wî derket, ew têgihîşt biryara ku wî da ne durust bû; û dîsa şande dû wî, ew vegerand û jê re got: Ji bo ew tiştê min li te pêşniyar kiri bû, ez di lêborîna te de ramîm û min dît, ku ew kara ji

---

<sup>1</sup>.Bend: Qeyd.

<sup>2</sup>Sincîpak: Xwedî Exlaq û sinciyên pak فاضل.



bilî bi destê te serast nabe, û ji bilî te kesek nikare pê rabe, tenê tu kanî wî barî hilgirî, loma jî, gerek e tu şora min neşkinî. Wê hîngê Beydeba ji daxwaza wî re erê kir.

Ji gerdişên<sup>1</sup> qeralên wê demêjî, gava ku yek dikirin şalyar<sup>2</sup>, tacek didan serê wî, li ser xelkê qeraltiyê û li nava bajêr digerlandin û bi wan didan nasîn. Herweha Qerêl ferman da, ku ji Beydeba re jî wilo bikin. Qerêl rabû tacek da serê wî, ew jî çû li nava bajêr gerî, û vegeerî li encûmena dad û mafdariyê rûnişt, bû dadwer û mafê kesên payenizim ji payebilindan stand, bi lawaz û hêzdarên re wek hev dida û distand, setemkarî hiltanî, dadmendî pêk tanî û pir westan û cefa di wî karî de didîtin.

Wê hîngê, nûça rewşa Beydeba gihîşt şagirtên wî û heryek ji derekê li warê xwe vegeerî, hatin ba wî û bi tiştê ku Xwedê di riya feraman qerêl re ji Beydeba re pêk hati bû, şa û bextewar bûn. Ji bo ku qeral Debşelîm jî li ser destê wî ji rêya bedkariya ku pê de diçû, vegeerî ser rêya rast, wan spasiya Xweda kir, ew roja jî wek cejn hate birin, û ta roja îro ew boneya<sup>3</sup> li welatê Hindê cejn e û tê lidarxistin.

---

<sup>1</sup>.Gerdiş: 'Adet.

<sup>2</sup>.Şalyar: Wezîr.

<sup>3</sup> .Bone: Bîranîn, munasebe..

## **Qeral Ji Beydeba Dixwaze Ku Pirtûkekê Dîne, Bila Ji Welêt re Bibe Destûr**

Dema ku bala Beydeba ji aliyê Debşelîm de vehesî, wî ji bo danîna pirtûkên siyasetê xwe vala kir, tê de xebitî, pirtûk çêkirin û gelek hûrmûrên hîlebazan<sup>1</sup> jî tê de danîn. Qeral jî li ser rêya ku Beydeba jê re danî bû meşî, çêkarî û dadmendî ji xelkê xwe re pêk anî. Pêwendiya qeralên li wan herêman bûn jî pê re xweş bû, karûbarên wî wek dixwast bi rê ve diçûn û xelk û mirovên qeraltiya wî jî pê şa bûn.

Piştire, Beydeba şagirtên xwe civandin, pêwendî bi wan re baş kir, sozên rind dane wan û ji wan re got: Bê guman, dema ku ez derbas ba qerêl bûm, kete dilê we û we got, gava Beydeba biryar da, ku derbas ba ew setemkarê zordar bibe, hişmendiya wî ji dest çû, ew winda bû û ramana xwe pûç bû. Lê we niha encama nêrîna min û durustiya ramana min nas kir. Bila win zani bin, ez ne bi nezanî çûm ba wî; ji ber ku min ji hişmendên berî xwe bihîsti bû, wan digot: Pêlên mîna pêlên serxoşiyê li ba qeralan hene, ew bê şîreta zanyaran û perwerdeya hişmendan ji wê serxoşiyê şiyar nabin. Loma jî gerek e qeral serboran<sup>2</sup> ji şîretên zanyaran bibin û jê hilînin. Ji erka zanyaran e, ku bi zimanê xwe qeralan durust bikin, bi hişmendiya xwe wan perwerde bikin û rastiyê ji wan re xuya bikin, da ku ji şaşitiyên ku li

---

<sup>1</sup>. Hîlebaz: Dibare, kuleh, pêlan..

<sup>2</sup>. Serbor: Di ser re borî û sûd jê dît, serpêhatî. درس و عبرة

ser bin û bêdadiya ku dikin, vegerin. Min dît jî, gotina zanyaran li ser hişmendan sepan û erk e, gerek e gotina xwe bigihînin qeralên xwe da ku wan ji xewna serxoşbûnê şiyar bikin. Mîna bijîşkê ku ji erka wî ye govdan durust bike, ji nexweşiyên biparêze û vegeîne ser tendurustiya wan. Min hez ne kir ku ew bimire, yan ez bimirim û kesek li ser zemînê hebe, bêje: Beydebayê feylesûf di dema Debşelîmê zordar de bû, û ew ji ser tiştê nebaş ku dikir venegrand! Eger yekê got: Wî ji tirsê nikarî gotina xwe bikira, dê bibersivanda û bigota: Reva ji qerêl û ji warê wî jê re çêtir bû.

Dûrketina ji welêt jî pir dijwar e, wê lomê jî min dît, ezê jiyana xwe bikim qurban, ezê û bi wê yekê ji bo hişmendan tişteki li dû xwe bihêlim, û min got, an ezê pê bimirim, an jî di tiştê ku min dixwast de bi serkevim, û encama wê jî wekî ku win niha dibînine. Çinkî di hin mînanan de weha hatiye gotin: Kes nagihê paybilndiyê ji bilî bi tişteki ji van her sê tiştan: Bi dijwariyekê ku pir pê bêşe, yan li malê xwe bibore, an kêmaniyekê di ola xwe de bike. Kî dijwariyan nebîne nagihê dilxwaziyên xwe.

Paşê qeral demkê li ser reftara pak ma, Beydeba jî bi karûbarên destlatê rabû û durust kir.

Piştî ku qeralî ji qeral Debşelîm re li saz ket, û bi saya Beydeba nema bi pirsên dijminan mijûl bû, wî hemî bala xwe da ser pirtûkên ku feylesûfên Hindistanê ji bav û bapîrên wî re danîbûn, û hate bîra wî, ku gerek e pirtûkek li ser navê wî jî hebe, tê de rojên wî jî, mîna yên bav û

bapîrên wî hatine gotin, werin gotin. Gava ku qerêl ji bo wê yekê biryar da, wî zanî ji bilî Beydeba tukes nikare bi wî karî rabe. Rabû ew wesand, vê re bi tenê ma û jê re got: Ey Beydeba, tu hişmendê Hindistanê û feylesûfê wê yî. Ez di kewareyên<sup>1</sup> hişmendiye yên qeralên berî xwe de ramîm, min lê nêrî û dît, ku heryekî ji wan pirtûkek ji xwe re daniye, serdem û jiyana xwe tê de xuya kirine, û rewîşt<sup>2</sup> xwe û xelkê qeraltiya xwe hewal daye.

Hinan ji wan qeralan, ji ber hişmendiya ku li ba wan hebû, pirtûk ji xwe re danîne, hinan jî hişmendên wan danîne. Ez ditirsim tiştê ku bi serê wan hat bigihê min jî û di kewara min de pirtûkek tunebe ku ez tê de werim bibîranîn mîna çawa ên berî min bi pirtûkên xwe bi bîr tî. Min hez kiriye, ku tu pirtûkeke watekûr<sup>3</sup> ji min re dînî, tiştê di hişê te de heye tê de vala bikî, bila ji ser ve siyaset û perwerda xelkê be, û di hundir de jî sinciyên qeralan û siyaseta wan li derbara destlatê be da ku xelk xizmet û guhdariya qeralan bikin. Bi wî karî, gelek tiştên ku di warê karûbarên destlatdariyê de ji me re gerek in, dê ji ser min û wan jî rabin. Ez dixwazim ev pirtûka li dû min, li serdemên dirêj wek bîranîn bimîne, û bila li ser navê min be.

---

<sup>1</sup>.Keware: Xezîne.

<sup>2</sup>.Rewîşt: Perwerde û zanîn مؤدب، أدب

<sup>3</sup>.Watekûr: Kûrwate: Xwedî wateya kûr.

## Beydeba Pirtûka Kelîle Û Dîmne Danî

Gava Beydeba gotina wî bihîst, jê re daket ser çokan, serê xwe rakir û got: Ey qeralê bextewer, stêrka te bilind be, bedbextî ji te dût be, û rojên te berdewam bin. Ew rewanbêjiya<sup>1</sup> ciwan û hişdariya bilind ku li ba qerêl hene, ew wî bi ser karên payebilind de dibin. Qîreta wî ew gihand bilintirîn astên rûmetê û armancên herî dût. Xwedê dilşahiya qerêl berdewam bike û ji bo pêkanîna dilxwaziyên wî alîkar be. Ji bo ku ez bigihêmx daxwaziya wî, bila ew jî ji min re alîkar be. Bila qeral ji bo wê daxwazê li min ferman bike, ezê daxwaza wî pêk wînim û bi hemî zanîna xwe tê de bixebitim.

Qerêl jê re got: Ey Beydeba! Tu bi nêrîna baş û guhdarîkirina li karûbarên qeralan tê naskirin. Min ew tişt ji te naskiriye, ji bo danîna vê pirtûkê jî tu vebjartî. Ta ji destê te were der û hişê te digihê, tu xwe pê mijûl bikî. Bila rastî, henek, lîstik, hişmendî û felsefe tê de hebe. Beydeba bejna xwe ji qerêl re tewand, daket ser çokan û got: Tiştê qerêl -Xwedê serdema wî dirêj bike- ez pê ferman kirim, min jê re erê kir, min di navbera wî û xwe de jî demek danî. Qerêl got: Ew dema çiqase ye? Got: Salek e. Got: Min da te, û da ji bo amadekirina pirtûkê bibe alîkar fermana xelateke baş ji bo Beydeba da.

Wê hîngê, Beydeba pûnijî û got ewê çawa dest bi pirtûkê bike, wê bi çî şeweyê dîne. Wî rabû şagirtên xwe

---

<sup>1</sup>.Rewanbêjî: Xwedî zimanê rast û durust بلاغة.

civandin û ji wan re got: Qerêl ez bi karekî stubar kirime, ew ji bo min, we û welatê we jî serbilindî ye, min ji bo wî karî win civandine. Qeral Debşelîm ez stubar kirime, ku pirtûkeke bila ji hemî cureyên hişdariyê tê de hebin, dînim. Bila heryek ji we tiştêkî ji kîjan hunerê dibe bila bibe, dîne, pêşniyara xwe jî pêş min bike da ku pileya hişdariya we nas bikim, û nas bikin win di têgihîştina xwe de gihîştine kîjan asta hişdariyê?!

Wan got: Ey hişmendê sincîpak! Bi navê zanayê hişdar, bi ewê ku hişmendî, hişyarî, rewîşt û sincîpakî daye te, bi carekê ev yeka ne hate bîra me. Tu serok û sincîpakê me yî, rûmeta me bi te ye, geşbûna<sup>1</sup> me jî li ser destê te ye. Emê di tiştê ku te ferman kir de xwe biwestînin. Paşê tiştê ku qerêl li ser pirtûkê goti bû ji wan re hewalda, mebesta wî jî jê xuya kir, lê belê hişê wan ne çû ser wê yekê. Gava ku Beydeba tiştê dixwast li ba wan ne dît, wê hîngê wî nas kir û têgihîşt, ku ew kara tenê bi guvaştina hiş û bi karanîna ramanê pêk tê, û got: Ez dibînim geştî di deryayê de bi saya geştevanan durust dibe û dimeşe, çinkî ew wê têvedidin, bi saya rêberê wê û fermana wî kane sîngê deryayê biqelêşe, lê gava ku ew bi siwaran hate dagirtin û geştevanên wê pir bûn, ew ji noqbûnê ewle nabe.

Wê hîngê Beydeba pûnijî wê çî di deriyê destpêka pirtûkê de dîne! Wî li dawiyê biryar kir, ku ewê li gel mirovekî ji şagirtên xwe ku pê bawer bû, di pirtûkê de

---

<sup>1</sup>.Geşbûn: Biserxwehatin, Intî'aş.

bixebite. Wî rabû kaxezên ku xelkê Hindistanê tişt li ser dinivîsand amade kirin, xwarina ku dê di wê salê de tere wî û şagirtê wî bike danî, di xanîkî de rûnişt, derî li xwe girt û dest bi ristina pirtûkê û dabeşkirina wê kir, wî digot û şagirt dinivîsand û paşê lê vedigerî, û bi wî rengî şev û roj derbas bûn ta pirtûk bi şêweyê herî rast û durust nivîsand û bi dawî kir. Beydeba panzdeh derî di pirtûkê de durust kirin, her deriyek bi serê xwe bû, di her deriyekî de pirs û bersiva wê jî hebû, da ji bo yê ku lê binêre hişdarî û ronîkirin be, û hemî derî jî xistin pirtûkê û navê ((Pirtûka Kelîle û Dîmne)) lê kir.

Di pirtûkê de, wî gotin li ser zimanên lawir<sup>1</sup>, cinawir û tilûran hewal dan. Mebesta wî jê ew bû, ku di rû re ji xelkê sade û kesên payenizim re kêfxweşî be, di hundir de jî ji hişên kesên payebilind re werziş<sup>2</sup> be. Tiştên ji mirov re gerek dibe da ku xwe, malbat û kesên xwe pê perwerde bike jî tê de hebe. Her tiştê gerekî ol, cîhan, dawîya wî û jiyana zaroyên wî dibe û guhdarîkirina xelkê ji qeralan re jî tê de hebe. Tiştê ku qeralan ji ser ji karên ne baş be bide alî jî tê de hebe. Wî ew ji derve û hundir de mîna hemî pirtûkên hişdariyê kir, bi wê şêweyê jî lawir dibe pêkenok, û tiştê dibêje jî hişdarî<sup>3</sup> û perwerde ye.

Gava ku Beydeba dest pê kir, wî despêka pirtûkê ji bo salixdana dostan, gerek e dost çawa be, danî, û çawa

---

<sup>1</sup>.Lawir: Dewar, حيوان

<sup>2</sup>.Werziş: رياضة

<sup>3</sup>.Hişdarî: Hişmendî, El Hîkme الحکمة

hezkirina durust bi pêlana nemerdekî<sup>1</sup> tê birîn jî xuya kir. Wî şagirtê xwe ferman kir, da ku li ser zimanê Beydeba, wekî qerêl merc kiri bû, binivîse, da ku bibe pêkenok û hişdarî jî.

Beydeba bi bîr anî jî, eger gotinên gotyaran<sup>2</sup> ketin nava hişdariyê, ew wê gendele<sup>3</sup> dikin û hişdariya gotinê ne tê zanîn. Herweha, ew û şagirtê xwe di daxwaza qerêl de pûnijîn ta hişê wan çû ser wê yekê, ku gotina wan li ser zimanê du dewaran be, pêkenok, teselebûn<sup>4</sup> û hişdarî jî di nava gotinan de hebe. Bi wî rengî, hişmend wê dewêr û henekan bidin aliyekî, li hişdariyê guhdar bin û zani bin ku sedema bikaranîna axaftinê di navbera dewaran de hişmendî ye. Nezan jî wê ji hevpeyvîna du dewaran seyr<sup>5</sup> bibin, hişdariya di nava wê de nabînin, wek pêkenok bibînin, têgihîştina wateya gotinan berdîn û mebesta ji bo wê hatiye danîn jî nas nekin. Ji ber ku mebesta feylesûf ji deriyê pirtûkê ê sereta bide zanîn, çawa birader bi hev re didin û distînin, hezkirin bi parastina ji fisûkan<sup>6</sup> û bi hajêkirina<sup>7</sup> ji kesên ku dijmantiyê dixin navbera evîndaran tekûz<sup>8</sup> dibe û tê parastin, dê çawa haya xwe jî ji kesên ku

---

1. Nemerd: Nemirov, mirovê pîs û ne dilsoz.

2. Gotyar: Ewên ji gotinan dibêjin خطيب.

3. Gendele: Xerab, kavi, pîs.

4. Teselebûn: Pê tesele bibin û sebra xwe pê wînin تسلية

5. Seyr: Mat, Ecêb عجب

6. Fisûk: Kesê ku şor û viran digihîne hinên din.

7. Hajêkirin: Haya xwe jê bibe.

8. Tekûz: Teqez تأكيد.



dijmantiyê dixin navbera hezkiriyên bibin û bi wê şeweyê ewê sûdê jê wergerin.

## Beydeba Pirtûk Bi Qerêl Dide Nasîn

Li ser wê biryarê, Beydeba û şagirtê xwe di xanîkî de man ta pirtûk di salekê de bi dawî kirin. Dema sal sergihayî<sup>1</sup> bû, qerêl ew agahdar kir û got: Sal bidawî bû, te çi kir? Beydeba jî lê vegerand û got: Ez li ser sozê min dabû qeralê xwe me, bila min ferman bike, şênîyê qeraltiyê jî bicivîne, da ku pirtûkê bi amadebûna wan bixwinim. Gava şande vegeerî ba qerêl, ew pir şa bû û soz da, ewê li rojekê şênîyê qeraltiyê bicivîne. Paşê wî hemî welatê Hindistanê agahdar kir, da ku li xwendina pirtûkê amade bibin. Gava ku ew roja hat, qerêl ferman da, da ku textekî mîna yê wî ji Beydeba re venin, daniştekan ji lawên qerêl û zanyaran re jî dînin, û weha hat kirin.

Dema ku şande hat ba Beydeba, wî jî rabû cilên ku pê derbas ba qeralan dibûn li xwe kirin, ew jî ji rîsê reş bûn, û şagirtê wî jî pirtûk hilgirt. Gava ku derbas ba qerêl bû, hemî xelk ji ber rabûn, qeral jî rabû ew spas kir, û gava nêzîk qerêl bû, xwe jê re xwar kir, daket ser çokan û serê xwe ranekir. Qerêl jê re got: Ey Beydeba, serê xwe rake! Ev rojeke xweşî, şahî û dilşadiyê ye, û ew ferman kir ku rûne.

Ji bo ku Beydeba pirtûkê bixwîne, li ser têxt rûnişt, qerêl li ser wateya her deriyekî ji deriyên pirtûkê û mebesta danîna wê pirs kir? Beydeba jî mebesta xwe ji her deriyekî jê re xuya kir. Bi wî rengî, qeral her çû bi pirtûkê

---

<sup>1</sup> .Sergihayî: Temam bû, kuta bû. Bidawî hat.

mat<sup>1</sup> û kêfxweş bû û jê re got: Ey Beydeba! Te ji tiştên ku di dilê min de ne tiştekan berneda û hemî got. Ev bû tiştê ku min dixwast. Tu çî dixwazî bixwaze û ferman bike! Beydeba bi dilşadî û kêfxweşî jê re tika<sup>2</sup> kir û got: Ey qeralê me! Sebare<sup>3</sup> peran, pêdviya min pê tune, ji bo cilan jî, ji cilên ku li min in çêtir naxwazim, lê ez qerêl ji xwastekeke xwe bêpar nahêlim, qerêl got: Ey Beydeba! Xwasteka te çî ye? Eger xwasteka te çî be wê pêk were!

Got: Bila qeral ferman bike, ev pirtûka ku min ji te re nivîsandiyê, mîna çawa bav û bapîrên te pirtûkên xwe nivîsandin, ew jî were nivîsandin û parastin. Ez ditirsim ew ji Hindistanê derkeve, û eger xelkê Faris pê haydar bibe, ewê ji xwe re bibin. Herweha qerêl ferman da, da ku ew ji Mala Hişdariyê<sup>4</sup> dernekeve; û paşê qerêl şagirtên wî jî vexwendin û xelatên baş dane wan jî!

Pişt re, û dema ku Kîsrayê Enûşêrwan qeralî wergirt - wî jî ji pirtûk, zanîn û wêje pir hez dikir, û dixwast dîrokên kevin zani be- nûçeya vê pirtûkê gihîştê, û ew ranewestî ta bijîşk Berzewê şand, wî jî xebat kir, pirtûk ji Hindistanê derxist û xiste kewareyên Faris.

---

<sup>1</sup>.Mat: Seyr, şêt, bihitîn دهشة عجب.

<sup>2</sup>.Tika: Lave دعاء.

<sup>3</sup>.Sebare: Bi taybet بخصوص.

<sup>4</sup>.Mala hişdariyê: بيت الحكمة.

**Deriyê**  
**Şandina Kîsrayê Enûşêrwan Kurê Qebad**  
**Bijîşk Berzewê Bo Hindistanê Ji Bo**  
**Bidestxistina Pirtûkê**

Xwedê mirov bi dilovaniya xwe çêkir, rindî û camêriya xwe bi ser de berda, bi qaserî pê jiyana xwe durust bike rozî<sup>1</sup> dayê, da ku kari be giyanê xwe ji êşa pişdawayî<sup>2</sup> xelas bike. Baştirîn roziya ku Xwedayê gewre daye mirov û rindiya pê kiriye jî hiş e, çinkî ew bingeha her tiştê ye, bê wî kesek nikare jiyana xwe di cîhanê de durust bike, ne jî sûdekê wergire û xwe ji zianê biparêze.

Herweha, ewê ku doza pişdawayî dike, û di karê ku pê giyanê xwe rizgar bike de dixebite, ew nikane bê hiş xebata xwe bi dawî û sergihayî bike; ji ber ku hiş sersedema<sup>3</sup> her çêxwazî û kilîta her şabûnekê ye, û kesek nikare bê hiş bijî. Hişdarî jî bi taqe<sup>4</sup> û perwerdê bi dest dikeve. Ew pergalek e xwezayî ye, di hinava mirov de ye, ew mîna agirê di nava kêvir de veşartî ye, dernakeve û ronîya wî ne tê dîtin ta kesek wî li hev dide; eger li hev da, xwezaya wî diyar dibe û tê nasîn. Herweha, hiş jî di nava mirov de ye, ew jî dernakeve ta perwerde wî diyar bike û taqe wî xurt bike. Û kê roziya hişdariyê bi dest ket, ew

---

<sup>1</sup>.Rozî: Rizq, tiştê ku Xwedê dide jîndaran.

<sup>2</sup>.Êşa pişdawayî: عذاب الآخرة.

<sup>3</sup>.Sersedem: Sedema sereke.

<sup>4</sup>.Taqe: Tecrîbe تجربة

rindî pê hate kirin û gotina wî bi perwerdekirinê baş bû, ew bextewar dibe, di jiyana xwe de digihê hêviyên xwe û li pişdawiye jî perûya<sup>1</sup> durustkaran<sup>2</sup> bi dest dixe.

Xwedê hişekî baş dabû qeralê dilşa Kîsrayê Enûşêrwan û ji zanîne pir hez dikir; wî ji tiştan ji tiştên dudrustir, ji karan jî ji ê çalaktir, û ji hêla lêkolîna ji bo kok û şaxên tiştan jî ji ên sûdartir hez dikir. Ew di cureyên zanîne de gihîştî bû asteke bilind ji felesefe ku tu qeral berî wî ne gihîştî bûne. Ta rojekê di nava daxwaz û lêgerîna xwe de nûçeya pirtûkeke ku li Hindistanê heye gihîştê, û nas kir ku ew bingeha her perwedeyê, serê her zanînekê, rêbera her sudekê, kilîta karûbarên pişdawiye û nasîna wan, û siwarîka<sup>3</sup> rizgariya ji xişmûbêtaran<sup>4</sup> e jî.

### **Çûna Berzewê Ji bo Destnivîskirina Pirtûkê**

Wê hîngê, Enûşêrwan wezîrê xwe Buzergumehir<sup>5</sup> ferman kir, da ku mirovekî hişmend û zana ji xelkê qeraltiyê bibîne, bila bi zimanê Farisî baş zani be, bi zimanê Hindî jî jîr be, ji bo bidestxistina zanîne û pirtûkên felsefe zana û jêhatî be, ji bo wêjevaniyê û lêgerîna ji bo pirtûkan jî cefakêş be. Wezîr çû, mirovekî hişmend û perwerdekar jê re anî, ew di karê bijîşkiyê de zana bû, bi

---

1.Perû: Sewab ثواب

2.Perûya durustkaran: Çêsezaya mirovê durust û çêkar ثوابالصالحين

3.Siwarîk: Tiştê ku mirov lê siwar dibe û dide rê, مركبة.

4.Xişmûbêtar: Belayên mezin.

5 . Navê wî bi farisî wiha dihat nivîsandi: بزرگمهر Bextigan. Ew wezîrê Nûşêrwan bû û li ser destê wî jî hate kuştin.

zimanê Farisî û Hindî jî jêhatî bû, navê wî Berzewê kurê Ezher bû. Dema ku ew derbas ba qerêl bû, wî xwe jê re xûz<sup>1</sup> kir û di nava destên wî de daket ser çokan. Qerêl jê re got: Ey Berzewê! Gava min zanîn û hişdariya te bi rindî bihîst, û xemxariya te ji bo zanîne -eger li kû be jî- nas kir, min ji bo wê armancê tu vebjartî. Çinkî min bihîstiyê, ku pirtûkek di kewareyên Hindistanê de heyê, navê wê ((Kelîle û Dîmne)) ye, û rabû çêroka wê jê re got, tiştê li ser bihîsti bû jê re hewal da, û got: Xwe amade bike, ezê te bişînim welatê Hindê, tuyê jî bi hişê xwe ê zelal, sinciya xwe a baş û nêrîna xwe a çak, wê pirtûkê bi riya zanyarên wan ji kewarên wan derîne û sûdê li xwe û li me jî bikî, û çî pirtûkên Hindistanê ku di kewarên me de tunene bi xwe re hilgirî û wîne. Çî dirav<sup>2</sup> jî ji bo te gerek in, bi xwe re bibe. Tu di wî karî de bilezîne û ji bo bidestxistina zanînan kêmaniyê meke, ta eger te dirav jî pir lê çûn. Bila tu zani bî jî, ku hemî tiştên di kewarên min de ji bo bidestxistina zanîne û vê pirtûkê ji te re rewana ne. Qerêl ferman da jî, da ku remildaran<sup>3</sup> bicivînin; ew civiyan û roj û kateke lêhatî ji bo ku Berzewê tê de derkeve rêwîngiyê vebjartin, bîst gore pere jî, di her gorekê de deh hezar Dînar hebûn, danê û ew verêkirin.

---

<sup>1</sup>.Xûz: Pişta xwe daxist, xwe xwar kir.

<sup>2</sup>.Dirav: Pere.

<sup>3</sup>.Remildar: Ewê ku remlê davê, û tiştê nediyar dibîne.

Dema ku Berzewê gihîşt Hindistanê, ew li ber dergeha qerêl gerî, li civakên zazûtan<sup>1</sup> jî amade bû. Li kesên ku ji qerêl ve nêzîk bûn, li payedaran, li zaniyar û feylesûfan jî dipirsî, diçû seredana wan, bi hezkirin xêrhatina wan dikir û ji wan re digot, ku ew mirovekî biyanî<sup>2</sup> ye, ji bo bidesxistina zanîn û rewîştê hatiye welatê wan û di daxwaza xwe de bi pêdvî û hêviya alîkariya wan e. Herweha, ew demeke dirêj wergî<sup>3</sup> ma, wî rewîsta ku berê jî pê zanî bû ji zanyarên Hindê radikir û zanîna xwe dewlementir dikir, lê belê ji wan re dida xuyakirin ku ew berê bi tiştêkî nizane, û bi wê yekê daxwaz û mebesta xwe vedişart.

Di wê dema dirêj de, wî gelek dost ji gernas, zanyar, feylesûf, bazirgan û ji her qad û pîşeyekê nas kirin û kirin dost. Lê ji nav wan dostan, wî mirovekî taybet nas kiri bû, ji xwe re kiri bû cihê nehêna<sup>4</sup> xwe û pê radiwêjî; ew jî mirovekî çekar û zana bû, biratiyeke durust jê diyar dibû û di tiştê pê mijûl dibû de jê re vedihesî, navê wî Erzewê bû. Lê belê Berzewê tiştê ku ji bo wê hati bû jê re xuya ne ne diki, wî ew taqe û ezmûn dikir, da nas bike ew hêja ye ku nehêna xwe bidê lê na. Gava ku wî bawerî bi dostê xwe ê hindî kir, tiştê di hişê wî de nas kir, dilê xwe jî jê re vehesî û pê ewle bû. Rojekê ew bi hev re rûnişti bûn, jê re got:

---

<sup>1</sup>Zazût: Kesên li ortan, yên bê kar û sincî.

<sup>2</sup>.Bêgan: Xerîb.

<sup>3</sup>.Wergî: Wanî, wiha, weha, werg, wilo, hanekî, bi wî rengî...

<sup>4</sup>.Nehên: Veşarte, سر

Kekê min, ji vê bêtir ez nikanim daxwaza xwe ji te veşêrim, çinkî bi rastî tu cihê baweriyê yî!

Bila tu zani bî, ku ez ji bo karekî hatime welatê we, ew jî ne tiştê ku ji min diyar dibe û tê nasîn e, lê belê hişmend kane li rûyê mirov binêre û nehêna wî û çî di dilê wî de ye nas bike. Dostê wî ê hindî jî jê re got: Eger min dest pê ne kir û ji te re ne got tu ji bo çî hatî û çî dixwazî, tiştê ku tu dixwazî jî ji min vedişêrî û bilî wî xuya dikî, û ew tiştê jî ji min ve diyar e û ne veşartiyê, ew hemî ji ber dilxwaşiya min ji bo te bû, û ji bo biratiya min bi te re ye. Loma jî min hez ne kir wî tiştî bidim rûyê te. Tiştê ku tu ji min vedişêrî, ji zû de ji min ve xuya bûye, û ji ber ku te got, diyar kir û li ser axivî, ezê li ser te ji te re hewal bidim, yê hundirê te ji te re xuya bikim, û tiştê ku tu pê hatî jî bi te bidim nasîn.

Tu hatî welatê me, da ku samanên<sup>1</sup> me ên buha ji me bibî welatê xwe û qeralê xwe pê şa bikî. Hatina te bi qelaşî bû, dostaniya te jî bi dibare bû. Lê belê, dema ku min sebra te dît, û dît çawa tu li daxwaza xwe berdewam î, û digel ku tu demeke dirêj jî li ba me mayî, te xwe girt û tu şor ji te derneketin ku em tiştê di dilê te de û karê te pê nas bikin. Wê hîngê, min biratiya te pir xwaş dît, bi hişê te bawer bûm û ji dostaniya te hez kir. Min di nava mêran de mêrekî ji te hişmentir ku rewişt, perwerde û bînferehiya ji bo bidestxistina zanîne û veşartiya xwe diparêze rintir<sup>2</sup> ne

---

<sup>1</sup>.Saman: kenz, كنز

<sup>2</sup> .Rintir: Rindtir.



dît; bi taybetî jî li welatê bîyanîyê, li xakeke ku ne xaka te ye û li ba miletekî ku tu sinciyên wan nas nakî. Bila tu zani bî, ku hişê mirov bi heşt salixan<sup>1</sup> tê nasîn, **Yek:** Dilovanî. **Duyem:** Mirov xwe nas bike û xwe biparêze. **Sêyem:** Ji qeralan re guhdar be û zani be ew bi çi qayîl<sup>2</sup> dibin. **Çarem:** Mirov cihê nehênên xwe nas bike, û zani be çi û çawa ji dostê xwe re bêje. **Pêncem:** Li dergehên qeralan perwer û zimanxweş be. **Şeşem:** Nehênên xwe û bilî xwe biparêze. **Heftem:** Bi zimanê xwe kani be, û tenê bi tiştê ku dawîya wê bi ewle ye, baxive. **Heştem:** Li civatan, ji bilî tiştê jê were pirsîn deng neke.

Eger ev salix li ba kê kom bûn, ew bi xwe rindiyê ji xwe re dixwaze û bi dest dixê. Ev salix tev jî li ba te civiyane û ji min ve xuya bûne. Bila Xwedê te biparêze, ji bo tiştê ku tu pê hatî ji te re alîkar be û te bigihîne doza te. Te dostanî bi min re kir, ji bo ku tu saman û tiştên hêja û zanîna me bibî, lê tu hêja yî ku pêdviya te pêk were, li daxwaza te erê bibe û di doza xwe de bi serkevî. Lê belê daxwaza tu pê hatî, ez tirsandim û xem û tirs xiste dilê min.

Gava Berzewê nas kir, mirovê hindî zane ku dostaniya wî jê re qelaşî û dibare bû, lê belê bi daxwaza ku jê xwast jî ne enirî<sup>3</sup> û poşman ne bû, li bervajî wê, ew mîna biraderekî bi nermî û xweşî pê re axivî û lê vegerand. Wê

---

<sup>1</sup>.Salix: Wesif وصف

<sup>2</sup>.Qayîl: razî.

<sup>3</sup>.Enirî: Qîherî, xeyidî.

hîngê, wî bi cihatina daxwaza xwe bawer kir, û jê re got: Min gotinine pir ji te re amade kiri bûn, pir şax jê kişandi bûn, bingeh û rê jî jê re danî bûn, lê dema ku tu gihîştî dawîya gotina xwe, û piştî te ji min re xuya kir, ku te pîrsa min nas kiriye û te bi xwe ji min re got, ku ji bo çi hatime, û dilxwaşiya xwe jî ji min re xuya kir. Min bi ew gotineke pir hindik bi te re bes kir, çinkî te bi gotina min a pir hindik armanca min nas kir, ew jî ji ber hişê ku Xwedê daye te. Te ne hîşt ez deng bikim, min jî bi te re kin birî; min bi alîkariya te ji bo pêkanîna pêdviya xwe, camêrî û dilsoziya te a hêja nas kir. Eger gotin ji feylesûf re hate kirin, nehên jî li ba hişmendê parêzvan hate danîn, ew têne parastin û xwediyê wê digihê dawîya hêviya xwe, wekî ku çawa tiştên buha di kelayên parastî de tên veşartin.

Hindî jê re got: Tiştêk ji hezkirinê rintir tune. Yê ku hezkirina wî pak û durust be, hêja ye mirov wî têxe dilê xwe, tiştêkî jê kêr neke û jê veneşêre, eger pê kanî jî, gerek e daxwaz û pêdviya wî pêk wîne.

Parastina nehênê jî navnîşana rewîştî pak e. Eger nehên li ba dilsozê nehênparêz<sup>1</sup> hate danîn, ew tê parastin û wî nabe, ji ber ku ewê pê deng neke û dernexe. Eger diduyan bi nehênê zanî û pê deng kirin, ew namîne nehên, çinkî yekî sisiyê jî dê ji yekî ji wan bibihîse, eger ew gihîşt sisiyan jî, ew tê belavkirin û deng dide; wê hîngê xwediyê wê nikare veşêre, mandel<sup>2</sup> bike û bervaniyê ji ber ve bike;

---

<sup>1</sup>.Nehênparêz: Nehênan diparêze حافظ السر.

<sup>2</sup>.Mandel: Înkâr.

mîna `ewrê ku li ezmên qutqutî bin, û yek bêje: Ev `ewrina qutqutî ne, wê hîngê kesek nikare wî virek derxe.

Hezkirin û danûstandina te ketiye dilê min û pir pê şa bûme. Ev tiştê ku tu ji min dixwazî, ez rind zanim ku ji nehênên ne tên veşartin e; bêguman ewê rojekê were hewaldan û derkeve, xelk wê pê deng bike, û eger derket jî, wê hîngê tu min dajoyî ser mirina min, û ezê nikaribim bi pereyên pir jî wê ji ser xwe rakim; ji ber ku qeralê me pir zordar û serhişk e, li ser gunehên biçûk sezayên mezin dide, lê çawa li ser ev gunehê mezin?! Eger hezkirina di navbera min û te de kir ku ez daxwaza te bi cih wînim, sezaya wê dê ji ser min ranebe.

Berzewê got: Eger Zanyar nehêna dostê xwe parast û ji bo serketina wî bû alîkar, ew xwe bilind û bi rûmet dike. Ev karê ku ez pê hatime min ji te re hîşt, û ez dixwazim bi saya te bigihêmê. Ez bi comerdî û hişmendiya te bawer im, ez zanim tu ji min natirsî, û natirsî jî ez wê nehênê derînim; lê belê tu ji kesên mala xwe, ên li derdora te ditirsî ku wê nehênê derînin û bigihînin qerêl. Ez hêvîdar im tişteke ji wî karî dernekeve; çinkî ez rêwî me, lê tu niştecih î, û ta ez li vir im kesê sisiyan wê di nav me de tunebe. Bi wî rengî, wan her duyan li ser vê yekê peyman dane hev.

Ew Hindiyê ku vê re bû dost xeznedarê<sup>1</sup> qerêl bû, û kilîtên kewareyên wî di dest de bûn. Wî rabû ew pirtûka û

---

<sup>1</sup>.Xeznedar: Berpisê Xezînê.

bilî wê jî dane Berzewê, ew jî li ser rûnişt û ji zimanê hindî wergerandin zimanê farisî, wî xwe pir westand, û bi şev û rojê xebitî, lê belê ew herdem ji qeralê Hindê bi tirs bû. Ew ditirsî ku qeral ji nişkave pirtûkê bixwaze û di kewarên xwe de nebîne.

## **Vegera Berzewê Li Gel Pirtûka Kelîle û Dîmne**

Gava ku Berzewê wergerandina pirtûkê û bilî wê jî kuta kirin, ji Enûşêrwan re nivîsand û ew agahdar kir. Dema ku name gihîşte Kîsra, ew pir şa bû, lê ew tirsî ku tiştêk bibe û şabûna wî ji dest here. Loma jî, wî ji Berzewê re nivîsand û jê xwast ku zû vegere, Berzewê jî zû vegeirî û hate ba Kîsra.

Wê hîngê, û gava qerêl dît ku Berzewê çiqas zer bûye û westiya ye, jê re got: Ey dilbendê şîretkar<sup>1</sup>, ji Berhema ku çandiye dixwe; tu rûgeş û dilşa be, ezê te rûmetdar bikim, te bigihînim astên herî bilind, û jê xwast heft rojan canê xwe vehesîne. Gava roja heştan hat, qerêl ferman da, da ku payedar, zanyar, helbestvan û gotarbêjên qeraltiyê li ba wî amade bibin. Gava ku ew civiyan, ferman da Berzewê jî da ku li civatê amade bibe, ew jî li gel pirtûkan amade bû, li ber destên qerêl çû ser çokan û rabû li cihê ku jê re amade kiri bûn rûnişt, dest pê kir û li ser tiştê dîti bû û pê re bû bû deng kir, û çêroka xwe ji destpêkê û ta dawiyê hewal da. Wê çaxê, hemî kesên ku gotina wî bihîstin mat

---

<sup>1</sup>.Dilbendê şîretkar: المخلص الناصح.

man, Berzewê di çavên wan de mezin bû û payedariya wî li ba qerêl pir bilind bû. Paşê, qerêl rûniştinek ji wan re amade kir, Berzewê, gotarbêj, rewanbêj û şalyarên dewletê lê amade bûn, û pirtûka Kelîle û Dîmne û pirtûkên din jî anîn ji şêniyê qeraltiyê re ku amade bû bûn hatin xwendin.

Dema ku pirtûk hatin xwendin, û pend û zanîna ku tê de hebûn bihîstin, ew pir şa bûn, pesna Berzewê dan û ji ber westana ku dîti bû spasiya wî kirin. Paşê, qerêl ferman da, da ku kewareyên lûlû, zeberced, yaqût, zêr û zîv ji Berzewê re vekin; ferman da jî ku çî ji mal û cilan dixwaze bibe bila ji kewaran bibe, û got: Ey Berzewê! Min ferman da, ku tu tacekê bidî serê xwe, li ser textekî mîna textê min rûnî, û bibî serokê hemî comerdan. Wê hîngê, Berzewê çû ser çokan, jê re lave kirin, ji Xwedê hêvî kir û got: Xwedê qerêl li cîhanê û pişdawayê rûmetdar bike, milkê wî herdemî bike û li şûna min wî çêseza bike. Bi ya Xwedê ez bi roziya ku ji destê qeralê bextewer gihaye min dewlemend im; pêdviya min jî bi mêl tune; lê ji ber ku qerêl ferman kir, min jî nas kir ewê pê kêfxweş bibe, ezê li ser fermana wî herim kewaran û tiştan jê bibim. Piştî, ew çû xezîna cilan û destek ji cilên qeralan jî çêkirina Xurasanê birin.

Gava Berzewê cilên ku vebjartin birin, ji qerêl re got: Xwedê qerêl rûmetdar bike û temenê wî dirêj bike. Bê guman, eger mirov camêrî kir, gerek e were spaskirin. Eger ez westiyam û min cefa dît, min zanî, ku razîbûna

qerêl di wê yekê de heye; westan, dijwarî û cefaya min dît, dê ji we û ji xwediyê vê malê re serbilindî be! Ta roja îro ez razîbûna we dixwazim, di wê rêkê de dijwariyan hêsan û sivik dibînim, ziyar û êşê jî wek xweşî û şahiyê dibînim, ji ber ku ez zanim razîbûna we û nêzîkbûna min ji we tê de heye. Lê qeralê min, ez tiştêkî ji te dixwazim, eger ew bi cih were, tuyê min pê dilxwaş bikî û daxwaza min bi cih bînî, pêdviya min jî hêsan e, lê belê di bicihanîna wê de sûdeke mezin ji bo min heye. Enûşêrwan got: Bêje! Her pêdviyeke te ji hêla me de pêkhatî ye, em ji daxawzên te re nabêjin na, eger te xwast di milkê me de jî bibî pişikdar<sup>1</sup>, dîsa em nabêjin na! Ma çawa tiştine din? Bêje û bixwaze; her tiştêkî ji te re rewa<sup>2</sup> ye. Berzewê got: Qeralo! Li westana min ji bo razîkirina te û guhdarîkirina min ji bo te menêre, ez koleyê te me, ezê dilê xwe diber te de bidim. Eger tu min çêseza nekî jî ew li ba min tiştêkî ne mezin e, ne jî li ser qerêl erk e; lê bêguman, ji ber camêrî û rûmeta destlatdariya te, tuyê me çêseza bikî, paye û radeke bilind jî bidî min û malbata min. Ez zanim eger qeral kani be rûmeta cîhanê û pişdawayî jî ji bo me baş bike, dîsa wê bike û kêmaniyê nakê! Xwedê te ji bo me, bi baştirîn çêseza seza bike.

Enûşêrwan got: Pêdviya xwe bêje, ezê te şa bikim. Berzewê got: Daxwaza min ji Qerêl -Xweda asta wî bilind bike- şalyarê xwe Buzergumehir kurê Elbextekan ferman

---

<sup>1</sup>.Pişikdar: Pareke xwe tê de heye.

<sup>2</sup>.Rewa: Bi rêdan û destûr.

bike, da ku rewşa min di warê destnivîs û anîna vê pirtûkê de xuya bike, tê de karûbarê min bi bîr wîne, ta kani be pesna min bide, zêde bêje û bike deriyek ji deriyên pirtûkê. Eger ew bidawî kir, bila wê li pêş deriyê " Gê û Şêr " dîne û bike deriyê pirtûkê ê yekê. Eger qerêl wilo kir, ewê min û xwediyên min bigihîne rûmeta her mezin, payedariya her bilind û bîranîna me jî ta dawiyê û her ku ev pirtûka were xwendin wê bi bîr were û bimîne.

Dema ku Kîsra û gewremerdan gotina wî bihîst, û çawa hez dike ku navûdengê wî jî li jiyanê bimîne, wan daxwaz û vebjartina wî baş dîtî û Kîsra got: Berzewê! Rûmet û hezkirina me ji te re ye, tu hêja yî daxwaza xwe wergirî. Tiştê tu pê qayîl bûyî û bes kiriye li ba me pir hindik û hêsan e, ra eger li ba te pir mezin jî xuya dibe.

Paşê Enûşêrwan berê xwe da şalyarê xwe Buzergumehir û jê re got: Te çêkariya ku Berzewê bi me re kir dît, çawa wî tirs û mirin bi çavê xwe dîtî da ku ji me ve nêzîk bibe, û çawa xwe westand da ku me şa bike. Rindî bi me kir, hişdarî û rewîştî ku serê me pê bilind e jî Xwedê li ser destê wî da me; ji bo ku em wî çêseza bikin jî, me tiştên kewareyên xwe li ber gerandin, lê dilê wî bi ser tiştêkî de ne çû; daxwaz û mebesta wî li ba me tiştêkî hêsan e, lê belê li ba wî rûmeteke pir gewre ye. Bila ew daxwaza wî ji bo wî çêseza be; ez dixwazim tu wê yekê li destê xwe bigerînî û daxwaz û pêdviya wî pêk wînî. Bila tu zani bî, ku ew kara min jî kêfxweş dike, bila tu di ber de biwestî, tiştêkî ji zêdegotinan nehêlî û hemî bixê, ra eger

tu êşekê jî di ber de bibînî. Daxawaz jî ew e, tu deriyekî mîna deriyên di pirtûkê de hene binivîsî, tê de rindiya Berzewê li ser me bi bîr wînî, destpêka jiyana û karûbarên wî çawa bûn binivîsî û li ser navê wî dînî, pişê û kesayetiya wî, çûna wî ya Hindistanê ku li ser daxawaza me bû, bi bîr bînî. Me çî sûde jî ji wir li ser destê wî dît, çawa em pê serbilind kirin û çawa Berzewê ji Hindistanê vegeştî, giştî hewal bidî. Tu çiqas kanî wî bipesninî û bilind bikî, bike, da ku ji Berzewê û jî şêniyê qeraltiyê re bibe şahî û xweşî. Berzewê jî, ji ber hezkirina wî ji zanînê, ji min, ji hemî şêniyê qeraltiyê û ji te re jî pir hêjayê pesnê ye. Bila bala te lê be, da ku nivîsa li ser Berzewê li ba kesên derdora me û ji tevaya xelkê re ji deriyên pirtûkê ên din çêtir be, û tu bikî deriyê pirtûkê ê yekê; wê hîngê, bi danîna pirtûkê tuyê jî bibî mirovê her bextewer. Eger te ew kara bi dawî kir, û di cihê wî de danî, min agahdar bike, da ku ez şêniyê qeraltiyê bicivînim û tu ji wan re bixwînî, bila westan û rindiya te ji bo hezkirina me xuya bibe û ji te re bibe serbilindî.

Gava ku Buzergumehir gotina qerêl bihîst, ew li ser çokan daket û got: Xwedê te bihêle qeralo! Te li vê cîhanê û li pişdawiye bigihîne baştirîn astên durustkaran. Te ez bi wê yekê bi rûmeteke mezin rûmet kirim, ew yeka jî wê ta pişdawiye bimîne. Paşê Buzrecmehere ji ba qerêl derket û çû.

Wê çaxê, Buzergumehir jî, çawa Berzewê ji roja yekê de ku bavê wî ew şandi bû ba mamoste hewal da, û çawa



ji bo peydakirina dermanan çû Hindistanê, nivîs û zimanê wan fêr bû, û ta dema ku Enûşêrwan ew ji bo peydakirina pirtûkê şand Hindê giş nivîsand, û ji rindî, hişmendiya Berzewê, sincî û baweriyên wî tişteke ne hîşt, hemî nivîsandin û bi şêweya her ciwan şirove kirin.

Paşê, Buzergumehir qeral agahdar kir ku wî karê xwe bi dawî kir. Enûşêrwan jî rabû payedarên milletê xwe û şêniyê qeraltiya xwe li ba xwe civandin, Buzergumehir jî ferman kir ku pirtûkê bixwîne. Berzewê jî li kêleka Buzergumehir sekinî, dest pê kir û salixa Berzewê da, ta gihîşt dawiya nivîsê. Wê çaxê, qeral bi hişdarî û zanîna Buzergumehir ku di nivîsa xwe de danî bû, pir şa bû. Piştî, qerel û hemî kesên ku li wir amade bû bûn destxweşiya Buzergumehir kirin, pesna wî dan û ew spas kirin. Qerel jî perene pir, cilûberg û gelek tiştên hêja dane Berzewê, lê wî ji bilî hin cilên qeralan tişteke nebirin, Berzewê jî spasiya wî kir, serî û destê wî maç kirin, berê xwe dayê û got: Xwedê milk û şahiya ku li ser te ye berdewam bike, bi fermana te ji Buzergumehir re ji bo danîna vê nivîsê, te ez û xwediyên jî min gihandin rûmeta herî bilind.

\*\*\*

\*\*\*

# Deriyê Danasîna Pirtûkê

## Ji danîna Wergêrê Pirtûkê

### Ebdella kurê Muqefe'<sup>1</sup>

Ev pirtûka Kelîle û Dîmne ye, ew şor û gotinên zaniyarên Hindistanê ne. Wan gotinên herî bi wate û bi rengê ku xwastine, xistine nava wê. Zanyarên her miletekî hewil didin hişdarî ji ba wan derkeve û ji wan were birin, ji bo wê jî, ew ton bi ton<sup>2</sup> fêlbaziyar dikin, dixwazin çi şêwe û zanyarî li ba wan hebin derînin, ta gihîştine radekê ku wan ev pirtûka li ser zimanê lawir û balindeyan<sup>3</sup> danîne û bi wê yekê tiştine pir baş û hêja derhatine.

Wan li aliyekî, şor û gotin dîtine û jê birine û di rêça ku dixwastin pê de herin de çûne. Lê belê pirtûkê hişmendî û

---

1. Navê wî yê resen Rozbe kurê Dadewê ye(106-142)G/(724-759)Z. Li bajerekî bi navê (Cûr/Fêrûz Ebada niha) ji welatê Faris ji dayîk bûye. Dê û bavên wî (Mecûs/Zeredeştî) bûn, ew hatine li besrayê rûniştine û Rozbepûr li wir hatiyê cîhanê. Bavê wî, qaserî ku Hecacê Seqefî ew êşandi bû, destên wî xwar û çolaq bû bûn, loma jî jê re digotin (Ibin El Muqefe`/Çolaq). Gava ku Rozbepûr misliman bû, wî navê xwe kir (Ebdella Bavê Mihemed). Lê hinek dibêjin ew paşê ji ola Mislimantiyê derket. Jêder dibêjin, Rozbepûr mirovekî zana, feylesûf û destpak bû, zulm û nerindî ne dipejirand. Û dibêjin jî, ji ber ku Rozbepûr li dijî nerindî û gendeleya Yezîd lawê Sifiyan waliyê Besrayê disekinî, wî bi pişgiriya Xelîfe Ebû Ce`fer El Mensûr ew kuşt. Dibêjin jî, Yezîd carê tiştêk ji govdê wî dibirî û li pêş çavên wî davête nava êgir û wilo ta can da.

<sup>2</sup>.Ton: Reng.

<sup>3</sup>.Balinde: Tilûr, balîne, têr طير

pêkenokî jî di nava xwe de civandine. Wê lomê jî, hişmendan ew ji ber hişmendiya wê vebijartine, û arode<sup>1</sup> jî wê ji ber pêkenokiyan dibin. Yê ku ji bûyeran baş fêr dibe, tiştê ku ji wan têdigihê baş li ezber dike, di sîngê xwe de dihêle, lê nizane ew çi ye, ew jî têdigihê ku wî tişteki baş û hêja ji pirtûkê wergirtiye. Mîna ew kesê ku gihîşt asta mêraniyê, û dît dê û bavê wî arziyeke pir jê re kom kirine, avahîne mezin jê re ava kirine, û dibîne ku ji bo berdewamkirina jiyana xwe pêdviya wî bi kar ne maye, û bi wî rengî, hişmendiya ku ew kesa ji pirtûkê bi dest dixwe, pêdvî nake ku dest bavêje curene din ji zanîn û rewîştê.

Yê ku vê pirtûkê bixwîne, gerek e li destpêkê zani be, ku ew ji bo çi hatiye danîn, mebesta daner ji wan tiştan çi bû dema ku wî li ser zimanê lawiran daniye û rewşine din jî wek mînak anîne, lê belê eşkere şirove ne kirine û ne gotine. Loma jî, eger xwendevanê pirtûkê wergî ne kir, ew ji wan mebestan têngihê, berheman jê wernagire û encamekê ji pêşgotina wê bi dest naxe. Eger mebesta wî ew be ku pirtûkê ta dawiyê bixwîne û têngihê çi dixwîne, ew sûdekê jê wernagire.

### • Mînaka Mirov û Samanê

Kê pir pirtûk civandin û xwendin, û bê ku li ber tiştên dixwîne bisekine, ewê bibe mîna mirovê ku zanyaran li ser gotiye, ew di deverê re diçû û raste cihê samanê hat, wî rabû ew ciha kola û raste per û kaxizan hat; wî bi xwe

---

<sup>1</sup>.Arode: Mirovê bed سفیه.

re got: Eger ez vî malî hindik hindik bibim, dem wê dirêj bibe û min mijûl bike, û bi wê yekê kêfa bidestxistina wî dê li min bihermîne<sup>1</sup>; lê ezê mirovina bigirim, bila wî hilgirin bibin mala min, û ezê jî li dawiya wan herim, bi wî rengê tiştek dê li dû min nemîne ku bala min mijûl bike, û ezê bi kirêke hindik ku bidim wan kesan govdê xwe jî vehesînim.

Herweha, wî barhilgir<sup>2</sup> anîn, heryekî qandî ku kanî hilgirta lê bar kir û şande mala xwe. Dema ku tiştek ji samanê li wir ne ma, ew jî rabû û çû mala xwe, lê wî tiştek, ne pir û ne hindik, ji mêl li mala xwe ne dît; têrî her barhilgirekî barê xwe ji xwe re biriye mala xwe û ji wî re jî tenê cefa û westan man. Ew jî ji ber ku ew li dawiya karûbarê xwe ne ramî û lê miqyat ne bû. Herweha, yê ku vê pirtûkê bixwîne, ji naveroka wê tenegehê û mebesta wê a di rû re û a di bin re jî nas neke, ew sûtê ji xêz û neqşên wê nabîne. Mîna gava tu gozeke sax bidî mirovekî, ta ew gozê neşikîne û dilikê wê dernexe, sûtê jê nabîne.

### • **Mînaka Xwende û Pelika Zer**

Yan jî wê bibe mîna mirovê ku ji nava gotinên xelkê li gotinên rewanbêjî digerî, û ji bo wê yekê çû ba dostekî xwe ji zanyarên ku bi zanîna rewanbêjîyê navdar bû û daxwaza xwe jê re hewal da; dostê wî jî rabû gotinên

---

<sup>1</sup>.Biherime: Li hev bikeve û tevlîhev bibe.

<sup>2</sup>.Barhilgir, barbir, barbar: Ewê ku bi peran tiştan hildigre, hemmal.

rewanbêj û veguhastina<sup>1</sup> wan li ser kaxezeke zer nivîsandin. Paşê, şagirt çû mala xwe û ew nivîsa pir xwend, lê belê li ser wateyên wan ranewestî. Rojekê ew li civata kesine xwedî zanîn û torevan<sup>2</sup> rûnişt û bi wan re kete gengeşê<sup>3</sup>, lê şorek vê re derbas bû û tê de şaş kir, civatê jê re got: Te şaş kir, û rastî ne wek te gotiye! Wî got: Çawa ezê şaş bikim, min kaxeza zer xwendiyê û ew li mala min e? Ew gotina wî li ser wî bervajî hat, ji nezaniyê nêzîktir kir û ji torevaniyê dûr xist. Eger hişdarek ji pirtûkekê têgihîşt û gihîşte dawîya zanînên wê, gerek e bi wê zanîne bixebite, da sûdê jê wergire, ji xwe re bike mînak û jê dûr nekeve.

### • Mînaka diz û mirov

Eger xwendekar wilo ne kir, dê bibe mîna ew mirovê ku dizek kete mala wî û ew pê hestewar bû, lê wî got: Bi Xwedê ezê xwe ker bikim, wî netirsînim û hestewar nekim ku ez pê haydar bûme, da ku ez bibînim wê çi bike, û eger gihîşte armanca xwe, wê çaxê ezê rabimê û dizîya wî lê bihermînim.

Herweha, wî hîşt diz here û were û tiştê ku didît bicivîne; û wilo ta xwediyê malê xulmaş bû û di xew ve çû, wê hîngê diz jî karê xwe bi dawî kir, û tiştê malê bir û çû. Piştî, mirov ji xew şiyar bû û dît ku diz tişt biriye û

---

<sup>1</sup>.Veguhastin: Guhertina di bêjeyan de صرف وإعراب.

<sup>2</sup>.Torevan: Wêjevan أدیب.

<sup>3</sup>.Gengeşe: Axaftin نقاش.

çûye. Wî rabû xwe lome ji xwe kir û nas kir ku wî sûd ji dîtina diz ne dît û tiştêk ji bo wî ne kir. Ango zanîn bi kar pêk tê, zanîn wekî darê ye, kar jî mîna berê wê ye; xwediyê zanînê kar dike da ku sûdê wergire, eger tiştê ku pê zane bi kar nanî, ew dibe wek yê ku tenê bi nêv zaniyar e. Eger mirovekî zanî ku rêyek a tirsdar e û tê re çû, ew nezan tê binavkirin. Eger ew li xwe vegere wê bibîne ku wî tiştêk kiriye û rind jî zane ku bi ziyar û êşgihandin e. Kî li dû meraqên xwe here, û nexwaze bi tiştên ku berê taqe<sup>1</sup> kirine, yan hinekan ew pê agahdar kiri be, bike, ew mîna nexweşê ku xwarina baş û nebaş, a sivik û giran ji hev derdixe, lê çavbirçîbûna wî dike, ku ew a nebaş bixwe, û ya ku dê wî ji nexweşiyê rizgar û sax bike jî berde.

### • Mînaka Kor Ê Bîner

Kesê ku bêtir cihê lomê ye, ewê ku karên qenc berdide û yên ku cihê lomê ne, dike, lê ewê ku wê yekê zane, ji hev derdixe û kane qenciya wan ji hev cuda bike û dîsa jî xwe şaş bike, wê hîngê ew dibe mîna du mirovên ku yek kor û ê din bi çav bû, felekê jî ew her du bi ser kortekê de birin û têwer bûn. Erê gava ew di binê kortê de bin mîna hev dibin; lê li ba xelkê ê kor hindik cihê lomê ye, çinkî ê kor ne didît û pê nizanî, lê ê biçav du çavên wî hene û pê dibîne.

---

<sup>1</sup> .Taqekirin: Cerbandin.

Gerek e zaniyar ji xwe de dest pê bike, henasa xwe bi zanîne perwerde bike, bila mebesta wî ne tenê ew be ku zanîne wergire, alîkariya bilî xwe bike, bibe mîna kaniya ku xelk ava wê vedixwe û ji wî re jî sûdek tu ne be. Yanê mîna kurmê hevrişmê ku baş karê xwe dike, lê sûde jî nabîne. Loma jî, yê ku doza zanîne dike, gerek e ji rawêjkirina xwe de dest pê bike û sûde jî xwe re jî wergire. Ji ber ku tiştine baş hene, gerek e mirov wan bi dest xwe bixe û ji xwe re bihêle, ji wan tiştan: Zanîn, mewdan<sup>1</sup> û riya çêkariyê. Gerek e zanyar rexna tişteki neke eger ew tişt di wî bi xwe de hebe, çinkî li wê çaxê ewê bibe mîna korekî ku korîtiya kesekî din jê re kêmanî dibîne. Gerek e yê ku doza tişteki bike, armanceke wî tê de hebe, bi xwe pê bike û baş pê bixebite, lê belê gerek e pir bi dozkirina daxwaz û dilxwaziyan de jî nere.

Tê gotin: Kî bê armanc bi rê de biçê, siwarîka<sup>2</sup> wî dê wî di rê de bihêle; loma jî rastir e, ku ew ji bo daxwaziyeke bêsinor ku berê bi dest kesekî din ne ketiye xwe newestîne û li ser poşmam nebe. Bila jiyana wî bandorê li ser dawîroja<sup>3</sup> wî neke. Ewê ku dilê xwe bi dilxwaziyan ve girê nede, kesera wî ji destdana wan dilxwaziyan kêmanî dibe.

---

<sup>1</sup>.Mewdan: Mal, arzû.

<sup>2</sup>.Siwarîk: Tiştê ku siwarî lê dibe, مركبة

<sup>3</sup>.Dawîroj: Pişdawi, roja dawiya jiyane, الأخرة

Belkî were gotin, du tişt hene her kesek pê rind dibe: Yek nasiktî<sup>1</sup>, a din jî malê helal. Belkî were gotin jî, du tişt hene ji kesekî re ne baş in: Qeralê ku hevbeşek bi wî re hebe, û mêrê ku kesine din di tiştên wî ên taybet de hevpar bin. Gerek e mirovê hişmend ji bo tiştê ku ji dest çû û nikarî careke din bi dest bixista, xwe lome neke, çinkî, belkî paşê Xwedê tiştêkî din ku hîç ne di bala wî de bû bidê û pê şa bike.

### • Mînaka Diz û Xizan

Dibêjin, mirovekî sêfil<sup>2</sup>, birçî û tazî hebû; rewşa wî hîştî bû ku ew parsê ji dost û mirovên xwe bike; lê li ba yekî ji wan tiştêkî zêde tunebû ku bidinê. Şevê ew li mala xwe bû, dît dizek hat û ket mala wî, wî di dilê xwe de got: Jixwe tiştêkî di mala min de tune ye ku li ser bitirsim, bila ew xwe biwestîne! Dema ku diz di malê de gerî tiştêkî hêja ne dît, lê raste kûzekî hat genim tê de hebû. Diz got: Bi Xwedê ez hez nakim westana min îşev vala here, belkî ez nikanibim bigihêmin derine din jî, ezê vî genimî rakim û bibim. Wî rabû, kirasê xwe raxist da ku genim li ser vala bike, wê hîngê mirov got: Çawa ewê genimê min bibe û ji bilî wî jî li ba min tune ye? Bi ser tazîbûna min de, hîn tiştê ku ez dixwim jî wê here! Bi Xwedê eger ew her du tişt (birçîbûn û tazîbûn) li yekî bicivin dê wî bikujin. Wê hîngê, wî deng li diz kir, çovek li ber serê wî bû rakir û

---

<sup>1</sup>.Nasik: Ewê ku tiştên olî zane, bi tenê dijî û Xwedê nas dike.

<sup>2</sup>.Sêfil: Xizan, fiqare.



rabû ser xwe, wê çaxê ji bilî ku diz bireve tişt di destan de ne ma, wî kirasê xwe jî hîşt, revî û xwe rizgar kir; mirov jî rabû kiras li xwe kir û pê bi kinc<sup>1</sup> bû.

Lê gerek e mirov xwe li benda bûyerên wiha nehêle û kar û xebatê ji bo başkirina jiyana xwe bernede. Bila mirov xwe nede benda lêhatina felekê, li kesên ku carina jê re lêtê, û felek alîkariya wan dike, nenêre; çinkî mirovên wilo pir hindik in, piraniya xelkê ji kesên ku ji bo başkirina rewşa xwe, bidestxistina daxwazên xwe kar dikin û xwe diwestînine.

Gerek e mirov li destkeftên baş û tiştên bi sûd miqyat be, xwe neke bin barê tiştê ku westan û ziyane peyda dike. Wê çaxê, ewê bibe mîna kevoka ku çêlikan derdixe, ew jî paşê tên şerjêkirin, û digel wê jî, dîsa li wî cihê kurk dibe, çêlikan derdixe û careke din çêlikên wê tên birin û şerjêkirin.

Belkî were gotin: Xwedê ji her tiştêkî re sînor daniye da ku li ber bisekine, kê di tiştan de sînor derbas kir, guman çêdibe ku ew tê de têk biçe û negihê armanca xwe. Dibêjin jî: Kî ji jiyan û dawîroja xwe re bixebite, jiyana wî ji wî re ye û li ser wî ye jî, lê kî tenê ji dawîroja xwe re bixibite, jiyana wî ji wî re ye. Gerek e hezkiriyên cîhanê çend tiştan durust bikin û di ber de biwestin, jê: Pirsra ola xwe, pirsra jiyanê, tiştê di navbera wî û xelkê de û bîranîna rind ku li dû wî bimîne. Dema ku karek bi dest mirov ne ket û jê re

---

<sup>1</sup>.Kinc: Cilên lixwekirinê.

serast ne bû, ji bo wê rewşê jî wiha hatiye gotin: Ew ji livgiraniyê<sup>1</sup>, windakirina derfetan, bawerkirina ji her hewaldêrekî<sup>2</sup> û ji derewên kesên zane tê. Belkî yek tiştêkî hewal bide, digel ku rastiya wî jî nas nake, lê pê bawer dike. Ji kesên wilo dikin jî, sê cureyên mirovan hene: Yek bi tiştê ku kesekî ji bilî wî taqe kiriye bawer dike, wekî ku wî bi xwe taqe kiri be bawer dike; mirovek jî heye bi tiştê ku wî bi xwe taqe kiri be bawer dike, lê belê rastiya wî tiştî nas ne kiriye û têngihîştîye; mirovek jî tiştê jê re zelal nabin, lê dîsa jî pê bawer dike. Loma jî, gerek mirov bi ber bayê dilxwaziya xwe nekeve û gotina her kesekî nepejrîne, eger tiştêkî jî jê ve zelal ne bû, gerek e ta rastî jê ve xuya û zelal nebe di şaşiyê de neçe.

Bila ew nebe wekî mirovê ku ji rêya rast derdikeve û pê de dere, loma jî di çûna xwe de bêtir diweste û ji mebesta xwe dûr dikeve. Mîna ew mirovê tiştêkî di çavê wî de hebe, lê dîsa jî wî miz dide, belkî ew mizdan jî bibe sedema çûna çavê wî. Gerek e mirovê hişmend bi qeda<sup>3</sup> û felekê<sup>4</sup> bawer bike, xwedî biryar be, ji xwe re ji çî hez dike ji xelkê re jî wilo hez bike, ji çî hez nake, ji bilî xwe re jî hez neke; tiştê ku ziyane digihîne xelkê nexwaze, hewil nede serketina xwe bi binxistina xelkê pêk wîne,

---

<sup>1</sup>.Livgiranî: Giran dilive.

<sup>2</sup>.Hewaldêr: Yê ku tiştan hewaldide.

<sup>3</sup>.Qeda: القضاء.

<sup>4</sup>.Felek: Qeder القدر

çinkî li dawiyê her xinanek<sup>1</sup> dê were sezakirin. Eger kesekî wilo kir, ew hêja ye ku bazirgên çî ji hevalê xwe dît, bigihê wî jî.

### • **Mînaka Her Du Mirovên Hevpar û Çiwalan**

*Mînaka ewê ku tîr avête bilî xwe, lê li xwe xist.*

Hatiye gotin, hevparekî<sup>2</sup> mirovekî bazirgan hebû, wan dukanek kirê kir û kelûpelin ji bo firotanê xistinê. Mala hevpar jî nêzîk dukanê bû. Wî kir dilê xwe ku çiwalekî ji çiwalên bazirgên bidize, got: Eger ez bi şev hatim, ez ewle nabim ku şaş nekim û çiwalekî ji çiwalên xwe, yan destakî ji destiyên xwe ranekim û ked û westana min jî wê vala here. Wî rabû xeftanê xwe li ser çiwale ku niyaz kiri bû bibe, danî, û çû mala xwe. Pişt ku çû, hevalê wî jî hat da ku çiwalên xwe durust bike, wî dît ku xeftanê hevparê wî li ser çiwalekî wî ye, got: Bi Xwedê ev xeftanê hevalê min e, ez bawer dikim wî ji bîr kiri be, ne baş e jî ez wî li vir bihêlim! Ezê wî dînim ser çiwalên wî, belkî berî min were dukanê û dê wî li cihê ku hez dike bibîne. Paşê xeftan rakir û danî ser çiwalekî ji çiwalên hevparê xwe. Dema ku êvar dahat, hevparê bazirgên û mirovekî ku berê haj hev hebûn û sozê peran dabûyê, çûn dukanê; wî di şevreşiyê de destê xwe peland ta bişkovên xeftên li ser çiwel bi ber destan ketin û wî û mirovê ku vê re bû, ew çiwala hilgirtin, ji dukanê derxistin, li ber hev berdêl bûn ta

---

<sup>1</sup>.Xinan: Xayîn خانن.

<sup>2</sup>. Hevpar: Hevkar, hevbeş, ortaq.

gihîştin mal, û ji ber westana ku dît xwe avêt ser zemînê û bi xwe ve çû.

Gava ku sibe vevat, wî dît ew çiwale ku dizî bû yê wî ye. Ew pir poşmam bû, rabû çû dukanê û dît ku bazirgan berî wî hatiye, dukan vekiriye û dîtiye ku çiwalek ji ên hevparê wî tune. Bazirgan pir xeyidî bû û bi hêrs digot: Ev çi nerindî ye ji bo hevlekî durust! Wî malê xwe sparte min û radestî min kir, ma rû û rewşa min wê li ba wî çawa be? Erê ez guman nakim ku ewê min gunekar bike, lê dîsa jî ezê berdêla wî bidim ê!

Gava ku hevparê wî hat û dît ku bazirgan xemgîn e, li rewşa wî pirsî, bazirgên jî jê re got: Min çiwale hejmartin û dît ku çiwalek ji yê te kêm e, ez sedemê jî nizanim, ez guman nakim jî ku tuyê min bi birina wî gunehkar bikî, lê min biryar daye, ku ezê berdêla wî bidim te! Hevparê wî jê re got: Birayê min, xemgîn mebe, ji kiryarên mirov kiryara herî çepel xinanî ye. Qelaşî û dibare kesî nagihînin tu xêrê, xwediyê wan herdem bêkêr e, ziyana zoredariyê jî tenê li xwediyê wê vedigere. Ez jî yek ji wan qelaş, dibarecî û fêlbaza me. Bazirgên got: Ma ew çawa bû? Wî rabû bûyer jê re hewalda û kiryar û çêroka xwe jê re got.

### • **Mînaka Diz û Bazirgên**

*Nimûna kesekî ku dixwest tişteki bidize, lê şaş kir û destê wî çû ser tiştê ku ne dixwest bidize.*

Bazirgên got: Mînaka te, mîna nimûna diz û bazirgên e. Hevalê wî jê re got: Ma ew çawa bû? Got: Dibêjin, du kûz

li mala bazirganekî hebûn, yek tijî zêr û ê din tijî genim bû. Dizekî jî demekê li bazirgên pa<sup>1</sup>, ta dît ku ew çend rojan ne hat mal û wî fersend dît û kete mala wî, lê dema ku çû kûzê zêran bibe, wî şaş kir û kûzê gênim rakir û guman kir zêr tê de ne. Wî pir bi westan û cefa kûz gihand mala xwe, lê gava ku vekir û nas kir çi tê de ye, pir poşman bû.

Hevalê xinan jê re got: Mînaka te şaş ne çû, hevpîvana<sup>2</sup> te jî zêde ne çû. Ez li guneh û şaşbûna xwe mikur hatim, li min pir giran e jî ku wilo bû, lê belê henasa pîs nerindiyê peyda dike. Bazirgên lêborîna wî pejirand û nema lome jê kirin, lê belê baweriya xwe jê birî; lê gava wî jî nepakiya xwe nas kir û nezaniya xwe xuya bû, ew jî pir li xwe poşman bû.

- ***Mînaka Her Sê Biran***

*Nimûna kesê ku serpehatî dît, lê sûda wê wernegiert û dîsa guh ne da karê xwe.*

Ewê ku bixwaze li vê pirtûka me binêre, bila ne ji ber ku rûpelên wê xweşik in û tenê wan di ser hev re teqle bike. Gerek e mebesta wî ew be, ku hemî mînakên tê de hatine nas bike, li ber her bêje û mînakekê raweste û bala xwe rind bidê ta digihê dawiyê. Bila mîna birayê biçûk ê her sê biran be, ewên ku bavê wan sermiyaneke mezin ji wan re hîştî bû. Wan jî ew li hev parve kir. Her du birayên

---

<sup>1</sup>.Payîn: Parastin.

<sup>2</sup>.Hevpîvan: Beramberkirin, muqarene.

mezin para xwe di warên ne durust de zû mezax<sup>1</sup> kirin, lê birayê biçûk, gava dît ku çawa her du birayên wî malê xwe di warên bê sûd de mezax dikin, ew bi henasa xwe re rawêjî û got: Ey henasa minê! Mirov mêt dixwaze, bi her awakî dicivîne, da ku pê li ser lingê xwe bimîne, jiyân, cîhan û rûmeta xwe biparêze, li pêş xelkê durust xuya bibe, pêdviya wî bi wan çênebe, wî di warên mirovperestiyê<sup>2</sup> û ji bo zarok û rindiya ji birayên xwe re mezax bike. Yê ku maldar be û hebûna xwe di warê durust de mezax neke, digel ku ew maldar e jî, lê dîsa jî mîna kesekî xizan tê dîtin. Lê eger ew rind li maldariya xwe miqyat bû û baş pê xebitî, ewê li cîhanê baş bijî û spasî jî dê jê re werin. Lê belê eger ew pereyên xwe di warine din de mezax bike, ewê wan zû winda bike û poşman û bi keser bimîne. Lê a rast, gerek e ez vî malî biparêzim, ezê ji Xwedê hêvî bikim, ku sûd pê li min bibe, birayên min jî li ser destê min maldar bibin, li dawiyê jî ew malê bavê min û wan e; gerek e li destpêkê mirov li mervên xwe mezax bike, ma çawa hîn li birayên xwe? Wê çaxê, wî şande dû wan, ew anîn û malê xwe bi wan re parve kir.

---

<sup>1</sup>.Mezaxkirin: Xerckirin.

<sup>2</sup>.Merivperestî: Merivantiyê diparêze

## • Mînaka Nêçîrvên û Qabqabûşkê:

*Mînaka ewê bi rûyê tişt hate xapandin û guh ne da hundirê wî, û tiştê ku di dest de bû berda û çû ê din.*

Herweha, ji xwendevanê pirtûkê tê xwastin rind lê binêre, jê ne tengije, li mebest û wateyan bigere, nebîne mijar tenê gotûbêjeke di navbera du lawiran de, yan jî guftûgoya şêr û gakî ye, gerek e li mebestên wan axaftinan bigere. Bila rewşa wî nebe mîna nêçîrvanekî, ku rojekê bi kelkê<sup>1</sup> li kendavekê masî digirtin, wî sedefek di binê avê de dît û qaserî ku dibrûsî, guman kir ew cewherekî pir bi nirx e, wî rabû toreya<sup>2</sup> xwe ya ku avêti bû nava avê û masiyek jî ku xwarina wî ya rojê bû vêketi bû, berda, û xwe avêt nava avê da ku sedefê derîne. Lê gava ku ji avê derxist, dît ew vala ye û tiştê guman dikir tê de tune, wê hîngê ew li masiyê ku ji destê xwe berda bû poşman bû, çinkî wî ji ber çavkuriya<sup>3</sup> xwe, tiştê ku di dest de bû ji dest da û ji ber wê pir mixabîner bû.

Bû roja din, ew masîgira<sup>4</sup> ji wî cihê dûr ket û toreya xwe avête nava avê. Vê carê wî balînekî<sup>5</sup> biçûk girt û sedefek tê de dît, lê guh ne dayê, xirab dît, li şûna xwe hîşt û çû. Nêçîrvanek jî di wir re derbas bû, sedef bir û durreke ku perene pir dikirin tê de dît. Herweha, eger mirov kûr li

---

<sup>1</sup>.Kelk: Qeyiq, geştiya biçûk.

<sup>2</sup>. Tore: Şebeke.

<sup>3</sup>.Çavkur: Çavbirçîtî, çav birçî, جشع، طمع.

<sup>4</sup>.Masîgir: Nêçîrvanê masiyan.

<sup>5</sup>.Balîne: Hût.

pirsa vê pirtûkê nenêre, li ser nehênên ku di wateyên wê de hene nesekine, û tenê di rû re lê binêre û naveroka wê berde, ewê mîna wî nêçîrvanî bibe.

Ewê ku tenê guh bide deriyên henekan jî, ew jî dê bibe mîna ew mirovê ku zeviyekî baş, şov<sup>1</sup> û tovine<sup>2</sup> baş jî bi dest ketin, wî ew çand û av da ta dema xêrûbêra wê nêzîk bû, lê belê rabû çîçekên wê beref kirin, tak<sup>3</sup> birîn û ew çandiniya sûdar û berhemdar wêran kir.

\*\*\*

\*\*\*

---

<sup>1</sup>.Şov: Ji bo çandinê lêhatiye.

<sup>2</sup>.Tov: Bidar بدار

<sup>3</sup>Tak: Şitil.



## Mebestên Pirtûkê Û Armancên Wê

Kesê li vê pirtûkê binêre, gerek e zani be ew li ser çar beş û mebestan parve bûye.

Yekem: Li ser zimanê lawirên ku napeyivin hatiye danîn, da ku xortên ji pêkenokan hez dikin, bixawzin wê bixwînin û dilê wan bi ser de here, çinkê soje<sup>1</sup> di serpêhatî û fêlbaziyên lawiran de ye.

Duyem: Derxistina sawêrên<sup>2</sup> lawiran bi hemî ton û rengan, da ku li dilên qeralan xweş were û bixwazin li wan wêneyan temaşe bikin.

Sêyem: Ew bi wî rengî hatiye, da ku qeral jî û arode jî pê ve werin girêdan, bi wî rengî wê bêtir belav bibe, bi derbasbûna demê re bimîne, wênekêş û jêgir jî wê sûdê jê bibînin.

Çarem: Ew jî armanca herî bilind e, bi taybetî jî ji bo feylesûfan e.

Ebdella kurê Muqefe` got: Gava min dît, xelkê Faris ev pirtûka ji zimanê hindî wergerandine farisî, deriyê bi navê bijîşk Berzewê pêve kirine, tiştê ku min di vî derî de got jî wan di wî derî de ne gotiye, û ji bo kesê ku dixwaze bixwîne û zanîn û sûdê jê wergire, min jî ev deriyê ku me li jor xwend di pirtûkê de danî.

---

<sup>1</sup>.Soje: Mebest, sûde, armnac.

<sup>2</sup>.Sawêr: Pêjn, xeyal.

## Deriyê Berzewê

### ji Danîna Buzregumehir Kurê Bextigan

Berzewê kurê Ezher serokê bijîşkên Faris ku ev pirtûka bi dest xistiye û ji pirtûkên Hindê wergerandiye, got:

Bavê min ji şervanan bû, diya min jî ji malmezinên Zimzimiyan bû. Wan ez di jînferehiyê<sup>1</sup> de mezin kirim, ez li ba wan zarokê buhatir bûm û di nava birayên min de pir bi min ve hati bûn girêdan. Dema temenê min gihîşt heft saliyê, wan ez radestî perwerdekarekî kirim. Gava nivîsandina min baş bû, min spasiya dê û bavê xwe kir û berê xwe da zanîne. Tiştê yekê ku min dest pê kir, zanîna bijîşkiyê bû, ew jî ji ber ku min giringiya wê nas kiri bû, û her ez zêde pê de diçûm, ez bêtir lê miqyat dibûm, ta min asteke bilind jê wergirt û nehênên wê jî nas kirin.

Gava min xwast û biryara xwe da, ku nexweşan derman bikim, min çar tiştên ku xelk jê re dilxwaz in û lê digerin, danîne ber çavên xwe û min got: Ez di karê xwe de çi dixwazim? Kîjan ji min re gerek e, da ku erk û pêdiviya xwe pê pêk wînim? Mal, nav, kêfxweşî yan pişdawî?

Min di pirtûkan de dîtî bû, ku baştirîn bijîşkên li ser karê xwe berdewam kiri bûn, tenê pişdawî doz dikirin. Min jî biryar da, ku ezê di karê bijîşkiyê de bixebitim, ji bo ku ez jî pişdawiye qezenc bikim. Bila nebim mîna bazirganê ku Yaqûteke buha bi morikeke ku tiştek ne

---

<sup>1</sup>.Jînferehî: Jiyanek pak û bi hebûn<sup>رفاهية</sup>

dikir, guhert. Min di pirtûkên kevin de dîti bû, bijîşkê ku bi bijîşkiya xwe doza pişdawayî bike, ew yeka bextewariya wî di cîhanê de kêr nake. Mîna wê, mîna cotkarê ku zeviyê xwe ji bo çandinê, ne ji bo geya amade dike, lê digel wê jî, dîsa geyayên rengereng ligel çandiniyeke baş tê de şîn dibin.

Herwiha, min ji bo dozkirina pişdawayî dest bi dermankirina nexweşan kir, min ne digot bila ev nexweşa çak bibe û evê din çak nebe, daxwaza min ew bû, ku nexweşiya wan sivik bibe. Loma jî min bi xwe ew derman dikirin û lê miqyat dibûm, ewê min nikarî bi xwe xizmetê bikira jî, min tiştê durust jê re salix dida û dermanê ku pê çak biba didayê. Ji berdêla karê min dikir jî min baxşîş ne dixwastin. Eger hevkarên min bi zanîna di bin min re bana û bi mêl û astê di ser min re bana, dilê min bi kesekî ji wan ne dima, nemaze ewên bi gotin û karê xwe ne çêxwaz û ne xwedî reftareke<sup>1</sup> rind bûn.

Gava carina henasa min bi aliyê wan de diçû û dilê wê bi rewşa wan dima, ez di rûyê wê de derdiketim û min jê re digot: Henasê! Tu çima kara<sup>2</sup> xwe ji ziyana xwe dernaxî? Ew tiştên ji malê cîhanê ku zû bi dest kesekî nakevin doz dikî. Eger bi dest ket jî, sûda wan ji bo kesê ew doz dikir kêr dibe, cefaya wî zêde dibe, xema wî giran dibe û eger ji dest çû jî, pir pê dêşe. Ma çima dilê te

---

<sup>1</sup>.Reftar: سلوك

<sup>2</sup>.Kar: Destkeftin, tiştê ku ji mal, pere û wekî din jî bi dest mirov dikeve.

bi ser wan tiştan de diçe? Henasa minê! Ma cihê ku li paş cîhanê ye ne tê bîra te, ku tu ewqas bi ser tiştên cîhanê de dikelî û pişdawayê ji bîra te dibin? Tu fedî nakî, tu jî li gel ewên fedî nakin ji cîhana lezok û têkber<sup>1</sup> hez dikî, gava tişteki wê di destê mirov de be ne yê wî ye, jê re namîne û ji bilî nezan û bêhişan bi ber bayê wê nakevin?

Henasa minê! Li rewşa xwe binêre, ji arodetiyê dûrkeve, bi kar û hêza xwe xêrê bike, nerindiyê meke. Bila tu ji bîr nekî, ku ev cana ji bo derdan heye, ew tijî têkelên<sup>2</sup> kufkî û genî ye, jiyan wan bi hev ve girêdide û jiyan bi xwe jî bi dawî dibe. Ew mîna pûtê ku endamên wî li ser mîxekî ava bûne, eger ew mîxa hate kişandin, endam jî ji hev dikevin.

Henasa minê! Bi pêwendiya bi dost û hevalan re pozbilind mebe, pir li wê dostaniyê miqyat mebe; dostaniya wan -digel ku şahî tê de heye - ew bi êş e û dawiya wê jî jihevûn e! Ew mîna heskê<sup>3</sup> ye, dema ku nû be, ji bo şîva germ tê bikaranîn, lê eger şikest, dibe ardû<sup>4</sup> û tê şewtandin! Henasê! Bila xwedan û mervên te, te nehevojin<sup>5</sup> ser tiştên ku tuyê pê têk herî; tuyê xwe bibînî tu bûyî mîna pixûra ku dişewite û kesine din bêhna wê dikîşînin.

---

<sup>1</sup>.Têkberî: bidawîhatî, tune dibe, rizîner, musthlek, fanî.

<sup>2</sup>.Têkel: Tiştên tevlêhev, xelaêt.

<sup>3</sup>.Hesk: Kevçiyê darî yê mezin.

<sup>4</sup>.Ardû: tiştê ku dişewite وقود.

<sup>5</sup>Hevojtin: Têvedana ser tişteki û germkirina li ser.

Henasa minê! Tu pala xwe mede ser ev cîhana têkber; tu ji bo mayîn û payedariyê<sup>1</sup> mexape<sup>2</sup>! Pir kes hene, biçûkahî û pîsîtiya tiştê mezin nabînin ta ji dest dere; mîna porê serî, ta ew li ser serî ye, xwedanê wî wî tîmar dike û lê miqyat dibe, lê eger ket, dibe qirêj û ne tê pejrandin!

Henasa minê! Ji seredana nexweşan û dermankirina wan mewest e. Wîne bîra xwe ku çawa mirov dixebite da ku êşekekê ji ser mirovekî melûl rake û çêsezakê<sup>3</sup> bi dest bixe, ma çawa bijîşkê ku wî karî gelek caran û bi gelek kesan re dike?! Ew wî karî dike da ku hêviya wî bilind bibe û çêsaziyeke baş qezenc bike.

Henasa minê! Ji bo ku tu di cîhanê de hindikiyê bi dest bixî, tu radibî pişdawayîê berdidî û dibezî cîhanê. Piraniyê bi hindikiyê mefroşe, mîna ew bazirganê ku tijiya xanekê textên dara sendelê li ba wî hebûn mebe, dema wî got: Eger ez wan bi pîvanê bifroşim, dê pir dereng bimîne, û rabû ew bi tevahî û bi buhayeke pir hindik firotin.

Min dît jî, ku nêrînên xelkê têvel<sup>4</sup> in û daxwazên wan cuda ne; heryek setemê li ê din dike, jê re dibe neyar û hîlebaz, zû dev jê berdide û bervajî gotina xwe dike.

---

<sup>1</sup>.Payedarî: Ast û paye مکان، منزله، مقام.

<sup>2</sup>.Mexope: Metê xopandin.

<sup>3</sup>.Çêseza: Perû, sezaya çê û baş ثواب.

<sup>4</sup>.Têvel: Cuda, ne wek hev

## • Mînaka Mirov û Dizê Xapandî

*Mînaka kesê bi tiştê ne bûye bawer dike û pê tê xapandin.*

Gava min wilo dît, min ne xwast ez bi dû kesekî ji wan bikevim. Ez tégihîştim eger min ji yekî bawer kir û rewşa wî jî nizanî, ezê mîna ew bawerkerê dibarelêbûyî<sup>1</sup> bibim, ewê ku li derbara wî wiha gotine: Dizek û hevalên wî hilkişîn ser xaniyê mirovekî dewlemend. Xwedanê malê li ser dengê lingên wan şiyar bû, jina wî jî pê hestewar bû, lê wî jê re got: Melezîne! Ez bawer dikim, diz hilkişîne ser xaniyê me. Tu bi dengê ku diz bibihîsin, min hişyar bike û bêje, mêrê min, çima tu li ser şeweya ku te pê ev malê xwe ê pir û samana xwe a mezin civandiye ji min re naxivî? Eger çiqas min got wê pirsê meke, tu dîsa pirs bike. Jinê wilo kir, wekî wî xwest jê pirs kir, dizan jî guhên xwe dan ser gotinên wan. Mêr ji jina xwe re got: Jinê! Felekê roziyeke mezin daye te, bixwe û deng meke, li ser tutiştî pirs meke. Eger ne piştrast im ku eger ez ji te re hewaldim, yekî din jî dê nebihîse û ewê ji min û ji te re jî nerind be. Jinê got: Hewalde! Kes li ba me tune ye ku bibihîse. Mêr jê re got: Min ev mala tev bi diziyê kom kir. Jinê got: Ma ew çawa bû? Te çi dikir? Ê digel wê jî tu di nav xelkê de bi rindî û durustxwaziyê tê nasîn!! Got: Ez nehêna diziyê nas kiri bû, loma jî ew bi min hêsan bû, ez ne bitirs bûm ku kesek gumanê bibe ser min û min gunehbar bike.

---

<sup>1</sup>.Dibarelêbûyî: Kesê ku dibare lê bûye.

Jinê got: Wê nehênê ji min re hewal bide. Got: Li şevên bi heyv, ez û hevalên xwe diçûn ser xaniyên dewlemendên mîna me, ez diçûm ber rojinê<sup>1</sup>, min ev tilasima<sup>2</sup> heft caran digot ((şewlem, şewlem)), paşê min berê xwe dida ronahiyê, xwe dixist taqa rojinê û xwe tê re berdida; bi wê yekê ez bêdeng diketim hundirê malê, kesek bi min hestewar ne dibû, her tiştê malê jî bi xwe dihatin ba min, û wilo min tu mal û tişt di hundir de ne dihîşt û giş dibir. Paşê, min dîsa ew tilasima heft caran digot, serê xwe dixiste taqa rojinê û wê ez hildikşandim jor ba hevalên xwe, û bi wî rengî bêtirs em ji wir diçûn. Tenê ji yê ku wilo bike tê xwastin ku wêrek be, xwe radestî benên ronahiyê bike, pê bigire û di taqa wê re dakeve hundir! Vî tiştî ji kesekî re hewal mede û kesekî fêr meke!

Gava dizan ew tişt bihîst, gotin: Malê ku em dixwazin me îşev bi dest xist! Ew demekê rûniştin ta bawer kirin ku xwedanê malê û jina wî razan; paşê rêberê wan çû ber taqa rojinê û heft caran got: Şewlem.. Şewlem, û xwe di taqa ronahiyê re berda, lê belê ew li binê malê ket, xwedanê malê jî çovê xwe rakir, çû ser û jê re got: Tu kî yî? Got: Ez bawer kirê xapandî me, bi tiştê ku hîç nabe hatim xapandin. Ev jî encama tilasima te ye, sezaya yê ku çî bihîst pê bawer bike ye.

---

<sup>1</sup>.Rojin: Rojen, rodank, taqek e di bana xanî de ronahî tê re dikeve hundirê malê.

<sup>2</sup>.Tilasim: Gotinên di avsênkirinê de têne gotin.

Wilo min haya xwe ji tiştê ne gengaz<sup>1</sup> bir, lê ez bi ewle nebûm eger pê bawer bikim ewê min nexe metirsiyê; wê hingê min berê xwe da olan û dadmendî jê hêvî kir. Lê min li ba yekî ji yên ku pê re axivîm bersiva pirsê ku min fikir ne dît. Ji tiştên ji min re dihat gotin jî, min tiştê ne dît ku ez pê bawer bikim û jê re bibim pêgir<sup>2</sup>. Dema ku min tiştê ne dît baweriyê jê wergirim, min got, bila ez bibim pêbendê<sup>3</sup> ola bav û bapîrên xwe. Lê paşê, min çarek ji xwe re dît û min got: Eger yê wilo bike neçar be ku here ser ola wan, gerek e yê ku bibîne bavê wî avsûnbaz<sup>4</sup> e, ew jî bibe mîna wî û tiştên mîna wê ku hiş qebûl nake, bike û lome jî jê nebin.

Min di wê yekê de gotina mirovekî pir xura<sup>5</sup> bû anî. Gava ji bo wê gerdişê<sup>6</sup> lome jê dihat kirin, digot: Xwarina bav û bapîrê min jî wiha bû. Herweha, çaxa min xwast behaneyan ji bo henasa xwe di ola bav û bapîrên xwe de bibînim, min dît ku henasa min nikare li ser ola bavan jî xwe ragire, ew dixwaze xwe ji lêkolîna olan re vala bike, pirsê wan bike û lê binêre. Lê nêzîkbûna kata mirinê, lezbûna bidawîhatina jiyane, mijûlbûna xelkê û çawa dem jiyana wan dipêçe hate bîra min û kete dilê min. Ez di wê de ramîm û min got, belkî dawîya min hati be û çûna min

---

1. Gengaz: Pêkane, dibe ku bibe, ممکن.

2. Pêgir: Pê girtî, pêbend, pê bawer kir

3. Pêbend: Pêgir, bawermend, pê bawer bike.

4. Avsûnbaz: Avsûnê dike ساحر

5. Xura: Mirovê ku pir dixwe.

6. Gerdiş: Sincî, adet.



nêzîk bûbe! Min wê hîngê karên durust kirin, û hêvî dikir ew karine qenc bin, lê min got, belkî dudiliya min bibe sedem ku karê qenc yê ku min dikir, berdim. Ji ber wê jî dawiya min wê ne wek ez dixwazim û hêvî dikim be; wê çaxê, û wekî ku çawa bi serê mirovekî bû, wê bigihê min jî.

### • Nimûna Mirov Û Berdest

Dibêjin, mirovekî bi berdestê<sup>1</sup> mala dewlemendekî re li hev kir, da ku her şeva xwedyên malê ne li mal bin were wê malê, berdest jî ji tiştê malê jê re bicivîne da ku bibe û bifroşe û nirxa wan li hev parve bikin. Şevêkê, gava ku xwedyên malê ji mal derketin, berdest rabû şande dû hevalê xwe, ew hat û derbas hundir bû.

Dema ku wan tiştên malê dicivand, li derî ket û berdest ji mirov re got, di deriyê ku li ba bîrê ye re derkeve, çinkî deriyekî malê î din hebû, bîreke avê li ber bû û wî mirovî pê nizanî. Wê hîngê mirov bezî, ew deriya dît lê bîr ne dît, ew li berdest vegeerî û got, min derî dît lê bîr ne dît. Wî jê re got: Ey bêhiş! Tuyê bîrê çi bikî? Min bi wê derî bi te da nasîn, eger te derî nas kir, bi lez here, wî got: Te rast ne got, çima te got (bîr) û ew jî ne li wir e? Berdest jê re got: Bêhişo! Malxirabo! Xwe xelas bike, bêhiş û dudilî mebe! Jê re got: Ezê çawa herim û te ez dame şaşkirin û bîra tu çêrê<sup>2</sup> bû jî ne li wir e? Ew hîn di wê rewşê de bûn,

---

<sup>1</sup>.Berdest: Xizemcî.

<sup>2</sup>. Çêrêbûn: Li ser hate denkirin.

xwedanê malê derbas hundir bû, bi stûkurê<sup>1</sup> wî girt, têr kotek kir û radestî siltên kir!

Dema ku ez ji dudiliyê tirsiyam, min biryar da, ez nêzîk tiştê ku xirabî jê bê nevim. Ezê karekî bikim bila ji bo hemî hiş û olan guncav<sup>2</sup> be û rast û durust were dîtin. Wê hîngê, min lêdan û kuştin berdan, henasa xwe ji tiştên xirab, enirîn<sup>3</sup>, dizî, xinanî, vir, bêbextî û ji dengkirina li paş hevdu jî dûrxist. Min xiste dilê xwe ku zorê li kesekî nekim. Bi vejîn<sup>4</sup>, dawîroj, çêseza û bedsezayê<sup>5</sup> bawer bikim. Herweha ez ji dil de ji şerxwazan dûr ketim. Min hewil da bi çêxwazan re rûnim. Min dît ku mîna zanîn û durustiyê dost û heval tunene. Eger Xwedê ji mirov re kire bext û hêsan kir jî, digel ku kara wan hindik e, lê ew bi mezaxkirinê kêr nabin, hîn zêde, nûjen û baştir dibin, ne av kane wan noq bike, ne agir kane wan bişewtîne, ne diz kanin bidizin, ne siltan kanin ji dest bibin, ne jî lawir û tilûrên<sup>6</sup>goştixwar<sup>7</sup> kanin wê perçe bikin.

---

1.Stûkur: Yaqe, yaqa cilan..

2.Guncav: Lêhatî, مناسب.

3.Enirîn: Qehîr زعل.

4.Vejîn: Rabûna ji mirinê البعث والنشور.

5.Bedseza: Sezaya ne rind عقاب.

6.Tilûr: Balinde طير.

7.Goştixwar: Goşt dixwin.

## • Mînaka Bazirgên û Qulkerê<sup>1</sup> Cewher

Min dît jî, mirovê ne haydar û kêfhez ku malekî hindik bi dest dixê, li roja din wê li xweşiyê mezax dike û wê xweşiyê di ser tiştê pir re, ku xweşiya wê dimîne û herdemî ye, digire. Wê hîngê, ew mîna ew bazirganê li ser hatiye gotin, dibe. Ewê ku cewherekî wî yî buha hebû. Wî rabû mirovek bi sed dînarî kirê kir û bi xwe re bire mala xwe da ku wî cewherê jê re qul bike. Li nav mala wî defikek danî bûn, bazirgên ji karker re got: Tu zanî li defikê bidî? Got erê, karker jî di lêdana wê de jîr bû. Bazirgên got: Defikê bigire û lê bide da em lê guhdar bikin. Mirov defik girt û bi lêdaneke durust û dengêkî xweş lê da, bazirgên jî bi dest û serê xwe kêfxwaşiya xwe dida xuyakirin, û wilo ta êvar hat, û dema ku roj çû ava, mirov ji bazirgên re got: Kirêya min bide min! Bazirgên got: Çima te tiştê kir ku tu kirê bibî? Mirov got: Tiştê te ji min xwast min kir, û jê ne gerî ta sed dînar jê stand û cewherê bazirgên jî qulnekirî ma.

Ez çiqasê zêde li cîhanê û xweşiyên wê jî dinêrîm, min ewqas xwe jê diparast û jê direvîm. Paşê, min dît nasik ji pişdawiya xwe re rêkê dûz dike, wekî ku çawa bav cih ji lawê xwe re amade dike. Min dît, nasiktî derî ji bo buhuşta herdemî vedike, karê xwe bi hêminî û serbilndiyê durust dike, ji Xwedayê xwe re spasdar e, dilnizim e, tiştê zêde naxwaze, bi tiştê ku heye qayîl dibe, guh nade tiştêkî din,

---

<sup>1</sup> .Qulker: Ê ku tiştêkî qul dike.. Di zimên de: Raweya Çêbiwar

cîhan daye paş xwe, ji şerxwaziyê rizgar bûye, kêfxwazî ne pijrandiye, bûye mirovekî pak û dexsî<sup>1</sup> berdaye. Wî hezkirin qezenc kiriye, pir comerd bûye, hişê xwe bi kar aniyê û paş tiştan dibîne. Ji xelkê dûr ketiye, li dû wan ne beziye, loma jî ji wan natirse û fehésiye, û bi wî rengî ew jî poşmaniyê rizgar bûye.

Wê hîngê, her ku min li pirsê nasikîyê nihêrî, ez ewqas jê re dilxwaz bûm, ta min xwast ez bibim ji kesên wê. Lê paşê ez tirsîm, ku nikanibim li ser şeweya jiyana wan xwe ragirim. Min bawer ne kir eger min cîhan berda û bi nasikîyê girt, ezê lawaz û qels nebim, ji ber jiyana xwe ya ku ez li ser mezin bûme kanibim li ber diwarî û giraniya nasikîyê xwe ragirim û di ber de newestim. Bi wî rengî, karine ku berê min dikirin, sûd jî jê werdigirt wê ji destê min herin. Ez tirsîm jî di vî warî de bibim mîna ew kûçikê ku hestûyek di devê wî de bû, û gava di ber çemekî re çû, wî siha wî hestûyî di binê avê de dît û xwe avêtê da ku derîne, lê tiştê vê re bû jî ji dest çû û tişteke di avê de jî ne dît.

Herweha ez ji nasikîyê pir tirsîm, ji xulqtengbûn û nearamiyê jî tirsîm û li ser rewşa ku tê de bûm min bêtir xwe girt. Lê paşê min got, ezê ew tiştên ku jê ditirsîm û nikani bim xwe li ber ragirim, mîna êş, tengahî û diwariya jiyana nasikîyê û hemî belayên ku digihên mirov taqê bikim. Di baweriya min de bû, ku hemî xwaşiyên jiyane û

---

<sup>1</sup>.Dexs: Çavtengî حسد

kêfxwşiyên wê tên veguhestin, dibin êş û xemginiyê peyda dikin. Çinkî cîhan mîna ava şor e, her mirov jê vedixwe bêtir tî dibe; mîna hestûyê ku kûçik dibîne, ew bêhna goşt jê dike û wî gez dike ta devê wî tijî xwîn dibe. Mîna başîqê<sup>1</sup> ku pariyek goşt bi dest dikeve, tilûr lê kom dibin, ew jî difire û digere ta diweste, bêhal dibe, dema ku westiya jî, goştê ku pê re bû ji devê xwe davêje. Mîna kûzê hinguv ku jehir di bin de ye, li destpêkê şêrîn e û tê xwarin, dawiya wî jî mirina reş e. Mîna xewna ye, mirov di xew de pê şa dibe, lê eger şiyar bû, ew şabûna diçe. Mîna birûskê ye, bêhnekê roniyê dide û paşê diçe û reşantî tê. Mîna kurmê hevrişmê ye, bi şev û rojê dixebite, lê rista ku çêdike li wî tê hev, nikare jê rizgar bibe û di nava rista xwe de dimire.

Gava ku ez di wan tiştan de ramîm, min dîsa doza nasikiyê kir û hezkirinê ez bi ser de kişandim. Lê paşê min lome ji henasa xwe kir, wekî ku ew di bedxwaziyên xwe de diçe û li ser biryarekê ranaweste. Mîna dadwerekî ku ji aliyekî dozê dibihîse û biryar jê re da, û gava ji aliyê dozê ê din jî dibihîse, ji biryara xwe a berê vedigere û li dijî kesê yekê biryarê dide.

Paşê min li dijawrî û tengahiyên ku di nasikiyê de hene û dibînin nihêrî û got: Çiqas dijwariyeke biçûk e li hember xweşî û vehesiya bêdawî ya giyanê mirov<sup>2</sup>! Paşê min bala xwe da xweşiyên cîhana ku henas bi ser de dikele û got:

---

<sup>1</sup>.Başiq:Tilûrekî goştxwar e.

<sup>2</sup> . Giyan: روح

Ev yeka çiqas tal û bi êş e?! Ew mirov bi ser êşa pişdawayê û bêtarên<sup>1</sup> wê de têve dide. Çawa mirov ji bo ku xweşiyek herdemî bi dest bixe, piçek talî napejrîne?! Çawa nabîne ku şîrîniyeke hindik taliyeke herdem li dû heye?! Min got: Eger ji mirovekî re hat gotin, bila sed salî bijî û li her rojekê tiştek jê were birin, eger wî sed sala kuta kir jî, ewê ji her êş û zîyanê rizgar, aram û dilşa bibe; wê hîngê, bê guman ewê wan salan pir hêsan û sivik bibîne. Lê çawa mirov dê çend rojan di jiyana nasktiyê de netebite, nemaze jî westana wan hindik e û xweşiyeke mezin li dû heye?! Ma tevaya cîhanê ne êş û bela ye. Ma mirov ji roja ku hîn di zikê diya xwe de ye û ta rojên xwe bi dawî dibin, ne herdem di êşa cîhanê de digevize<sup>2</sup>?!

Gava ew zarok be, êşekên rengereng dibîne; eger birçî bû, nikare bixwe; eger tî bû, nikare avê vexwe, eger êşek dît, nikare alîkariyê bixweze; ji bilî êşeka hilgirtina di zikê dayîkê de, jidayîkbûnê, pêçan û mizdanê; eger li ser piştê danîn, nikare xwe wergirîne. Paşê, dema ku dibe şîrmij dîsa tonbiton êşekan dibîne. Eger ji mêjandinê xelas bû, dikeve êşa perwerdeyê û rengereng tundî ji mamoste, tengijîna ji wanê û nivîsandinê dibîne. Paşê ji dermankirinê, parêziyê, nexweşî û êşekan jî hîç bêpar namîne. Eger mezin bû jî, xema xwedanên xwe hildigire, hemî hêza xwe dide komkirina mêl, perwerdeya zarokan, dozkirina tiştan, çûnhatin, westan û cefakêşiyê. Digel wan

---

<sup>1</sup>.Bêtar: Belayên mezin.

<sup>2</sup>.Digevize: يتمرغ

hemîyan, ew bi dijminên xwe ên hundirê govde xwe re jî serûbinê hev dibe, ew jî zerik, reşik, ba, belxem, xwîn, jehra kujer û marên gezok in. Li gel tirsî ji cinawir û hovan, parastina ji sermê, germê, bê, baranê, berfê, Iblîsê herdem, henasa bedkar, ji bilî nişkaviyên bed, cureyên eşa pîrbûnê, hîn eger gihîşte wî temenê jî.

Eger ew ji tiştêkî ji van jî ne tirsî, û pê bawer bû ku wê bi hêsanî<sup>1</sup> jê derkeve û pê ne rame, wê hîngê, dê di kata ku mirin were de birame; çawa wê dest ji jiyanê berde û tiştê ku dê bi serê wî were bi bîr wîne. Ewê li wê katê, tiştên her buha bi bîr wîne, wek destbirfîna ji yar, xwedî, meriv û ji her tiştê ku ji jiyanê dixwast, û çûna wî a ser tirsî mezin a piştî mirinê; eger wîlo neke, ewê mirovekî bêçare be, mîna hezkiriyê kêmaniyê were dîtin, hêjayî lome û kêmaniya mezin be.

Ma kî dê wan tiştan zani be û berî ku bi ser de werin xwe jê re amade neke, jê re nexebite û tiştên ku wî ji xweşî û şahiyên cîhanê dîr bixe, qebûl neke? Nemaze jî li ev dema ku ji ser ve sade û zelal xuya dibe, lê di rastiyê de herimî<sup>2</sup> ye. Çinkî, digel ku eger qeral hêzdar û xwedî biryar, qîretbilind û kûrzan<sup>3</sup> be, dademend, ricakar, rastgo û spasdarê Xwedê be, destdirêj, serkar, çavdêr û li rewş û karûbarên xelkê berdewam be, ji zanîn, çêxwazî û çêxwazan hez bike, li dijî zordariyê raweste, ne tirsok be,

---

<sup>1</sup>.Hêsanî:Silametî

<sup>2</sup> Herimî: Lihevketî, ne pak û ne zelal عكر

<sup>3</sup>.Kûrzan: Kûr bi tiştan zane.

xwedî rêbertiyeke zîrek be, ji tiştên ku millet jê hez dike re dilxwaz be, û ji tiştên jê hez nake jî xwe diparêze. Di nava van hemî tiştan de em dibînin dem li her derekê piştî xwe didê û jê direve, mîna ku rastî ji xelkê hatiye birin, tiştê ku pir buha ye ji destan hatiye birin, tiştê ku ziyana wî tê de heye jî maye, wekî ku çêxwazî çelmisiye û şerxwazî geş bûye û têgihîştin jî rêwindayî bûye. Wekî ku mafdarî dilşikestî bûye û çûye, nerastî<sup>1</sup> jî li şûnê hatiye, çûna li dû meraqan û windakirina destlatê jî bûye karê destlatdaran, kesê zorlêbûyî lawaziya xwe pejirandiye û zordar jî vehesiya xwe biriye.

Wekî ku çavbirçîtiyê devê xwe bi her aliyekî de vekiriye û tiştê jê ve dûr û nêzik dadiqurtîne. Mîna ku qayîlbûn û pêbawerî bûne tişteki nenas e, şerxwaz berve ezmên hildikşin, çêxwaz dadikevin zikê zemînê, comerdî ji astên bilind de berve binê kortalê hatiye avêtin û destlatdarî jî ji ba payedaran çûye ser kesên nizimkar. Wekî ku cîhan geş û dilxweş bûye û dibêje: Min xêr tune kirin û bedkarî bilind kirin.

Dema ku ez di cîhanê û karûbarên wê de ramîm, min nas kir çawa mirov tê de afrandeyê herî rûmetir û çêtir e, lê ew di şerxwazî û xemgîniyê de digevize! Ez ji wê rastiye bihitîm û têgihîştim, yê ku wî tiştî nas dike û ji bo jê rizgar bibe kar neke û derfetan ji dest xwe berdide, ew li

---

<sup>1</sup>.Nerast: Tiştê ne rast, باطل



ba min mirovekî ne xwedî nêrîn e û ji bo rewşa ku tê de ye bê qîret e!

Paşê min nihêrî û dît, ku hemî mirov wan derfetan ji destê xwe berdidin û haya wan jê tuneke, wê hîngê ez jê mat mam û rabûm jê re li sedeman gerîm. Min nihêrî û dît, tiştê ku nahêle mirov ji bo henasa xwe bixebite, tenê kêfxweşiyêke biçûk û pîs ji bîn, çêştin, nêrîn, bihîstin û pelmistinê<sup>1</sup> ye, belkî ew tenê tibabeke pir hindik jê ji wan tiştan wergire û piçekî biçûk jê jê bi dest bixe, lê belê ew tiştê wî mijûl dike û dihêle ji bo rizgarkirina henasa xwe nexebite û rizgariyê jê re nexwaze.

- **Minaka Mirov û Bîrê:**

*Mirov li cîhanê, û şerên li derdora wî*

Ez ji mirov re li mînakekê gerîm, min dît ew mîna mirovê ku xwast ji tîrsa fîlekî gurgîn xwe rizgar bike, xwe rabû xwe berda devê bîrekê û bi du şiqnên darekê ku li ser devê wê bûn girt, lingên xwe jê li ser tiştina sekinîn. Wî li jêr xwe nihêrî, dît ku çar maran serên xwe ji qulan derxistine û lingên wî li ser sekinîne, li binê bîrê jê nihêrî, dît ku cinawirek di binê bîrê de ye, devê xwe vekirîye û li bendê ye ku bikeve û wî daqurtîne. Wî serê xwe bi jor de rakir, dît ku di koka wan du şiqnan de du mişk hene, yekî reş û yekî sipî, ew jê bê rawestan ji koka wan şiqnan dixwin.

---

<sup>1</sup>.Palmistin: Bi destan mizde û nas bike.

Ew hîn wilo bû, di rewşa xwe de diramî, wî qewêrek<sup>1</sup> li nêzîk xwe dît, hinguv tê de hebû, rabû hinguv tam kir, şêrînî û xweşikiya wî hunguvî ew kişand, kir ku rewşa xwe ji bîr bike û hewilnede xwe xelas bike. Ji bîr kir jî ku lingên wî li ser çar maran e, çi çax be ewê bi ser wan de bikeve. Ji bîr kir jî ku ew her du mişk bê rawestan wan her du şiqnan dibirin û kînga be dê werin birîn û ewê bi ser cinawir de bikeve! Herweha ew bi şêrîniya hinguv mijûl bû ta kete devê cinawir û pê çû.

Min ew bîra, bi cîhana tijî nexweşî, xirabî, tirs û derdan nimûnand; çar mar bi çar têkelên<sup>2</sup> govde nimûnandin, kengî ew, yan yek ji wan hêgin<sup>3</sup> bibe, ew mîna taya maran û jehra kujer dibe. Du şiqin jî bi temenê mirov nimûnand, çinkî kînga be ewê biqetin. Min du mişkên sipî û reş jî bi şev û rojê nimûnandin, ew herdem ji bo birîna temenê mirov dixebitin. Cinawir jî bi çarenûsa mirov a bê rev nimûnand. Hinguv jî bi şêrîniya hindik ku mirov ji cîhanê dibe nimûnand, ew şêrîniya ku jê dixwe, bîn dike, dest pê dike, pê xwe ji bîr dike, paşê jî ji rê û armanca xwe dimîne û pişdawiye ji bîr dike.

Wê hîngê, ez ji xwe razî bûm, çi karê çê ku min kanî bikira, min kir. Min got jî, belkî di rojên min ên ku mane de, ez pêrgî<sup>4</sup> rêberekî çêkar werim, bi henasa xwe kani

---

<sup>1</sup>Qewêr: Qula fere û ne kûr.

<sup>2</sup>.Têkel: Tiştên têkel hev bûne خلانط.

<sup>3</sup>.Hêgin: Azirî استفحال.

<sup>4</sup>.Pêrgî: Rastêhatin التقاء.

bim, karê xwe durustir bikim û li ser wê jî mam. Min pir pirtûk destnivîs dikirin, min ev pirtûka jî destnivîs kir û ji welatê Hindê hatim.

\*\*\*

\*\*\*

## Deriyê Gê û Şêr

### Ew jî Destpêka Pirtûkê Ye

Qeral Debşelîm bi feylesûf Beydeba re, ku serokê Berahîmiyan bû, got: Nimûnekê<sup>1</sup> li ser du kesên ku ji hev hez dikin û çawa mirovekî virek bikeve navbera wan, rik û dijmantiyê di navbera wan de peyda dike, ji min re wîne.

Beydeba got: Eger bû û virekekî fisûk<sup>2</sup> kete navbera du yaran, pir naçe ew ji hev dibin û ji hev dûr dikevin. Ji ber wê jî derd û neyarê hezkirinê fisûkî ye.

#### • Mîna Şêx û Her Sê Lawên Wî

Ji mînakên wê, li welatê Destawendê pîremêrekî sê lawên wî hebûn, wan tu pîşe bi dest ne xisti bûn da ku sûdekê jê bibînin, ji malê bavê xwe dixwarin, vedixwarin û zêde mezax dikirin. Dema ku ew mezin bûn, bavê wan ew lome kirin û ji bo bedkariya wan ew şîret kirin. Ji gotinên wî ji wan re got: Kurên min! Mirov di jiyana xwe de dixwaze sê tiştan bi dest bixe; lê bê çar tiştên din nikare wan bi dest bixe; ew sê tişt jî ev in: Roziyeke pir, payedariyeke bilind di nav xelkê de û sermiyanêke ji rindiyê ji bo pişdawiya xwe. Pêwîstî bi çar tiştan jî heye ku ew pê bigihê wan sê armancan, ew jî ev in: Qezenckirina diravê bi şeweya her baş, parastina wê

---

<sup>1</sup>.Nimûne: Mînak, مثال.

<sup>2</sup>.Fisûk: Ewê ku gotinên rast û nerast ji yekî digihîne yekî.

qezencê, bikaranîna wan, li dawiyê jî mezaxkirina wan ji bo jiyanêke rind û razîkirina Xwedê û biraderên xwe, da ku sûda wan tiştan li roja pişdawayî li wî vegere. Eger tiştêk ji wan tiştan bi cih nanî, ew nagihê daxwaza xwe; çinkî eger ew diravê qezenc neke, nikare bijî, eger bû xwedî qezenc û mal, lê rind ranekir û danenî, ew mala dê ji dest here û bêmal bimîne. Eger ew mala jî veşart û pê kar ne kir, ta mezaxkirina hindik jî wî ji dawîbûna bilez neparêze, mîna kilaya çavan, erê ew piçek toz e, bi serê mîl tê birin, lê dîsa jî zû bi dawî dibe. Eger pereyên xwe di cihên ne durust de mezax kirin, xistin cihê ne guncav, di cihê wî ê rast de bi kar nanîn, ew mîna xizanekî bêmal dibe, malê wî ji bûyeran û ji ziyânên ku bi ser de werin neparêze; wê hîngê, ew dibe mîna bendeke avê, her diçe av tê de gol dibe, eger dergehêk û cihek tunebe av tê re biherike, ewê xira bibe, di gelek cihan re av dê jê darive û tê here, belkî qul bibe û ava bendê jî bi tevahî winda bibe.

Wê hîngê lawên şêx bi gotina bavê xwe kirin, naskirin ku xêr di gotina wî de ye û pê kirin.

Paşê, lawê wî ê mezin rabû û berê xwe da welatekî jê re dibêjin Meyûn. Ew li ser rê gihîşt ciyekî pir bi herî, du gayên wî jî hebûn erebana wî dikişandin, navê gaki Şetrepe û ê din jî Bendepe bû. Şetrepe li wê derê di heriyê de ma, mirov û kesên ku vê re bûn pir hewil dan wî ji heriyê derînin, lê nikarîn. Wî rabû mirovekî xwe li ber hîşt û jê re got: Belkî herî ziwa bibe û ga derkeve, tuyê wî wîni û xwe bigihîni me. Lê gava ku ew mirova bi tenê ma,

tenêbûn û tirsê ew westandin, rabû ga hîşt û çû xwe gihand hevalên xwe û ji dostê xwe re got ku ga mir, jê re got jî: Dema ku temenê mirov xelas bû û mirina wî hat, çiqas xwe ji tiştên metirsîdar û xedar<sup>1</sup> biparêze, sûdê nabîne, belkî hîn xebata xweparastinê li serê wî bibe bela jî.

### • **Mîna Yê Ku Ji Gur û Diz Revî**

Wekî ku hatiye gotin: Rojekê, mirovek di cihekî re çû, zanî jî ew wara ne hêmin e û cinawir li wir pir in. Ew hîn pir ne çû bû, gurekî har li pêş wî derket. Dema ku dît gur berve wî tê, ew jê tirsî, li rast û çepê xwe nêrî da ku cihekî bibîne, xwe ji gur biparêze û xelas bike. Wî dît gundek li paş geliyekî heye, wî rabû berê xwe dayê û lezand, gava gihîşt ba gelî, dît ku pira li ser tune, û çaxa dît ku gur jê ve nêzîk bû, ji tirsê re xwe avêt nava avê, lê wî baş bi avcenyê jî nizanî û hindik ma ku di avê de noq biba, ta hinekan ji şêniyê gund ew dîtin, hatin xwe avêtin nava avê, ew jê derxistin û ji mirinê rizgar kirin.

Dema ku mirov gihîşt ba gundiyan û ji gur ewle bû, wî dît xanîkî tek li ser avraza gelî heye, got: Ezê bikevim vî xanî û tê de vehesim. Gava derbas xanî bû, dît ku komek diz rê li bazirganekî girêdane, malê wî parve dikin û dikin wî jî bikujin. Dema ku wilo dît, ji xwe tirsî û vegeê gund da ku ji tirsê û westana ku dît vehese û piştî xwe da

---

<sup>1</sup>. Xedar: Bi tirs.

dîwarekî û rûnişt, lê belê dîwar bi ser de hilweşî û mir. Bazirgên got: Gotina te rast e; min jî ev çêroka bihîstiye.

Paşê, gayê bi navê Şetrepe ji heriyê derket û rabû û demekê li mêrgeke pir şov û bi av û geya ma. Gava ku ewle û qelew bû, dest bi urînê<sup>1</sup> kir û dengê xwe bilind dibû. Daristanek jî li nêzîkî cihê gê hebû, şêrekî gewre tê de dijiya, ew qeralê wê deverê bû û gelek cinawir, gur, çeçel, rovî, şip<sup>2</sup> û piling vê re bûn. Wî şêrî bi ya xwe dikir û guh ne dida şora kesekî ji hevalên xwe. Gava ku wî urîna gê bihîst, berê jî ga ne dîti bûn, ne jî dengê urîna wan bihîsti bû, tirs û guman kete dilê wî, lê wî ne xwast leşkerên xwe bi wê yekê haydar bibin, lê ji ber tirsê wî dengê, herdem li cihê xwe bû, ne dilivî, karek ne dikir û heroj xwarina wî ji hêla leşkerên wî jê re dihat. Ji nava cinawirên ku vê re bûn du çeçel jî hebûn, ji yekê re Kelîle û ji ê din re Dîmne digotin. Ew her du jî xwedî hiş, zanîn û rewîşt bûn.

### • Hevpeyvîna Kelîle û Dîmne Li Derbara Şêr.

Dîmne ji birayê xwe Kelîle re got: Çi pirsê vî şêrî ye, ne ji cihê xwe dilive û ne karekî dike? Kelîle jê re got: Çi karê te bi vê pirsê ye tu dipirsî? Em li ber deriyê qeralê xwe ne, tiştê ku jê hez dike, em dikin, tiştê ku naxwaze jî berdidin. Em ne ji asta ew kesên ku li ser qeralan bipeyivin û li karûbarên wan binêrine. Dev ji wê yekê

---

<sup>1</sup>.Urîn: Belkî ji bingeha xwe de (hurîn) be, dengê ga.

<sup>2</sup>.Şip: Lawirekî hov e فهد.

berde, bila tu zani bî kesê ku destê xwe bavêje kar û gotinên ne ji karê wî bin, ewê bibe mîna ew meymûnê<sup>1</sup> ku lêdan ji destê necêr dît. Dîmne got: Ma ew çawa bû?

### • Mînaka Darteraş (necêr) Û Meymûn

Kelîle got: Dibêjin meymûnekî dît darteraşekî çiviyek kiriye nav textekî, li ser têxt rûniştiye û wî dibire. Wî ew tişta seyr dît, û dema ku necar ji bo karekî derket, wî karê ku ne karê xwe bû kir û rabû li têxt siwar bû, berê xwe da çiviyê, piştî xwe da text, dûvê wî jî kete nav tîşa têxt, bi çiviyê lîst û ji ber têxt kişand, bi wê yekê dûvê wî di tîşa têxt de ma û ji ber êşekê ji hişê xwe ket. Gava ku necar hat û ew di wê rewşê de dît, wî jî rabû lêda, hîn lêdana ji necêr dît ji êşeka ku ji têxt dît girantir bû.

Dîmne got: Tiştê te got min bihîstiye, lê ne herkesê ku ji qeralan ve nêzîk bibe, kane dostaniya wan bike. Ez jî zanim ne herkesê ku ji wan ve nêzîk dibe ji bo zikê xwe nêzîk dibe, ew nêzîk dibe da ku dostan kêfxweş bike û neyaran zelîl bike. Ji mirovan kesên bê qîret hene; ew bi hindikiyê şa dibin, bi kêmaniyê qayîl dibin; mîna kûçikê ku hestûyek bi dest dikev û pê şa dibe. Lê xwedî qîret û camêr, bi hindikî qayîl nabin, berê wan herdem bi jor de ye, berve tiştê li gora wan û hêjayî wan e; mîna ew şêrê ku kêvrûşkekî digire, lê gava ku hêştir dibîne, wî berdide û diçe hêştir! Tu nabînî çawa kûçik dûvê xwe dileqîne, ta pariyê nên jê re tê avêtin û pê şa û qayîl dibe; lê filê xwedî

---

<sup>1</sup>.Meymûn: Kûnsork قرد.



hêz û sûdar, eger danê<sup>1</sup> wî danê, ew nêzîk xwarinê nabe ta rûyê wî tê mizdan û tê nazdarkirin! Kî maldar jiya, li ser xwe, xwedan û birayên xwe bû xwedî rindî û payedariya wî bilind bû, ta temenê wî kin be jî, temenê wî dirêj e. Kî di jiyana xwe de miqris be, yan jî li ser xwe û xwediyên xwe desthişk<sup>2</sup> be, mezax neke û ne xwedî paye be, mirî dîsa jê çêtir dijîn. Kê ji zikê xwe re kar kir û tiştên ji bilî wê berda, ew ji dewaran tê jimartin.

Kelîle got: Tiştê te got ez têgihîştim. Li hişê xwe vegere; bila tu zani bî ku her mirovekî paye û nirxeke wî heye. Eger ew di paya xwe de cihgirtî be, gerek e bi rewşa xwe qayîl bibe. Paya me jî ne bilind e ku em ji wê kêmtir bibin. Paşê payedariya mirov wekî feleka<sup>3</sup> wî ye, ew ji berê de hatiye danîn, gerek e feleka wî ji bingehê de çawa be, pê qayîl bibe, çinkî rê tê re tune ye.

Dîmne got: Paye, bi qaserî qîreta ku bi mirov re heye û pê dixebite, jê re tê. Qîreta mirov, wî ji paya nizim radike paya bilind. Yê ku bê qîret be, xwe ji paya bilind dadixe paya nizim. Bilindbûna ji bo paya bilind zor dijwar e, lê daketin hêsan e; mîna kevîrê giran, rakirina wî ji erdê ta ser mil dijwar e, lê daxistina li ser zemînê hêsan e. Ji mafê me ye, ku em bi qîreta xwe, paya li jor xwe ji xwe re bikin armanc û bixwazin; ma emê çima bi paya nizim qayîl bibin û em kanin rewşa xwe biguhêrin?!

---

<sup>1</sup>.Dan: Xwarina demekê وجبة.

<sup>2</sup>.Desthişk: Destgirtî, miqris بخيل

<sup>3</sup>.Felek: Qeder.

Kelîle got: Tu gihîştî çi baweriyê? Dîmne got: Ez dixwazim di vê derfetê de xwe di şêr bidim; ji ber ku şêr di ev rewşa ku tê de ye, xwedî nêrîneke lawaz e, pirs li ba wî û leşkerên wî tevlî hev bûye, belkî ez kani bim di vê rewşê de jê ve nêzîk bibim û li ba wî bibim xwedî cîgeh<sup>1</sup> û payeke bilind. Belkî ew dest bi gotinê bike, ez jî gotinên rewanbêj jê re bêjim û bikim tiştê ku veşartîye ji min re bêje û diyar bike.

Kelîle got: Tu çawa zanî şêr şaş maye? Dîmne got: Ez bi hest û nêrînê têgihîştim. Mirovê xwedî nêrîn, kane rewşa hevalê xwe û hundirê wî ji pergala û rewşa wî nas bike.

Kelîle got: Tu çawa dixwazî bigihê payekê li ba şêr û tu ne xwedî destlat î, ne jî zanîna te bi xizmeta siltanan, rewîştî wan û encûmenên wan heye? Dîmne got: Mirovê xurt û zorbe<sup>2</sup>, ta ku karê wî ne barhilgirtin be jî, barê giran wî bêçare nake; mirovê jar jî biçûk ne tê dîtin, ra eger wiha lê bê nêrîn jî.

Kelîle got: Armanca siltên bi dandina camêriyên xwe, tenê kesên payebilind yên ku li civata wî ne; ew ew kesên payenizim ku xwe jê ve nêzîk dikin, nabîne. Tê gotin: Di vî warî, siltan mîna dara mêwê ye, tenê xwe bi darên baştir ve digire. Ma tu çawa dixwazî li ba şêr bibî xwedî paye û tu berê jê ve nêzîk ne bûyî?

---

<sup>1</sup>.Cîgeh: Xwedî cihê bilind, مكانة

<sup>2</sup>.Zorbe: Bi zor û hêz القوي المقتدر.

Dîmne got: Ez ji hemî gotin û tiştê te got têgihîştim û tu rast dibêjî. Lê ez zanim, ewên ku niha ji siltên ve nêzîk in, li ba wî xwedî pile<sup>1</sup> ne, berî ku bigihên ba wî, ma ew asta<sup>2</sup> ji cih û ji paya wan bû? Ez jî hevî dikim bi keda xwe bigihêm payedariya wan, hatiye gotin: Kes nikare li ber deriyê siltên bimîne, ji bilî ewê xwe ji pozbilindiyê xelas bike, xwe li ber êşgihandinê ragire<sup>3</sup>, bi hêrsa xwe kani be, bi xelkê re nerm be û nehênê biparêze. Eger ev tiştina bi cih anîn, ewê bigihê daxwaza xwe.

Kelîle got: Em bêjin tu gihîştî ba şêr! Tuyê çawa û bi çi şêweyê bi serkevî? Çawa li ba wî bibî xwedî paye û şor? Dîmne got: Eger ez jê ve nêzîk bûm, min sinciyên wî jî baş nas kirin, ezê bi wî re pir nerm bim, li dijî wî nesekim, eger tişteke xwast û rast dît, ezê wî tiştî jê re fodiltir<sup>4</sup> bikim, sebra wî pê wînim, çi sûd û rindî tê de hebin jî pê bidim nasîn û wî bi ser de bihevojînim, da ku bigihê wî tiştî û pê şa bibe. Eger tişteke jî xwast û ji ziyana nerindiya wî tirsî, ta ez kani bim ezê ziyana wî tiştî jê re bêjim û sûda devjêberdana wî jê re xuya bikim.

Ez bawer dikim ku bi wê yekê paya min wê li ba şêr bilind bibe, tiştê ji min bibîne jî wê li ba kesekî din nebîne. Mirovê bi rewîşt û zana, eger xwast rastiye nerast bike, nerastiye jî rast bide xuyan, ew mîna wênêkêşê destxweş

---

<sup>1</sup>.Pile: Ast, derece, paye.

<sup>2</sup>.Ast: Pile, Paye مستوی، مقام

<sup>3</sup>.Ragirtin: Li ber dijwariyan bisekine û nekeve.

<sup>4</sup>Fodil: Rind, ciwan..

dike, ewê ku wêneyan li ser dîwaran çêdike wekî ku ew dikin ji dîwêr derkevin, lê ew jê derne tên, hinek jî mîna ku dikevin dîwêr, lê ew nakevinê. Eger şêr nas kir çî li ba min heye û nêrîna min a durust jê ve hate nasîn, ewê bixwaze min nirxdar bike û ji xwe ve nêzîk bike.

Kelîle got: Eger te wilo got, an wekî din got, ez ji aliyê siltên de li ser te bi tirs im, ji ber ku hevaltiya wî bi tirs e û ez ji bo wê yekê te haydar dikim. Zanyaran gotiye: Sê tişt hene ji bilî kesên bê hiş wan nakin, pir hindik jî mirov ji encamên wan tên parastin, ew jî: Hevaltiya siltên, danîna nehênan li ba jinan û vexwarina jehrê ji bo taqekirinê. Zaniyaran siltan bi çiyayên dijwar nimûnandine, ewên ku ber û tiştên şêrîn, çemên zelal, cewherên buha û dermanên sûdar lê hene; lê belê cinawir, piling, gur, û her tiştê hov û bi tirs jî li nav hene, loma jî hilkişîna ser wan zor e, mandina li ser jî zortir e.

Dîmne got: Tiştê te got rast e, lê belê ewê ku li dijwariyan siwar nebe, nagihê daxwazên xwe. Kî ji ber tirsê û ji bo xweparastinê karê ku wê pê bigihê pêdviyên xwe berde, ewê destkeftinên mezin nebîne.

Hatiye gotin: Sê karên mezin hene bê qîretiyêke bilind û tirsdariyêke<sup>1</sup> mezin pêk ne tên, ew jî: Dostaniya siltên, bazirganiya deryayê û destpêkirina pêvçûnê bi dijmin re. Zanyaran li derbara mirovê pak û hişmend jî wiha gotine: Gerek e ew tenê li du cihan were dîtin, ji bilî wan jî ne

---

<sup>1</sup>.Tirsdarî: Tirs tê de heye خطر.

hêjayî wî ne: Yan bi rûmet li gel qeralan be, yan jî bi nasikan re perestvan be; ango mîna fîl, ciwanî û heybeta wî li du cihan tê dîtin: An li çolê hov û gurgîn<sup>1</sup> be, yan jî dema bibe siwarîka qeralan. Kelîle got: Here! Di tiştê te biryar kiriye de Xwedê bibe hevalê te.

Paşê, Dîmne rabû û çû derbas ba şêr bû, rûyê xwe li zemînê mizda, li nav destên wî rawestî, silav lê kir û bêdeng sekinî. Şêr ji hin kesên ku rûnişti bûn pirsî: Ev kî ye? Got: Ev Dîmne kurê Selît e. Got: Min bavê wî nas dikir. Paşê jê pirs kir ew li kû dimîne? Dîmne got: Ez hîn li ber deriyê qerêl im, lava serketin û mandinê jê re dikin, hêvî dikim tiştê bibe û ez bi henas û nêrîna xwe alîkariya qerêl bikim. Çinkî pir tişt li ber dergehên qeralan dibin, belkî qeral ji bo wan bi gerekî kesên ku kes guh nade wan bibe. Eger çiqas yek biçûk be, dîsa jî belkî hin sûdên bi qaserî wî jê hebin; ta darikê ku li ser xakê avêtî be, dîsa jî belkî sûdar be û carina mirov wî radike guhê xwe pê dixurîne, gava gerek dibe jî jê re dibe alîkar.

Gava qerêl gotina Dîmne bihîst û xweş dît, hêvî kir ku ewê xwedî nêrîn û şîret be. Wî berê xwe da kesên amade û got: Mirovê xwedî qîret û zanîn, dengê wî dernakeve û payenizim dimîne, lê belê kîjan katê be, payedariya wî serî hildide û bilind dibe. Mîna agirê ku çiqasê xwedanê wî lê dide, ew dîsa jî xwe hildide û bilind dibe. Gava Dîmne nas kir, ku şêr şora wî xweş dît û gotina wî lê xweş hat, got:

---

<sup>1</sup>.Gurgîn: Yan jî girgîn, gava ku dewarek har dibe.

Ey qeralo! Xelkê qerêl tê ber deriyê wî, da ew nas bike ku çi zanîn li ba wan hene, çinkî ew mîna çandiniya di binê xakê de ne, rindiya wê ne tê nasîn, ta ew derdikeve ser rûyê zemînê. Gerek e qeral her mirovekî li gora nêrîna wî û qaserî sûda li ba wî dibîne, wî bigihîne payedariya wî.

Hatiye gotin: Du tişt hene gerek e mirov neke: Ew xilxalê bike gerden û têxe stû, gerden jî bike xilxal û têxe lingan. Belkî were gotin jî, rindî di du tiştan de ye: Rindiya şervên li ser şervên û ya zanyêr li ser zanyêr. Pirbûna alîkaran jî, eger ew ne xwedî ezmûn bin, belkî ji bo karan ziyar be, ji ber ku kar ne bi alîkarên pir e, lê bi alîkarên durustkar e.

Mînaka wê, mîna ew mirovê ku kevirekî giran hildigire, dibin de dimire û sûda buhayekê jî jê nabîne; lê mirovê ku yaqût hildigire, ta ew biçûk e jî, lê wî bi pereyên pir difroşe. Karên ku pêdviya<sup>1</sup> xwe bi fêlbazî û xapandinê hene, ji bilî mirovê têgihîştî û hişyar nikare pê rabe; mirovê ku pêdviya xwe bi daran heye, çiqas qamîşan bibîne sûdê lê nakin. Qeralê min, gerek e qîreta ku li ba mirovekî payenizim hebe tu kêm nebînî, çinkî belkî ew kesê biçûk gewre bibe, mîna tamara ku ji termekî tê birin, dema ku kevanek jê çêdibe, ew bi nirx dibe, qeral jî bi destê xwe pê digirin û di lîstikê û di şer de jî gerek dibe.

Dîmne xwest ji civatê re xuya jî bike, payedariya ku wî li ba qerêl bi dest xist, ji ber qîret, nêrîn û hişdariya wî ye;

---

<sup>1</sup>.Pêdvî: Gerekî, hâcet.

çinkî wan nas kir ku qerêl berê bavê wî nas dikir û got: Siltan mirovan ji xwe ve nêzîk dike, ne ji ber ku bavên wan ji wî ve nêzîk bûn, an jî bi sedema ku bavên wan jê dût bûn ji xwe dût dixê. Gerek e li gora tiştên ku li ba mirov hene lê were nêrîn; çinkî ji govde mirov ji mirov ve nêzîktir tune, lê govde bi xwe jî nexweş dibe, ziyana digihîne wî jî û ji bilî bi dermanê ku ji dût ve jê re tê çak<sup>1</sup> nabe.

Gava ku Dîmne gotina xwe kuta<sup>2</sup> kir, qeral pir pê şê<sup>3</sup> bû, gotina wî baş dît û qîmeta wî zêde kir. Paşê qerêl ji civata xwe re got: Gerek e siltan mafên xwedî maf wî wî neke, ta ji ewê ku ziyana jê guman dibe jî; çinkî dawîya wî karî jê re ne baş e. Di vî warî de jî mirov du cure ne: Mirovek xwedî sinciya şerûd<sup>4</sup> e, ew mîna marekî ye, eger yekî pêlê kir û pê daneda, gerek pê ne tê xapandin û careke din pêlê neke, çinkî ewê pê dade; eger bingeha sinciyên mirovekî jî asa<sup>5</sup> be, ew mîna dara Sendelê a sar e, eger pir hate mizdan, germ û ziyandar dibe. Piştî, Dîmne bi şêr re bû dost û bi tenê jî vê re dima.

Rojekê ji qerêl re got: Ez dibînim qeralê me li ciyekî rûniştiye û jê ranabe, ew jî ne ji sinciyên wî ye. Çinkî ew bi hêz û xwedî ferman e, min xwast -wek destdirêjî-

---

<sup>1</sup>.Çakbûn: Durustbûn, rihetbûn شفاء.

<sup>2</sup>.Kuta: Bi dawî, xelas kir.

<sup>3</sup>.Şê: Mat, seyr, maliq, bihitîn دهشة تعجب.

<sup>4</sup>.Şerûd: Har, no شرس، شرير.

<sup>5</sup>.Asa: Normal, xwazayî هادئ، جيد طبيعى.

pirsekê bikim, ji ber ku tiştê veşartî bi lêkolînê tê nasîn, eger ew diyar bû, bingeş û ramana wî jî tê naskirin? Ew hîn di wê axaftinê de bûn, Şetrepe bi dengê bilind urî û şêr jê tengijî, lê wî ne xwast ji Dîmne re xuya bike; lê belê Dîmne nas kir, ku vî dengî guman û tirs xistiye dilê şêr û rabû jê pirsî: Ma qeral di wî dengî de bi guman bûye? Qerêl got: Jixwe<sup>1</sup>, tiştêk ji bilî wî min gumanbar nake! Wî ez li vê dema dirêj di vî cihê de rawestandime! Dîmne got: Ne rast e qeral ji bo dengêkî ji cihê xwe dernekeve. Zanyaran gotiye: Ne gerek e tirs ji her dengêkî hebe. Şêr got: Bi texmînê li ba min xuya dibe, ku govdê xwedanê ev dengê nexweş ku min tucarî mîna wî ne bihîstiye, pir mezin e, çinkî dengê wî li gora govdê wî ye, eger rast wilo be jî, dostanî û rûniştina me vê re ne gengaz e! Dîmne got: Ne rast e qeral ji bo dengêkî ji cihê xwe ne live. Çinkî zanyaran gotiye: Gerek e ji her dengêkî tirs peyda nebe. Şêr got: Ma mînaka wê çi ye?.

### • Mînaka Rovî û Daholê:

*Mînaka laşê mezin û rastiya biçûk*

Dîmne got: Hatiye gotin, ku daholek li nava daristanekê bi darekê ve xisti bûn û her dema ku ba radibû, şaxên darê dihejîn, li daholê diketin û dengêkî bilind jê derdiket. Rojekê roviyek ji bo wî dengî hat nav daristanê, berê xwe da cihê deng û çû, gava gihîşt ba wê, dît ku ew tiştêkî pir

---

<sup>1</sup> Jixwe: `eyn wilo, بالذات، ذاتاً



mezin e, wî bawer kir ew tijî goşt û bez<sup>1</sup> e, ew vêket ta dirand. Lê gava dît ku ew vala ye û tiştêk tê de tune, got: Ez nizanim, belkî tiştên her têkber ewên deng bilintir û laşe mezintir bin!

Min ev nimûna ji te re anî, da tu zani bî, eger em bigihên ev dengê ku em tirsandin, emê bibînin ew ji tiştê ku me guman li ser danî bû pir siviktir û hêsantir e. Eger qeral bixwaze, ew kane li cihê xwe be û min bişîne ta ez rastiya wî dengê jê re tînim.

Şêr ji gotina wî re erê kir û rê ku dayê bi aliyê wî dengê de here. Dîmne jî rabû û çû cihê ku Şetrepe lê bû. Lê gava ku Dîmne ji şêr dût ket, şêr di mijarê de ramî û poşman bû ku wî Dîmne şand. Di dilê xwe de got: Gava min bi Dîmne bawer kir û nehêna xwe dayê, min rind ne kir, çinkî ew bêçarek e li ber deriyê min. Mirovê ku tê ber deriyê qerêl jî, eger mafekî wî bê gunehkarî hati be xwarin, ji hêla siltên de hati be setemkirin, qeral bi çavtengî û miqrîsiyê hati be naskirin, ziyan gihîştî bûyê, keti bû tengahiyê û qerêl alîkariya wî ne kiri be, gunehek kiri bû û ji sezaya wê ditirsî, tiştêk dixwast lê ji wî re sûdar bû û ji qerêl re jî ziyan bû, yan jî dostaniya dijminê qerêl fikir û dijîtiya dostên wî fikir, wê hîngê, ne rast e ku qeral ji ber wan tiştan bilezîne, xwe radestî wî bike û baweriyê pê bike. Dîmne jî hişdar e û zane çî dixwaze, lê digel wê jî, ew wek remtelekî<sup>2</sup> bêguhndan bû li ber deriyê

---

<sup>1</sup> .Bez: don دهن

<sup>2</sup>.Remtele: Bê hiş û bê sûde.

min hati bû jîbîrkin. Belkî ji ber wê jî ew li ser min bi kîn be, xinantiyê li min bike û alîkariya neyarê min bike, niha jî nehêna lawaziya min li ba wî ye. Dibe ew bibîne ku xwedanê wî dengê ji min xurtir e, rabe aliyê wî bigire û bi wî re li dijî min bisekine! Gerek bû min bi xwe hêriş xwedanê deng bikira!

Şêr wiha bi xwe re axivî û ji cihê xwe rabû, hinekî meşî û li riya ku Dîmne tê re çû nêrî. Lê pir ne çû, dît ku Dîmne berve wî tê, wê hîngê dilê wî hêmin bû û vegeirî cihê xwe. Dîmne derbas ba wî bû û şêr jê pirsî: Te çi kir? Te çi dît? Got: Min gayek dît, ew xwedanê wê urînê û dengê te bihîsti bû, bû. Got: Ma hêza wî çawa ye? Got: Hêza wî tune, ez jê ve nêzîk bûm, mîna hemtayekî<sup>1</sup> bi wî re axivîm û wî tiştêk bi min ne kir! Şêr got: Bila tu pê ne tê xapandin û pirsî wî li ba te biçûk nebe; ji ber ku bayê hêgin guh nade geyayê lawaz, lê ew darên xurmê ên dirêj û darên mezin diqurêfe û hildike. Dîmne got: Qeralê min tu hîç jê metirse, bila pirsî wî li ba te mezin nebe! Ezê bi lawaziya xwe wî ji te re wînim û bila ji te re bibe kolekî guhdar û sernerm jî. Şêr got: Tu çawa zanî û dixwazî bike; hêviya wî jî bi Dîmne bilindtir bû.

Wê hîngê, Dîmne çû ba gê û bê tirs û hesab jê re got: Şêr ez şandime ba te, da ku te bibim ba wî, got jî, eger te lezand, ewê li gunehê te yê berê bibore, çinkî tu dereng mayî, zû neçûyî ba wî û te ew ne dîtîye. Eger tu dereng

---

<sup>1</sup>.Hemta: Wek wî, bi pîvana wî...

bimînî yan jî neçî, ezê bi lez vegerim û jê re bêjim. Şetrepe got: Kî ye ew şêrê ku tu şandî ba min? Li kû ye? Rewşa wî çi ye? Dîmne got: Ew qeralek e ji cinawiran. Ev xaka em li ser in ya wî ye, ew li filan cihê ye, leşkerine pir ji resena wî jî vê re ne. Şetrepe ji gotina navê şêr û cinawiran tirsî û got: Eger tu sozê ewlehiyê bidî min, ezê bi te re herim ba wî. Dîmne rabû ewlehiya ku ga pê bawer bû dayê û bi xwe re bir ta derbas ba şêr kir, şêr jî payedaariya wî girt, ji xwe ve nêzîk kir û jê re got:

Tu kînga hatî vî welatî? Çi tu anî vir? Şetrepe rabû çêroka xwe jê re hewalda. Şêr jê re got: Bi min re bimîne û ji ba min mere, ezê te rûmetdar bikim, gê jî lave jê re kirin, pesna wî da û derket û çû, şêr jî bi hiş û rewîsta wî pir kêfxwaş bû! Piştî wê, şêr ga ji xwe ve nêzîk kir, nirxdar û rûmetdar kir, pê hêmin bû, nehênên xwe spartinê, di karên xwe de pê rawêjî, roj bi rojê pê şa bû, jê razî bû û ji xwe ve nêzîktir kir, û li ba wî bû dostê her taybet û nêzîk.

Lê belê, dema Dîmne dît, ku ga li ba şêr bû di ser wî û hemî dostên wî re, bû xwedanê nêrîn, kefxweşî, kar û şevbêrkên şêr ê taybet, ew pir ji wê yekê dexts û çavteng bû, diltengiya wî gihîşte radeke pir bilind, rabû giliyê xwe kire ber birayê xwe Kelîle û jê re got: Birayê min, tu ji helwesta min û tiştê ku min bi xwe kir mat nabî?! Tu dibînî min çawa guh da tiştê ku ji şêr re sûdar e û min xwe jî ji bîr kir; min çû gayek ji şêr re anî, wî jî cihê min li ba

şêr girt! Kelîle got: Çi bi serê nasik hat bi serê te jî hat.  
Dîmne got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Diz û Nêsik**

Kelîle got: Hatiye gotin, ku nasikekî ciline qeralan ên baş bi dest ketin, lê dizek pê nasî, çavên xwe berdanê, xwast wan bidize û hate ba nêsik û jê re got: Ez dixwazim bi te re bimînîm, ji te fêr bibim û bibim wek te. Nêsik rê dayê ku vê re bimîne, wî jî xwe wek nêsik kir, vê re ma û xezmeta wî kir ta baweriya nêsik pê bû. Diz jî rabû nasik pa<sup>1</sup> ta rojekê derfet lê hat û cil birin û çû. Gava ku nasik hat û cil ne dîtî, wî nas kir ku dostê wî cil birin û rabû bi dû wî û cilan ket û çû.

Nasik di riya xwe de rastî du geyîkan hat, wan qoce hev dikirin û xwîn bi ser wan de diherikî. Wê hîngê roviyek jî hat, ew xwîna alast, dev jî avête wan û xwe ajot ser wan, lê belê her du geyîkan hêriş ser wî kirin û ew kuştin. Nasik ji wê yekê mat ma û çû ta gihîşt bajarekî. Lê wî cihek ne dît ku lê raze, tenê çiyek li ba jinekê hebû û ew lê bû mêvan. Cariyeke wê jinê jî hebû bi kirê dida, cariyê jî çavê xwe berda bû mêrekî û dixwast pê re bigan<sup>2</sup> bibe, wê yekê kiri bû, ku cariyê pir guhdariya jinikê neke, jinê jî nîkarî ew mêra ji cariyê dût bixista. Loma jî wê karê xwe kir ku wê şevê wî mêrî bikuje. Rabû meye dayê ta serxoş bû û raza; çaxa ku mirov baş kete xewê û kesên ku li malê

---

<sup>1</sup>.Pandîn, payîn: Nêrevaniya wî dikir, lê dipê:

<sup>2</sup>.Gan: Cîns, zewac.

bûn jî razan, çû qamîşek<sup>1</sup> ku berê amade kiri bû û jehir xisti bûyê anî, da ku pê pufe pozê mirov bike, û gava ku xwast wilo bike, mirov bênijî<sup>2</sup> û jehir çû gewriya jinê û ket û mir. Ew hemî jî li ber çav û guhên nêsik bû.

### • **Mînaka Jina Kascî Û Koşkêr**

Gava nêsik wilo dît, wî bawer ne kir ku sibe bibe. Ew ji wir derket û li maleke din gerî. Vê carê koşkarekî ew li ba xwe kire mêvan û jina xwe anî û jê re got: Guh bide vî nasikî, qedra wî bigire û xizmeta wî bike; hin hevalên min ez vexwandime vexwarinê û ji malê derket û çû. Keçeke jinikê jî hebû, dixwast wê bide mirovekî, lê mêrê wê pê qayîl ne dibû, û dema ku xwedanê malê derdiket, ew mirova dihat mala jinikê, jina mirovekî din jî ku piyal lêdixistin<sup>3</sup> ji wan re dibû navbêncî<sup>4</sup>.

Wê hîngê, jina koşkêr şande dû jina kascî û got ku mêrê wê ne li mal e, bila zû were, wî mirovî agahdar bike û jê re bêje: Mêrê min çûye ba hevalên xwe da ku vexwe, eger hat jî serxoş tê, bila zû were. Piştî ew mirov hat, li ber derî rûnişt û li benda jinikê sekinî, wê hîngê koşkar jî hat û serxoş bû, lê wî di şevreşiyê de mirov dît û lê kete gumanê, lê deng lê ne kir û bi hêrs derbas ba jina xwe bû,

---

<sup>1</sup>.Qamîş: Geyak e, dirêj dibe, û nava wî qul e.

<sup>2</sup>.Bênijîn: `Empişk, gava ba bi hêz di poz re drdikeve.

<sup>3</sup>.Piyal lêdixistin: Kas lêdixistin, cureyek ji dermankirina berê ye, الحجامة

<sup>4</sup>.Navbêncî: Di navbera du kes an du aliyan de diçe û tê.

ew têr kuta, bi stûnekî malê ve jî girêda û mîna bêhişekî ket û raza.

Piştire, jina kascî hat, da wê agahdar bike ku ew mirova li derve li bendê maye, lê wê jê re got: Binêre bi sedema wî ez di çi rewşê de me, eger tu bixwazî rindiyekê bikî, tuyê min vekî û xwe li şûna min girêdî, ta ez diçim ba wî û zû vedigerim, jina kascî bi ya wê kir, ew vekir, xwe li şûnê girêda û jinik jî derket û çû ba mirov. Lê berî ku jina wî vegere, koşkar hişyar bû û bi navê jina xwe bang kir, lê jina kascî tirsî ku dengê wê nas bike û riswa<sup>1</sup> bibe, lê banga venegerand, wî careke din deng lêkir, lê wê dîsa bersiv ne da; wê hîngê ew pir enirî, bi hêrs rabû, çû pozê wê bi neşterê birî û got: Vî jî diyarî ji yarê xwe re bibe. Lê belê wî nizanî ew ne jina wî ye. Paşê jina koşkêr hat û kiryara ku mêrê wê bi jina kascî kiri bû, dît, ew tiştê li wê pir giran hat, mezin dît û rabû ew vekir. Jina kascî jî lezand û pozbirî çû mala xwe. Ew hemî tişt jî li ber çav û guhên nêsik dibû.

Wê hîngê, jina koşkêr lave kirin, nifir li mêrê xwe yê ku ew setem kiri bû, kirin û bi dengê bilind got: Xwedêwo! Eger mêrê min setem li min kiriye, tu pozê min durust li min vegeîrî! Wê deng li mêrê xwe kir û got: Ey pûştê setemkar, rabe û tiştê te bi min kir bibîne! Bibîne çawa Xwedê dilovaniya xwe li min kir û pozê min wekî berê durust li min vegeîrand! Wê çaxê, mêrê wê rabû, çira

---

<sup>1</sup>.Riswakirin: Rezîlkirin, navderketin...

vêxist û nêrî, çi bibîne! Dît ku pozê jina wî durust bûye. Wê hîngê, wî lêborîna wê xwast, li gunehê xwe tobe kir û lêborîna xwe ji Xwedayê xwe jî xwast.

Jina kascî jî, çû gihîşte mala xwe û ramî wê çi sedemê ji bo birîna pozê xwe li ba mêr û xwedanên xwe bibîne da ku tu gumanê li ser xwe nehêle. Gava ku berbang bû, kascî ji jina xwe re got: Hemî amûrên<sup>1</sup> min wîne, ez dixwazim herim ba hin dewlemendan, wê çaxê, wê rabû kêr jê re anî. Wî jê re got: Hemî amûran wîne, lê wê ji bilî kêrê tiştek jê re nanî! Gava wê tim wilo kir, wî kêr rakir û avêtê, wê hîngê wê kir wîlewîl û bang kir: Pozê min, pozê min û kir hêlehêl, ta xwedî û mirovên wê hatin û ew di wê rewşê de dîtin û kascî girtin û birin ba dadwer<sup>2</sup>.

Dadwer jê re got: Sedem çi bû ku te pozê jina xwe birî? Jixwe tu behane li ba wî tunebûn ku xuya bike! Herweha dadwer biryar da, ku wî seza bikin. Û gava dane ber sezayê, nasik jî gihîşt wir û berve dadwer hat û jê re got: Ey dadwer, bila tu şaş neçî; diz ji min ne dizî, geyîkan jî rovî ne kuşt, jin jî ne bi jehrê mir, û jina kascî jî ne mêrê wê pozê wê birî, lê me bi xwe bi henasa xwe kir. Dadwer mebesta wê gotinê ji nêsik pirsî, wî jî rabû çêroka xwe jê re hewalda. Wê hîngê dadwer ferman da û kascî serbest berda.

---

<sup>1</sup>.Amêr: Alav, emraz, indize.. أدوات، عدة

<sup>2</sup>.Dadwer: Dadger, dozger, dadmend قاضي، حاكم

Dîmne got: Min ev mînaka bihîst, ew mîna rewşa min e, belkî jî tenê henasa min ziyana bi min kiri be? Kelîle got: Nêrîna xwe ji min re bêje, tu dixwazî di vî warî de çi bikî? Dîmne got: Ez naxwazim payedariya min li ba şêr ji berê bilntir bibê, ez dixwazim li asta xwe ya ku berê ez li ser bûm, vegerim. Sê tişt hene, gerek e hişmend lê binêre û ji bo wan bixebite, jê: Li kar û zirara xwe a berê vegere û binêre; ji ziyana ku gihîştîyê xwe biparêze da ku careke din lê venegere; sûda ku dîtî bû nas bike; bixebite da ku dîsa bi dest bixe. Jê jî: Li kar û ziyana ku tê de ye binêre, tiştê kardar<sup>1</sup> tekûz bike û ji ziyane bireve. jê jî: Li paşeroja sûdeweriyê binêre û tîrsa ji ziyandîtinê nas bike, da ku tiştê dixwaze pêk were û ji tiştê ku jê ditirse jî xwe biparêze.

Gava min li tiştê ku dê payedariya min pê vegere nêrî, û çawa ez ji rewşa ku tê de bûm hatim dûrxistin, min dît, ji bilî ku ez dibarê li evê geyaxwar<sup>2</sup> bikim û destê wî ji jiyane bikim, min tu rê û çare ne dîtin. Çinkî gava ku ew ji şêr dûr bikeve, payedariya min wê li min vegere, belkî ew yeka ji şêr re jî rind be, çinkî nêzîkbûna gê ji şêr, ne li gora wî ye û ziyane digihîne karûbarên wî.

Kelîle got: Ez di nêrîna şêr de li derbara gê, paye û cihê wî yê bilind li ba şêr jî tu nerindî û kêmaniyê nabînim. Dîmne got: Siltan bi şeş tiştan tê xapandin û karûbarên wî

---

<sup>1</sup>.kardar: Kar û destkevtin tê de heye

<sup>2</sup>.Geyaxwar: Geya dixwe.



wêran dibin, ew jî: Bêparmayîn<sup>1</sup>, pilok<sup>2</sup>, dilxwazî<sup>3</sup>, sertî, dem û bêhişî. **Bêparmayîn** ew e, ku siltan ji alîkarên çêxwaz, şorind û siyasetvanên xwedî nêrîn, hawardar<sup>4</sup> û dilsoz bêpar bimîne, ên dora wî jî bedkar bin û nehêlin karûbarên destlatê bigihên ber dest û agahiyên siltên, siltan bi xwe jî kesên şorind û durustkar ji xwe dûr bixe û guh nede wan. **Pilok** jî, gava nakokî di navbera wan de çê bibin û li hev nekin û xelkê wî bi hev re şer bikin. **Dilxwazî** jî, hezkirina ji jinan, vexwarina meyê, nêçîr û tiştên mîna wan. **Sertî** jî, sertiya giran ew e, ku ziman xeberên giran bêje û zordestiya ku ne di cihê xwe de be li xelkê were kirin. **Dem** jî, ew e, ku ji ber borîna salan, mirin digihê xelkê, berhem kêmbibe û talan û tiştên mîna wan, wan têk dibin. **Bêhişî** jî, gava tundî û sertî li şûna nermiyê bi kar were, nermî jî li şûna sertiyê bi kar were.

Şêr jî, pir ji gê hez kiriye û pê ve hatiye girêdan, ev jî wek min ji te re got, ne li gora payedariya şêr e, û ziyane digihîne karûbarên wî. Kelîle got: Tuyê çawa bi gê kani bî û ew ji te bihêztir e, li ba şêr ji te camêrtir e û dostên xwe jî pirtir in? Dîmne got: Li biçûkî û lawaziya min menêre; tişt ne bi lawazî û hêzê ye, ne jî bi biçûkahî û girsbûna govde ye. Belkî biçûkekî lawaz bi fêlbazî, hişdarî û nêrîna xwe kani be tiştina bike, ku gelek hêzdar nikani bin bikin.

---

<sup>1</sup>.Bêparmayîn: Āirman, mehrûm.

<sup>2</sup>Pilok: pêlankirin, fitne.

<sup>3</sup>.Dilxwazî: Tiştê ku dilê mirov dixwaze رغبات

<sup>4</sup>.Hawardar: Zû tê hawarê, alîkar ...

Te ne bihîstiyê ku qirikeke lawaz fêlbaziyek li marekî reş kir ta kuşt? Kelîle got, ma ew çawa bû?

- **Mînaka Qirikê û Marê Reş**

*Mînaka kesê lawaz, dema ku bi şêwr û fêlbaziyê zora ê hêzdar dibe.*

Dîmne got: Gotine, ku qirikekê malika xwe di darekê de li ser çiyakî çêkiri bû. Li nêzîka wê qula marekî reş jî hebû. Dema ku qirikê çêlik dertanîn, marê reş dihat û ew dixwarin. Wê yekê qirik pir dixeyidan û xemgîn dikir. Qirikê rabû giliyê xwe kire ber destekê xwe ji çeçelan û jê re got: Ez dixwazim karekî bikim û ji bo wê bi te rawêjim, got: Çi kar e? Qirikê got: Min biryar kir, gava ku marê reş kete xewê, ez herim çavên wî nikil bikim û birijînim, belkî çêlikên min nexwe û ez jê vehesim! Çeçel got: Te dibara herî xirab vebjart. Fêlbaziyekê bibîne, bila tu xwe nexî bin buvehiyê û armanca xwe jî ji marê reş bi cih wînî. Bila tu mîna têrikê masiyan<sup>1</sup> nebî, ewê ku xwast kêvcêl bikuje, lê xwe kuşt! Qirkê got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Kêvcêl û Têrikê Masiyan.**

Çeçel got: Tê gotin, têrikekê masiyan malika xwe li ciyekî ku masiyên wê pir bûn, çêkiri bû. Wî nêçîra xwe dikir, masî dixwarin û demeke dirêj li wir jiya. Lê dem derbas bû, ew pîr bû, nikarî nêçîr bikira, bêçare û birçî bû, pir westiya, bi xemgînî rûnişt û ji bo rewşa xwe li çarekê

---

<sup>1</sup>.Têrikê masiyan: Tilûrekî avî ye, li ser girtina masiyan dijî.

gerî. Wê hîngê kêvcalek di cem re derbas bû, rewş, xemgînê û melûliya wî dît, jê ve nêzîk bû û got: Çima tu melûl û xemgîn bûyî? Têrik got: Ma ezê çawa xemgîn nebim?! Tu zanî ez bi nêçîra masiyan dijîm, lê min îro dît, du nêçîrvan di vir re derbas bûn, yekî ji hevalê xwe re got: Masine pir li vir hene, emê ji vir de dest bi nêçîra xwe bikin, lê ê din got: Min li filan derê masine ji vir pirtir dîtin; emê ji wir de dest pê bikin, eger me wir kuta<sup>1</sup> kir, emê werin ên vir jî bigirin û xelas bikin! Herweha, min nas kir, eger wan wir xelas kir, ewê werin vê golê û çî masî tê de hene bigirin. Eger wilo bû, ew ji min re mirin û dawiya ye.

Kêvcêl lezand û çû ba masiyan û ew bi wê yekê agahdar kirin. Ew jî hatin ba têrik, pê rawêjîn û jê re gotin: Em hatine ba te, da ku tu nêrîna xwe ji me re bêjî, çinkî kesê hişmend rawêjê bi dijminê xwe jî dike, mandina te jî bi mandina me ye. Têrik got: Sebaret<sup>2</sup> nêçîrvanan, ez nikanim xwe di wan bidim û tu rêkên din jî nabînim, ji bilî ku win herin cowikekê ku ji vir ve nêzîk e, masî tê de hene û qamîşa wê jî pir e. Eeger win kani bin herin wir, ez dibînim rizgarî û durustbûna we di wê de be. Jê re gotin: Emê herin, lê belê ji bilî te kesek nikare wê rindiyê bi me bike û me bibe wir!. Herwiha, têrik rojê du masî radikirin û dibirin, li ser girekî li wan derdoran datanîn û dixwarin. Rojekê, dema ku têrik hat masiyan bibe, kêvcal hat ba wî

---

<sup>1</sup>.Kutakirin: Xelaskirin.

<sup>2</sup>.Sebaret: Bi taybet filan tiştî.

û got: Dilê min jî ji vî cihî reş bûye û ez jî jê tirsî me, ez dixwazim tu min jî bibî wê cowikê. Têrik got: Li ser dil û çavan, ew hilgirt û firî ta gihîşte ber girê ku masî li ser dixwarin, wê hîngê, kêvcêl li jêr nêrî, koma hestuyên masiyan li wir dît û nas kir, ku têrik wilo kiriye û dixwaze wî jî bixwe. Wî di dilê xwe got: Eger mirov dijminê xwe li ciyekê dît û zani be gerek e şer bike, eger neke jî wê bimire, wê hîngê, gerek e ew ji bo xwe û rûmeta xwe şer bike, çi çare li ba wî hene di şer de bi kar wîne, ji ber ku ew zane wê bimire, lê belkî bi wî şerî xwe xelas bike! Wilo, ew û têrik rabûn hev, ta ot<sup>1</sup> lê anî û her du kelpên<sup>2</sup> xwe avêtin stuyê têrik û guvaşt ta canda û mir. Herwiha, kêvcâl meşî û çû ba civata masiyan û çêrok ji wan re hewalda.

Min ev nimûna ji te re anî, da tu zani bî, ku hin fêlbazî hene, dawiya wan mirin e. Lê ezê rêkekê ji te re bêjim, eger tu kani bî bikî, wê hîngê bê ku tişteke bigihê te, marê reş wê were kuştin û tuyê jî ewle bibî.

Qirikê got: Ew çare çi ye? Çeqel got: Tuyê bifirî û baş binêrî, belkî tu xemleke jinan bibînî û birevînî, paşê bifirî û bikevî da ku tu ji ber çavan winda nebî, eger te dît ku xelk bi pê te ket, tuyê herî ser qula marê reş û wê xemlê bavêjî ber. Eger xelk wilo bibîne, ewê xemla xwe bibin û te jî ji mar vehesînin. Qirik firî û bi banî ket, ta raste jinekê ji keçên xwenedanan hat, wê li ber çemekê xwe

---

<sup>1</sup>.Ot: Fersend, derfet, keys...

<sup>2</sup>. Kelp: Destikê wî yên mîna kelpedanê.

dişuşt, cil û xemla xwe jî danî bûn alîkî, wê çaxê qirikê xwe berda ser, ji nava xemla wê gerdenek rakir û firî, xelkê jî dît û bi pê ketin, ew firî û ket da ku were dîtin, ta gihîşt ber qula marê reş, gerden avêt ber û xelkê jî lê dinêrî, û gava ku hatin gerden birin, marê reş jî dîtin û kuştin.

Min ev nimûna ji te re anî da tu zani bî, ku tiştê fêlbazî kane bike, hêz nikare bike. Kelîle got: Eger hêz û nêrîna rast li ba gê ne gihîştî bana hev, a te rast bû, lê li gel hêz û xurtiya wî, ew xwedî nêrîn û hişdariyeke baş e, ma tu kanî çî pê bikî? Dîmne got: Ga mîna ku tu dibêjî, xwedî hêz û nêrîn e, lê belê ew rindiya min li ser xwe zane; mîna kêvroşka ku şêr kuşt, ezê jî wî bikujim. Kelîle got: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Şêr û Kêvroşk**

*Kesê lawaz ku bi rawêj û fêlbaziyê bi yê hêzdar kanî.*

Dîmne got: Digotin şêrek li warekî bi av û geya hebû. Ji ber av û geyaya pir, gelek cinawir jî li wir hebûn. Lê ji ber tirsê ji şêr, wan sût ji ew warê xweşik ne didît. Ji lewre, cinawir li hev civîn, hatin ba şêr û jê re gotin: Tu bi ked û westanê yekî ji me digirî û dixwî, me ji bo te çarek dît, ewê ji te re baş be û ji me re jî ewlehî be. Eger te em ewle kirin û ne tirsandin, emê rojê dewarekî<sup>1</sup> ji te re amade bikin û li dema firavîna te ji te re bişînin. Şêr bi wê yekê

---

<sup>1</sup> .Dewar: Lawir, nawir..

qayîl bû, li ser wê bi wan re li hev kir û wan jî sozê xwe vê re bi cih anî.

Rojekê pişk li kêvroşkekê<sup>1</sup> ket ku bibe firavîna şêr, wê ji lawiran re got: Eger gunehê we bi min tê, bila ziyar jî negihê we, ezê hewildim we ji şêr vehesînim.

Lawiran got: Tu me bi çi stubar dikî? Got: Winê yê ku dê min bibe ba şêr ferman bikin, bila li min nelezîne, da ku hinekî li ser şêr dereng bimînim. Jê re gotin: Bila bi ya te be. Kêvroşk rabû xwe giran kir, ta dema şêr tê de xwarin dixwar ma! Paşê hêdî hêdî û bi tena xwe çû ba şêr, ew jî pir birçî bû bû; şêr bi hêrs ji cihê xwe rabû, berve kêvroşk çû û jê re got: Tu ji kû hatî? Got: Ez şandeya lawira me ji bo te, wan ez şandim ba te. Kêvroşkek ji bo te bi min re bû, lê şêrek li ser rêkê bi dû min ket, ji min stand û got: Ez xwedanê vî warî û hemî lawirên wê me. Min got: Ev xwarina qerêl e, lawiran ji wî re şandiye, wî hêrs meke; lê wî xeber û sixêf bi te re gotin, ez jî bilez hatim ji te re hewaldim! Şêr got: Bimeşe bi min re here û cihê wî şêrî pêş min bike. Kêvroşk çû li ber bîreke tijî ava zelal bû sekinî, serê xwe xwar kir, li avê nêrî û got: Ev ciya ye. Şêr li bîrê nêrî, pêjna<sup>2</sup> xwe û kêvroşkê di avê de dîtî, di gotina kêvroşk de guman ne kir û xwe avête bîrê da ku bi şêrê di bîrê de ye re şer bike, lê bi wî rengî di ew avê de fetîsî, kêvroşk jî vegeîrî ba lawiran û tiştê bi serê şêr kir ji wan re hewalda.

---

<sup>1</sup>.Kêvroşk: Kêrguh, kerguh أرنب.

<sup>2</sup>.Pêjn: Sawîr, sî خیال.

Kelîle got: Eger tu kani bî gê bikujî û bê ku zîyanê bigihînî şêr, ew biryara te ye, çînkî gê zîyan gihande min, te û hemî lawirên dîn jî. Eger şêr bê kuştin, an jî zîyan bigihêjê û tu nikani bî wî biparêzî, wî karî meke, çînkî ew dê ji min û te jî xinanê be.

Piştre, Dîmne çend rojan derbas ba şêr ne bû, paşê dema carekê şêr bi tenê bû, hate ba wî û şêr jê re got: Çi tu ji min dûr xistî, min ji zû de tu ne dîtî, hêvîdar im nehatina te xêr be? Dîmne got: Bila xêr be qeralê min! Şêr got: Ma tişteke bûye? Dîmne got: Tişteke bû, ne şêr û ne kesekî ji leşkerên wî dixwast bibe. Got: Ew çi ye? Got: Gotinine pir mezin bûne. Şêr got: Ji min re hewalde.

Dîmne got: Her gotinekê ku guhdarê wê jê hez neke, ta şîret û dilşewatî be jî, yê ku dibêje ne wêre bêje, tenê eger ewê ku jê re tê gotin hişmend be, wê hîngê, ew gotina dê ji aliyê hezkirinê were birin, rindiya ku tê de hebe jî wê were naskirin û sûda tê de heye jî ji wî re ye. Qeralê mino! Tu jî xwedanê rindiya yî, tu zanî jî tiştê ku tu jê hez nakî pir bi min ne xweş e ku bêjim. Ez di wê baweriyê de me, ku tu dilsoziya min ji te re nas dikî, tu zanî jî ez te di ser xwe re digirim. Carina bi xwe re dibêjim, belkî tiştê ku ji te re bêjim tu bawer nekî. Lê gava ez tînim bîra xwe û diramîm, ku henasa me gelî lawiran bi te ve hatiye girêdan, ji bilî erka ku ez li ser xwe bikim çareyê nabînim, ta eger tu bi xwe jî ji min nepirsî û bitirsim tu ji min qebûl jî nekî. Çînkî tê gotin: Kê şîreta xwe ji siltên veşart, nexweşiya

xwe ji bijîşk veşart û nêrîna xwe ji ber biraderên xwe veşart, ew xinaniyê bi henasa xwe dike.

Şêr got: Ew çi ye? Dîmne got: Rastgoyê bawerdar ji min re got, Şetrepe bi serokên leşkerên te re rûnişt û ji wan re got: Min şêr ezmûn kir, nêrîn, hişdarî û hêza wî nas kir û ji min re xuya bû, ku ew berve lawazî û bêçaretiyê diçe û di navbera min û wî de tiştin wê çêbibin. Gava ku ew tişt a gihîşte min, min nas kir, ku Şetrepe xinaneke bê ewle ye, te jî rûmeteke pir mezin dayê û rakirye asta xwe, wê ûştê jî ew guman dike, ku ew bûye mîna te û dema ku tu ji cihê xwe herî, milkê te wê bi wî bimîne, loma jî çi hêza xwe heye wê bide ser te.

Berê dihat gotin, eger qerêl nas kir ku mirovekî wî, xwe di asta payedariya wî de dibîne, bila wî bikuje, çinkî eger wilo ne kir, ewê were kuştin. Şetrepe jî rind bi tiştan zane û baş pê de çûye. Kesê hişmend, berî ku tiştekeke temam dibê û tê kirin, amadekariya xwe jê re dike. Çinkî ew ewledar nabe ku ew tişt a nebe, gerek berî bibe xwe bigihîne û çareser bike. Ji ber ku dibêjin jî: Mirov sisê ne: Birdar<sup>1</sup>, birdartir û bêçare. Eger tişteke hate serê kesekî **birdar**, matmayî û dudilî nabe, ew ji bo ku pirsê çareser bike, li ber çare û debarê nasekine.

Yê **birdartir** jî, xwedî amadebûn e. Berî bela bikeve pê zane û xwe jê re amade dike. Berî tişteke were serê wî nexweşiyê çareser dike. Berî ew tişteke pêk were, wî ji ser

---

<sup>1</sup>.Birdar: Xwedî vîn û biryar; حازم، حاسم



xwe dide alî. Yê **bêçare** jî, dudilî dibe, li ber hêvî û sebrê dimîne, ta bi wê belayê dere. Ji nimûna wê, mînaka her sê masiyan. Şêr got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Sê Masiyan**

*Mînaka kesê birdar, dema ku dikeve tengahiyê, xwe bi dibare jê rizgar dike. Ê birdartir jî ewê ku xwe nagihîne tengahiyê. Ê bêçare jî, yê ku dikeve tengahiyan û pê diçe.*

Dîmne got: Hatiye gotin, ku sê masî di golekê de hebûn; yek jîr, yek jîrtir û yek qels bû. Ew cowika li çiyekî bilind bû, zûzû kes ne digihîştê û çemek jî li nêzîk wê diherikî. Lêhat û rojekê du nêçîrvan di ber wî çemî re derbas bûn, ew gola dîtî û soz dan hev ku ewê toreyên xwe wînin, masiyên tê de hene bigirin û masiyan jî gotina wan bihîst; masiyê jîrtir dema ku gotin bihîst, kete gumanê û tirsî, hemî tişt berdan û di cihê ku av ji çem dikete golê re derket û xwe xelas kir. Ê jîr jî bi sivikî li pirsê nihêrî û ta nêçîrvan hatin di golê de ma, lê gava wî ew dîtî û nas kir ku çî dixwazin, xwast di cihê ku av tê re derbas golê dibe re derkeve, lê dît ku wan ew rê girtiye, wê hîngê got: Min derfet ji dest xwe berda, ev jî sezaya guhnedanê ye! Ma di vê rewşê de çare heye?! Di dema lezbûn û westanê de çare pir bi sernakevin?! Lê belê di gel wê jî, hişmend di rewşên wiha de ji nêrînên baş bêhêvî û dilsar nabin û ked û ramanê ranawestînin. Wî rabû xwe li mirinê na, xwe bi ser rûyê avê xist û carekê li ser piştê û carekê li ser zik xwe werdigerand, nêçîrvanan jî guman kir ku ew miriye, û

rabûn birin û di navbera çem û golê de li ser erdê danîn. Wê hîngê, wî derfet dît, xwe avête nava çem û rizgar bû. Lê masiyê qels, vir de çû, wir de çû, lê çare ne dît û hate girtin!

Şêr got: Ez ji wê têgihîştim, lê ez guman nakim ku ga min dixapîne û xirabiyê ji min re dixwaze. Ewê çawa wilo bike û hîç tu nerindî ji min ne dîtine, rindiyek jî ne maye ku min jê re ne kiriye û daxwazek jî ne maye jê re pêk naniye. Dîmne got: Ey qeralo, ew tişt û camêriya ku te jê re kir, payedariya -ji bilî payebilindiya te- ku te ew gihandiyê, wê kiriye ku ew wilo bike. Niha jî çavê wî li payedariya te ye. Mirovê qelaş<sup>1</sup> ta digihê payedariya ku ne li gora wî be sûdar dimîne; dema ku gihîştê jî, henas û çavê wî diçe cihê jê pilindtir, nemaze jî ew kesên xinan û bêfedî. Çinkî kesê qelaş û bêfedî xizmet siltên nake, ew tenê ji bo pêdviyeke xwe xwe rind dike. Eger pêdiviya xwe bi siltên ne ma, heybet jî ji ser siltên çû, daxwazên wî jî pêk hatin, ew vedigere ser cewherê xwe. Mîna dûvê kûçikê, ew tê girêdan da ku serast bibe, ta gava ku girêdayî be rast dimîne, lê eger vebû, wek berê xwar dibe û li hev tê badan.

Qeralê min, bila tu zani bî, ewê ku şîretan ji rawêjkarên xwe qebûl neke û lê giran werin, ew bi encama nêrîna xwe tenê ewle nabe, mîna ew nexweşê ku tiştê bijîşk jê re salix dide berdide û diçe tiştê dilê xwe dixwaze dixwe. Ji erka

---

<sup>1</sup>.Qelaş: Leîm, xinan û durû.

pişgirên siltên e, ku tiştên pê destaltdariya wî xurt û baştir bikin pê agahdar bikin, ji tiştê ku ziyane jê dibîne û wî biçûk dike jî dûr bixin.

Birader û pişgirên baştir ji siltên re, ewên xwe li ser şîretkirina wî ker nakin. Karê baştir, ewê ku encama wî baş be; jina çêtir, ewa li şora mêrê xwe be; pesna çêtir, ewa ji devê kesên hêja derdikeve; qeralê rintir ewê ku nabitire<sup>1</sup>, xwe di ser rawêjkirinê re nagire; sinciyên baştir jî ewên ji rastî û dadê re pişgir bin. Hatiye gotin jî: Eger yek pala xwe bide ser êgir û li ser maran raze, ji yê ku dijmantiyê bi dostê xwe re dike çêtir kane raze û ewle bibe. Dema mirov pê hestewar bibe, ku dostê wî dijîtiya wî dike, ew jê bi ewle nabe. Qeralê herî bêgav<sup>2</sup> ewê ku tiştan bi sivikî dibe, bi sivikî li paşerojê dinêre, mîna fîlê gurgîn dibe û guh nade tutiştî; eger tişteki ew xemgîn kir jî, bi sivikî lê dinêre; eger rewş jî ji destan çû, wê dike stûyê hevalên xwe.

Şêr got: Te şor giran kirin, lê gotina şîretkar tê pejrandin û daqurtandin! Eger wek tu dibêjî be, û raku Şetrepe ji min re bibe dijmin jî, ew nikare ziyane bigihîne min, ne jî bi min kane; ewê çawa bi min kani be, ew geyaxwar<sup>3</sup> e û ez jî goştixwar im?! Ew ji min re xwarin e û tirs min jê tune. Lê belê, piştî ku min ewlehî dayê, ew

---

<sup>1</sup>.Bitirî: Têr û pozbilind بدران.

<sup>2</sup>.Bêgav: Bêçare.

<sup>3</sup>.Geyaxwar: Geya û çawîrê dixwe.

rûmet kir û pesinand, ez nikanim pûştîyê<sup>1</sup> lê bikim. Eger piştî tiştê min jê re kir, ez rabim xwe biguhêrim, wê hîngê ez ji rûmeta xwe kêr dikim, xwe nezan dikim û sozê xwe dixwim.

Dîmne got: Bila gotina te ((ew ji min re xwarin e, û tîrsa min jê tune)) te nexapîne; ji ber ku eger Şetrepe bi xwe neke, wê bi destê bilî xwe bike. Tê gotin jî: Eger rojekê kesekî tu vexwendî, tu jî sinciyên wî nizanî, baweriya xwe pê meke, bila tu pê ewle nebî ku ji wî yan ji bin serê wî de tiştek dê negihê te; mîna çawa ji kêçê gihîşte sipiyê. Şêr got: Ma ew çawa bû?!

### • **Mînaka Kêçê û Sipiyê<sup>2</sup>**

*Mînaka bi sedema yekî din şer digihê te.*

Dîmne got: Gotine ku sipiyek demeke dirêj di nava nivînên mirovekî dewlemend de bû, ew hêdî hêdî dimeşî, di xew de xwîna mirov dimêt û ew jî pê hestewar ne dibû. Sipî demekê wilo ma, ta şevê kêçê hate ba wê, wê jî jê re got: Îşev li ba me be û di nav nivînên nerm û xwîna xweş de derbas bike! Herwiha kêç li sipiyê bû mêvan û li ba wê ma ta mirov kete nav nivîna xwe, wê hîngê kêçê xwe avête ser wî, ew gez kir û şiyar kir û xwe ji ber çavan jî winda kir. Mirov rabû û ferman da berdestan, ku nava nivîna wî vejon<sup>3</sup>. Berdest rabûn li nav nivînê nêrîn, lê ji

---

<sup>1</sup>.Pûştî: Karê ne rind û xinan.

<sup>2</sup>.Sipî, Kêç: Kêzikin biçûk in, ji xwîna mirov dijîn.

<sup>3</sup>.Vejotin: Lênêrîn تفیش.

bilî sipiyê tiştekan ne dîtin, wan ew girt û pelixandin û kêçê jî lotikek<sup>1</sup> da xwe û revî!

Min ev nimûna ji te re anî, da tu zani bî, ku kesek ji şerê şerxwazan xelas nabe, eger ew bi xwe jî nekin, dibe ku nerindî ji bin serê wan de bigihê mirov. Eger tu ji Şetrepe natirsî, ji leşkerên xwe, yê ku wî ew bi te re kirine dijmin û li dijî te gerim kirine, bitirse.

Gotina Dîmne cihê xwe di henasa şêr de girt û wî got: Eger wilo ye, ma tu çawa dibînî? Çi dibêjî? Dîmne got: Xwedanê diranê kurmî, êşek û zîyanê ji ber dibîne ta wî heldike; xwarina di zikê mirov de kufkî dibe jî, vehesa wî bi deranîna wê ye, dijminê bi tirs jî, dermanê wî kuştin e.

Şêr got: Te kir ku ez ji Şetrepe bêkêf û bi guman bibim. Ezê niha bişînim dû wî û tiştê ku kete dilê min jê re bêjim. Eger tu dixwazî, tu jî amade bibe. Dîmne ji wê nêrînê hez ne kir, wî nas kir eger şêr di wê mijarê de bi Şetrepe re deng bike û bersiva wî bibîse, ewê derewa ku wî kir nas bike, vir û bêbextiya wî bibîne û pêlana wî jî dê xuya bibe! Wî ji şêr re got: Ez anîna te ji Şetrepe re nêrîn û biryareke rast nabînim. Çinkî ta dema ew nizani be ku pirsra wî gihaye te, biryar di destê te de ye, lê eger bi mijarê hestewar bû, ez ditirsim bi serhişkiyê were te. Eger şerê te jî bike, wê hîngê dê xwe jê re amade bike. Wê hîngê ra eger ji ba te here jî, ewê ji te re bibe nav û kêmanî. Digel ku qeral sezaya yê ku li xwe nanin diyar

---

<sup>1</sup>.Lotik: Xweavêtin قفزة

nakin, lê belê li ba wan, ji bo her gunehêkî sezayeke heye: Gunehê diyarkirinê û lêmikurhatinê diyar e, sezaya gunehê nediyarkirinê jî diyar e.

Şêr got: Eger qeral ji gunehê kesekî piştrast nebe û wî li ser gumanê seza bike, wekî ku ew henasa xwe seza dike, wê setem dike, tiştan rind nabîne û têngahî jî! Dîmne got: Eger nêrîna qerêl wiha ye û te xwe ji hatina wî re amade ne kiri be, bila Şetrepe derbas ba te nebe. Haje xwe bike bila ji nişkave negihê te û jinedîve<sup>1</sup> te negire. Bê guman, gava ku ew derbas ba qerêl bibe, ewê nas bike, ku wî xwe ji bo tişteki mezin amade kiriye. Ji nîşanên wê, tuyê bibîne, rengê wî hatiye guhertin, govde wî dilerize, çep û rast dinêre; tuyê bibînî jî ew qoçên xwe nîşan dike, wekî ku dike qoç û şer bike! Şêr got: Ezê haya xwe jê bibim. Eger tiştên ku te gotin min li ser dîtî, wê hîngê ezê zani bim ku guman li ser niyaza<sup>2</sup> wî a bedxwaz ne ma.

Dema ku Dîmne ji hevojtina şêr li ser gê kuta bû, nas kir jî ku tiştê dixwast cihê xwe di henasa wî de girt, dê haya xwe ji gê bibe û xwe jê re amade bike; xwast here ba gê, wî jî bihevoje ser şêr û wîne ba wî. Lê ji tirsê ku ew ji gê re bêje û belkî zianê jê bibîne, kir ku bila hatina gê li ba şêr li ser daxwaza şêr be.

Got: Qeralê min! Ez dibînim ez herim ba Şetrepe, da li rewş û karê wî binêrim û gotina wî bibîsim; belkî ez

---

<sup>1</sup>.Jinedîve: Ji nişka ve فجأة

<sup>2</sup>.Niyaz: Nête نية.

nehênên wî nas bikim, tiştine wî ji min ve xuya bibin û werim qerêl pê agahdar bikim? Şêr ji bo wê yekê rê dayê, ew jî rabû û çû û wek kesekî melûl û xemgîn derbas ba Şetrepê bû! Gava ku gê ew wiha dît, bixêrhatina wî kir û got: Sedema ku tu bi ser me de ne tê çi ye? Min ji çend rojan de tu ne dîtî, hêvîdar im xêr be? Dîmne got: Kînga kesê ku ne xwedanê henasa xwe be, ewlehî jê re heye? Hîn eger fermana wî jî di destê yê ku baweriyê pê nake de be, herdem di bin tirs û metirsiyê de be, her katekê û herdem jî bê ewle be.

Şetrepe got: Ma çi bûye? Dîmne got: Tiştê ku felekê dixwast biba, bû! Ma kî kane zora felekê bibe?! Kî di cîhanê de gihîştiye tiştên pir mezin û har<sup>1</sup> ne bûye?! Kî gihîştiye daxwaza xwe û pozbilind ne bûye?! Kî bi dû dilxwaziyên xwe ketiye û dernedaye<sup>2</sup>?! Kê bi şerxwazan re daye û standiye û têk ne çûye?! Kî bûye hevalê şerxwazan û ewle bûye?! Kê bi jinan re daye û standiye û tûk<sup>3</sup> ne gihîştinê?! Kî bûye hevalê siltên û ewlehî û çêkarî jê re maye?! Ewê ku wiha gotiye, rast gotiye: ((Siltan di nedilsoziya xwe de ji dostên xwe re û di xemsariya jidestdanê hevalên xwe de, mîna xwedanê xanê ye, heryek ji ba wî diçe, yekî din dixê şûnê)).

Şetrepe got: Ez gotinine ji te dibihîsim, ew destnîşan dikin ku tu di şêr de ketî gumanê û tişteki wî tu tirsandî.

---

<sup>1</sup>Har: bi hêz û zulm, bitirî شرس.

<sup>2</sup>Derdan: Jidestdan خسارة.

<sup>3</sup>Tûk: Tişt û şorên ne rind.

Dîmne got: Belê, ez jê bi guman bûme, ew jî ne ji bona min e. Şetrepe got: Lê gumana te ji bona kê ye? Dîmne got: Tu baş zanî çi di navbera min û te de heye. Tu zanî jî çi mafê te li ser min heye û ku şêr ez şandim ba te, min çi soz û peyman dabûne te, loma jî, min çare ne dît, ji bilî ku te biparêzim, tiştê bi tirs ku min li ser te bihîst te pê agahdar bikim. Şetrepe got: Ma te çi bihîstiye?

Dîmne got: Nasekî zana, rastgo ku guman li ser gotina wî tune ye bi min re got, ku şêr ji hin dost û rûniştvanên xwe re gotiye: Ez qelewbûna gê xweş dibînim, pêdviya min jî bi jiyana wî ne maye, ez dikim wî bixwim û dostên xwe jî bi goştê wî dan bikim. Gava ku ev gotina gihîşte min, min xinanî û nedilsoziya wî û çawa sozê xwe bi me re xwar, nas kir, ez hatim ba te, da ku sozê xwe bi te re bi cih wînim û tu jî haya xwe ji rewşa xwe bibî!

Gava ku Şetrepe gotina Dîmen bihîst û hate bîra wî, çawa Dîmne soz û peyman jê re girêdabûn, gava ku di rewşa şêr de jî ramî, bawer kir, ku Dîmne rast dibêje û wî şîret dike; bawer kir jî, ku pîrs mîna Dîmne dibêje.

Wê nûçeyê ga xemgîn kir û got: Jerkî ku ez bi şêr re me, min tu guneh ne bi wî û ne bi leşkerên wî ne kiriye da ku xinaniyê bi min bike. Ez bawer dikim, şêr li ser derewan gunehê min rakiriye şaş ji min têgihîştiye; ji ber ku kesine bedxwaz li dora wî kom bûne, viran li ba wî dikin, ew jî tiştên li ser kesên din diçihêne wî înan<sup>1</sup> dike.

---

<sup>1</sup>.Înan dike: Bawer dike.



Çinkî dostaniya bi şerxwazan re, dihêle guman bi çêxwazan bibe, ew tiştê jî dike ku ew di dermafê bilî xwe de xwe şaş bike.

### • **Mînaka Ordekê û Roniya Hesareyê**

*Mînaka kesê ku tiştan di rû re dipêve, wê ûştê jî rastiye nabîne.*

Ew mîna şaşîtiya ew ordeka ku li ser dibêjin: Wê ronahiya hesarekê<sup>1</sup> di avê de dît, guman kir masî ye û hewil da wê bigire; lê piştî ku gelek caran hewil da, wê nas kir ku ew tişteke e, ne tê girtin û rabû berda. Paşê, roja din wê masiyek di bin avê de dît, lê guman kir ew mîna ya ku duh dîtî bû ye, rabû ew berda û ne girt. Eger vir li ser min gihîştî bin şêr û pê bawer kiri be, wê hîngê tiştê ku bi serê bilî min hat, wê bi serê min jî were; lê eger tişteke li ser min ne gihîştî bê, û xwasti be bê sedem nerindiyê bi min bike, ew jî tişteke pir seyr û mat e.

Berê dihat gotin: Tişteke pir seyr e, ku mirov razîbûna dostê xwe bixwaze û ew jî pê razî nebe, hîn ji wê seyrtir, ew rizatiya wî bixwaze, lê sixêf lê were kirin. Eger ev pirsgirêka ji ber sedemekê be, wê hîngê razîbûn wê hebe, hêviya lêborînê jî wê hebe. Lê eger bê sedem be, ew hêviya tê birîn. Çinkî eger sedem hebe, hêvî di hilanîna wê de tê dîtin. Lê ez dinêrim û dibînim, ku min tu guneh di navbera xwe û şêr de, ne biçûk û ne mezin ne kirine. Lê bêguman, gava ku kesek demeke dirêj hevaltiya hevalekî

---

<sup>1</sup>.Hesare: Stêrkên mîna gozemînê, کۆکب.

xwe bike, ew nikare ji bo wî di her tiştêkî de haydar be, ne jî kane xwe biparêze û tiştêkî biçûk an jî mezin ku hevalê wî jê hez nake jê dernekeve. Lê mirovê xwedî hiş û dilsoz, eger şaşiyekek ji hevalekî wî derket, ew lê dinêre, radeya şaştiya wî nas dike, aya<sup>1</sup> wî bi mebest şaşbûn kiriye, yan na. Paşê jî dinêre, eger di lêborînê de zîyan û kêmanî heye, yan na? Eger bibîne derfeta lêborînê heye, ew li hevalê xwe dibore û tiştêkî lê çênake.

Belkî şêr gunehêk li ser min guman kiriye be û ez pê nizanîm, belkî min ji hin nêrînên wî re erê ne kiriye, yan jî ew şîret kiriye, wî jî ew tiştêkî wek destdirêjê û nakokî ji xwe re dîtiye; lê ez di wî warî de tu gunehê ji xwe re nabînim, çînkî min hêç rikberiya wî di tiştêkî de ne kiriye; ji bilî ku carine pir hindik, ew di mijarên hişdarî, sûdekarî û olî de dibû, lê belê min ew tiştine li ba serleşker û dostên wî aşkere ne digotin, min ew bi tenê didît, bi dengkirineke pîvayî, giran û bi dizî gotinên xwe jê re dikirin.

Min naskiriye jî: Kî ji bo rawêjê xwe bavêje dostên nezan, li dema nexweşiyê jî xwe bavêje bijîşkên nezan, ji olzanan jî ên nezan da ku sûdê ji nêrîna wan bigire, li wê demê hîn rewşa ku ew tê de ye xirabtir dibe, zîyan girantir dibe, belkî şaşiyekekê jî bike û pê here û şaşiya wî ne tê naskirin jî.

---

<sup>1</sup>.Aya: هل

Eger ne ev be jî, belkî hin rindiyên ku min kirine, bûne ûşt<sup>1</sup> mirina min, ((hin rindî jî ji xwedanê xwe re dibin bela)). Çinkî, dara ku berê wê şêrîn be, ji ber berê wê ye şêrîn, şiqnên wê tên badan, şaxên wê tên kişandin, dişikên û ziyane dibîne. Tilûra tawûsê jî, ji ber ku dûvê wê ciwantir e, tê hilkirin û wê dêşînin; hespê beza jî tê bezandin ta dimire, bilbilê dengxweş jî ji berî hemî tilûran tê girtin.

Eger ne ev û ne ew be, nexwe<sup>2</sup> ew ji karên qeda û felekê ye, ku ji mirov dût nakeve. Ew felek e, hêz û xurtaniya şêr jê dibe û wî dixê gornê jî, ew e ya ku mirovê lawaz li piştê fîlê gurgîn dike. Kane kesekî jî berde ser marê jehirdar, jehra wî jê bibe û pê bilîze jî. Ew kesê bêçare jîr dike, kesê bi qîret jî destgirêdayî dike; xizanan destfere dike, tirsokan wêrek dike, wêrekan bêçare dike, nexweşiyên ku felekê jê re amade kirine lê peyda dike, tîra ku hatî avêtin radiwestîne û kesê desteng jî dewlemend dike.

Dîmne got: Helwesta şêr ji te, ne ji hevojtina şerxwazan e, ne ji sermestiya siltên e, ne ji bilî wan e jî, ew ji xinanî û zirtiya<sup>3</sup> wî ye; ew zirt, xiniz û nankor<sup>4</sup> e, destpêka wî şêrîn e û dawîya wî jehra kuştar e.

---

<sup>1</sup>Ûşt: Sedem, sebeb.

<sup>2</sup>.Nexwe: Yan jî ولا

<sup>3</sup>. Zirtî: Kîryarên ne duruust û li tersî sinciyan.

<sup>4</sup>.Nankor: Ne dilsoz ناکر الجمیل.

Şetrepe got: Ez dibînim, gava ku min ew şêrîniya çêş<sup>1</sup> kir, min xweş dît, niha jî ez gihîştim dawîya wê, ew jî mirin e. Eger ne ji felekê ba, ma ez li ba şêr rûdiniştim? Ew goşt-xwar e, ez jî geyaxawr im. Ez di vî warî de bûme mîna mêşa hunguv, dema ku li ber ronîya çîçekê Nîloverê rûdine, bi bên û çêşa wê kêfxwaş dibe, lê belê xwaşiya çîçekê wê ji dema ku gerek e bifire û here, dihêle; eger hêvar dahat jî, çîçek lê tê hev, ew tê de vedipirpîte û paşê dimire.

Kî li vê cîhanê bi hindikiya ku têra wî dike qayîl nebe, çavên wî li tiştên zêdeyî wê be û ji encama wê netirse, ew dibe mîna mêşa ku bi dar û çîçekan qayîl nabe, diçe ser ava ku ji guhê fîl diherike û fîl jî bi guhê xwe lê dide û wê dikuje.

Kî şîret û hezkirina xwe bide kesê ku rindiyê nabîne, ew dibe mîna yê ku tova xwe li zeviyên bêxêr belav bike. Eger rawêjê jî bide kesê ji xwe razî, ew mîna ku rawêjê dide miriyan, an jî bi keran<sup>2</sup> re daxive.

Dîmne got: Van gotinan berde û haje xwe bike. Şetrepe got: Eger şêr xwast min bixwe, ezê çawa û bi çi haje xwe bikim, te bi xwe ewqas ji min re li ser şêr got û sinciyên wî ên bed hewaldan?!

Ez zanim, eger dostên wî bi qelaşî û zirtiyan xwastin min bikujin, ra eger ew rindiyê jî ji min re bixwaze, ewê

---

<sup>1</sup>.Çêştin: Tamkirin تذوق

<sup>2</sup>.Ker: Nabihîse.

dîsa kani bin; çinkî, eger qelaşên zordar li bêgunehekî durustkar werin hev, ta ew lawaz bin û ew jî bi hêz be, dîsa ewê kani bin wî bikujin. Mîna çawa gur, qirikê û çeçel bi qelaşî, dibare û xinaniyê li hêştir hatin hev û ew kuştin. Dîmne got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Gur, Qirikê û Çeçel bi Şêr û Hêştir re**

*Mînaka kesên lawaz, ku alîkariya hêzdarekî li dijî hêzdarekî din dikin, ta wî dikujin, ji ber ku sûdeke wan tê de heye.*

Şetrepe got: Gotine, ku daristanek li ber rêyeke xelkê bû, şerek û sê hevalên wî; gurek, qirikek û çeçelek di nav de dijiyan. Rojekê şivanin di wê rêkê re derbas bûn, hêştirin vê re bûn, hêştirek li şûnê ma, kete nava wê daristanê û çû ta gihîşte cihê şêr.

Şêr jê re got: Tu ji kû hatî? Got: Ji filan derê. Got: Pêdviya te çi ye? Got: Qeral min bi çi ferman bike ew e. Got: Tuyê bi xweşî, ewle û xwarin li ba me bimînî; hêştir jî demeke dirêj li ba şêr ma.

Rojekê şêr derket nêçîrê, raste filekî gewre hat û şerekî dijwar di navbera wan de rabû; fil bi şêlima<sup>1</sup> xwe li şêr xist, xwîn jê herikan û bi birînine dijwar jê rizgar bû. Gava ku gihîşte cihê xwe, ket û nikarî ne biliviya û ne jî nêçîr bikira.

---

<sup>1</sup>.Şêlim: Qoçê fil.

Ji ber ku hevalên şêr jî ji xwarin û bermayên xwarina wî dixwarin, gur, qirik û çeql bi rojan rûniştin, xwarin bi dest neketin, pir birçî û jar bûn, şêr jî rewşa wan dît, ji wan re got: Win jî westiyar û pêdviya we jî bi xwarinê heye. Gotin: Henasên me ji bo me ne giring in, lê li me pir giran tê, ku em qerêl di vê rewşê de dibînin. Xwazî em çarekê ji bo xwarin û tendurustiya te bibînin. Şêr got: Ez gumanê di gotina we de nakim, herin belkî win nêçîrekê bibînin û ji min re wînin; ewê ji bo min û we jî roziyeke rind be. Herweha, gur, qirik û çeql ji ba şêr derketin, xwe dane aliyekî, bi hev re pêlanek gerandin û gotin: Çiyî me ji vî hêştirê geyaxwar tê, ne pergala wî ji pergala me ye û ne nêrîna wî ji nêrîna me ye?! Çima em wî ji şêr re şêrîn nakin da ku wî bixwe û ji goştê wî bide me jî?! Çeql got: Em nikanin vî tiştî ji şêr re bêjin; ji ber ku şêr ewlehî, soz û peyman danê.

Qirikê got: Ez şêr li xwe digirim. Ew çû derbas ba şêr bû, şêr jê re got: Te tişteke girt? Qirikê got: Yê ku diweste û dibîne ew digire, em jî ji ber birçîbûnê ne kanin bigerin û ne bibînin; lê em gihîştin nêrînekê û me li ser li hev kir; eger şêr bi me re erê bike, emê bi ya wî bikin. Şêr got: Ma ew çi ye?

Qirikê got: Ev hêştirê geyaxwar ku di nava me de kêf dike, ne sûdeke me jê tê, ne kane rindiyekê bike, ne jî berjewendiyeyeke me jê heye. Gava şêr ew tiştê bihîst, hêrs bû û got: Çiqas nêrîna te şaş e, gotina te lawaz e û tu ji dilsozî û dilovaniyê dûr î! Mafê te tunebû ku tu bi vê

gotarê derbas ba min biba û ev gotina ji min re bikira; tu baş zanî jî ku min hêştir ewle kiriye û kiriye stûyê xwe. Ma te ne bihistiye, tu rindî jê mezintir tunene, eger yek henaseke tirsiyayî ewle bike û rêtina xwînekê rawestîne?! Min jî ew ewle kiriye, ez xinaniyê pê nakim, ne jî sozê xwe vê re dixwim.

Qirikê got: Ez têgihîştim qeral çî dibêje, lê belê henasek ji ber malekê ve dibe qurban, malek ji ber hozekê ve dibe qurban, hozek dibe berdêla welatekî, welatek jî dibe qurbana qerêl. Niha jî qeral bi pêdvî<sup>1</sup> bûye! Ezê rêkekê ji soz û peyman qeralê xwe re bibînim, bila qeral gunehê wî qet raneke, bi xwe neke û kesekî jî ferman neke. Emê bi awakî werin wî, ewê ji me û ji te re jî durust û guncav be. Wê hîngê şêr li ber bersiva qirikê û gotina wê bêdeng bû.

Dema ku qirikê erêkirina şêr nas kir, ew hat ba her du hevalên xwe û ji wan re got: Min li ser xwarina hêştir bi şêr re deng kir, lê gerek e em û hêştir li ba şêr bicivin, emê tiştê hatiye serê wî bibîr wînin, xwe xemgîn bikin, wekî ku em bo rewşa wî pir xerîk<sup>2</sup> û xemgîn in û ji bo çakbûna wî xemxwar in. Heryek ji me, wê xwe li ba şêr rind salix bide û xwe pêşniyar bike da ku şêr wî bixwe, lê em her duyên din, emê lê vegeînin, gotina wî ne baş bibînin û ziyana ku wê ji xwarina goştê wî were xuya bikin. Eger dora hêştir hat, emê gotina wî rast bibînin û wilo ewê bimire, emê jî

---

<sup>1</sup>.Bi pêdvî: Bi gerekî tiştêkî محتاج.

<sup>2</sup>.Xerîkbûn: Mijûlbûn.

rizgar bibin û şêr jî wê ji me razî be. Wan wilo kir û çûn ba şêr.

Qirikê got: Qeralê me, tu îro bi pêdviya tiştê ku te çak û bi hêz bike bûyî. Ji erka me ye ku em henasa xwe bibaxşînin te, çinkî em bi te dijîn, eger tu jî mirî kesek ji me li dû te namîne, ne jî xêr ji me re di jiyane de dimîne. Bila qeral min bixwe û henasa min jî ji bo wê yekê kêfxwaş e. Lê gur û çeçel bersiv danê û gotin: Bêdeng be! Xêr ji qerêl re di xwarina te de tune, ne jî ji te têr dibe. Çeçel got: Ezê qerêl têr bikim, bila min bixwe, ez bi wê yekê qayîl im û henasa min jî jê re vehesîye; lê gur û qirikê lê veçerandin û gotin: Tu genî û qirêj î! Gur got: Ez ne wilo me; bila qeral min bixwe, min rê dayê û dilê min jî vehesîye! Lê qirikê û çeçel rê lê birîn û gotin: Bijîşkan gotiye: Kî dixwaze henasekê bikuje, bila goştê gurekî bixwe.

Hêştir guman kir, eger ew jî xwe ji bo xwarinê pêşniyar bike, mîna çawa wan ji hev re bihane dîtin, dê ji wî re jî bibînin, ew jî wê ewle bibe, şêr jî wê jê razî bibe û ji metirsiyan rizgar bibe. Got: Lê di min de ji bo qerêl têrbûn û xweşî heye, goştê min xweş û tendurust e, zikê min jî pak e, bila qeral min bixwe û heval û berdestên xwe jî dan bike. Ez bi wê yekê razî me, rê didimê û henasa min jî vehesîye. Gur, qirikê û çeçel gotin: Hêştir rast got, camêrî kir û tiştê zanî hewalda. Herweha wan xwe avêtin ser û hêştir ji hev perçe kirin û xwarin.



Min ev nimûna ji te re anî, da tu zani bî, eger hevalên şêr li ser kuştina min li hev kiri bin, raku nêrîna şêr li ser min ne wek ya wan be jî, ezê nikani bim xwe ji wan rizgar bikim, ne jî xwe bipolarêzim, nêrîna wî dê sûdê li min neke û nikani be tiştêkî jî ji min re bike.

Belkî were gotin: Siltanê baştir yê ku ji xelkê re dadmend be, mîna qertel<sup>1</sup> be û term<sup>2</sup> li dora wî bin, ne mîna termekî be û qertel li dora wî bin. Eger ji bilî xêrê û dilovaniyê jî di henasa şêr de ji bo min tunebe, lê gotinên pir dê wî biguhêrin. Çinkî eger kesên ne baş pir bûn, ew diltenikî û dilpakîyê zû têk dibin. Ma tu nabînî av çiqas nerm e, kevir jî ji mirov hişktir e, lê eger av di ser kêvir re pir biherike, ew li kêvir kar dike û wî qul dike! Ev gotina ji bo mirov jî rast e.

Dîmne got: Tu niha dixwazî çi bikî? Şetrepe got: Ez ji bilî ked û xebatê li hember şer tu rêkê nabînim; çinkî çêsezaya xebata ku mirov di ber henasa xwe de bike, nemaze eger xebata wî li ser mafdariyê be, ji ya nimêjê, sexdeyê<sup>3</sup> û perestvaniyê bêtir e. Dîmne got: Eger mirov kani be çareke din bibîne wê baştir be, çinkî gerek e mirov xwe neke metirsiyê. Xwedanê nêrîna rast, şer wek çareya dawiyê dihêle, berî wê û ta kani be, bila bi nermikî û bi sebrê dest pê bike. Hatiye gotin jî: Neyarê lawaz û payenizim biçûk mebinê, nemaze jî eger zana be û şora

---

<sup>1</sup>.Qertel: Tilûrekî Goştixwar e.

<sup>2</sup>.Term: Laşê mirî.

<sup>3</sup>.Sexde: Sedeqe صدقة

xwe li ba alîkarên xwe hebe; ma çawa bi şêr û wêrekî û hêza wî re?! Kî ji ber lawaziya dijminê xwe wî biçûk bibîne, tiştê ku ji Tîtwê gihîşte berdevkê<sup>1</sup> deryayê wê were serê wî jî. Şetrepe got: Ma ew çawa bû?

### • **Tîtwê û Berdevkê Deryayê**

*Mînaka ê lawaz û pozbilind û çawa têk diçe.*

Dîmne got: Gotine ku tilorek ji tilûrên deryayê hebû jê re digotin Tîtwê. Warê wî li ser kendava deryayê bû û jina wî jî vê re bû. Gava ku çaxa kurkbûna<sup>2</sup> wan hat, tilora mê ji ê nêr re got: Bila em cihekî parastî bibînin û hêlîna<sup>3</sup> xwe lê çêkin, ez ji deryayê ditirsim, eger ava wê rabe, ewê çêlikên me li ber xwe bibe. Wî jê re got: Ez bawer nakim ku berdevkê deryayê bi ser me de were, çinkî ew ditirse ez paşê tola xwe jê hildim. Tu li cihê xwe kurk bibe, li vir av û çîçek jî ji me ve nêzîk in û ji me re baş e.

Wê jê re got: Nehaydaro! Tu çiqas sert û ser hişk î! Ma gefgura<sup>4</sup> wî ji te re ne tê bîra te?! Tu xwe û payedariya xwe li hember tiştê ku tu pê nikarî nas nakî? Lê wî guhdariya wê ne kir. Gava ku pir jê re got û guh ne dayê, wê got: Ewê gotina rawêjkaran nebihîse, tiştê ku gihîşte

---

<sup>1</sup>.Berdevk: Wekîl, şane. Di pirtûkê de wiha hatiye, wekî ku wekîlê deryayê heye, jixwe ew jî ne rast e, belkî çêre pêlên deryayê û tevgera wê dike.

<sup>2</sup>.Kurk bû: Hêk kirin û li ser rûnişt.

<sup>3</sup>.Hêlîn: Malik, pînika tilûran.

<sup>4</sup>.Gefgur: Gefkirin تهديد

reqê<sup>1</sup>, li dema ku gotina her du ordekan ne bihîst, wê bigihê wî jî. Tilûrê nêr got: Ma ew çawa bû?!

### • **Mînaka Req û Du Ordekan**

*Mînaka ewê ku gotina rawêjkar nabihîse.*

Tilûra mê got: Gotine ku goleke avê hebû, geya li ber pir bû, du ordekan jî tê de dijiyan û di navbera wan de hezkirin û dostanî hebû. Demek hat, ew ava kêmbû, her du ordekan hatin xatirê xwe ji reqê bixwazin û gotin: Silav li te. Ji ber ku av ji vir kêmbû, emê ji vî cihê herin. Wê got: Kêmbûna avê li yê mîna min xuya dike, çinkî ez wek gemiyê me, bê av nikanim bijîm; lê ji bo we, li kûderê be win karin bijîn, ez dixwazim win min jî bi xwe re bibin. Wan got: Belê. Got: Lê winê çawa min hilgirin? Gotin: Emê bi du aliyên darikekê bigirin, tu jî bi devê xwe bi nivê wî bigire û emê bi te bifirin. Lê haje xwe hebe, eger te bihîst ku xelk daxive, devê xwe vemeke. Wan ew hilgirtin, firîn û bibanî ketin! Lê gava ku xelkê ew dîtin, bang kirin û gotin: Ev çi mitêl<sup>2</sup> e, reqek di navber du ordekan de û wan hilgirtiye! Gava reqê ew gotina bihîst, wê jî got: Xwedê çavên we birjîne! Dema ku wê devê xwe vekir û axivî, bi ser zemînê de ket û mir. Tilûra nêr got: Min gotina te bihîst; tu jî ji berdevkê deryayê metirse.

---

<sup>1</sup> .Req: Kêsbûya (kêsefis) avî.

<sup>2</sup>.Mitêl: Xerîb.

Lê belê dema ku ava deryayê rabû, berdevkê deryayê hat û çêlikên wan birin. Wê çaxê mêzayê<sup>1</sup> got: Min ji destpêkê de zanî ku ev tiştê wê bibe, tiştê ku bi serê me hat jî ji bin serê te de bû! Ê nêr got: Erê min got û ez li ser şora xwe me. Tuyê bibînê ezê çi pê bikim û çawa tola xwe jê hilînim. Ew rabû û çû ba civata tilûran û ji wan re got: Win birayên min in û cihê baweriya min in, alîkariya min bikin! Gotin: Tu dixwazî em çi bikin? Got: Winê bicivin û bi min re herin ba hemî tilûran, giliyê berdevkê deryayê li ba wan bikin û ji wan re bêjin: Win jî mîna me tilûr in, alîkariya me bikin!.

Wê hîngê, civata tilûran jê re got: Tilûra `Enqa, keça bê, ew serwer û qerala me ye, me bibe ba wê, emê gazî wê bikin, ewê xwe li me xuya bike û emê ji bo tiştê ku gihîştiye te li wekîlê deryayê gilî bikin û jê bixwazin bi hêz û destlatdariya xwe tola me jê vede! Paşê, ew bi Tîtwê re çûn ba wê, gazî wê kirin, ew li wan xuya bû, wan çêroka xwe jê re hewalda û jê xwastin bi wan re here cenga berdevkê deryayê bike, wê jî ji wan re erê kir.

Gava ku berdevkê deryayê bihîst ku `Enqa li gel civata tilûran berê xwe dane wî, wê hîngê ew ji şerê qeralekî ku ne barê wî ye, tirsî, rabû çêlikên Tîtwê lê vegeandin, vê re li hev hat, `Enqa jî ji ser vekişî.

Min ev gotina bi te re kir, da ku tu zani bî, ez şerê bi şêr re ji bo te çare nabînim. Şetrepe got: Ez bi şêr re şer

---

<sup>1</sup>.Mêza: Ya mê.

nakim, ne bi dizî û ne eşkere dijmantiya wî nakim, ne jî di tenga wî re hatime guhertin ta ku ez jê bitirsim û şerê wî bikim. Dîmne gotina wî baş ne dît û nas kir, eger şêr şan û berjengên<sup>1</sup> ku wî jê re hewal dane li gê nebîne, ewê li gotina wî têkeve gumanê û belkî wî gunehbar jî bike. Wî ji şetrepe re got: Here ba şêr, gava ku ew li te binêre, tuyê nas bikî çî ji te dixwaze.

Şetrepe got: Ezê çawa wî tiştî nas bikim? Dîmne got: Gava tu bikevî ba wî, tuyê bibînî li ser dûvê xwe rûniştiye, sîngê xwe hildaye û daye te, kûr li te dinêre, guhên xwe piç kirine, devê xwe vekiriye û xwe ji bo avêtinê amade kiriye. Şetrepe got: Eger min ev nîşanina ji şêr dîtî, ezê zani bim ku gotina te rast e.

Gava Dîmne şêr hevojte ser gê û ga jî hevojte ser şêr, çû ba Kelîle, dema ku hevdu dîtî, Kelîle got: Karê ku tu tê de bû te çawa kir? Dîmne got: Nêzîk bûye ku mîna ez û tu dixwazin bi dawî bibe. Paşê, Kelîle û Dîmne bi hev re rabûn û çûn, da ku li şerê şêr û gê amade bibin û bibînin wê di navbera şêr û gê de çî bibe û rewşa wan wê çawa be.

Şetrepe hat û derbas ba şêr bû, dît ku şêr wekî Dîmne jê re salix dabû, kiriye û li ser kûna xwe rûniştiye; wî di dilê xwe de got: Dostê siltên mîna yê ku mar di paşela wî de be, nizane dê kînga har bibe û pê dade. Şêr jî li gê nihêrî, wî jî nîşanên ku Dîmne jê re hewal da bûn li ser dîtî û bi

---

<sup>1</sup>. Şane û berjengên: علامات وأعراض

wê yekê, tu guman li ba wî jî ne ma ku ga hatiye şerê wî bike, wî xwe avête ser gê û şer û pevçûn di navbera wan de derket, şer giran û dirêj bû û xwîn di navbera wan de herikî. Gava Kelîle dît, ku çi bi serê şer hat û gihîşt çi deraq<sup>1</sup>, ji Dîmne re got: Bê qîret, te çiqas karekî pîs kir, dawiya te jî wê ji bo vê yekê pir pîs be.

Dîmne got: Ew çima? Kelîle got: Şêr birîndar bû û ga jî mir! Nêrîna herî pîs ew e, ku ji dêvla mirov çarekê bibîne, ew dost û mirovên xwe bajo ser sinciyên bed û şer û pevçûnê. Ra eger mirov ot<sup>2</sup> li neyarê xwe anî û ji tirsî ku aşkere xwe tê nede<sup>3</sup>, ew wî berdide û li bendê dimîne ku bê şer zora wî bibe. Mirovê hişmend berî ku dest bi tiştan dike, wî dipîve û rêkê tê re dibîne, eger guman kir ku kane bike, dike, eger tirsî nikari be bike jî, jê digere û careke din lê venagere. Ez jî ji encama vî karê te li ser te bitirsim, çinkî te rind got, lê te baş kar ne kir!

Kanî peymanî te ji min re da, ku tu ziyane nagihînê şêr? Hatiye gotin: Xêr di gotina bê karkirin de tune, bê henasa pak xêr di zanîna olî de jî tune, bi niyaza pak re sexteyî<sup>4</sup> nabe, bê camêrî xêr di mêl de tune, bi rastgotinê re jî dilsozî gerek e, bo jiyanê jî tendurustî û bi ewlehiyê re jî dilşahî tê. Te tiştêk merc kir, ji bilî hişmendan kesek nikare pêk bîne. Bila tu zani bî, ku

---

<sup>1</sup> .Deraq: Rewş, hâl

<sup>2</sup> .Ot: Fersend.

<sup>3</sup> .Têdan: Pevçûn.

<sup>4</sup> .Sexte: Celeb; ne resen.

rawêjî bedkariyê ji ser hişmendan radike, lê arodan bêtir bê hiş dike, wekî ku çawa roj nêrîna çavên her kesekî zêde dike, lê pêrçemokê<sup>1</sup> bê nêrîn dike. Eger xwedî hiş payebilind bû, nabitire, eger kanîn û asta wî jî bilind bû, ew dibe mîna çiyayê ku bayê hêgin wî nahejîne, lê belê ê arode mîna geya ye, bayekî biçûk wî dihejîne. Karê ku te jî kir, tiştêkî ku min bihîsti bû anî bîra min; çinkî dibêjin: Eger siltan çêkar be û wezîrên wî jî bedkar bin, ew rê li ber rindiya wî digirin û kesek nikare jê ve nêzîk bibe. Mînaka wî siltanî, mîna ew ava pak ku timsah tê de hene, ra ku pêdivî jî pê hebe, lê kesek nikare jê vexwe.

Qeral û rindiya wî jî di durustiya leşker û wezîrên wî de ne, çinkî ew rewşa xelkê rind dikin û li durustkirina karûbarên wan dinêrin; tu jî ey Dîmne, te xwast kesek ji bilî te nêzîk şêr nebe, ev jî tiştêkî ne rast e û hîç ne gengaz e. Ji bo vê yekê ev mînaka hatiye gotin: ((Derya bi pêlên xwe û siltan bi hogirên xwe)).

Ji bêhişiyê ye ku tu dostan ji xwe re bigirî, lê ji wan re ne dilsoz bî, pişdawayî bi viran bixwazî, hezkirina jinan bi sertiyê bi dest bixî û bi êşgihandina bilî xwe sûdê li henasa xwe bikî. Şîret û perwerda min ji te re, mîna gotina mirov ji tîlûr re bû, dema jê re got: ((Di tiştê ku serast nabe de xwe mewestîne, yê ku perwerde nabe jî perwerde meke)). Dîmne got: Ma ew çawa bû?

---

<sup>1</sup>.Pêrçemok: Tilûreke biçûk û bê per e, pêşiya xwe nabîne. خفاش

## • Mînaka, Tilûr, Mirov û Meymûnan

*Mînaka kesê ku şîretê napejirîne<sup>1</sup>, karê pê de ne ketiye dike û pê têk diçe.*

Kelîle got: Hatiye gotin, ku komek meymûn li çiyakî bi war bû bûn. Di şeveke sar, bi ba û baran de xwastin agirekî dadin, lê agirek ne dîtî ku pê vêxin. Wan kurmikekî şevê<sup>2</sup>, ku weke çîkeke êgir difirî, dîtî û guman kirin ku agir e. Wan rabû êzîngine pir kom kirin, danîn ser wî kurmikî, bi devên xwe pufê kirin û bi destên xwe hêlpize<sup>3</sup> kirin; ew li bendê bûn, ku agir vêkeve û xwe li ber germ bikin! Li nêzîk wan tilûrek li ser darekê bû, wan li wî dinêrî û wî jî li wan dinêrî. Tilûr dît wan çikir û çî dikin. Wî rabû deng li wan kir û got: Xwe mewestînin, yê ku we dîtiye ne agir e! Dema ku wan karê xwe ranewestand û pê de çûn, wî xwast ji wan ve nêzîk bibe û wan ji wî karî bigerîne. Wê hîngê mirovek di ba wan re çû û nas kir tilûr dixwaze çî bike, jê re got: Xwe mewestîne! Tiştê ku ne tê rastkirin rast meke, kevirê sert ku ne tê birîn, şûr lê ne tîn taqekirin, darikê ku xwar nabe jî, kevan jê çênabe. Lê tilûr guhdariya wî ne kir, berve meymûnan çû da bi wan bide nasîn ku ew kurmkê şevê ye ne agir e, lê meymûnina ew girt, li zemînê dan û kuştin! Di vî warî de, ev e mînaka min ji bo te. Lê belê xapandin û bêşermiyê tu girtî, ew jî du sinciyên pîs in, sezaya xapandinê jî a

---

<sup>1</sup>.Pejirandin: Qebûlkirin.

<sup>2</sup>.Kurmikê şevê: Kurmikê êgir: Kêzikek e, bi şevê vedibrûse.

<sup>3</sup>.Hêlpize: Li bakirin تهویه.



girantir e, nimûna wê jî heye! Dîmne got: Mînaka wê çi ye?

• **Mîna Gêjik û<sup>1</sup> Xapînok<sup>2</sup>**

*Mînaka tiştê ku dawiya xwe ya ne baş û xuya ye, dawiya çavbirçîtiyê jî ziyan e.*

Kelîle got: Gotine, xapînokek û gêjkekî di bazirganiyekê de bûn hevparên hev û bi rê de çûn. Dema ku di rê de bûn, gêjik ji bo pêdviyeke xwe li şûn ma û tûrikek dît hezar dînar tê de bû, wî ew rakir û ji xwe re bir. Lê xapînok pê hestewar bû û bi hev re vegeîn welatê xwe. Gava ku ji bajêr ve nêzîk bûn, ew rûniştin da ku peran parve bikin. Gêjik got: Nîvî peran bibe û nîvî bide min. Lê xapînok di dilê xwe de biryar kiri bû, ku hezarî gişî ji xwe re bibe. Wî jê re got: Em parve nakin, hevparî û danûstandin ji bo dilxwaşî û pêwendîyan baştir e; ezê mezaxeke<sup>3</sup> xwe bibim, tu jî mîna wê bibe, yê ku bimîne jî, emê di koka vê darê de veşêrin; ew jî cihekî ewle ye û dê nehêna<sup>4</sup> me biparêze, eger pere gerekî me bûn, ez û te emê werin, pêdviya xwe jê bibin û kesek jî bi cihê me nizane.

Wan li hev kir û tibabeke<sup>5</sup> hindik ji peran birin, yê mayî jî di koka darê de veşartin û derbas bajêr bûn. Paştî wê, xapînok bi dizî hat, hemî dînar birin, xak jî mîna berê rast

---

<sup>1</sup>.Gêjik: Kesekî gêj.

<sup>2</sup>.Xapînok: Xapînok, mirovê mera dixopîne.

<sup>3</sup>.Mezax: Xercî, mesref..

<sup>4</sup>.Nehên: Veşarte سر

<sup>5</sup>.Tibab: Parek, hinek bi hejmar كمية، مقدار

kir û vegeî. Rojekê gêjik hat û ji xapînok re got: Pêdivya min bi mezaxekê heye, bimeşe em herin pêdviya xwe bibin; xapînok rabû û vê re çû cihê peran, wan xak kola, lê tişteke ne dîtin! Xapînok rabû li rûyê xwe xist û got: Baweriyê bi dostaniya dostan meke, tu bi tenê hatî û te dînar birine! Wê yekê kir, ku gêjik sond bixwe û nifiran li yê ku pere birine bike; xapînok jî her diçû li rûyê xwe dida û digot: Ji bilî te kesekî ne biriye, ma ji bilî te kesî pê zanî?!

Ew yeka di navbera wan de mezin bû, her du çûn ba dadwer û dadwer çêroka wan bihîst. Xapînok ji dadwer re got, gêjik pere birine, lê gêjik mandel<sup>1</sup> kir. Dadwer ji xapînok re got: Ma tu bihane<sup>2</sup> te li ser gotina te hene? Got: Belê, dara ku dînar li ba wê bûn ji min re nêrevan e ku gêjik pere birine. Wê çaxê xapînok çû ba bavê xwe, çêroka xwe û gêjik jê re hewalda û ji bavê xwe xwast, ku xwe di nava darê de veşêre, eger ji darê hate pirsîn, ewê bersivê bide. Bavê xapînok jê re got: Dibe ku fêlbaziya fêlbazekî wî bi xwe bixe deraqên pir teng û nikani be jê rizgar bibe. Bila tu mîna kêvcêl nebî! Xapînok got: Ma ew çawa bû?.

---

<sup>1</sup>.Mandel: Înkâr.

<sup>2</sup>.Bihane: Eger, sedem, hicet حجة، دليلان برهان

## • **Mînaka Mar, Fistekê û Têrikê Avî**

*Mînaka yekî ku dibarê li dijminê xwe bike û wî bikuje, paşê ziyana wê dibarê bigihê wî bi xwe û ew jî were kuştin.*

Bavê wî got: Gotine, ku têrikekî avî bû bû hemsiyê marekî û her cara ku wî çêlik dikirin, ew dihat nava hêlîna wî û çêlikên wî dixwarin. Wî rabû giliyê xwe kire ber kêvcêl, kêvcêl jê re got: Li nêzîk malika te qulek heye fistekek<sup>1</sup> tê de dijî, ew jî maran dixwe. Tu masine pir bigire û ji ber qula fistek de, ta ber qula mar belav bike, eger wî dest bi masiyan kir û xwarin, ewê bigihê ber qula mar û wî jî bixwe. Wî rabû wilo kir û wilo jî bû; lê paşê, fistek ji ber qula mar çû, li masiyan gerî ta gihîşt ber qula têrikê avî û ew û çêlikên wî jî xwarin!

Min ev nimûna ji te re anî, ji ber ku ewê ji fêlbaziyên xwe ne bawer be, rast pêk neyîne û baş durust neke, fêlbaziya wî dê wî jî têxe nava fêlbaziyeyeke ji ya wî girantir. Xapînok ji bavê xwe re got: Ez têgihîştim te çî got, lê metirse, pirs hêsan û biçûk e! Ew bi bavê xwe de ma, ta ew qayîl kir û vê re çû kete nava darê. Dema ku dadwer nûçeya nêrevaniya darê ji xapînok bihîst, wî ew yeka mezin û seyr dît; ew, dostên xwe, diz û gêjik jî bi wan re bû, çûn ta gihîştin ba darê û ji darê pirs kirin; wê çaxê Şêx ji hundirê darê de got: Belê gêjik dînar birine.

Gava ku dadwer wilo bihîst, zêde mat bû, li dora darê gerî, wî tîşek di darê de dît û tê re nihêrî, lê tiştek tê de

---

<sup>1</sup>.Fistek: Lawirekî biçûk î goştixwar e.

ferq<sup>1</sup> ne kir. Wî rabû êzingin xwastin û ferman da ku darê bişewtînin û rabûn agir li dora darê dadan. Wê hîngê bavê xapînok bang kir û kir hawar û rabûn ew ji koka darê derxist, lê rewşa wî xirab bû bû! Dadwer rabû çêrok jê pirsî, wî jî rastiya wê jê re hewalda. Wê hîngê, wan li xapînok da, bavê wî jî dane ber sîlan, di nava xelkê de riswa kirin û dînar ji xapînok standin û dane gêjik!

Min ev nimûna ji te re anî, da ku tu zani bî, belkî xwedanê xapandin û dibarê bi xwe jî were setemkirin. Ey Dîmne! Te jî dibare, xapandin û pîsîtî di xwe de civandine, loma jî ez ji ber encama karê te li ser te bitirs im, tu ji bedsezayê rizgar nabî, çinkî tu bi du rû û bi du zimana yî.

Bila tu zani bî, xweşiya ava çeman berî ku digihê deryayê ye; tenê dema ku bedkar di nava malê de tunebe, xelkê wê durust dibe. Tu jî mîna marê bi du zimana yî jehr tê de heye, tiştê ku ji zimanê te tê jî mîna wê jehrê ye. Ez ji zihêra<sup>2</sup> ku ji zimanê te tê, bi tirs im, ez pêşbîn<sup>3</sup> im jî tiştên ne baş wê bi serê te werin. Çinkî ewê ku di nava dostan de bedkariyê bike, mîna marê ku mirov wî tîmar dike, dan dike, pak dike, qîmetê didê û paşê ji bilî pêddadanê tiştêkî jê nabîne.

---

<sup>1</sup>.Ferqkirin: Dîtin.

cd

<sup>3</sup>. Pêşbîn: Bi tiştên ku dê bibe bawer dike متوقع، متوقع.

Belkî were gotin: Bibe dostê xwedî hiş, camêr, xwedî resena<sup>1</sup> pak û xwe bi dest wan de berde û jê meqete. Bibe dostê dostê xwe eger hişmend û camêr be; çinkî hişmendê camêr kamil e. Dostaniya hişmendê ne camêr jî bike, ta ku xwediyê sinciyên ne baş be jî, tuyê ji hişê wî sûdê wergirî, lê bila haya te ji sinciyên wî ên ne baş hebe. Bibe hevalê camêrê ne hişmend jî, pê re bimîne û jê meqete ta ku tu hişê wî jî ne ecbînî, çinkî tuyê sûdê ji camêriya wî bibînî, bi hişê xwe jî sûdê lê bikî. Lê ji kesê kêr û arode bireve. Ez jî mafdar im ji te birevim. Çawa biraderên te wê hêviya camêrî û hezkirinê ji te bikin û tuyê jî vê yekê bi qeralê xwe yê ku rûmeta te digirt û tu payebilind kir, bikî?! Yên ku mîna te, mîna ew bazirganê goti bû: Warekî ku mişkên wê sed lîtir<sup>2</sup> hesin bixwin, ne mitêl<sup>3</sup> e ku bazên wê jî kani bin fîlan birevînin. Dîmne got: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Bazirgên û Mişkên Hêsinxwar**

*Mînaka ewê ku tişteki beramberî tişteki wek wî dike, da ku ji encamên wî tiştî were parastin.*

Kelîle got: Hatiye gotin, ku bazirganek li welatekî hebû, sed qentar<sup>4</sup> hesin li ba wî hebûn. Rojekê xwast ji bo karê xwe here dereke dûr, rabû ew hesina danî ba mirovekî ji biraderên xwe û bi riya xwe de çû. Piştî demekê vegeerî hat ba mirovê xwe û hesinê xwe xwast, lê

---

<sup>1</sup>.Resen: Bi kokûbinyat, esîl.

<sup>2</sup>.Lîtir:Retil رطل. yekîne (mane) yeke sengê ye. وحدة قياس الوزن

<sup>3</sup>.Mitêl: Bêgan, Xerîb.

<sup>4</sup>.Qentar: Her qentarek dora 250kg e.

mirov jê re got: Mişkan hesin xwar. Wî got: Min jî bihîstiyê ku ji bo birîna hêsîna ji diranên wan tûjtir tunene! Mirov bi gotin û bawerkirina wî şa bû, bazirgan jî ji ba wî derket û çû.

Dema ku bazirgan ji ba wî derket, raste kurekî wî mirovî hat; rabû ew revand û bire mala xwe. Mirov roja din hate ba bazirgên û jê re got: Te haje kurê min heyê? Bazirgên got: Na! Lê duh, dema ku ez ji ba te derketim, min dît bazekî lawikekî bi salixên lawê te rakir û revand, belkî lawê te bû. Mirov li serê xwe xist û got: Ey millet, we bihîstiyê, an dîtîye ku bazek lawikan direvînin?! Bazirgên got: Erê, welatekî ku mişkên wî sed lîtir hesin bixwin, ne seyr e ku bazên wî fîlan jî birevînin! Mirov jê re got: Min hesinê te xwar, va ye ji te re buhaya wî, tu jî lawê min li min vegefirê.

Min ev nimûna ji te re anî, da ku tu zani bî, kê xinanî bi qerêl û xêrxwazan kir, ne seyr e ku xinaniyê bi bilî wan jî bike. Eger yek bû dostê yekî û paşê xinanî pê kir, dostê wî dê zani be ku hezkirin li ba wî tune. Çinkî hezkirina ji kesê bê qîret û ne dilsoz, camêriya ji kesê ku spasîyê neke, perwerdeya ji kesê ku perwerdeyê nagire û pê bi perwer nabe, nehêna ku li ba kesê ku wê neparêze tê danîn, ew hemî bê sûde diçin. Dara tal, eger bi hunguv jî were mizdan, ew tu sûtê lê nakin; dostaniya xêrxwazan jî xêran tîne, dostaniya şerxwazan jî şer peyda dike; ew mîna bayê ku di nav bînxwaşê re here bînxwaşê bi xwe re hildigire,

eger di ber tiştê genî re jî çû, genîbûnê hildigire. Ez dibînim ku gotina min li ser te dirêj û giran bû!

Kelîle bi gotina xwe gihîşt vî cihê û şêr jî ji gê xelas bû. Piştî ku şêr ga kuşt û hêrsa xwe dahat, ew di kuştina wî de ramî û got: Şetrepe bi rewşa xwe ez pir êşandim. Ew xwedî hiş, nêrîn û sinciyên baş bû, ez nizanim belkî ew bê guneh bû û vir lê bûn. Şêr li ser tiştê ku jê derhat xemgîn û poşman bû, wê yekê di rûyê wî re xuya dikir. Gava ku Dîmne jî ew tiştê dît, dengkirin bi Kelîle re birî, berve şêr çû û jê re got: Bila tu serkeftî û dilxwaş bî qeralê min! Va ye Xwedê dijminên te winda kir, ma tu ji bo çî xemgîn dibî?! Şêr got: Ez li ser hişê Şetrepe, nêrîn û rewîsta wî xemgîn im! Dîmne got: Bila dilê te li ser neşewite ey qeral, kesê hişmend, dilovaniyê li yê ku jê ditirse nake. Belkî mirovê xwedî biryar ji mirovekî bixeyîde û jê hez neke, lê ji ber zanebûn û hişdariya wî, wî tîne ba xwe û ji xwe ve nêzîk dike; mîna ew mirovê ku dermanê nexweş vedixwe, bi hêviya ku sûdê jê bibîne. Belkî jî ji wî mirovî hez bike, li ba wî buha be jî, lê ji tirsê ziyandariya wî, wî ji xwe dûr dixê û dike jî. Mîna ewê ku mar bi tiliya wî dadide, ji tirsê ku zihêr di canê wî de here, tiliya xwe dibire û xwe jê xelas dike. Şêr bi gotina Dîmne qayîl bû. Lê piştî wê, ew bi vir, xinanî û çepeliya Dîmne agahdar bû û bi kuştineke pîs kuşt.

## Deriyê Naskirina Pirsâ Dîmne

Qeral Debşelîm ji Feylesûf Beydeba re got: Tu ji min re li ser fisûkê jîr ê fêlbaz axivî; ma çawa dostaniya rast di navbera du hezkiriyan de bi fisûkiyê têk diçe. Ji min re li ser rewşa Dîmne hewalde, ew çawa bû; piştî kuştina Şetrepe çi bi serê wî hat; dema ku şêr li helwesta xwe ya li derbara gê vegeî, bihaneyên Dîmne li ba şêr û dostên wî çi bûn û çi hîşt ku Dîmne fisûkiyê bike?.

Feylesûf got: Min ji axaftina Dîmne nas kir, gava ku şêr Şetrepe kuşt, li ser kuştina wî pir poşman bû, dostaniya wî a dirêj û xizmeta wî a mezin bi bîra xwe anî. Çawa ga li ba wî dostê herî rûmetdar, payebilind û nêzîktir bû; çawa ji nav kesên li derdora qerêl, tenê wî şîret lê dikirin.

Piştî gê, piling dostê qerêl yê nêzîk bû. Şevêkê lê hat û piling şevbêrkiya xwe bi şêr re dirêj dikir, li derengiya şevê derket û berê xwe da mala xwe û di ber mala Kelîle û Dîmne re derbas bû. Dema ku gihîşt ber deriyê wan, bihîst ku Kelîle bi ser Dîmne de deng dike, li ser tiştê ku kir, fisûkî û virûvûtên<sup>1</sup> ku li dermafê kesên ji şêr ve nêzîk dike wî lome dike. Wê hîngê, piling nerindiya Dîmne nas kir û çawa Kelîle gotina wî qebûl nake. Piling li wir sekinî û li gotina ku di navbera wan de dibû guhdarî kir.

Ji tiştê ku Kelîle ji Dîmne re got: Te karekî pir mezin kir, tu ketî deraqekî pir teng, te gunehekî pir pîs bi ser xwe

---

<sup>1</sup>.Virûvût: Derew.



de anî, dawiya wê jî pir xirab e. Eger karê te kir ji şêr re diyar bibe û nas bike, xinanî û dibara te nas bike, tu wê hîngê bê pişgir jî bimînî, dawiya te wê pir pîs be, kuştina te jî wê pir bi êşek be. Ji ber şerkariya te û xweparastina ji te, ez jivirûhade te ji xwe re hogir nabînim, ne jî nehêneke xwe didim te; çinkî zaniyaran gotiye: Ji yê bêxêr û kesê dilê te ne li ser be dûr bikeve. Gerek e, ez jî ji te dûr bikevim û ji tiştê ku wê ji ber karê te ji şêr derê, xwe xelas bikim.

Gava ku piling gotina wan bihîst, liserstû<sup>1</sup> vegeerî û derbas ba diya şêr bû, soz û peyman jê birin, ewê nehêna ku jê re bêje dernexe; wê soz dayê, wî jî rabû gotina ku ji Kelîle û Dîmne bihîst tev jê re hewalda.

Gava ku sibeh lê vekat<sup>2</sup>, diya şêr derbas ba şêr bû û dît ku ew ji ber kuştina Şetrepê melûl, bêmirûz<sup>3</sup> û xemgîn e! Wê jê pirsî: Ew xema ku gihîştiye te û tu bêçare kirî çi ye? Got: Kuştina Şetrepe min xemgîn dike; dostanî û hevaltîya wî hat bîra min, xizmeta wî ji min re û şîretên ku min jê dibihîstin tînim bîra xwe. Diya şêr got: Eger tu dibînî serketin di kuştina wî de heye, gerek tu xemgîn nebî, yan jî dilê te ji te re dibêje, karê ku te kir ne rast û ne dadmend bû; ji ber ku zaniyaran gotiye, eger tu dixwazî dostê xwe ji dijminê xwe nas bikî, li hundirê xwe birame, eger dilê te jê re durust ne bû, bila tu zani bî dilê wî jî ji te re wilo ye.

---

<sup>1</sup> .Liserstû: Li ser stû, yanê yekser, bê rawstan

<sup>2</sup> .Sibe vekat: Sibe bû.. Bû sibe.

<sup>3</sup>.Bêmirûz: Rû tirş û zer.

Birame! Li hundirê henasa xwe binêre! ma wijdanê te ji te re çi bersivê dide, tiştê ku te bi gê kir setemkarî lê dadmendî bû?

Şêr got: Li gora tiştê rast ku tu dibêjî, min Şetrepe bi setembarî kuşt; çinkî min li dilê xwe nêrî, lê min tişteke ji bilî bêgunehiya Şetrepe ne dît, kuştina wî setem û têvedanek ji şerxwazan de bû! Lêgerîna di tiştan de mafan bi cih dike, nerastiyan<sup>1</sup> jî diyar dike; lê ez dibînim, tişteke di paş axaftina te de heye, ma tişteke li ser vê mijarê gihîştîye te?

Diya şêr got: Tiştê herî giran ew e, ku mirov bi xwe li xwe ne. Ev şaşiyeke pir mezin bû te kir; te çawa bê zanîn û bawerî ga kuşt?! Eger ne ji gotina zaniyaran li ser derhanîna nehênan ba û çi guneh û nerindî tê de heye, minê tiştê ku min bihîst ji te re bigota. Şêr got: Gelek rû û wateyên gotinên zaniyaran hene, wan gotiye jî: Gotinên zaniyaran bi gelek rûçik<sup>2</sup> û bi wateyên têvel tene şirovekirin; wan gotiye jî: Kî bi gunehên gunehkaran hestiyar bû, ji siltên veşart û li ser gunehên xwe ne hatin sezakirin, ew roja qiyametê li şûna wan seza dibe.

Ewê ku ew nehêna mezin daye te, wî daye te, da ku tu ji min re hewaldî. Gerek e tiştê ji te re got, tu ji min re xuya bikî û ji min veneşêrî. Wê jî rabû hemî tiştê ku piling jê re goti bû, hewalda, lê belê navê wî ne got, û got: Ez

---

<sup>1</sup>.Nerastî: Tiştên ne rast باطل.

<sup>2</sup>.Rûçik: Rû, rûçik.

gotina zanyaran di warê mezinahiya sezayê de zanim, zanim jî dema ku mirovek nehênan dertîne çi riswatî digihê wî! Lê ji ber ku berjewendiya te tê de heye min xwast ji te re bêjim; çinkî zaniyaran gotiye jî: Tişt di du rewşan de kavi<sup>1</sup>l dibin: Yek, derhanîna nehênê, a din jî ewê ku hêjayî sezayê be û seza nebe. Lê derhanîna nehênê ji mandina Dîmneyê xinan, ku bi qelaşî û pûştiya xwe, nerindî xiste navbera te û gê çêtir e! Eger pirsra wî bihata veşartin, ewê ji sezayê rizgar biba û mirov dê ji karên wî ên ji vê mezintir bitirsiya. Zaniyaran lêborîna ji sezakirina ziyambar û gunehkaran rewa û erk dîtine, lê lêborîna ji bo gunehkarî û kiryarên mezin rast û rewa ne dîtine.

Gava ku diya şêr gotina xwe kuta kir û karê ku Dîmne kiri bû hate naskirin, şêr dost û leşkerên xwe wesandin, ew jî derbas ba wî bûn û ferman da ku Dîmne jî wînin.

Gava ku Dîmne hat, şêr bi melûlî û xemgînî serê xwe daxisti bû û li zemînê dinihêrî; wê hîngê Dîmne li hin kesên ku li wir amade bûn vege<sup>r</sup>î û got: Çi bûya? Ji bo çi win civîne? Çi qeral xemgîn kiriye? Diya şêr lê vege<sup>r</sup>î û jê re got: Qeral xemgîn bûye, ji ber ku tu hîn bi qasî kêlîka çavkutanekê li jiyane mayî û ne hafî kuştin. Şêr ji niha û şûnde te xweş nahêle! Dîmne got: Min çi kiriye ku ez li ser werim kuştin?! Diya şêr got: Hemî vir, pûştî û fêlebaziya te di kuştina bêguneh a gê de ji şêr re aşkere bû; gerek e tu bi qasî kutaneke çavan li cîhanê nemînî! Dîmne

---

<sup>1</sup>.Kavil: Wêran, xerabkirin.

got: Yê despêkê tişteki ji yê dawiyê re ne hîşt; çinkî tê gotin: Mirovê ku xwe ji şer diparêze, berî yê ku xwe radestê dike şer digihe wî. Bila qeral, mirov û leşkerên wî nebin mîna keke xirab. Yê ku wiha gotiye rast dibêje: ((Çiqas mirov ji bo rindiyê bixebite, şer jê ve nêzîktir dibe)). Hatiye gotin jî: ((Kê dostaniya şerxwazan kir, rewşa wan zanî, ziyana ku dê bigihê wî, ji ber wê dostaniyê bi xwe ye)). Wê lomê jî nasikan xwe ji xelkê dûr xistine, tenahî<sup>1</sup> danîn pêş pêwendiya bi xelkê re û hezkirina ji karê ji bo Xwedê danîne pêş hezkirina ji cîhanê û xelkê wê. Ma kî ji bilî Xwedê xêrê bi xêrê û rindiyê bi rindiyê seza dike? Kî ji ber rindiyê ve çêseza ji xelkê xwastiye û bi dest ketiye? Çinkî pir şaş e, tu ji kesekî ji bilî Xwedê re kar bikî û çêsezayê ji xelkê bixwazî. Lê mixabin, bedsezaya ku gerek e kesên pûşt<sup>2</sup> pê seza bibin, li çêxwazan vedigere û ew pê seza dibin.

Ev tiştê jî mîna rewşa min e; ji ber ku hezkirina min ji qerêl re, çêkariya min jê re, wekî ku dilê min jî li ser wî ye, hîşt ku ez nehêna dijminê wî yê xinan jê re hewal dim. Qerêl jî ew tiştê ku jê dît û berjengên<sup>3</sup> ku min jê re gotin bi çavê serê xwe dîtin! Ma sezaya min ew e, ku ez ji ber wê rindiyê ve werim kuştin?!

Gava ku şêr ev tiştê ji Dîmne bihîst, ferman da, ku wî ji ba wî derxin. Ewê li rewşa wî binêre û baş vekolîne, da ku

---

<sup>1</sup>.Tenahî: Bi tenê.

<sup>2</sup>.Pûşt: Ne durust, li namûsa xelkê digere, durû, منافق.

<sup>3</sup>.Berjeng: Nîşanê ku diyar dibin أعراض وعلامات.

dîsa nelezîne û poşman nebe. Wê hîngê, Dîmne ji şêr re daket ser çokan, lave jê re kirin û got: Ey qeralo! Di kuştina min de melezîne, gotina şerxwazan mebîse, rewşa min vekolîne ta tu rastgotina min dibînî. Zaniyaran gotiye: Agir di keviran de hatiye veşartin, ew bi kar û lihevdanê jê derdikeve. Eger min zanî ba gunehkariyeke min di dermafê qerêl de heye, ez li ber destên wî amade ne dibûm. Ez ji qerêl hevî dikim, eger guman di rewşa min de hebe, bila baş lê binêre, ji bilî Xwedê ji kesekî netirse, yan jî ji bilî ku ez xwe bavêjim Xwedê rê ji min re namîne. Çinkî tenê ew nehênên perestvanên xwe zane û çî di dilê wan de heye jî zane.

Tiştê her durust jî ku xelk ji qerêl dixwaze, sinciyên pak, rastî û reftara rind e; lê carina rastî û nerastî dikevin nava hev û wekî hev dibin; zanyaran gotiye: Kî tiştê ku ne tê bawer kirin bawer bike, kesê ku gerek e jê bawer bike virek bibîne, ew ji rêza hişmendan derdikeve. Çî bi serê xeznedêr hat, dema ku nehêna xwe bi şaşîtî diyar bû, dê were serê wî jî. Şêr got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Wênekêş û Xeznedar Ku Nehêna Wî Eşkere Bû**

*Mînaka çawa mafdarî û nemafdarî tevlî hev û wek hev dibin, lê belê pir namîne nemafdarî têk diçe û nas dibe.*

Dîmne got: Gotine ku li bajarekî ji bajaran bazirganek hebû û xeznedarekî arziyên wî hebû. Xeznedêr xwast tişteki jî mël bidize lê nikarî; ji ber ku gava xeznedar diket

arzîxanê<sup>1</sup>, bazirgên derî li ser kilît dikir, li dema ku dixwast derkeve jî, ew vedijot<sup>2</sup> û paşê berdida.

Li kêleka cihê bazirgên jî wênekêşekî jîr hebû, dostê xeznedêr bû. Rojekê jê re got: Tu kanî bi min re bibî alîkar da ku em ji vî malî bidizin?! Got: Erê, lê rê tune ye ku ez derkevim ba te, ne jî tu derbas ba min bibî, ma çare heye? Rabû çêroka xwe û bazirgên jê re got, wênekêş got: Ma pencerek di arzîxanê de tune ye ku tu di şevreşiyê de tiştêkî tê re bidî min?! Got: Belê, lê ez ditirsim kesek me bibîne! Got: Eger şev reş bû, ezê di ber wê pencerê re bimeşim û fît bikim, yan jî şanekê bidim te, wê hîngê tuyê baxçikekê bavêjî min, ezê bibim û kesek bi me nahese! Xeznedar bi wê yekê qayîl bû û demekê wilo kirin.

Piştî wê, rojekê xeznedêr ji wênekêş re got: Ez î bi tirsim! Ma tu nikarî rêkeke din bibînî, da bê ku tu fît bikî, yan nîşanan bidî, ez bi hatina te hestewar bibim, wilo kesek jî wê bi karê min û te hestewar nebe? Ez tirsîme kesek bi me haydar bibe! Wênekêş got: Tiştê ku te xwast, li ba min çare jê re heye; kurkek li ba min heye, wêneyên tiştan û pûtan li ser in, eger ez hatim, ezê wî li xwe bikim û xwe li te bimînim. Paşê wênekêş kurk li xwe kir, ji xeznedêr ve xuya bû, baxçikek jê re avêt, wî jî ew rakir û bir.

Wan demekê wilo kir, lê hemsiyekî wênekêş hebû bi wan hestewar bû. Di navbera hemsî û berdestê<sup>3</sup> wênekêş

---

<sup>1</sup>Arzîxane: Arzêxanê, cih û xana ku arzû tê de tê danîn.

<sup>2</sup>.Vejotin: Pelmistin, pelandin تفتيش

<sup>3</sup>.Berdest: Xizmetkar, xizmetçî.

de jî dostanî hebû, wî kurk ji berdest xwast û got: Ez dixwazim wî pêşe hevaleyê xwe bikim, wî pê şa bikim û berî ku serwerê<sup>1</sup> te pê zani be, ezê vegeřnim û berdest rabû kurk dayê. Gava ku hêvar dahat, wî kurk li xwe kir û di cihê ku wênekêş tê re diçû re derbas bû. Gava ku xeznedêr ew dît, tu guman li ser ne bir, baxçikek ji mal jê re avêt, wî jî bir û vegeřî, kurk da berdestê wênekêş û wî jî danî cihê berê. Wê hîngê wênekêş ne li mal bû, gava ku vegeřî mal, wî wek hercar kurk li xwe kir û xwe li xeznedêr mand<sup>2</sup>, xeznedar li vegeřa wî mat ma, tiştêk jî li ba wî tunebû ku jê re bavêje û wênekêş destvala vegeřî.

Paşê, wan hevdu dît, wênekêş jê re got: Te çima baxçik ji min re navêt? Got: Ma ne tu berî wê di wir re derbas bûyî û min ji te re avêt. Wê hîngê, wênekêş vegeřî mal, deng li berdestê xwe kir û ew bi kuştinê gef<sup>3</sup> kir ku rastiyê hewal nede, wî rabû jê re hewalda û wênekêş rabû kurk şewitand!

Min ev mînaka ji te re anî, da ku qeral li ser gumanê di rewşa min de nelezîne. Ez vê dibêjim, ne ku ji mirinê ditirsim, mirin çiqas pîs e jî, lê dîsa rizgarî jê tuneye û her zindîyek wê bimire. Zaniyaran gotiye: Kê şaşiyek an gunehek kir û paşê pêwîstî hebû ku xwe radestî mirinê bike, Xwedê lê dibore û li pişdawayê ji êşa êgir rizgar dike.

---

<sup>1</sup>.Serwer: Mirovê payebilind سید.

<sup>2</sup>.Lêmandin: Xwepêşêkirin, xwe lê mand, hîşt ku wî bibîne..

<sup>3</sup>.Gef: Gefgur تهديد.

Eger sed henasa min heba û min zanî biwa xweşiya qerêl di têkbirina wan hemiyan de ye, ezê ji wê yekê re kêfxweş biwama! Wê çaxê leşkerekî got: Ew wiha dibêje, ne ji ber ku ji qerêl hez dike, lê ji bo ku henasa xwe rizgar bike û bihaneyê jê re bibîne. Dîmne got: Mala te bişewite! Ma eger ez bihaneyê ji xwe re bixwazim şerm e? Ma kesek ji henasa mirov ji mirov nêzîktir heye?! Eger mirov lêborînê ji wê re nexwaze, ma wê ji kê re bixwaze?! Dexsî û hêrsa ku te nikarî di xwe de bigirta ji te derket!? Kesê ku ew tiştê ji te bihîst, nas kir ku tu xêrê ji kesekî re naxwazî û dijminê henasa xwe yî! Ma tiştê her li pêş çî ye? Ewê mîna te ne hêja ye bi dewêr re jî bijî, ne bi qerêl re û hîn li ber deriyê wî be jî! Dema ku Dîmne ew bersiva dayê, ew melûl, xemgîn bû û bi fedîbûn derket.

Lê diya şêr ji Dîmne re got: Ey kulehcî<sup>1</sup>! Ez li ser bêfedîbûn, zimandirêjî û lezbûna bersiva te ji axîver re mat mam. Dîmne got: Ji ber ku tu bi çavekî tenê li min dinêrî û bi guhekî tenê ji min dibîsî. Bextê min ê xirab jî her tiştê ji ser min hilaniye û li ba qerêl li ser min bi nerindî hatiye dengkirin. Ez dibînim her tiştê durûyî bûye û rastiyê nabêjin, ewên ku li ber deriyê qerêl in bi sivikî li wî dinêrin, ew jî wan pir bi qîmet dike; ji ber xweşiya ku ew tê de dijîn, nizanin kengî gerek e deng bikin û kengî bêdeng bibin.

---

<sup>1</sup>.Kulehcî: Pêlanger, hîlebaz.



Diya şêr got: Win li vî têrîyî<sup>1</sup> nanêrin -li gel gunehê wî yê mezin- çawa dike xwe bêşûc û bêguneh derxe?! Dîmne got: Yên ku karên ne karên xwe bin dikin, ne hêjayî tiştêkî ne, ew mîna yê ku ariya sergîn<sup>2</sup> datîne ciyekî ku gerek e qûm<sup>3</sup> lê were danîn, mîna mirovê kincên jinan li xwe dike û jina kincên mêran li xwe dike, mîna mêvanê ku dibêje: Ez xwedanê malê me û di nava civakê de tiştê ku jê ne tê xwastin dibêje. Ê nezan, ewê ku kar û rewşa xelkê baş nas nake û nikare şer ji ser xwe bide alî.

Diya şêr got: Ey bêbexto! Tu bawer dikî ku bi vê gotina te, tuyê kani bî qerêl bixapînî da ku te zîndan neke? Dîmne got: Bêbext ew e, yê ku dijmin ji qelaşiya wî xelas nabe, eger ot li dijminê xwe anî jî, wî bêguneh dikuje. Diya şêr got: Ey bêbextê virek! Tu guman dikî ku tuyê ji encama derewa xwe rizgar bibî? Gotina te jî li gora gunehê te wê sûdê li te bike?!

Dîmne got: Virek, yê ku tiştê ne bûye dibêje û tiştên ne hatine gotin û kirin hewaldide; lê gotina min rast e, qeral jî zane, eger ez virek bûma, dilê min ne digirt ez van gotinan li nav destê wî bikim; çinkî hatiye gotin: Ji mirovê bêguneh wêrektir tuneye, ji xwedanê maf zimandirêjtir jî tuneye. Diya şêr ji civatê re got: Zanyarên ku di nav we de ne, kanin li gor van gotinan rewşa wî nas bikin û rabû û

---

<sup>1</sup>.Têrî: Zîrekê qelaş û ne hêmin..

<sup>2</sup>.Ariya sergîn: Ziblê hişkirî, gava ku dişewite, arî ji ber dimîne. Di pirtûkê de jî bi vî navî hati bû.

<sup>3</sup>.Qûm: Kevirên pir hûr ku li ber kendavan kom dibin.

derket. Şêr jî Dîmne radestî dadwer kir, wî jî ferman da, ku wî zîndan bikin. Herweha, tokek xistin stuyê Dîmne û birin zîndanê.

Li nivê şevê, Kelîle pê agahdar bû, ku Dîmne di zîndanê de ye. Ew rabû û bi dizî çû ba wî. Gava ku dît ew çawa di qeydên teng û cihê ne baş de ye, dagirî û jê re got: Tu bi karê xapandin û xinaniyê gihîştî vê rewşê, te şîret ne girtin; lê ji ber ku ez ji te re dilsoz im, ji bilî ku ez te agahdar û şîret bikim û xwe bigihînim te, tu çare di destê min de tunebû. Çinkî ji her ciyekî re gotinek heye û ji her tiştekî re derfetek heye. Eger min di şîretkirina te de kêmanî bikira, ezê niha di gunehê te de bibûma hevpar. Lê pozbilindiyê tu xapandî û nêrîn û hişê te têk birin. Min ji te re gelek nimûne tanîn û gotinên zanyaran digotin; lê belê zaniyaran gotiye: Bêbext berî çaxa xwe dimire. Dîmne got: Min rastiya gotina te nas kir, lê zanyaran gotiye jî: Eger ji ber gunehê be ji êşgihandinê<sup>1</sup> metirse; eger tu ji ber gunekariya xwe ve di vê cîhanê de bêşî, çêtir e ku tu li roja dawîrojê ji ber gunehê xwe ve êşekê bibînî. Kelîle got: Ez ji gotina te têgihîştim, lê gunehê te mezin e, sezaya şêr jî ji te re mezin û bi êş e.

Li wê demê, li nêzkî wan şîpek<sup>2</sup> di zîndanê de hebû, gotina wan dibihîst lê wan ew ne dîtî bû. Wî loma Kelîle ji Dîmne li ser bedkariya wî nas kir, çi jî kiriye bihîst, çawa Dîmne li bedkarî û gunehê xwe yê mezin mikûr hat jî nas

---

<sup>1</sup>.Êşgihandin: Êşeke bigihê, ezab.

<sup>2</sup>.Şîp: فهد

kir. Wî axaftina wan li ba xwe hîşt, da eger jê hate pirsîn li ser bibe nêrevan. Paşê Kelîle derket û çû mala xwe.

Roja din, li dema sibê, diya şêr derbas ba şêr bû û jê re got: Ey serwerê lawiran! Ez tirsîme ku tiştê te diho got tu ji bîr bikî, te ew ji wê demê re goti be û tenê pê Xwedayê xwe razî kiri be. Zanyaran gotiye: Gerek e mirov ji durustkariya xwe dereng nemîne û ji ber gunehê gunekaran ve berevaniyê neke! Gava ku şêr gotina diya xwe bihîst, ferman da, da ku piling amade bibe, ew jî dadwer bû, û gava amade bû, ji wî û ji alîkarê wî yê dadmend re got: Li cihê dadkirinê rûnin, gazî leşkeran bikin, çî biçûk û çî mezin, bila amade bibin, da ku li rewşa Dîmne binêrin, pirsî wî vekolin, gunehê wî nas bikin, gotin û bihaneyên wî di pirtûkên dadê de biçespînin û roj bi roj ji min re hildin.

Gava ku piling û alîkarê wî yê dadmend, ew jî apê şêr bû, ew gotina bihîstin, gotin: Guhdarkirin û erêkirin ji fermana qerêl re; ew rabûn ji ba wî derketin û li gora fermana wî kirin. Ta wê hîngê sê kat ji dema rûniştinê derbas bûn, dadwer ferman da, ku Dîmne wînin, ew anîn û li ber destê wan sekinî, hemî kes jî amade bûn. Gava ku dadgeh amade bû, serokê civatê bi dengê bilind bang kir: Ey kesên civatê! We nas kir, jerkî ku serwerê lawiran Şetrepe kuştiye, henasa wî westiya ye, pir melûl û xemgîn bûye, ew dibîne ku wî Şetrepe bê sûc kuştiye û ew tiştê jî li ser derewe û fisûkiya Dîmne bû. Ev dadgeha hatiye lidarxistin, da ku encûmena dadgehê rûne û rewşa Dîmne

vekole. Kî ji we tiştêkî li derbara rewşa wî zane, çi rind û çi xerap, bila hewal bide, li hember civatê û amadeyan bêje, da ku dadgeh li gora wê karê xwe bike. Win zanin jî, lezbûn ne ji hişmendiyê ye, alîkariya dostan li ser şaşiyê jî kêmanî ye; eger Dîmne hêjayî kuştinê ye, gerek e were naskirin û çespandin.

Wê hîngê dadwer got: Gelî civatê, gotina serwerê xwe bibîsin, tiştê ku win li derbara Dîmne zanin vemeşêrin; da ku win tiştan li ser wî nepeçinin, sê sinciyan ji bîr mekin: **Yek**, ew jî a giringtir e, win guneh û kiryara wî hindik û biçûk nebînin, çinkî gunehê her mezin kuştina kesekî milahîm<sup>1</sup> û bêguneh bi derew û bêbextiyê ye; kî tiştêkî li ser pirsê ew virekê ku bi derew û bêbextiyê kesekî bêguneh gunebar kir, veşêre, ew jî di guneh û sezayê de hevalê wî ye. A **duyem**, eger gunekar li gunehê xwe mikur hat, dê ji wî re çêtir be, wê ji qerêl û leşkerên wî re jî guncavtir<sup>2</sup> be ku lê biborin û wî berdîn. A **sêyem**, xatirê kesên fisûk û bedkar nizani bin, dev ji wan berdîn û têkilî û dostaniya bi wan re bibirin.

Eger kesek tiştêkî li ser pirsê vî xapînokî zane, bila li hember kesên amade deng bike, da ku ew li ser wî bibe bihane; hatiye gotin: Kî nêrevaniya kuştîyekî veşêre, li roja pişdawayê bi lîwaneke<sup>3</sup> ji êgir tê lîwankirin; gerek e her kesek çî zane, bêje.

---

<sup>1</sup>.Milahîm: Bê guneh û dilpak.

<sup>2</sup>.Guncav: Lêhatî مناسب بشكل أكثر

<sup>3</sup>.Lîwan: Dixin devê hepan, da ku pê kanibin.

Gava ku civatê gotina wî bihîst, gotin hatin birîn. Lê Dîmne got: Çi win kerûlal<sup>1</sup> kirin? Tiştê ku win zanin bêjin; lê bila win zani bin, ku ji her şorekê re bersivek heye. Zaniyaran gotiye: Kî li ser tiştê ku ne dîtiye bibe nêrevan, tiştê ku nizane jî bêje, çi gihîşte bijîşkê ku ji tiştê nizane re got. Ez zanim! Wê bigihê wî jî. Civatê got, ma ew çawa bû?

### • Mînaka Qerêl, Nezan û Bijîşk

*Mînaka ewê nizane û dibêje ez zanim û pê dike û li dawiyê ziyar li wî vedigere.*

Dîmne got: Hatiye gotin, ku li bajarekî ji bajaran, bijîşkekî diltenik û zana hebû, li ser destê wî dermankirinên baş dihatin kirin. Lê ew bijîşka mezin bû û çavên wî kûrik bûn! Keçeke qeralê wî bajarî jî hebû, wî ew dabû kurekî birayekî xwe; ew keça tûşî<sup>2</sup> êşekên ku bi jinên ducanî re peyda dibin, bû. Wan çû ew bijîşka anî, û gava ku ew hat, li ser êşekên wê û çî vê re çêdibe ji cariyê pirs kir, wê jî jê re hewalda, wî derd û dermanê wê nas kir û got: Eger çavên min durust biwana, minê li gor zanîna xwe têkel jê re bicivandana, lê ez baweriyê bi kesekî ji bilî xwe nakim ku kani be wilo bike.

Mirovekî arode jî li bajêr hebû, gava ku ew nûçe bihîst, hate ba wan û got: Ez bi taybetiyên dermanên têkel<sup>3</sup> û

---

<sup>1</sup>.Kerûlal: Bêdeng û bihîstin.

<sup>2</sup>.Tûşîbûn: Rastêhatin تعرض لاصابة

<sup>3</sup>.Têkel: Tevlîhev خليط

yeksan<sup>1</sup> jî zanim. Wê hîngê, Qerêl ferman da, ku têkeve kewara dermanan û pêdviya xwe ji têkelên dermên bibe; gava ku ew nezana kete kewarê, derman li pêşiyê hatin danîn, lê wî nizanî ew çi ne, jêdera wan çi ye. Ji nava tiştên ku rakir, baxçikeke dermanê ku yekser mirov dikuşt tê de hebû, rabû ew jî tevla dermanan kir! Gava ku derman têkelhev kirin û jê da jineke cariyê<sup>2</sup>, ew di cih de ket û mir. Gava qerêl ew tişt bihîst, wî ew nezana wesand, ji wî dermanî bi wî jî da vexwarin û ew jî di cih de ket û mir!

Min ev nimûna ji were anî, da win zani bin, çi bi kesê ku li ser gumanê bêje û bike, ji sînore xwe derkeve û derbas bike, tiştê gihîşt ewê nezan, wê bigihê wî jî, paşê dê loman ji xwe bike. Zaniyaran gotiye jî: Belkî axêver<sup>3</sup> jî sezaya gotina xwe bibîne, gotin jî li ber destê we ye; herweha li xwe binêrin û paşê deng bikin!

Serwerê berazan, ji ber delalî û pozbilindiya xwe û payedariya wî li ba qerêl, deng kir û got: Zaniyarên xwedî rûmet! Win gotina min bibihîsin û bi hişê xwe têbigihên; zaniyaran li derbara durustkaran gotiye: Ew bi pergalên xwe tîn nasîn, win jî xwedanên zanîne ne, win bi şêweyên xwe ên ciwan ku Xwedê win pê çêkirine, xêra wî ya ku bi ser we de tê, hûn kesên durustkar bi pergal û benzên<sup>4</sup> wan nas dikin. Tiştê mezin bi tiştên biçûk nas dikin. Gelek tişt

---

<sup>1</sup>.Yeksan: Tek مفرد.

<sup>2</sup>.Jina cariyê: Jina ku bi peran dihat kirîn û firotin.

<sup>3</sup>.Axêver: Yê ku diaxive.

<sup>4</sup>.Benz: Reng û dîmena rû.

li vir hene xinaniya Dîmne û şerxwaziya wî destnîşan dikin. Eger win ji ser ve li govdê wî binêrin, winê wan tiştan nas bikin û pê bawer bibin.

Dadwer bi serwerê berazan re got: Min nas kir, kesên li civatê jî nas kirin, ku tu şanên bedkariyê di govde û wêneyan de nas dikî; tiştê ku tu dibêjî ji me re şirove bike, tiştê tu di pergala vî teresî<sup>1</sup> de dibînin jî ji me re xuya bike.

Serwerê berazan rabû, Dîmne pîs kir û got: Zaniyaran nivîsandiye û hewal daye, ku kî çavê xwe yê çepê ji yê rastê biçûktir be û dilîze, pozê wî bi aliyê rastê de xwar be, ew teresekî çepel<sup>2</sup>, xinan û jirêderketî<sup>3</sup> ye. Gava ku Dîmne ew tişt a bihîst, got: We nas kir wî çi got. Win li vir bi gotinan dikin û zanîne berdidin, bibihîsin ezê çi ji we re bêjim, win jî bi hişê xwe bipîvin.

Eger ew dibêje, nîşanên ku di govdê min de hene, ji bo tiştê ku ez pê tême gunehbarkirin şan û berjeng in, yanê tê wê wateyê, şanşûretên<sup>4</sup> ku di govdê min de hene, ez neçar kirime wî gunehê bikim û tiştê ku min kir tu gunehkariya min tê de tuneye, gotina wî li ser karyara min jî, bihanehiya bêgunehtiya min diçespîne. Paşê li serwerê berazan vegeerî û got: Kêmhişiya te ji kesên amade re xuya bû. Mînaka di vî warî de, mînaka ew mêrê ku ji jina xwe

---

<sup>1</sup> .Teres: Têrî وغد

<sup>2</sup> .Çepel: Pis, genî فدر

<sup>3</sup> .Jirêderketî: Facir, fasiq.

<sup>4</sup> .Şanşûret: Şan û nîşan.

re got: Berî li tazîtiya xwe binêre, paşê li tazîtiya bilî xwe binêre. Jê re gotin: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Çotkar Û Her Du Jinên Wî**

Dîmne got: Dibêjin, bajarek kete ber hêrişa dijminekî, wî xelkê wî kuşt, jin birin, talanî kir û vegeerî welatê xwe! Lêhat jî mirovekî cotkar û du jinên wî bûn par û dîlê leşkerekî. Wî leşkerî jî ji aliyê cilan û xwarinê de pir kêmanî bi wan re dikir. Rojekê cotkar û her du jinên wî, çûn êzingan ji leşker re bikin, her sê jî tazî bûn; lê jinekê li ser rêkê paçek dît, xwe pê sitirand û ji mêrê xwe re got: Tu vê pîsê nabînî, ew çima fedî nake û xwe naporêze?! Mêrê wê got: Eger te li xwe binêriya û bidîta ku govdê te jî tazî ye, te bi tiştê ku di te de jî heye hevala xwe kêm ne didît!

Pirsa te jî seyr e, ey çepelê xwedî nîşanên beloq<sup>1</sup> û pîs. Paşê hîn seyrbûn di wêrekiya te de ye, çinkî digel genîtû û pîsîtiyên di govdê te de, kêmaniya di henasa te de ku tu û bilî te jî pê zane, tu hîn ji xwarina qerêl jî dixwî.

Tu li ser canpakiya govdê bêkêmanî deng dikî?! Ne ez tenê kêmaniya te zanim, hemî kesên ku amade ne wê yekê nas dikin. Lê dostaniya di navbera min û te de ne dihîşt ez wê xuya bikim. Lê ji ber ku te di rûyê min de vir û bihtanî di min dan, ez gumanbar kirim, dijîtiya min kir, bê ku tu zani bî jî te li nav amadeyan li ser min deng kir, ezê jî tenê hin tiştên ku ji kêmaniyên te zanim û civak jî zane, xuya bikim. Ji erka kesê ku te rind nas dike ye, ku nehêle qeral

---

<sup>1</sup>.Beloq: Aşkere, diyar.



te ji bo amadekirina xwarina xwe bikar bîne. Ta eger tu erkdar kirin tu di çandiniyê de jî bixebitî, tuyê dîsa tê de bi ser nekevî! A çêtir tu nêzîk karekî ji karan nebî, tu nebî çermkar<sup>1</sup> û ne jî kasan lêxî, lê hîn çawa xizmeta qerêl?! Serwerê berazan got: Tu vê gotinê bi min re dikî û tu min wiha dinasînî?! Dîmne got: Belê, min rastî got û li ser te got, ey kulekê lingşikestî, qalçeçul, lingxwar, zikperçifî, lêvqelişî, xwedî dîmen û hewaldanên pîs! Gava ku Dîmne wilo got, benzê serwerê berazan hat guhertin, şerm û fedî kir, ziman li hev gerî, li xwe sar û kerûlal bû û dagirî.

Dema ku Dîmne girîn û dilşikestiya wî dît, got: Eger qeral qirêjî û kêmaniyên te nas bike, te ji xwarina xwe dûr bixe, nehêle tu xizmeta wî bikî, te ji civata xwe jî dûr bixe, gerek e girîna te hîn bêtir bibe. Paşê, çeçelek li ba qerêl bû, qerêl ew taqe kiri bû, dilsozî û rastgoyî tê de dîtî bû, kiri bû xizmeta xwe, ew stubar kiri bû jî ku tiştê di navbera wan de dibe tomar bike û wî pê agahdar bike; ew rabû derbas ba şêr bû û tevahiya axaftinê jê re hewalda. Wê hîngê, şêr rabû serwerê berazan ji kar derxist û ferman da, ku careke din derbas ba wî nebe, rûyê wî nebîne û ferman da jî ku Dîmne vegere zîndanê. Ta wê hîngê piraniya rojê çû bû, her tiştê ku bû û hate gotin jî, hate nivîsandin, bi mora piling hate morkirin û her kes vegeirî mala xwe.

---

<sup>1</sup>.Çermkar: Ewê ku di çerm û eyranên dewêr de kar dike.

Paşê, Kelîle ji dilşewatiya li ser birayê xwe Dîmne, ji tîrsa ku bi egera<sup>1</sup> wî tiştê bigihê wî jî, nexweş bû û mir. Wê hîngê, çeçelê bi navê Rozbe, di navbera wî û Kelîle de dostanî û biratî hebû, li ba şêr jî navser<sup>2</sup> bû, jê re camêr bû jî, çû ba Dîmne û nûçeya mirina Kelîle jê re hewal da, wî jî dagirî, xemgîn bû û got: Piştî jidestana birayê dilpak, ezê ji vê cîhanê çî bikim?! Ax ji şewatiya dil! Eger belak hate serê mirov, şer ji her aliyekî de bi ser de tê, xem û qisawet jî ji her aliyekî de digihênê. Lê ez spasiya Xwedê dikim, wekî ku ji nava mervên min, birayekî mîna te ji min re hîşt; min bi rindiya Xwedê û tiştê ku daye min bawer kir, wekî ku te guhdaye min û li min miqyat bûyî. Ez zanim ku di vê rewşa ku ez tê de, tu hevî û piştî min î. Ez dixwazim, ji kerema xwe, tu herî filan derê, diravên<sup>3</sup> ku bi ked, debar û daxwaza Xwedê min û birayê xwe civandi bûn derîni û ji min re wîni.

Çeçel tiştê ku Dîmne jê xwast kir û gava ku pere danîn ber destên wî, hinek jê dane wî û jê re got: Tu ji bilî xwe bêtir kanî têkevî ba şêr û derkevî, hevîdar im tu xwe ji pîrsa min re vala bikî, li min miqyat bî, tiştê ku li ba şêr li ser min tê gotin bibîsî, tiştê ku di navbera min û neyarên min de dibe û radibe ba şêr, çî ji hêla diya şêr de li dermafê min tê gotin, şêr di çî de li guhdariya wê dike, û di çî de bi ya wê nake, tu hemî hilîni û nas bikî. Wê hîngê,

---

<sup>1</sup>.Eger: Sedem, sebeb..

<sup>2</sup>.Navser: Naskirî, gernas.

<sup>3</sup>. Dirav: Pere.

çeqel ew perên ku Dîmne danê birin û li ser wî sozî ji ba wî derket û çû.

Şêr li siberoja din zû hat, li cihê xwe rûnişt. Piştî du kat ji rojê derbas bûn, dostên wî destûra derbasbûna ba wî xwastin; wî jî rê da wan, derbas ba wî bûn û nivîsar danîn ber destên wî. Dema ku wî gotina wan û ya Dîmne bihîst, gazî diya xwe kir û jê re xwend. Dema ku diya wî tiştê di nivîsarê de bihîst, bi dengê bilind bang kir û jê re got: Eger min di gotinê de giran kir, loman ji min meke; çinkî tu ziyana xwe ji sûda xwe dernaxî! Tiştê min ne xwast tu bibîst ev bû? Ev e gotina gunehkarê ku nerindî û pîstî bi me kiriye? Paşê bi xeyd derket, ew tişt jî hemî li ber çav û guhdariya çeqelê ku Dîmne ji xwe re kiri bû bira dibû. Wê hîngê çeqel jî bi lez li dû wê derket, ta gihîşt ba Dîmne û axaftin jê re hewalda.

Lê hîn ew li ba wî bû, şandeyê şêr hat û Dîmne bi xwe re bir civîna dadwer. Gava ku li ber destê dadwer amade bû, serwerê encûmenê dest pê kir û got: Ey Dîmne! Dilsozê rastgo xebera te gihande me. Gerek e em jî ji vê bêtir li rewşa te nenêrin. Çinkî zaniyaran gotiye: Xwedê cîhan ji bo pişdawayî kiriyê sedem û rastî, ji ber ku ew warê şande û pêxemberên ku xêrê destnîşan dikin, riya bihuştê şanî didin û doza nasîna Xwedê dikin e. Rewşa te jî li ba me mêlag<sup>1</sup> bûye. Kesê ku em pê bawer dikin ji me re hewal da, me jî bi gotina wî bawer kir; û digel ku ew li

---

<sup>1</sup>.Mêlag: Çespandin, teqez تەگێ

ba me diyar e jî, lê serwerê me, em ferman kirin, ku em li rewşa te vegerin û dîsa li pirsar te temaşe bikin.

Dîmne got: Ey dadwer, ez dibînim tu hîn di dadweriyê de hînî karê dadmendiyê ne bûyî. Çinkî ne ji dadmendiyê qeralan e, ku setembaran û ên bêguneh bidin ber dadwerekî ne dadmend; lê li bervajî wê, gerek e dadwer bi xwe di ber barê setembaran<sup>1</sup> de rabe û berevaniyê di ber mafên wan de bike. Tu çawa dibînî û dibêjî ku gerek e ez werim kuştin û ez berevaniya xwe nedim?! Tu li gora daxwaza dilê xwe dilezînî û hîn sê roj jî di ser darizandinê re derbas ne bûne. Lê xuya ye ewê ku wiha gotiye, rast gotiye: ((Ewê jê re bûye adet ku rindiyê neke, eger ziyar jî jê peyda bibe pê hêsan e)).

Dadwer got: Em di pirtûkên pêşiyar de dibînin: Gerek e dadwerê dadmend karê kesê çêxwaz û yê bedxwaz nas bike, da ku çêxwaz ji bo çêxwaziya wî, bedxwaz jî li ser bedxwaziya wî seza bike. Eger wilo kir, çêxwaz wê li çêxwaziyê miqyat bin, bedxwaz jî dê xwe ji bedxwaziyê biparêzin. Ey Dîmne, gerek e tu li rewşa ku tu ketiyê binêrî, li gunehê xwe mikur werî, li ser erê û tobe bikî; eger mirov li cîhanê seza bibe, ji sezakirina pişdawayê çêtir e.

Dîmne bersiv da û got: Dadwerên durustkar, ne ji bo payedarar û ne ji bo xelkê sade biryarê li ser gumanê nastîne û pê kar nakin, çinkî ew zane guman ji rastiye kêr

---

<sup>1</sup> .Setembar: Mezlûm.

nake. Eger we guman kiri be, ku ez di tiştê min kiriye de gunehkar im, ez ji we çêtir bi henasa xwe zanim; naskirina min jî ji henasa min re rastî ye û guman lê tune, lê naskirina we ji min re gumana herî mezin e. Tiştê ku pirsar min li ba we pîs kiriye, ew e ku min derew li bilî xwe kiriye. Ma bihaneya we dê çi be eger ez niha rabim bi xwe derewan li henasa xwe bikim û wê radestî lêdan û kuştinê bikim. Digel ez zanim jî ez ji tewana ku pê hatime tometkirin<sup>1</sup> bêguneh im? Parastina henasa min li ba min erkeke pêwîst e. Eger ez wî tiştî biçûk bibînim, ne ola min û ne qîreta min wê yekê gotir<sup>2</sup> dike, ne jî ji mafê min e ku ez bikim. Ma ezê çawa karekî wiha bi henasa xwe bikim? Dadwero! Vê gotinê meke; eger ew şîret be, te di cihê wê de bi kar naniye, eger dibare be, ew dibara her pîs -wekî ku ez dibînim û nas dikim- û gerek e ji xwediyê dibaran ne tê, digel ku hîn xapandin û qelaşî jî ne ji karên dadwerên durustkar û ne ji karê waliyên bawerdar in.

Bila tu zani bî, ku nezan û şerxwaz gotina te ji xwe re dikin destûr û pê dikin; çinkî ji taybetiya dadgehê ye, kesên li ser rastiye bin, bi rastiya wê bikin, û kesên ku li ser şaşî, nerastî û ji Xweda natirsin jî pê bigirin. Ey dadwer! Ez ji gotina te bi tirs im ku kêmanî û belayên mezin jê peyda bibin. Pirsgirêk û bela mezin, ne ji ber ku tu li ba qerêl, leşker, dostên qerêl û xelkê wî xwedî nêrîna rast î, dadweriya te cihê baweriyê ye, di hişmendî,

---

<sup>1</sup>.Tometkirin: Gunehbarkirin.

<sup>2</sup>.Gotir: استيعاب

destpakî û rindiya xwe de jî cihê pesnê yê! Lê bela mezin ew e, ku te çawa ew sincî di pîrsa min de ji bîr kirine?! Ma te ji zaniyaran ne bihîstiye, dema gotine: Ewê ji tiştê nizane re dibêje ez zanim, ji tiştê ne dîtiye re jî dibêje min dît; ew tiştê gihîşt bazyar, dema ku jina serwerê xwe gunehkarî kir, dê bigihe wî jî? Dadwer got: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Bazyar û Jina Merzebên**

*Mînaka ewê ku dibare kir, kûr ne ramî, tê de bi ser ne ket û encama wê jî li wî vegeirî.*

Dîmne got: Dibêjin, li bajarekî ji van bajaran mirovekî navdar ji Merzebanan (serwerê farisan) hebû û jineke wî ye sibehî û dawpak<sup>1</sup> jî hebû. Bazzarekî<sup>2</sup> wî jî hebû di tîmarkirin û perwerdekirina bazan de jîr û şareza bû û li ba mirov wek hogirekî wî bû, lewre jî, wî ew kiri bû nav mal û malbata xwe. Rojekê lêhat û şoreke bazyêr li jina mirov ket, jin jî jê xeyidî û ew riswa kir. Bazyar jê bi hêrs bû û karê xwe kir ku nerindiyekê bi wê bike! Rojekê wekî her car ew derket nêçîrê, du çêlikên tilûra Tûtî girtin, birin mal û tîmar kirin. Dema ku mezin bûn, wî ew ji hev kirin, heryek xiste rekehekê<sup>3</sup>, yek fêr kir da bêje: Min gumanek di xatûna xwe de dît, ê din jî fêr kir ku bêje: Lê ya min ez

---

1. Dawpak: `Efif, bi namûs.

2. Bazyar: Tîmarkerê tilûran (balindeyan).

3. Rekeh: Qefes.

tişteki nabêjim! Paşê ew li ser wan şoran perwerde kirin, ta baş têgihîştin û di şeş mehan de baş hilanîn<sup>1</sup>.

Gava wî tiştê ku ji wan dixwast bi dest xist, rabû ew ji mamosteyê xwe re birin, wan li ba wî deng kir, ew jî pir bi wan şa, seyr û kêfxwaş bû, lê belê wî nizanî wan çî digot; çinkî bazyêr ew bi zimanê Belxî<sup>2</sup> fêr kiri bûn. Herweha merzeban pir bi wan şa bû, payedariya bazyêr li ba wî bilintir bû û ji jina xwe xwast, da ku haya xwe ji wan hebe, wan biparêze, jinê jî wekî wî xwast, kir.

Piştî demekê, lêhat û mirovin ji gernasên Belxê hatin ba xwediyê malê û lê bûne mêvan. Ew li xwarin û vexwarina wan pir miqyat bû, pir cure ji meywe û tiştên xweş anîn û ji wan re danî. Mêvan li ser xwarinê amade bûn û têr xwarin. Gava ku ew ji ser xwarinê rabûn û dest bi axaftinê kirin, merzebên ji bazyêr xwast wan her du tûtiyan wîne. Gava ew anîn û li pêş wan danîn, tûtiyan<sup>3</sup> bi tiştê ku fêr bû bûn bang kirin. Wê hîngê, mêvan têgihîştin ew çî dibêjin, wan li hev nêrî, ji fedîbûnê serên xwe daxistin û çav di hev de qurîçandin! Mirov ji wan re got: Ez nizanim ew çî dibêjin, lê ez wê yekê ji wan xweş dibînim.

Wî ji wan pirs kir, da ku zani be çî dibêjin, lê wan tiştê ku digotin hewal ne dan. Wî pir ji wan xwast û pirs a xwe dubare kir da ku zani be çî dibêjin. Wê hîngê wan got, ew

---

<sup>1</sup> .Hilanîn: Têgihîştin.

<sup>2</sup> Welatê Belxê: Niha li nav sînorên Afganistanê ye, li destpêkê Zeredştî li wir belv bû, Zereşt jî li wir mir.

<sup>3</sup> .Tûtî: Tilûra bebexan.

hane û hane<sup>1</sup> dibêjin, û ne ji payedariya me ye jî, ku em li maleke nerindî tê de dibe xwarinê bixwin! Gava ku ew tişta gotin, mirov ji wan xwast ji bilî wan şoran bi zimanê Belxî jî bêjin, wan rabû wilo kir, lê nas kirin, ku tûtî ji bilî tiştê ku gotin tişteki din nizanin; bi wî rengî, dawpakiya jinê ji wan û ji civatê re xuya bû, hat naskirin ji tiştê ku li ser hate gotin jî dûr e û vira bazyêr jî hate xuyakirin.

Wê hîngê, xwediyê malê ferman da, ku bazyar derbas ba wan bibe, ew derbas bû û bazekî gewrbelek li ser destê wî bû, wê gavê, jinê ji hundir malê de bang kir û got: Ey dijminê henasa xwe, ma rast mîna ku tu dibêjî te ez dîtîme û te çûye tûtî pê fêrkirine?! Got: Erê wek ew dibêjin min tu dîtî! Wê hîngê baz xwe avêt ser rûyê wî û bi pepilên xwe çavekî wî rijandin! Jinê bang kir û got: Gerek bû wilo biba; ew bedsezaya Xwedê ye li ser ew nêrevaniya ku wan çavên te ne dîtîne!

Ey dadwer! Min ev mînaka ji te re anî, da tu nerindiya encama nêrevaniya virek li cîhanê û li pişdawayê jî zani bî. Gava dadwer gotinên Dîmne bihîstin, wî yekser gihandine şêr, şêr jî li wan nêrî, gazî diya xwe kir û jê re hewalda. Piştî ku wê jî li gotina Dîmne nêrî, got: Tirsî min ew e, ku Dîmne bi qelaşî û hişdariya xwe te bixapîne û te bikuje, yan jî rewşa te xirab bike; ew tirsî ji gunehê ku berê kirine mezintir e, tu zanî jî ku wî dostê te bê guneh kuşt.

Gotina wê cihê xwe li ba şêr girt û ji diya xwe re got: Ewê ku li ser Dîmne ji te re got û çî got ji min re hewal

---

<sup>1</sup> . Hane, hanekî: Wiha, wilo..



bide, da ji min re bibe bihane ku ez wî bikujim. Wê got: Ez hez nakim nehêneke ku dane min derînim, eger tiştê zanyaran li ser belavkirina nehênê gotiye were bîra min, min pê ne kiri be û di ser re gav kiri be, dilê min wê bi kuştina Dîmne xweş nebe. Ez ji ewê ku ji min re got dixwazim min ji wê yekê biborîne, bila ew bixwe hewal bide û tiştê ku bihîsti bû bêje.

Paşê diya şêr derket, wesand dû piling û jê re got: Gerek e kesê mîna wî nêrevaniyê veneşêre. Ji bo pêkanîna mafdariyê alîkariya şêr bike, ligel ku ew ji bo alîkariya setembaran erk e û nêrevaniya wî ji bo jîyan û mirinê ye. Zanyaran gotiye: Kê nêrevaniya xwe ji bo mirina miriyekî veşart, ew nêrevaniya xwe li roja qiyametê şaş dike. Wilo ew pê de ket, ta derbas ba şêr kir û rastiya lixwenana Dîmne ya ku bihîsti bû jê re hewal da. Dema ku piling nêrevaniya xwe da, ew şîpê zîndankirî ku lixwenana Dîmne bihîsti bû, wî jî xeber ji şêr re şand û got: Nêrevaniyek li ba min jî heye. Rabûn ew jî anîn, wî jî lêmikurhatina ku ji Dîmne bihîsti bû hewal da û nêrevaniya xwe da.

Şêr ji wan re got: Çi hîşt win nêrevaniya xwe veşêrin û nebêjin, nemaze piştî we rewşa me dît û xerîkbûna<sup>1</sup> me bi rewşa Dîmne nas kir? Heryekî ji wan got: Wekî em zanin, nêrevaniya yekî bi tenê qebûl nabe, me jî ne xwast me berê darizandinê biguhêrta, me got ta yek nêrevaniya xwe

---

<sup>1</sup> .Xerîkbûn: Mijûlbûn, pê mijûl bû.

bide, ê din jî wê were û nêrevaniya xwe bide. Şêr gotina wan pejirand û ferman da, ku Dîmne di girtîgehê de were kuştin û li nav xelkê were xaçkirin<sup>1</sup>. Wê hîngê, bangdêr<sup>2</sup> di nava xelkê de bang kir û got: Ev e sezaya ewê bi vir û vûtan têkeve navbera qerêl û leşker û berdevkên wî.

Kî li vî tiştî binêre, bila tê bigihe, ku kî bixwaze bi xinanî û qelaşiyê zîyanê bigihîne bilî xwe da ku sûdekê jê wergire, ewê li ser xinanî û qelaşîya xwe were sezakirin!

---

<sup>1</sup>.Xaçkirin: Li ser xaçekî (selîbekî) were danîn.

<sup>2</sup>.Bangdêr: Mirovê ku bang dike.



## Deriyê Kevoka Bigerden

Qeral Debşelîm ji Beydebayê feylesûf re got: Min Mînaka çawa virekek dikeve navbera du hezkiriyên, wan ji hev dike bihîst û dawiya wî jî çawa bû, nas kir. Eger te xwast, ji min re li ser dostên dilsoz baxivî; çawa digihên hev û bi hev şa dibin?! Feylesûf got: Mirovê hişmend biraderan bi tiştêkî naguhêre, çinkî birader bi rindiyên xwe ji hev re alîkar in; gava belak tê serê wan, ew ji ber wê ve xemxwar dibin. Ji mînaka wê, mînaka Kevoka Bigerden(gerdenkirî), mişk, xezal û qirikê ye. Qerêl got: Ma ew çawa bû?!

### • Mînaka Mişk, Qirik, Xezal û Kevoka Bigerden.

Beydeba got: Hatiye gotin, ku li welatê Sekawendcînê, li nêzîk bajarê Daherê, çiyak hebû, nêçîr lê pir bû û carcaran nêçîrvan diçûne wir. Dareke mezin jî li wî cihê hebû, şiqin û çiloyên wê pir bûn, qirikekê jî malika xwe di nav de çêkiri bû.

Dema rojekê ew di hêlîna xwe de bû, çavên wê li nêçîrvanekî xwedî çûlekî<sup>1</sup> pîs û pergaleke bed ket; torek<sup>2</sup> li ser milê wî bû, çovek di dest de bû û berve darê dihat û dîmena wî a pîs bedkariya wî xuya dikir. Qirik ji nêçîrvên tirsî û got: Yan dawiya min, yan jî ya bilî min ev mirova

<sup>1</sup>.Çûl: Dîmen.

<sup>2</sup> .Tore: Kemend, daf, şebeke.

bi vir de anî. Ezê li cihê xwe bim, da bibînim ewê çî bike. Wê temaşe kir û dît, nêçîrvên toreya xwe vena, tene li ser belav kir, li nêzîk wê avsûn<sup>1</sup> girt û rûnişt. Pir ne çû, kevokeke jê re digotin Bigerden, ew serwera kevokan bû, kevokine pir jî vê re bûn, di wir re derbas bû û ew û hevalên xwe kor bûn, tore ne dîtî, bi ser tene ketin, xwarin û ew hemî bi toreya ketin, nêçîrvan jî bi kêf û şahî rabû û bi ser wan de hat.

Wê çaxê, her Kevokê di nava benikên torê de berxwe da û xwast xwe rizgar bike. Bigerdenê got: Ji bo çareseriyê bêhêvî mebin, bila henasa heryekê ji we ji henasa hevala xwe ne çêtir be, emê hemî bi hev re bibin alîkar, mîna tilûrekî bifirin, torê hilkin û bi hev re rizgar bibin. Wan xwe kir yek, bi hev re hilpekîn û bi alîkariya wan gişan tore hilbû û bibanî ketin. Nêçîrvên ew yeka dît, lê hêviya xwe ne birî û guman kir ku ewê pir dûr ne rin û bikevin.

Qirikê got: Min got, ezê bi dû wan bikevim û bibînin çî wê bi wan re çêbe. Bigerdenê jî li paş xwe nêrî, dît ku nêçîrvan bi dû wan ketiye, wê ji kevokan re got: Ev nêçîrvana ji we nagere, eger em bi banî bikevin, ewê me bibîne û ji dû me venagere; lê eger em berve şengehê<sup>2</sup> herin, ewê me winda bike û vegere. Li filan derê jî mişkek heye birayê min e; eger em bigihên ba wî, ewê vê

---

<sup>1</sup>Avsûn: Cih û kozika ku nêçîrvan xwe tê de vedişêre.

<sup>2</sup>.Şengeh: Cihê şên ku avahî lê heye.

kemendê<sup>1</sup> ji me bibire û emê rizgar bibin. Wan rabû wilo kir, nêçîrvan jî bêhêvî bû û ji dû wan vegeerî. Lê qirik bi dû wan ket, li wan nihêrî, got belkî ez tiştêkî ji wan fêr bibim û di tengahiyê de ji min re jî bibe alîkar.

Gava ku kevoka Bigerdenê gihîşt ba cihê mişk, wê ferman da kevokan da ku dakevin, ew veniştin; mişk jî ji bo xweparastinê sed qulik amade kiri bû; kevokê bi navê wî bang kir, navê wî jî Zîrek<sup>2</sup> bû, mişk ji qulika xwe de bersiv da û got: Tu kî yî? Got: Ez hogira te Bigerdenê me. Mişk bi lez hat ba wê û jê re got: Kê tu xistî vê belayê? Wê jê re got: Ma tu pê haydar ne bûyî ku çî rindî û xirabî hene berê miqederkirî ne û têne serê mirov, wê yekê ez bi vê belayê xistime, belkî kesek ji min bihêztir û xwedî femandariyeke ji min mezintir be û dîsa nikani be xwe jê biparêze. Eger ew bibe qeder, belkî roj û hêv jî werin girtin.

Paşê mişk rabû dest bi birîna girêka ku Bigerden tê de bû kir, lê Bigerdenê jê re got: Ji girêkên kevokên din de dest pê bike û paşê were girêka min; wê çend caran gotina xwe dubare kir, lê mişk guh ne da gotina wê. Gava ku pir got û dubare kir, mişk jê re got: Te çend caran gotina xwe dubare kir, wekî ku pêdviya te bi henasa te tuneye, ne bi ber wê dikevî, ne jî guh didî mafên wê! Wê got: Ez ditirsim eger tu ji girêka min de dest pê bikî, tu ji bo birîna

---

<sup>1</sup>.Kemend:Tore, şebeke.

<sup>2</sup>.Zîrek: Di bingeha xwe de wiha hatiye.

ên din hosan<sup>1</sup> û qels bibî. Lê eger tu ji wan de dest bikî û ez bibim a dawiyê, ez zanim ta tu biwestî jî, tu qayîl nabî ez di kemendê de bimînim, mişk got: Ev tişt a dihêle, dilxwazî û hezkirina min ji te re bêtir bibe. Paşê mişk rabû tore birî ta bi dawî kir û Bigeredenê ligel kevokên xwe firîn û çûn.

Gava qirikê kiriyara mişk dît, xwast dostaniya wî bike, hatnêzîk wî û bi navê wî gazî kir. Mişk serê xwe ji qulikê derxist û jê re got: Daxwaza te çi ye? Got: Ez dixwazim dostaniya te bikim. Mişk got: Danûstandin di navbera min û te de tune ye; gerek e mirovê hişmend tiştê ku rê tê re hebe doz bike, tiştê ku rê tê re tunebe jî doz neke. Mîna ewê ku dixwaze gemiyê li ser zemînê bimeşîne, erebanê jî di deryayê de bimeşîne; tu xurayî<sup>2</sup> û ez jî xwarina te me. Qirikê got: Digel ku tu ji min re xwarin î, lê eger te bixwim tu sûd li min nabe, dostaniya te ji min re ji tiştê te got çêtir e, lê tu ne mafdar î ku ez dostaniya te bixwazim û tu jî min dilşikestî vegeirî; sinciyên baş ku min ji te dîtin, ez hevojtîm ser dostaniya te ra<sup>3</sup> eger tu naxwazî jî, rindîkariya mirovê hişmend -raku wî veşart jî- ew ne tê veşartin. Çinkî ew mîna miska ku hatiye pêçan e, digel wê jî ew dîsa bîn û hulma xwe a xweş belav dike.

Mişk got: Dijmantiya xurtir dijîtiya cewherê ye, ew jî du dijmantî ne: Yek jê, hemtayî hev in, mîna neyartiya fîl

---

<sup>1</sup>Hosan: Westan.

<sup>2</sup>Xura: Pir dixwe.

<sup>3</sup>Ra: Ta حتى

û şêr, belkî şêr fil bikuje, yan fil şêr bikuje. Yan jî, gava hêza aliyekî ji ê din xurtir be, mîna dijmantiya di navbera min, fistekê û min û te de. Dijîtiya di navbera min û te de ziyane nagihîne te, lê ziyana wê li ser min e. Ra eger av pir were germkirin jî, lê dîsa gava li êgir dibe wî vedimrîne. Ewê ku dostaniya dijimin bike û vê re li hev were, mîna ew marekî di paşila xwe de hilgirî. Mirovê hişmend baweriyê bi dijminê gumanbar nake.

Qirikê got: Ez têgihîştim tu çi dibêjî. Gerek e tu bi ramana xwe bikî, lê gerek e tu gotina min jî rast bibînê û bi gotina ku tu dibêjî, rêkê ji danûstandina di navbera me de negirî! Bila tu pirsê li min dijwar nekî; çinkî hişmendên camêr çêsezayê ji berdêla rindiyê ve naxwazin. Hezkirin di navbera durustkaran de zû peyda dibe û dereng jî tê birîn; ew mîna kûzê ji zêr e, zû naşkê, eger tîk bû yan jî şikest, zû û bi hêsanî digihê hev û durust dibe. Hezkirina di navbera şerxwazan de jî zû têk diçe û dereng digihê hev, ew mîna kûzê ji qermît e, ji ber tişteki biçûk dişkê û careke din nagihê hev. Comerd ji comerdan hez dike, lê qelaş ji kesekî hez nakin, eger hez kirin jî, ew yan ji bo dilxwaziyekê yan jî tirsek hebe.

Ez jî bi gerekî hezkirin û rindiya te me; çinkî tu camêrî, ezê li ber deriyê te bim û xwarinê naxim, ta tu bi min re dibî bira. Bila tu zani bî, eger min bixwasta ziyana bigihanda te, gava ku te benê kevokan dibirî û ez di ser te re firîm, minê bikira. Mişk got: Min biratiya te pejirand. Min cara tukes ji bo pêdviyekê venegerandiye. Lê min tu



ezmûn kirî û xwast baş bawer bibim: Eger te ez xapandim jî, bila tu nebêjî, min dît mişk xwedî nêrîna lawaz in û zû têne xapandin! Paşê ji qulka xwe derket û li ber derî sekinî. Qirikê jê re got: Çi nahêle tu derkevî werî ba min û bi min re baxivî?! Ma hîn guman di dilê te de li ser min heye?!

Mişk got: Xelkê vê cîhanê bi du tiştan bi hev re didin û distînin û pêwendiyên pê dîkin, ew jî: Bi henasê û bi destan. Ên ku bi henasê dîkin, ew dilpak û dilsoz in, lê yê ku alîkariya bi destan dîkin, ew ji hev re alîkar in û dixwazin sûdê ji hev wergirin. Kî rindiyê bike da ku tenê hin sûdê ji vê cîhanê wergire, ew di dandin û camêriya xwe de mîna nêçîrvên e; dema ku ew tene ji tilûran re davêje, naxwaze sûdê li tilûr bike, ew sûdê ji xwe re dixwaze; loma jî, danûstandina bi henasê ji ya destan çêtir e.

Ez bi niyaza te bawer im, min ji henasa xwe de bawerî da te, lê tiştê nahêle ku ez derkevim ba te, ne gumana min ji te ye; çinkî min nas kiriye ku hevaline te hene, cewherên xwe mîna cewherê te ne, lê nêrîna wan ne wek ya te ye.

Qirikê got: Ji nîşanên dostan, gerek e ji dostê dostê xwe re dost be, ji dijminê dostê xwe re dijmin be. Dost û hevalên min yê ku ji te hez nekin jî tunene; yê ku ji cewherê min be û ji te hez neke jî, bi min pir hêsan e ku ez wî berdim. Eger çandiyarê çîçekrihanê<sup>1</sup> geyakê di nav de

---

<sup>1</sup>.Çîçekrihan: Çîçeka rihanê.

bibîne, wê hildike û davêje. Paşê, mişk derket ba qirikê, silav dane hev, dilê xwe ji hev re vekirin, bûn dostên hev û heryek bi dostaniya ê din kêfxwaş bû.

Pir roj derbas bûn, ta rojekê qirikê ji mişk re got: Qulika te ji rêka xelkê ve nêzîk e, ez ditirsim hin zarok kevirekî bavêjin te û te bêşînin. Cihekî min li aliyekî heye, dostekî min ji reqan jî li wir e, ew cih tijî masî ye û çî tiştê em dixwazin bixwin lê heye. Ez dixwazim te bibim wir, da ku tu bi ewle bijî! Mişk got: Ez jî ji vî cihî hez nakim, eger em bigihên wir, gelek serpêhatî û çêrokên min hene ezê ji te re hewal bidim; mîna tu dixwazî bike.

Qirikê rabû bi dûvê mişk girt û firî ta gihîşt cihê ku digot. Gava ji kaniya ku req tê de bû nêzîk bû, reqê dît ku qirikekê mişkek vê re ye, lê wê nizanî ew dostê wê ye, ew jê tirsî, lê qirikê deng lê kir, ew jî derket û jê pirs kir û got: Tu ji kûderê hatî? Wê rabû çêroka xwe jê re hewal da, çawa bi dû kevokê ket, pirsaxwe û mişk jî ta gihîştin vir jê re got!

Gava ku reqê mesela mişk bihîst, ji hişdarî û dilsoziya wî mat bû, bixêrhatina wî kir û jê re got: Çi tu anîyî vî warî? Qirikê jî ji mişk re got: Ez dixwazim ew çêroka te got ku ezê ji te re hewal bidim, ligel bersiva pirsaxwe reqê ji me re bêje. Bila req jî li ba te di paya min de be. Wê hîngê mişk dest bi dengkirinê kir û got:

## • Mînaka Mişk û Nêsik

Wî got: Li despêkê, cihê min li bajarê Marût, li mala mirovekî nasik bû, xêzan<sup>1</sup> û zarok tê de tunebûn. Heroj qufikek xwarin jê re dihat, wî têra xwe jê dixwar û ê din bi dar dixist. Min jî nasik dipa<sup>2</sup>, eger ji mal derdiket, min xwe davêt qufikê, çi xwarina ku tê de hebû dixwar û ji mişkan re jî davêt. Nêsik pir hewilda ku qufikê bi derekê ve bixe ku ez negihînimê, lê wî nikarî! Ta şevêkê mêvanekî wî hat, wan bi hev re xwar, paşê ketin şoran û nêsik ji mîvên re got: Tu ji kîjan welatî hatî û dixwazî bi kû ve herî? Wî mirovî jî pir welat dabûn hev, tiştên seyr dîti bûn û rabû li ser welatên ku gihîştî bûyê û tiştên seyr ku dîti bûn ji nêsik re hewalda, nêsik jî, da ku min ji qufikê dûr bixe, di nava gotinê de dida çepikan, mêvan ji ber wê yekê bi hêrs bû û got: Ez bi te re deng dikim û tu jî tinaziyan bi gotina min dikî! Ma çima te ji min pirs kir? Nêsik lêborîn jê xwast û got: Ez li çapikan didim, da ku mişkekî ez gêj kirime bitirsînim. Ez çi datînim mal ew dixwe! Mîvên got: Mişkekî tenê wilo dike lê gelek mişk?! Nêsik got: Ez nizanîm, mişkên malê pir in, lê mişkek di nav wan de heye, wî ez westandime û çarê jê re nabînim.

Mêvên got: Te gotina ewê ku wiha gotiye anî bîra min: ((Vê jinê ji bo tiştêkî kunciyên qeşartî bi ên neqeşartî guhertin!)). Nêsik got: Ma ew çawa bû?

---

<sup>1</sup>.Xêzan: Kebaniya Malê.

<sup>2</sup>.Dipa, Payan: Payandin û pasewaniya tiştêkî dike.

## • Mînaka Jinê û Kunciyan

Mîvên got: Ez carekê li filan derê li mirovekî bûm mêvan. Me şîv xwar, paşê nivîn ji min re danîn û mirov jî çû nav nivînên xwe. Li dawiya şevê min bihîst mirov ji jîna xwe re dibêje: Ez dixwazin siba hin kesan vexwînim mal da ku nên li ba me bixwin, tuyê xwarinekê ji me re bikî, jinê got: Tu çawa xelkê vedixwîni xwarinê, tiştêk ji bo zarokên te di mala te de tune ye û ne tiştêkî dihêlî û ne hiltîni?! Mirov got: Li ser tiştê ku me daye xwarin û mezax kiriye poşman mebe, belkî dawiya komkirin û hilanînê mîna dawiya gur be, jinê got: Ma ew çawa bû?

## • Mînaka Gur, Mirov û Benê Tîrkevanê

Mirov got: Dibêjin, rojekê mirovekî nêçîrvan tîrkevana xwe rakir û derket nêçîrê. Ew pir ne çû, xezalek kuşt, hilgirt û xwast wîne mala xwe, lê berazek<sup>1</sup> jî hate ser riya wî, wî tîrek avêtê, di govdê wî de çû, lê beraz bi birîna xwe bi ser wî de hat, bi şêlima<sup>2</sup> xwe lêxist, kevan ji destan firand û her du ketin û mirin! Wê hîngê gurek jî gihîşt ser wan, wî got: Ev mirov, xezal û beraz wê demekê têra xwarina min bikin. Lê ezê dest bi çermê kevanê<sup>3</sup> bikim, bila ew xwarina min a vê rojê be, ezê ên din jî bihêlim siberojê û piştî wê jî. Ew di çermê kevanê de xebitî ta

---

<sup>1</sup>.Beraz: Xenzîr.

<sup>2</sup>.Şêlim: Qoçê Beraz.

<sup>3</sup>.Kevan: Beşê Tîrkevanê yê tê hev û vedizele قوس

perçe kir. Gava ku perçe bû, beşek ji kevanê firî, li gewriya wî ket û ew jî ket û mir!

Min ev mînaka ji te re anî, da tu zani bî, ku dawiya komkirin û veşartinê pir xirab e. Jinê got: Te tiştêkî hêja got! Nexwe têra şeş kesan û belkî bêtir jî, birinc û kuncî li ba me hene, ezê li sibê xwarinê çêkim; te kî xwast vexwîne. Gava sibe vevat, jinê kuncî qeşartin, li ber rojê raxistin da ku ziwa bibin û ji kolê<sup>1</sup> malê re got: Wan ji kûçik û tilûran biparêze, û çû karê xwe. Lê kole haya xwe jê ne bir û kûçikekî hat ew qirêj kirin. Gava jinê dît ew gemarî bûne; wê rast ne dît xwarinê jê çêke, rabû ew birin bazarê, bi koncine neqeşartî guhertin û ez jî li bazarê sekinîbûm. Mêrekî got: bê guman, vê jinê ji ber sedemekê konciyên qeşartî bi hine neqeşartî guhertin!

Herweha ji bo ev mişkê ku tu çêrê bûyî jî, ew bê sedem nikare tiştê ku tu jê digazîe bike; rabe qazmekî<sup>2</sup> ji min re wîne, ezê qula wî bikolim û rewşa wî nas bikim. Nêsik çû qazmek ji ba cîranên xwe anî û da mîvên, ez jî wê çaxê ne di qulika xwe de bûm û min gotina wan dibihîst. Di qulika min de jî kîsek hebû, sed dînar tê de hebû, lê min nizanî kê xisti bûyê! Wî qulika min kola ta gihîşt dînanan, deranîn û ji nêsik re got: Eger ne ji van dînanan ba, vî mişkî nikarî xwe bavêta cihê ku digihîştê; mal hêz, nêrîn û kanîne jî zêde dike; tuyê piştî vê bibînî, ewê nikari be xwe bavêje cihê ku berê xwe davêtê.

---

<sup>1</sup>.Kole: Xulam غلام

<sup>2</sup>.Qazme: Alavek bi du seriya ye, pê zemîne dikolin.

Dema ku sibe vevat, mişkên ku bi min re bûn civiyan û gotin: Em birçî bûne, tu jî hêviya me yî. Ez û mişkan rabûn çûn cihê ku min xwe jê davêt qufikê, min gelek caran hewil da û xwe avêtê, lê ez ne gihîştimê, bêçaretîya min ji mişkan re xuya bû û min bihîst ew dibêjin: Ji dora wî herin, bila çavê we ne li wî be, em rewşa wî dibînin, ew bi xwe bigerekî kesekî ye ku alîkariya wî bike! Herwiha wan ez berdama, ji min dûrketin û çûn ba ewên ku berê ji min dexs<sup>1</sup> dibûn, neyartîya min dikirin, li ser min deng kirin, bûn wekî ku hîç ez nas ne dikirim û li ser wan jî ne serok bûm.

Wê hîngê, min di dilê xwe de got: Bira, pişgir û dost bi pera ne; min nas kir ewê bê pere, eger dilê wî tiştek xwest, tunebûn wî ji daxwaza wî bêpar dike. Pere mîna ava ji barana Zivistanê ye, eger di geliyan de bimîne, derbas çemekî nabe û naherike, ew genî dibe, dimiçiqe û sûd jê ne tê dîtîn! Min dît jî, ewê ku birayên xwe tunene, xwedan û zarokên wî tunebin, navê wî jî ne tê gotin. Eger ew bê mal be, bê hiş jî dibe û cîhan û dawîroj jî jê re tune; çinkî yê ku xizan dibe, neçar dibe şermê jî berde; kê şermdariya xwe ji dest çû dilxwaşiya wî jî diçe, kê dilxwaşiya wî jî çû ji xwe dixeyîde, kî ji xwe xeyidî xema wî pir dibe, kê xema wî pir bû hişê xwe kêmbê û rewşa wî li hev dikeve, kê hişê xwe jî kêmbê, piraniya gotin û karê wî li ser wî ye, ne ji bo wî ye; û kî wilo bû, ew dibe mirovê her bedbext di jiyanê û pişdawayî de jî.

---

<sup>1</sup>.Dexsî: Çavtengî, hesûdf.

Eger mirov xizan bû, meriv, bira û dostên wî, wî perçe dikin, jê heznakin, wî naxwazin û payenizim jî dikin. Ew neçar dibe ku dibin dijiwariyan de li roziya xwe bigere, dawîroja wî bed dibe û bi wî rengî her du jiyan ji dest derin. Xizanê ku bi pêdviya tiştê xelkê be jî, ew mîna dara ku di çiravan<sup>1</sup> de be û ji her aliyekî de tê xwarin e.

Min dît, xizanî serê her belakê ye, ji xwedanê xwe re tiştê pîs tîne, dibe kana<sup>2</sup> nerindiyê. Min dît jî, mêrê ku bû xizan, kesê ku pê ewle dibû, wî gunehbar dike, yê ku bawerî pê dikir, lê dikeve gumanê. Eger yekî din gunehkê kiri be, ew dibe cihê gumanê. Çi sinciya ku ji dewlemend re pesin be, ji xizan re dibe cihê lomê; eger ew wêrek be, dibêjin dîn e, eger camêr be dibêjin malbelav<sup>3</sup> e, eger hişmend be dibêjin lawaz e, eger şîwaz<sup>4</sup> be dibêjin korfam<sup>5</sup> e, eger pir naxive dibêjin nezan e, eger axêver<sup>6</sup> be jî dibêjin pir deng dike. Mirin ji ew pêdviya ku mirov neçar dike parsê bike siviktir e, nemaze jî parsê ji çekoz û sûtaran<sup>7</sup>. Eger kesê comerd neçar bû destê xwe têxe gewriya mar, zihêrê jê derxe û daqurtîne, dîsa ji pîrsa ji çekozê sûtara çêtir û hêsantir e. Di gotinên kevin de wiha

---

1.Çirav: Lêçe مستتفع

2. Kan: Cihê tiştêkî pir منجم

3.Malbelav: Malê xwe li tiştê bê sûde mezax dike مسرف،مبذر.

4.Şîwaz: Xwedî rûmet û giran وقور.

5.Korfam: Nezan.

6.Axêver: Ewê ku deng dike.

7.Sûtara: Bedxwaz لنيم.

hatiye: Eger belake nexweşiyê bi canê yekî ket, ew wî bernade, ta pêdvî û xizaniya ku ji wê girantir e wî digirin.

Wê gava, dema ku mîvên dînar birin û nêsik ew li xelkê parve kirin, min dît nêsik para xwe bir, xiste tûrikekî û danî ber serê xwe. Gava bû derengiya şevê, min xwast hinan jê bibim û li qulika xwe vegeçînim, min hêvî dikir ewê hêza min zêde bikin, yan jî bi sedema wê hin dostên min li min vegeçînin; herwiha ez ji qulika xwe derketim û berve nêsik çûm, ta gihîştim ber serê wî, ew jî raza bû, lê min dît mêvan payî ye û çovek di destê wî de ye; wî ji nişkave lêdanek bi êşek li serê min xist û ez vegeçîm qulika xwe. Gava ku êşeka min hêmin bû, dilxwazî û çavbirçîtîyê ez kelecana<sup>1</sup> kirim û dîsa derketim. Lê min dît mêvan li min dipê, wî dîsa lêdanek li min da, xwîn ji min herikand, lê min xwe girt, bi zikepişt<sup>2</sup> vegeçîm qulika xwe û gêj bûm û ketim. Êşeka ku min dît, mal li pêş min reş kir. Ta niha eger navê wî dibihîsim, lertz û tirs têne min.

Paşê hate bîra min, ku bela li cîhanê ji çavbirçîtî û dilxwaziyê tê; ji ber ku ew xwedanê xwe ji tiştêkî dixin tiştêkî din, tişt jî bi dawî nabin. Yê ku malê cîhanê dixwaze, hergav di bela, westan û pêlanan de ye! Min dît, eger ez ji bo jiyana xwe rêwîngiya dûr û dijwar bipejînim, ji rewşa ku ez destê xwe li ber kesekî maldar û camêr vegirim hêsantir e, ma hîn çawa ji kesekî miqris<sup>3</sup>?!  

---

<sup>1</sup>.Kelecana: Heyecan.

<sup>2</sup>.Zikepişt: Geh li ser zik û geh li ser piştê.

<sup>3</sup> .Miqris: Çekoz, desthişk بخيل



Min ji bawerdariyê<sup>1</sup> jî rintir tiştê ne dît. Min bihîst ku zaniyaran gotiye: Tu hişdarî mîna karsaziya<sup>2</sup> durust tune, xweparêzî mîna destpakiyê tune, kokbinyatî<sup>3</sup> mîna sinciya baş tune, dewlemendî jî ji bawerdariyê ne çêtir e. Tiştê mafdartir ku gerek e mirov li ser bisebire henasa wî ye, xêrxwaziya baştir jî dilovanî ye, serê hezkirinê jî berdeyamî ye û serê hişmendiyê jî mirov tiştê gengaz û ne gengaz ji hev nas bike.

Hatiye gotin jî: Bêdengî ji zimanê virek çêtir e. Tunebûn û xizanî ji hebûn û dewlemendiya ji malê xelkê çêtir e. Herweha ez bawerdar û qayîl bûm, ji mala nêsik derketim û çûme çolê. Dostekî min ji kevokan hebû, di riya wî re qirik jî bû dostê min. Mişk li reqê nihêrî û got: Paşê, qirikê ji min re hewal da, ku dostanî di navbera te û wî de heye û dixwaze min wîne ba te, min jî hez kir ku ez bi wî re werim ba te. Ez ji tenêtiyê westiya bûm, çinkî tiştê ji xweşiyên cîhanê hemtayî dostaniya biraderan nabe, tiştê ji xema dûrketina ji wan jî girantir tune.

Min taqe kir û nas kir jî: Gerek e ji bilî tiştê ku tere mirov bike û pê ziyane ji xwe dûr bixe ji cîhanê nexwaze; ew jî tibabeke hindik ji xwarin û vexwarinê ye ku mirov pê tendurustiya xwe biparêze. Eger mirovekî cîhan bi hemî tiştên wê ve danê, ew ji wê gişî tenê sûdê ji tiştên hindik ku pê pêdviya xwe bi kesekî nebe, werdigire, ew

---

<sup>1</sup>.Bawerdarî: Bi tiştê ku heye bawer bî القناعة.

<sup>2</sup>. Karsazî: Sazkarî, kar li saz dixê, تدبير.

<sup>3</sup>.Kokbinyatî: Bi kok û binyat الحسب والنسب.

tişta bi xwe jî mîna bilî xwe dibe, tiştê mirov dimîne re jî tenê lênihêrîn e. Ez ligel qirikê li ser vê baweriyê hatim ba te, ez jî birayê te me û bila payedariya min jî li ba te wilo be.

Dema ku mişk gotina xwe bi dawî kir, reqê bi axaftineke nazik û şêrîn bersiva wê da û got: Min gotina te bihîst û axaftina ku te kir pir ciwan bû! Lê min dît, tu tiştina bi bîr tînî ew tenê di dilê te de hene. Erê malê te hindik e, rewşa te ne baş e û tu ji warê xwe dûr ketî, lê wan tiştan ji dilê xwe bavêje. Bila tu zani bî, ku şorên xweş bi karê xweş pêk tê, nexweşê ku dermanê derdê xwe nas kir û xwe pê derman ne kir, ew naskirina tiştêkî jê re nake, çareseriyê ji nexweşiya xwe re nabîne û jê çak nabe. Tu bi nêrîna xwe bike, û ji bo kêmaniya mêl xemgîn mebe. Belkî mirovê bi qîret li ser tiştên ji bilî mêl were rûmetkirin; mîna çawa şêr, raku mexelî<sup>1</sup> be jî tirsdar e. Dewlemendê bê qîret, eger malê xwe pir be jî tê nizimkirin; mîna kûçikê ku bi gerden û xilxalên zêrîn hati be fodilkirin, lê dîsa jî kes guh nadê!

Bila xerîbiya te li te giran ne tê, çinkî mirovê hişmend xerîbiya wî tune ye, mîna şêrê ku bi kû ve diçe hêza wî vê re ye. Tu guh bide henasa xwe, eger te wilo kir, rindî wê ji her derekê de -mîna ava ku serberjêrbûna xwe dixwazê werin te bibînin. Karê rind ji kesê zana û xwedî biryar tê, lê ê qels û dudilî, karindî (rindkarî)<sup>2</sup> nabe hevalê wî. Ji

---

<sup>1</sup> .Mexelîn: rûniştina dewêr.

<sup>2</sup>.Karindî, rindkarî: Karê rind, العمل الصالح.

tiştên ku tebat<sup>1</sup> û mayîna wan tuneye re hatiye gotin: Siya ((ewr li havînê ye)). Dostaniya şerxwazan, evîndariya jinan, nûçeya derewîn, avakirina bê bingeş û malê pir jî ji kesî re namînin.

Mirovê hişmend ji bo hindikbûna mêl xemgîn nabe, mal û hişê wî karê wî ê qenc e, ew kar jî jê ne tê standin, li ser tiştê ku ne kiriye jî ne tê lomekirin, gerek e pirsaw dawîroja wî jî ji bîrê neçe; çinkî mirin jinişkave tê û di navbera wê û mirov de tu çaxên naskirî tunene; tu bi zanîna xwe a bilind jî ne motacê<sup>2</sup> şîreta min î, lê min xwast ez mafê te li ser xwe bi cih wînim, çinkî tu birayê me yî û hertiştê ku em pê kanin ji te re rewaw ye.

Gawa ku qirikê gotina reqê ji mişk re bihîst, bersiv û dilxwaşiya wê jî dît, ew pir şaw bû û got: Te ez şaw kirim, rindî bi min kir, tu hêjayî ku şaw bibî, wekî ku te ez bi wê yekê şaw kirim! Pêştirîn kesên ku gerek e pir şaw be, ewê ku hîn dost û birayên wî ên durustkar li dora wî ne, hîn kesin li ba wî hene wî kêfxwaş dikin, ew jî wan şaw dike û ji bo karûbar û pêkanîna pêdiviyên wan jî amade ye. Sinciya baş mirov bi kû de diçe bi xwe re hildigire, eger mirovekî comerd ket, ji bilî comerdan kesek bi destan nagire, mîna fîlê di heriyê<sup>3</sup> de dimîne, tenê fîl kane wî jê derxe.

Hîn qirik di gotina xwe de bû û bi hev şaw dibûn, xezalek bi lez û tirs berve wan hat, req jê tirsî û xwe xiste binê avê,

---

<sup>1</sup>.Tebat: Rawestan, seknandin, diywata (lebatê).

<sup>2</sup>.Motac: Bi pêdvî, bi gerek محتاج

<sup>3</sup>.Herî: Axa şil.

mişk jî kete qulekê, qirik jî firî û çû ser darekê. Xezal jî hat ser avê, piçek vexwar, bi tirs sekinî û li çep û rastî xwe nêrî.

Paşê qirik firî û li ezmên gerî, da ku bibîne eger kesek bi dû xezalê ketiye û wê dixwaze? Wê nihêrî lê tiştê ne dît û rabû deng li mişk û req kir, ew derketin. Gava req dît ku xezal li avê dinêre, ew jê ve nêzîk bû û jê re got: Eger tu tî yî vexwe, metirse!, tirs li ser te tune! Wê hîngê xezal nêzîk bû, req jî xêrhatina wê kir, silav dayê û jê re got: Tu ji kû de hatî? Got: Ez li van çolan diçêrîm, lê siwaran ez ji ciyekî diqewitandim ciyekî din, ta îro min pêjnek dît û ez tirsîm ku ew sekvanek<sup>1</sup> be! Req got: Metirse; me hîç tu sekvan li van deran ne dîtî, em li vir sekinîne, daxivin û hevdu tesele dîkin. Li ba me bimîne, emê ji te hez bikin, cihê xwe bidin te, av û çêre jî li ba me pir e, tu dil bike û dostaniya me bike. Xezal li ba wan ma, holikeke wan jî hebû li bin kom dibûn û nûçe û axaftin dikirin.

Gava ku rojekê qirik, mişk û req li binê holikê bûn, xezal winda bû. Ew katekê li bendê man lê ew venegerî. Dema ku dereng ma, ew tirsîn ku ziyaneke gihîştî bê, mişk û req ji qirikê re gotin: Rabe binêre, ma tu tiştêkî li derdora me dibînî?

Qirik firî û li ezmên gerî, dît ku xezal di nava benan de maye û hatiye girtin; ew bi lez firî û hat ji wan re hewal

---

<sup>1</sup>.Sekvan: Tîravêj قنص.

da. Req û qirikê ji mişk re gotin: Di vî karî de ji bilî te hêvî ji tukesî nabe, zû birayê xwe feryad<sup>1</sup> bike. Mişk lezand û çû ta gihîşt ba xezalê û jê re got: Tu çawa ketî vê tengiyê<sup>2</sup> û tu ji hişmendan têyî jimartin? Xezalê got: Haydarî kane bi felekê çî bike! Ne jî hişmend kane ji felekê re tişteki bike!

Wan hîn deng dikir, req jî gihîşt wan, xezalê jê re got: Ne rast bû ku tu hatî ba me. Eger mişk ben birîn û sekvan gihîşt me, ezê bi bezê bikevim pêşiya wî, ji bo mişk jî gelek qulik hene dê têkevê, qirik jî wê bifire, lê tu giranî, nikarî ne bilivî û ne birevî. Ez li ser te ji sekvên bitirsim! Wê got: Piştî jidestdana hezkiriyan jiyan nabe! Eger dost dostê xwe ji dest da, dilê wî jî bi xwe re dibe, ji şahiya wî bêpar dibe û pêşiya xwe nabîne. Hîn axaftina wan bi dawî ne bû bû sekvan hat, lê li wê çaxê mişk birîna kemendê<sup>3</sup> kuta kiri bû û xezalê xwe xelas kir, qirik jî firî û bi banî ket, mişk jî kete qulekê û ji bilî req kesek li wir ne ma. Gava ku nêçîrvan gihîşt wir, dît ku benên wî hatine birîn. Wî li çep û rastî xwe nêrî û ji bilî reqa ku hêdîka dimeşî kesek ne dît, wî rabû ew girt û girêda.

Pir ne çû, qirik, mişk û xezalê li hev civiyan û nas kirin ku sekvên req girê daye. Ew pir xemgîn bûn û mişk got: Ta em ji belakê derketin em ketin yeke jê girantir! Rast gotiye yê ku gotiye: Mirov di feleka xwe de rast diçe ta

---

<sup>1</sup>.Feryad: Hawarçûn إنقاذ، نجدة.

<sup>2</sup>.Tengî: Tengahî.

<sup>3</sup>.Kemend: Dehf, pê tilûran digirin مصيدة، شبكة.

vedilukume<sup>1</sup>, eger velukumî jî ew velukumandina bi wî re diçe ra ku li cihê dûz jî bimeşe. Xema min ji bo req e, xema min ji baştirîn dost re ye, ewê ku dostaniya wî ne ji bo çêsezayê ye, ne ji bo bidestxistina şabaşekê ye, ew dostaniya comerdî û rûmetê ye. Dostaniyek e, ji pêwendiya law ji bavê re çêtir e. Dostaniyek e, tenê mirin wê têk dibe. Pir seyr û mat e ji bo ev govdê ku bela bûye para wî. Ew hergav di kar û mijûliyê de ye û li dawiyê jî tiştêk jê re namîne. Mîna çawa hilhatin ji stêrka hilhatî re namîne, ne jî ji a çûye ava û windabûye re dimîne, lê hîn jî ewa hilhatî berve çûnavayê<sup>2</sup> dere, a windabûyî jî dîsa hiltê. Êşekên birîn û kulan çawa ne, rewşa min jî wilo ye. Vê belayê rewşa min a berê anî bîra min, ew mîna birîna kewandî ye, dema ku derbek lê dikeve du êşek jê dertên: Êşeka derbê û êşeka birînê. Ewê ku piştî hevdişînê biraderên xwe ji dest dide, herdem piştîşikestî û xemgîn dimîne!

Xezalê û qirikê ji mişk re gotin: Agahdarkirina me û te, û gotina te ji req re digel ku kûrwate<sup>3</sup> bû, lê ew niha sûdekê lê nakin. Wek tê gotin: Mirov li ber belayê tê naskirin, xwediyê dilsoziyê jî li dema danûstandinê, xwedan û zaro jî li dema xizaniyê û birader jî di tengahiyan de têne nasîn! Mişk got: Xezalê! Wek çareserî,

---

<sup>1</sup>.Velukmandin: Ling bi ber tiştêkî yan bi ber hev ket û ket ،تعرفل،  
تفشكل

<sup>2</sup>.Çûnava: Çûndina berve rojava û windabûna wê، الغروب، السير نحو  
الاختفاء في الغرب

<sup>3</sup>.Kûrwate: Gotin bi wateyên Kûr ذومعنى ومغزى عميق

ez dibînim tu herî, wekî ku tu hatî nêçîrkirin û birîndar bûyî xwe ji sekvên re xuya bikî, bila qirik jî dakeve ser te, wekî ku ji te dixwe, ez jî hewil bidim ji nêçîrvên ve nêzîk bibim û lê binêrim, belkî alava ku vê re ye bavêje, req berde û bi hêviya ku te bigire bi ser te de were. Eger ji te ve nêzîk bû jî, tu hêdî hêdî jê bireve. Lê bila ji girtina te bêhêvî nebe û car carê ji te ve nêzîk jî bibe û ji me dûr dikeve, ta tu kanî jî tu wilo bikî; ez hêvî dikim, ta ez benan ji req dibirim û wê rizgar dikim, ew ji dû te venegere.

Qirikê û xezalê tiştê ku mişk ji wan re got kir, sekvan jî bi pê wan ket, xezalê jî ew kişand ta ji mişk û req dûr xist, mişk jî rabû ben birîn, req rizgar kir, nêçîrvan jî westiyayî û ji dû xezalê vegeerî; lê wî dît ku benên wî hatine birîn! Wê çaxê ew di pirsaxwe de bi xezalê re ramî, di rewşa xezalê û qirika dikir ku ji wê dixwe û benên xwe yên ku hatine birîn de pûnijî, wê hîngê, wî guman kir ku hişê wî li hev ket, ji wê xakê tirsî û got: Ev xaka ya pêrî<sup>1</sup> û avsûnbaza ye! Wî tiştê ne xwast û li tiştê ne sekinî û ji zû wir çû, qirik, xezal, mişk û req jî bi durustî û ewlehî ji berê rintir bûn û vegeerî li warê xwe li hev civîn.

Eger van afrendeyan, digel biçûkahî û lawazbûna wan, bi hezkirin û dilsoziya xwe a cigirtî, kêfxwaşiya dostaniyê, kanîn carekê li dû carekê ji mirinê rizgar bibûna, gerek e mirovên ku hiş û têgihîştin wergirtine, xêr û şer nas kirine,

---

1. Pêrî : Êneçê, Êgonê, cin جن

jihevcudakirina tiştan û zanîn wergirtine, gerek e ji bilî  
xwe re têkildartir û jê re alîkartir bin.

Ev e mînaka birayên dilsoz di dostaniya durust de û  
hevgirtina wan bi hev re.

\*\*\*

\*\*\*



## Deriyê Kund Û Qirikan

Qeral Debşelîm ji Beydebayê feylesûf re got: Min mînaka biraderên dilsoz bihîst; ji min re mînaka ew dijminê ku xwe rind û nêzîk bike, lê dîsa jî gerek e mirov pê ne tê xapandin, wine. Ji min re bêje jî, ma dijmin dibe dost? Bawerî bi tişteki wî dibe? Dijmantî çi ye? Ziyana wê çi ye? Eger dijmin lihevhatin xwast, gerek e qeral çi bike?

Feylesûf got: Kî bi dijminê ku hîn dijmin e re were xapandin, tiştê ku ji destê qirikan gihîşt kundan wê bigihê wî jî! Qerêl got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Dijminan**

*Eger dijminan çiqasî xweşî û rindî diyar kirin, gerek e mirov pê ne tê xapandin.*

Beydeba got: Gotine ku li çiyakî ji çiyar, darek ji darên mezin hebû, malika hezar qirikî li ser bû û yek ji wan serwerê wan bû! Şikeftek jî li nik<sup>1</sup> wê darê hebû, hezar kund tê de bû, serdarekî wan jî ji wan hebû! Di dilê qeralê kundan de dijîtiya qeralê qirikan hebû, di dilê qirikan û qeralê wan de jî mîna wê dijmantiyê ji kundan re hebû. Li şevêkê, qeralê kundan ligel kundên xwe, hêriş di malên qirikan de birin ser wan, gelek kes ji wan kuştin û hin jî dîl girtin. Gava ku sibe vekat<sup>2</sup>, qirik bi qeralê xwe re civiyan û jê re gotin: Te dît me îşev çi ji destê qeralê kundan dît,

---

<sup>1</sup>.Nik: Cem, rex, ba, tenişt, kêlek...

<sup>2</sup>.Sibe vekat: Sibe bû.

kesek ji me ne ma yan hat kuştin, yan birîndar bû, yan bask şikestî bû, yan jî pirçûlaskî<sup>1</sup> û dûvbirî bû!

Lê tiştê ku bêtir em êşandin, wêrekiya wan li ser me û naskirina wan ji cihê me re ye. Ji ber wê jî, em guman dikin, ku ewê dîsa bi ser me de werin. Ey qeralê me! Em xelkê te ne, hêvîdar in tu ji me û ji xwe re çarakê bibînî. Di nava qirikan de pênc qirik hebûn bi nêrîna xwe a baş dihatin naskirin, karûbarên qirikan diketin stûyê wan û bi şopandina rewş û pirsan dihatin stûbarkirin. Qeral jî gelek caran di tiştan de bi wan radiwêjî û nêrîna wan di bûyer û serboriyan de dibir.

Qerêl ji yekî ji wan pêncan re got: Dîtina te di vê pirsê de çi ye? Wî bersiv da û got: Nêrîna min berê zaniyar gihîştinê û gotine: Ji bo dijminê kîndar<sup>2</sup>, tenê rev çare ye.

Qerêl ji ê duyem re got: Nêrîna te di vê rewşê de çi ye? Got: Nêrîna min jî wek nêrîna hevalê min e; çare bi revê ye. Qerêl got: Ez nêrîna we rast nabînim; di belaya yekê de ku gihîşte me, em welatê xwe ji dijimin re bihêlin û jê bar bikin! Gerek e em wilo ne nikin; çinkî em bi wê yekê ji dijminê xwe re dibin alîkar; gerek e em xwe bidin hev, ji dijminê xwe re amade bin û agirê cengê di navbera me û wî de gur bikin. Emê haya xwe ji hêrişa jinişkave jî bibin; eger ew bi ser me de hat jî, emê jê re amade bin, jê netirsin, kêlek û pêşengên<sup>3</sup> me wê şerê kêlek û pêşengên

---

<sup>1</sup> .Pirçûlaskî: Per jê hatin hilkirin û dûzana wan xira bû.

<sup>2</sup> .Kîndar: Bi kîn û zikreş.

<sup>3</sup> .Kîlek û pêşeng: Leşkerên li kêlekan û yê li nivî(ortê)

wî bikin. û şerekî bê rev pê re bikin. Emê di keloşkên xwe de haydar bin, dijminê xwe jî geh bi sebrê û geh bi hêzê jê dûr bixin, ta em digihêjin derfet û armanca xwe û wilo emê dijminê xwe ji ser xwe bidin alî.

Paşê qerêl ji ê sêyem re got: Nêrîna te çi ye? Got: Tiştê wan got ez nêrîneke baş nabînim. Bi ya min be, emê çavdêran belav bikin, casûsan bişînin, şandeyan jî di navbera me û dijminê me de rêkin; emê zani bin ew lihevhatinê dixwazin, dixwazin şerê me bikin lê berdêlê<sup>1</sup> dixwazin? Eger me dît pirsra wî pirsra dawaxziya mêl e, emê lihevhatinê li ser xûka<sup>2</sup> salane bipejrînin û bidinê, bi wê yekê emê wî ji ser xwe têvedin û li welatê xwe ewle bibin; çinkî ji nêrîna qeralan e, eger hêza dijminê wan xurt be, li ser xwe û welatê xwe jî bi tirs bin, ew malê xwe dikin parêzerê welêt, qerêl û xelkê xwe.

Qerêl ji ê çaremîn re got: Nêrîna te di vê lihevhatinê de çi ye? Wî got: Ez wilo nabînim, ez dibînim em ji welêt derkevin û li ser xerîbiyê û dijawariya jiyane bisebirin; çinkî ew yeka ji me re çêtir e, ku em payebilindiya xwe ji dest bidin û bikevin bin destê dijminê ku em jê rûmetdartir in. Ra eger me lihevhatinê jî pêşniyar kir, kund ji bilî tiştên giran ji me naxwazin û pê qayîl nabin. Di mînakên de tê gotin: Ta tu pêdviya xwe bi dest bixî, gerek e tu xwe piçekî ji dijminê xwe ve nêzîk bikî, lê serûber xwe nêzîk wî meke; çinkî paşê ewê xwe li ser te bibîne, leşkerên te jî

---

<sup>1</sup>Berdêl: Berdêla tiştêkî, مقال مالي أو فدية

<sup>2</sup>Xûk: Xerac, pereyên ku salane ji ber tiştêkî ve têne dan.

wê lawaz bibin û tuyê henasa xwe jî nizim bikî! Mînaka wê, mîna textê li ber rojê venandî ye, eger te ew hinekî xwar kir, siya wî pir dibe, û eger te bêtir xwar kir, siya wî kêmtir dibe. Dijminê me jî qayîl nabe ku xwe ji me kêmtir bibîne, loma jî, ez di vî warî de dibînim, ku nêrîna rast ji me û ji te re jî şerkirin e.

Qerêl ji ê pêncemîn re got: Ma tu çî dibêjî? Tu çî dibîni? Şer, lihevhatin, lê barkirina ji welêt? Got: Sebare şer, mirov nikare şerê yê ku pê nikare bike. Belkî were gotin, ewê ku xwe û dijminê xwe nas neke û şerê ku pê nikare bike, ew xwe dajo ser mirinê. Kesê hişmend dijminê xwe biçûk nabîne, çinkî yê ku dijminê xwe biçûk bibîne wê were xapandin, kî bi dijminê xwe jî hate xapandin jê ewle nabe! Ta ku kund şerê me jî nekin, ez dîsa ji wan pir bitirs im; ez berê jî ji wan bitirs bûm; eger di çî rewşê de be, dîsa jî kesê biryardar bi dijminê xwe ewle nabe; eger ew dûr be yan nêzîk be ji destdirêjiya wî ewle nabe, eger bi tenê be jî ji qelaşiya wî ewle nabe. Miletên hêzdartir û zanatir, ji şer hez nakin û berdêla wî didin; berdêla şer jî ne mal, gotin û kar e, mezaxa<sup>1</sup> wî ji henasa û bedena ye. Lê belkî ew bi mezaxeke hindik û gotina nerm çareser bibe. Qeralê min, bila şerê kundan ne nêrîna te be, çinkî yê ku şerê yê ku pê nikare bike, ew henasa xwe dixapîne.

---

<sup>1</sup>.Mezax: Mesref مصروف.

Eger qeral nehênparêz be, ew wezîrên xwe baş vedibjêre û wilo di çavên xelkê de bi heybet dibe, zû ne tê xapandin û tiştên baş ji destê xwe bernade. Qeralê min, tu jî wilo yî, qeral bi nêrîna wezîrên xwe bêtir dibîne; mîna çawa derya bi ava çeman pirtir dibe. Te li ser tiştêkî ji min pirs kir, bersiva min jî li ser wê hinek aşkere ye, min bersiva wê da, hin jî nehênî ye. Nehên jî aste ne: Hin jê komek pê zane, hin bi rawêjkariya millet dibe, hinek jê jî di navbera du mirovan de ye. Li gora vê nehênê, ez dibînim gerek e tenê çar guh û du ziman tê de beşdar bin.

Wê hîngê qeral yekser rabû, vê re bi tenê ma û pê rawêjî. Tiştê yekê ku qerêl jê pirs kir, ev bû: Ma tu despêka dijmantiya di navbera me û kundan de zanî? Got: Erê, gotinek bû qirikekê kir. Qerêl got: Ew çawa bû?

Qirikê got: Komek legleg bê qeral ma bûn, wan li hev kir, ku qeralê kundan li ser xwe bikin qeral. Gava ku ew di civata xwe de bûn, qirikek bi wir ket û wan got: Eger ev qirika bihata ba me emê pê rawêjîna. Pir ne çû, qirik hate ba wan, ew pê rawijîn û qirikê got: Eger tilûr li van welatan ne man, tawis, ordekan, mam<sup>1</sup> û kevok jî li cîhanê ne man, dîsa win ne bêgav in ku kund li ser xwe bikin qeral. Ew tilûra her dîmen û bedtirîn afrande ye; bi kêmtirîn hiş e, pir bi hêrs û ji dilovaniyê dûr e, kor û şemkorî<sup>2</sup> ye, bêhna wê a nexweş Jî dike ku tilûrek nikani be nêzîk wê bibe! Hîn ji wê bêtir û tiştê wê yê her pîs,

---

<sup>1</sup> .Mam: Ne`amê نعامة

<sup>2</sup> .Şemkorî: Bi şev nabîne.

arodetî û sinciya wê a bed e. Yan jî eger we ew kire qeral, winê bê wê, bi nêrîn û hişê xwe karûbarên xwe bi rê ve bibin. Eger wezîrên qerêl baş bin, wî jî guhdariya wan kir, nezaniya wî ziyane nagihîne milkê wî û karûbarê wî jî durust dibe. Mîna kêvroşka ku got, hêv qeralê wê ye û bi nêrîna xwe bi ser ket! Tilûran got: Ma ew çawa bû?.

### • **Mînaka Kêvroşk û Qeralê Fîlan**

*Mînaka ewê lawaz, ku bi dibaran şerê kesê hêzdar ji ser xwe dide alî û ziyane jî nagihîne.*

Qirikê got: Gotine ku li demekê, gelek salên ziwa di ser warekî ji warên fîlan re derbas bûn; ew ziwa bû, ava wî kêmbû, kaniyên wî miçiqîn, geya lê ne ma, dar hişk bûn, fîl jî pir tî bûn û rabûn çûn giliyê xwe kirin ba qeralê xwe. Qerêl jî ji bo peydakirina avê şande û pêşengên xwe bi her aliyekî de şandin. Hin şande ji wan vegeerîn û jê re gotin, li filan derê kaniyek heye jê re Kaniya Hêvê dibêjin, ava wê jî pir e. Qeralê fîlan ligel hevalên xwe berê xwe dane wê kaniyê, da ku avê jê vexwin, kanî jî di warekî kêvroşkan de bû; gava ku fîl bi wir ketin, wan pêle qulikên kêvroşkan kirin û gelek ji wan kuştin! Kêvroşk jî rabûn çûn ba qeralê xwe û jê re gotin: Te nas kir çî ji fîlan gihîşte me! Qerêl got: Bila herkesek ji we amade bibe û nêrîna xwe li ser wê yekê ji me re bêje. Kêvroşkeke ji kêvroşkan navê wê Feyrûz bû, qerêl zanî ku ew xwedî nêrîn û rewîşte e, got: Eger qeral baş bibîne, bila min bişîne ba fîlan; bila yekî dilsoz jî bi min re bişîne, da ku bibihîse û bibîne ezê çî

bêjim û bigihîne qerêl. Qerêl jê re got: Tu dilsozî, em bi gotina te qayîl in, here ba fîlan û te çî xwast, tu kanî li ser zimanê min bigihînî wan. Lê belê bila tu zani bî, ku şande bi nêrîn û hişê xwe, bi nermbûn û rindiya xwe tiştê ku di hişê yê ku şandî de ye xuya dike. Bila tu nerm, diltenik, hişmend û bi hedar<sup>1</sup> bî; çinkî şande eger diltenik be, dilan nerm dike, eger sert be jî, dilan teng dike.

Paşê kêvroşk di şevêk bi hêv de çû ta gihîşt ba fîlan, û ji tirsê ku -eger ne bi mebest be jî- ew pêlê wê bikin û wê bikujin, wê xwe nêzîk wan ne kir û çû li ser sirtekê sekinî, deng li qeralê fîlan kir û jê re got: Heyvê ez şandime ba te. Ji bo tiştê ku şande digihîne jî, ra eger şor giran jî kirin, lome jê nabin. Qeralê fîlan got: Name wê çî ye? Got: Ew ji te re dibêje: Ewê ku hêzdariya xwe li ser lawazan bibîne, û li gora wê yekê xwe li ser hêzdarên bibîne, hêzdariya wî dibe bela li serê wî. Te jî hêzdariya xwe li ser dewaran naskiriye, xwe li ser wan dibînî û hatî ser kaniya ku bi navê min bi van dibe, te jê vexwar û ew qirêj jî kir. Hêvê ez şandime û ez jî te agahdar dikim, ku tu careke din wan tiştan nekî. Eger te wilo kir, tuyê kûr û nexweş bibî! Eger tu li nama min jî bi guman î, bimeşe em herin ser kaniyê!

Qeralê fîlan ji gotina kêvroşkê mat ma û bi Feyrûzê re çû ser kaniyê, gava ku wî li kaniyê nêrî û ronîya hêvê tê de dît, wê hîngê Feyrûzê jê re got: Bi xertûmê xwe avê bibe,

---

<sup>1</sup>.Hedar: ragirtin, sebir الصبر

rûyê xwe pê bişo û ji hêvê re here ser çokan. Fîl xertûmê xwe xiste avê, av livî, fîl guman kir ku hêv lerizî! Wî got: Çi pirsra hêvê ye dilerize? Tu dibêjî, belkî ji ber ku min xertûmê xwe xiste avê ew xeyidî? Kêvroşk Feyrûzê got: Erê. Wê hîngê, fîl ji hêvê re çû ser çokan, ji bo tiştê ku kiri bû tobe kir û biryar da ku ne ew û ne fîlên wî dê careke din karekî wiha nekin!

Qirikê got: Digel tiştê ku me li ser Kundan got, hîn qelaşî, fêlbazî û pêlan jî li ba wan hene, qeralê şerûdtir jî e fêlbaz e! Kî bi ber destê siltanekî fêlbaz ket û berdestî jê re kir, çî hate serê kew û kêvroşkê, dema giliyê xwe kirin ber pisîkê, wê were serê wî jî. Leglegan got: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Kew, Kêvroşk û Pisîkê**

*Mînaka yê ku xwe ji mirov re bi rindî û çêkariyê bide nasîn, ta baweriyê pê dike û paşê zîyanê digihînê.*

Qirikê got: Cîranekî min ji kewan hebû; ew li nêzîk malika min di koka darekê de bû û pir dihat ba min. Paşê ew demeke dirêj ne hat ba min wînda kir û nizanî çû kû. Paşê kêvroşkek hat, li cihê kew rûnişt, min jî nexwast li dij wî derkevim û ew jî tê de ma. Lê piştî demekê kew vegeerî û hat mala xwe, lê wî kêvroşk tê de dît û rabû jê re got: Ev cihê min e, jê derkeve. Kêvroşkê got: Mal a min e, di destê min de ye, tu jî hatî wê ji xwe re dixwazî! Eger mafekî te heye ji min re mêlag<sup>1</sup> bike?. Kew got: Dadwer ji me ve nêzîk e; rabe em herin ba wî. Kêvroşkê got: Dadwer

---

<sup>1</sup>.Mêlagkirin: Çespandin, tekûzkirin تَأْكِيد



kî ye? Kew got: Pisîkeke perestvan li ber kendalê deryayê ye, bi rojê rojiyê digire û bi şev jî nimêj dike; ew kurmikekî nêşîne, xwînê jî narijîne û bi geya û tiştê ku derya jê re davêje dijî. Eger te hez kir, emê giliyê xwe li ba wî bikin û bi encamê qayîl bibin. Kêvroşkê got: Eger ew mîna te salix daye be, ez pir pê qayîl im, û bi hev re çûn ba wî, ez jî bi dû wan ketim da darizandina<sup>1</sup> nimêjekê şevperest<sup>2</sup> bibînim. Gava pisîkê dît ku kew û kêvroşk berve wî tên, rabû sekinî, nimêj kir û bawermendî û nasiktî li xwe xuya kir. Ew li rewşa wî mat bûn, bi tirs jê ve nêzîk bûn, silav danê û jê xwastin ku bikeve navbera wan; wî jî xwast ew çêroka xwe hewal bidin, wan jî rabû jê re hewal da, wî ji wan re got: Ez navsal bûme, guhên min giran bûne, ji min ve nêzîk bibin, bila ez bibihîsim win çî dibêjin; ew jê ve nêzîk bûn, dîsa çêroka xwe jê re hewal dan û daxwaza darizandinê jê kirin.

Wî got: Min nas kir we çî got; lê berî ku ez navbera we bibirin, ezê we şîret bikim. Ez dibêjim win guhdariya Xweda bikin û ji bilî mafê rast nexwazin; ji ber ku mafxwaz bi ser dikeve, ta ku biryara dadwer li dijî wî be jî; dozdarê<sup>3</sup> nerastiyê jî bi ser nakeve, ta ku biryar jê re jî were standin. Kesê ku vê cîhanê dixwaze, bila zani be ku tişteki wî tê de tune, ne mal û ne dost, tenê karê qenc yê ku dike, tenê ew jê re dimîne; çînkî gerek e xwedî hiş tiştê

---

<sup>1</sup>. Darizandin: Dadgehkirin محاکمة

<sup>2</sup>. Şevperest: Bi şevê perstvaniya Xwedê dike.

<sup>3</sup>. Dozdar: Yê ku doza tişteki dike.

ku mayînde<sup>1</sup> bixwaze, da ku siba sûdê jê bibîne, di daxwaza xwe de jî ji bilî wê ji tiştêkî ji karûbarên cîhanê hez neke; çinkî nirxa mêl li ba hişmend mîna nirxa axê ye, payedariya xelkê jî li ba wî wekî ku çawa çêxwaziyê ji bo henasa xwe dixwaze, şerxwaziyê jê re naxwaze û ji bilî xwe re jî wilo ye. Pisîkê tiştên mîna van gotinan pir ji wan re gotin, ta ew jê re vehesîn, bi ser de hatin û jê ve nêzîk bûn. Wê çaxê wê xwe avêt ser wan û ew her du kuştin. Qirîkê got: Li gel bêbextiya kund ku min ji we re got, hîn gelek kêmaniyên din jî di wî de hene, wê lomê jî bila kund nebe qeralê we.

Gava ku leglegan ew gotina ji qirîkê bihîstin, wan kund ji xwe re ne kirin qeral. Wê hîngê, kundek jî li civatê hebû gotina wan bihîst, wî ji qirîkê re got: Te ez pir tengijandim, ez nizanim ku berê tiştêkî ji min gihîştîye te ta ku te ew gotina kir! Bila tu zani bî, tevir<sup>2</sup> darê dibire lê dîsa şîn dibe, şûr goşt dibire lê ew jî dîsa tê hev, lê birîna zimên çak nabe û keviyên wê nagihên hev; hesinê serê kevanê jî di goşt de winda dibe lê dîsa jê tê derxistin! Lê gotinên mîna serê tîrê, eger gihîştin dil jê nakişên û dernakevin. Her şewatek jî bi tiştêkî vedimire; ji êgir re av, ji zihêrê re derman, ji xemê re hedarî û ji evînê re jevdûrketin; lê belê agirê kînê hîç venamire! Qirîkino, we di navbera me û xwe de dara kîn, dijmantî û zikreşiyê çand.

---

<sup>1</sup> .Mayînde: tiştê ku dimîne.

<sup>2</sup>.Tevir: Bivir, alaveke hesinî ye duserî ye, pê daran dipaqînin.

Piştî ku kund gotina xwe kuta kir, bi hêrs rabû û çû û qeralê kundan bi her tiştê ku bû û hemî gotina qirikê agahdar kir. Paşê qirik li tiştê ku jê derhat poşman bû û got: Bi xwedê ez di gotina xwe de şaş çûm û dijmantî û zikreşî bi ser xwe û xelkê xwe de anî. Xwaziya min li ser wê rewşê bi leglegan re deng nekira û ew tiştina bi wan re hewalnedana! Belkî piraniya tilûran ji min bêtir cîhan dîtibin, bi gelek caran ji min zanatir bin jî, lê gotina ku min kir wan ne kir, ew jî ji ber ku ew xwe ji tiştê min xwe jê ne parast diparêzin; min li tiştê ku dê li dû wê gotinê were kirin ne nêrî, nemaze jî eger ew gotina gotineke pir xirab be û kîn û rikê di dilê guhdar de diçîne; gotina mîna vê, gotin ne tê jimartin, çinkî ew wek tîra ye. Gotinên xirab xwediyê xwe davêje nava kîn û dijmantiyê. Hişmenced jî -raku bi hêz û ji rindiya xwe bawer be -gerek e bi hêz û nêrîna ku li ba wî heye dijmantiyê ji xwe re çêneke. Ra eger dermanê dijî jehrê jî li ba wî hebe, dîsa jî gerek e jehrê venexwe. Xwedanê karê çê, raku gotina wî li despêkê hindik be, lê rindiya wê gotinê di seza û ezmûnê de aşkere û diyar dibe. Xwediyê şorên xweş jî, raku xelk bi salixdana wî ji tiştan re seyr dibe, lê dîsa jî dawiya karê wî bi guman dibe.

Ez xwedanê gotina ku dawiya wê ne baş e me! Ma ne ji kêmhîşîya min e, ku ez li ser tişteki baxivim, baş tê de neramim û bi kesekî ranewêjim?! Kî bi şîretkar û mezinan ranewêje, tiştan baş raneke, dînene û nepîve û tenê bi ya xwe bike, ew bi encama nêrîna xwe şa nabe. Ma ev tiştê

ku min kir û xema ku ez ketimê gerekî min bû?! Qirikê bi van gotinan û yên mîna wan xwe lome kir û çû.

Ev bû rastiya mijara<sup>1</sup> despêka dijmantiya di navbera me û kundan de ku te pirs kir.

Te ji bo şer nêrîna min nas kir, nas kir jî ez çiqas jê hez nakim. Lê li ba min -ji bilî şer- nêrîn û fêlbazî hene, bi ya Xweda çareserî jî wê tê de hebe; çinkî belkî miletek, da ku tiştê dixwaze bi dest bixe, bi hişê xwe xwe diparêze. Ji mînaka wê, çêroka kesên ku nasik têkbirin û gîska<sup>2</sup> wî jê birin. Qerêl got: Ma ew çawa bû?

- **Mînaka Gîskê, Nêsik û Koma Mirovan**

*Mînaka kiriyara fêlbazan bi kesên nezan re ta wî têk dibin.*

Qirkê got: Dibêjin nasikekî gîskeke girs kirî da ku bike qurban. Wî ew li dû xwe kişand û çû mal; lê komek qelaş ew dîtî û di nav xwe de pêlan gerandin ku gîskê ji nêsik bibin. Yek ji wan hate pêşiya nêsik û jê re got: Nasiko! Ev çi kûçik e bi te re ye? Yekî din jî di wir re derket û ji hevalê xwe re got: Ev ne nasik e, çinkî nasik kûçikan najon! Wan wilo bi nêsik kir, ta wî bawer kir, ku ewê vê re kûçik e, ne gîsk e, ewê ku firote wî jî çavên wî avsûn kirin û ji hev dernexist ku gîsk e yan seg e! Bi wî rengî, wî gîsk ji destê xwe berda, koma fêlbazan jî ew bir û çûn.

---

<sup>1</sup>.Mijar: Pirsar mijarekê موضوع

<sup>2</sup>.Gîsk: Karika yek salî.

Min ev mînaka ji te re anî, çinkî ez hêvî dikim, em bi nermî û fêlbaziyê bigihên daxwaza xwe. Ez ji qerêl dixwazim min li pêş xelkê nikil bike, per û dûvê min pirçûlaskî bike, min bavêje koka vê darê û ew û leşkerên xwe jî koçe filan derê bikin. Ez hêvî dikim bisebirim û rewşên kundan û cihên çeper û dergehên wan nas bikim; paşê ezê wan bixapînim û werim ba we, da ku em hêriş wan bikin; bi ya Xwedê, bi wê yekê emê bi wan re bigihên armanca xwe. Qerêl got: Ma tu ji wê yekê re dilxwaz î? Got: Erê, emê çawa jê re ne dilxweş bin û kêfxwaşiya mezin ji qerêl û leşkerên wî re tê de heye!? Qerêl jî rabû tiştê ku qirikê xwast pê kir û li gel civata xwe ji wir bar kir.

Wê gavê, qirik rabû nalî û bi hêdîka deng derxist, ta kundan dengê wî bihîst û dîtîna kî dinale. Ew çûn ba qeralê xwe û pê agahdar kirin, ew jî hat ba wî da ku li ser qirikan jê bipirse; gava jê ve nêzîk bû, ferman da kundekî da ku jê bipirse, wî jê re got: Tu kî yî? Qirik kanîn? Got: Navê min filan e, lê ji bo tiştê ku te ji min pirs kir jî, ez bawer dikim, tu dibînî, ku rewşa min ne rewşa yê ku bi nehênan zani be ye. Wê hîngê ji qeralê kundan re hate gotin: Ev wezîrê qeralê qirikan û rawêjdarê wî ye. Emê jê bipirsîn, bi çi gunehî ev tiştê pê hatiye kirin?! Gava ku li ser rewşa wî jê hate pirsîn, wî got: Qeralê me ji bo rewşa we bi civata me rawêjî, ez jî wê rojê li wir amade bûm, wî got: Qirikino! Win di vê yekê de çi dibêjin? Min got: Qeralê me, em nikanin bi kundan re şer bikin; ji ber ku ew pir şerûd in û

dilên xwe ji yên me xurtir in. Ez dibînim, em lihevhatinê bixwazin û xûkê<sup>1</sup> ji ber ve bidin, eger kundan ew ji me pejirand, emê li cihê xwe bimînin; yan jî gerek e em ji welêt birevin! Eger şer jî di navbera me û kundan de çêbû, dê ji wan re xêr be û ji me re şer be! Lihevhatin ji dijmantiyê çêtir e; min ji wan xwast ku ji şer bigerin; min mînak jî li ser wê anîn û ji wan re got: Hêz û hêrsa dijminê xurt ji bilî ku tu xwe radestê bikî ne tê hembêzkirin. Tu nabînî çawa geya bi nermikî û tewandina xwe, xwe ji bayê hêgin diparêze, lê dara bilind pê dişkê û perçe dibe. Lê wan bi ya min ne kir û gotin em şer dixwazin. Wan bi sedema gotina min ez gunekar kirim û gotin: Tu bi kundan re li dijî me yî, bi gotin û şîreta min ne kirin, ez êşandim û qerêl û leşkerên wî ez hîştim û çûn, ji wê çaxê de jî ez rewşa wan nizanîm.

Gava ku qeralê kundan gotina qirikê bihîst, bi wezîrên xwe re got: Win ji bo qirikê çi dibêjin? Ji bo wî çi dibînin? Yekê got: Ji bilî kuştinê ez çareyê jê re nabînim, ev baştirîn mirovê qirika ye, kuştina wî dê me ji qelaşîya wî vehesîne, çûna wî jî ji nav qirikan wê li wan pir giran be. Eger ew were kuştin, mala wan hildiweşe û wêran dibe. Ez dibînim ev serketineke ku Xwedê ji te re şandiye. Dibêjin: Eger kê derfeta serkeftinê bi dest ket û wek tê xwastin ne kir, ew ne hişmend e; kê tiştê mezin xwast û bi dest ket û ne kir, ewê ji dest here û ne hêja ye ku careke din wê fersendê bibîne. Kê dît jî, dijminê wî lawaz e û ne

---

<sup>1</sup>.Xûk: Baç, bac, pereyên ji berdêla lihevhatinê..

kuşt, dema ku ew xurt bû û pê nikarî dê poşman bibe!  
Çinkî kar bi demên xwe ve girêdayî ne.

Qerêl ji wezîrekî din re got: Tu ji bo vê qirikê çi dibînî?  
Got: Ez dibînim tu wê nekuştî; tu dibînî wê çi ji hevalên  
xwe dîtiye, ew kane bibe hewaldê<sup>1</sup> li ser kêmaniyên wan,  
ji bo têkbirina wan jî wê ji te re bibe alîkar; dijminê bêçare  
û bê pişgir jî, hêja ye ku ewle bibe, nemaze ewê tirsîyayî û  
xwe avêtiye ber deriyê te. Eger sûd ji dijminekî hat, raku  
ne bi mebest be jî, hêja ye ji bona wê lê were borîn. Mîna  
ew bazirganê ku jina wî bi sedema dizekî jê hez kir û ew jî  
li diz borî. Qerêl pirsî: Ma ew çawa bû?

### • Mînaka Diz û Bazirgên

Wezîr got: Gotine ku bazirganekî xwedî mal û  
dewlemend hebû, jineke wî ye pir xweşik jî hebû; lê dilê  
wê ne bi ser mêrê xwe de bû. Rojekê dizekî xwe avêt mala  
bazirgên, derbas hundir bû û dît ew di xewê de ye, lê jina  
wî payî bû, ji diz tirsî, xwe avêt ser bazirgên, pê girt û xwe  
kir hembêza wî; hêviya bazirgên jî ew bû, ku rojekê jina  
wî jê ve nêzîk bibe, wê çaxê bazirgan şiyar bû û dît ku jina  
wî di hembêza wî de ye, wî got: Ev xêra ji min re ji kû  
hat? Dema ku çavên wî li diz ketin, got: Dizo, tişt û malê  
min yê ku te bir li te helal be, bi saya te dilê jina min bi ser  
min de hat û kir min hembêz bike.

Qeralê kundan ji wezîrekî din ji wezîrên xwe re got: Tu  
ji bo qirikê çi dibêjî? Got: Ez dibînim tu wî bihêlî û jê re

---

1. Hewaldê: Ê ku tiştan hewaldide, rêber, defil.

rind bî; çinkî ew kane te şîret bike. Dijîtiya dijminan ji hev re, ji mirovê hişmend re serketineke baş e; xerîkbûna<sup>1</sup> dijminan bi hev rizgarî ji henasa qerêl re tê de heye, mîna rizgarbûna nêsik ji diz û pelîd<sup>2</sup> gava ku li hev ne kirin. Qerêl pirsî: Ma ew çawa bû?

### • Mînaka Diz, Nêsik û Pelîd

Wezîr got: Gotine ku nasikekî çêleke bi şîr ji mirovekî wergirt û bire mala xwe; lê dizek lê derket û xwast wê bidize, pelîdekî jî cilên mirovan li xwe kiri bûn, ew jî bi dû ket û xwast nêsik birevîne. Pelîd ji diz re got: Tu kî yî? Got ez dizim; eger nêsik xew kir, ez dixwazim vê çêlê jê bidizim. Lê tu kî yî? Wî jî got: Ez jî Pelîd im, eger wî xew kir ez jî dixwazim wî birevînim. Ew li ser wê yekê gihîştin ber mala nêsik, nasik derbas mala xwe bû, ew jî li dû derbas bûn. Nêsik çêl derbas hundir kir, li koşa malê girêda, şîv xwar û raza. Wê hîngê, diz û Pelîd hatin da ku karê xwe bikin; lê wan li hev ne kir ku kî wê li despêkê dest bi karê xwe bike, pelîd got: Eger te dest pê kir û çêl bir, belkî mirov şiyar bibe, bang bike û xelkê bicivîne, wê hîngê ezê nikanibim wî bibim; li benda min bisekine ta ez wî dibim û paşê tu çawa dixwazî bike. Lê diz tirsî eger pelîd li despêkê wî birevîne, belkî nasik şiyar bibe û wilo ewê nikani be çêlê bibe, got: Na! Tu li benda min be ta ez çêlê dibim û paşê tu çi dixwazî bike. Pelîd got: Tu li benda

---

<sup>1</sup>.Xerîkbûn: Mijûlbûn.

<sup>2</sup>.Pelîd: Şêtan البليس.



min be ta xelk dikeve xewê û emê wan bi hev re bibin. Ew hîn di wê dengkirinê de bûn, diz dengê xwe bilind kir û bang kir: Nasiko! Haj xwe hebe; ev pelîda dixwaze te birevîne; pelîd jî bang kir û got: Nasiko! Haj xwe hebe; ev diza jî dixwaze çêla te bidize! Nasik û cîranên wî li ser dengên wan şiyar û haydar bûn û her du çepel jî derketin û revîn.

Wezîrê yekê yê ku goti bû ku qirikê bikuje, got: Ez guman dikin qirikê win xapandin û gotina wî li ba ê bêhiş cihê xwe girt. Win dixwazin nêrîna rast dînin cihê a nerast. Qeralê me! Hêdî hêdî ji bo vê nêrînê. Bila tu ji tiştê ku dibîhîsî, ji tiştê ku dibînî bêtir bawer nekî. Mebe mîna mirovê ku bi tiştê dît bawer ne kir û bi tiştê bihîst bawer kir, û wilo ew hat xapandin! Qerêl got: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Diz û Mirov**

Wezîr got: Gotine ku şevê mirovek bi tena xwe li mala xwe xew kiri bû, dizin jî hatin ketin mala wî, çi tişt tê de hebû kom kirin û gihîştin cihê ku xwedanê malê lê raza bû. Wê hîngê ew li wan haydar bû, lê ji tîrsa ku diz li wî bidin, ew ranebû. Di oda ku ew tê de raza bû de jî deriyekî din hebû, ew di rêkê re vedibû, wî bi xwe re got: A rast ew e, ku ez wan li xwe haydar nekim û netirsînim, bila tişt bibin cihê ku dixwazin lê kom bikin, wê hîngê ezê di deriyê din re derkevim, deng li cîranan bikim û emê jinişkave herin û wan bigirin.

Wilo, ew di nava nivînên xwe de ma, wekî ku di xew de bû, ta dizan tiştên ku dixwastin bicivînin civandin û derketin da ku bar bikin. Wê hîngê mirov hêz da xwe da ku rabe, lê diz bi liva wî hestewar bûn û serokê wan bi dizî ji wan re got, rawestin û metirsin, werin em dibarekê lê bikin, wî bixapînin û bila westana me vala neçe! Ezê niha dengê xwe bilind bikim û tiştêkî ji we re bêjim, win jî gotina min rast bibînin û guhdariya min bikin. Gotin: Bila be! Diz dengê xwe bilind kir da ku xwedanê malê bibîse û ji hevalên xwe re got: Ez dibînim ev tiştine pir giran û bi westan in, nirxa wan ne hêjayî barkirina wan e û em xwe ji bo wan nexin metirsiyê! Ji min ve xuya dibe, ku jiyana vî mirovî ne baş e û dilê min jî pê şewitî, ez li ber ketim û min nêrîna xwe li ser guhert. Ez dibînim em tiştê wî jê re bihêlin, çinkî ew ew tiştê jî ne hêjayî westanê ye, ne jî sûdeke mezin ji me re tê de heye û li ser me diziyek jî tê hesêb, û.

Min ji hin navdartirîn dizan bihîstiyê û wan digot: Kê kanî tiştê xizanekî bidiziyê û hîşt û ne dizî, Xwedê li gunehê diziyê sed dewlemendî dibore. Diziyê mafdar û helal, diziyê ji dewlemenda ye, nemaze jî ên çekoz û hesabdar, yên ku mal û xezînen wan ji malên ku tê de hatine veşartin re bûne gor û ne sûdê jê werdigirin ne jî ji xelkê re dihêlin! Bimeşin em herin mala yekî ji wan, ev kilkewşa<sup>1</sup> ku sûdê tê de tune ye bihêlin û çêsezaya ev mirovê xizan ji xwe re wergirin! Hevalên diz hemîyan got:

---

<sup>1</sup>:Kilkewş: Tiştê hûrmûrê bê nirx.

Te rast got û baş kir, wan kirin ku baran vedikin û derketin derve û li bendê man ku xwedanê malê raze. Dema ku mirov gotina wan bihîst, wî pê bawer kir, ewle bû û guman kir ku ew derketin û çûn, û ew hêmin bû û raza! Diz jî man, ta bawer kirin ku wî xew kir, ew çûn ber baran, rakirin û ji xwe re birin!

Min ev nimûna ji te re anî, da tu nebî mîna ew mêrê bi tiştê ku dît û pê bawer ne kir û tiştê bihîstî jî rast dît. Lê Qerêl guh ne da gotina wî û ferman da ku qirikê bibin warê kundan, rûmetdar bikin û bi rindî lê binêrin!

Rojekê komek ji kundan li ba qerêl kom bû bûn, wezîrê ku xwast qirik were kuştin jî hebû, qirikê got: Qeralo! Te dît çi ji qirikan bi serê min hat, eger ez tola xwe ji wan hilnedim, dilê min venahese. Min li pirsê nêrî û min dît, ji ber ku ez qirik im, ezê nikani bim armanca xwe pêk bînim! Lê li ser zimanê zaniyaran hatiye hewaldan ku wan gotiye: Kê xwast xwe bişewtîne, qurbanek pir mezin ji bo Xweda dike û wê hîngê çi daxwaz û çi lavê bike jê re pêk tê. Eger qeral bibîne û fermanê bide, ku ez xwe bişewtînim û ji Xwedayê xwe bixwazim min bike kund da ez bi xurtî ji qirikan re bibim neyar û li ser wan bihêztir bibim, ezê bi ya wî bikim û xwe bişewtînim; belkî wê hîngê ez kani bim tola xwe ji wan hilînim. Lê wezîr goti bû ku bila ew were kuştin, got: Bi rindiya ku tu xuya dikî, bi şerê ku di hundirê te de vedişêrî, tu mîna meya tamxawêş î û bayê ku zihêr tê de belavkirî yî. Ma tu bawer dikî, eger me govdê te bi êgir şewitand, cewher û sinciyên

te wê werin guhertin?! Ma ne tu bi kû ve herî sinciyên te jî bi te re diçin û paşê vedigerî ser kokûbinyat û xwezaya xwe?! Mîna mişkê jê re gotin tu dixwazî bi kê re bizewicî, rojê, bê, `ewr lê çiyê, wê pir rakir û danî û li dawiyê li koka xwe veogerî û mişkek kir. Ji wezîr re gotin: Ma ew çawa bû?

### • **Mînaka Mişkê û Nêsik**

Got: Gotine ku nasikekî bergera<sup>1</sup> xwe bi ci dihat. Dema ku rojekê li ber perava deryayê rûnişti bû, başîqek di ser re derbas bû, çêlikeke mişkan bi lingan ve bû û ew çêlika ji pepilan fikitî û li ba nêsik ket. Dilovanî kete dilê nêsik û rabû ew mişka bi kaxetekê pêça û bi xwe re bir û çû mala xwe. Ew tirsî ku ji xêzana<sup>2</sup> wî re dijwar be û nikani be wê mişkê tîmar bike, wî ji Xwedayê xwe tika<sup>3</sup> kir ku wê bike keçeke cariyê, û wilo ew bû cariyêke sibehî, bi xwe re bir ba jina xwe û ji jina xwe re got: Ev keça min e, wekî ku tu ji lawê min re dikî ji wê re jî bike.

Dema ku keçik mezin bû, nêsik jê re got: Keça min, mêrekî xwe bibîne û vebjêre da te bidimê. Wê got: Eger tu dixwazî ez vebjêrim, ez mêrekî dixwazim bila ji her tiştêkî bihêztir be. Nêsik got: Belkî tu rojê dixwazî! Ew çû ba rojê û jê re got: Ey afrandeyê<sup>4</sup> gewre, cariyêke min heye

---

<sup>1</sup>.Berger: Lave, tika الرجاء، دعاء،.

<sup>2</sup>.Xêzan: Jin, hevjin

<sup>3</sup>.Tika: Ji xwedêyê xwe xwast, rica kir.

<sup>4</sup>.Afrande: Hatiye afrandin, mexlûq.

mêrekî ji hemî tiştan bihêztir dixwaze, ma tu bi wê re nazewicî? Rojê got: Ezê ewê ku ji min hêzdartir şanî te bidim, ew jî `ewr e, ew ser rûyê min digire, tîna tîrêjên min vedigerîne û ronîya min kûrik dike, ew ji min bihêztir e! Nasik çû ba êwr û gotina rojê jê re got, êwr got: Ezê jî yê ji min bihêztir şanî te bidim, here cem bê, ew min radike, dibe û tîne û min bi Rojhilat û Rojava de dibe. Nasik hat ba bê û mîna tiştê ku ji êwr re hewl da ji wî re jî got, wî jî got: Ezê jî yê ji min bihêztir şanî te bidim, ew jî çiya ye, ez çiqas bi hêz im, lê ez nikanim wî bilivînim. Mirov çû ba çiyê û gotina bê jê re got; çiyê jî bersiv da û jê re got: Ezê jî yê ji min bihêztir şanî te bidim, ew jî mişk e, ez bi wî nikanim, ew xaka min qul dike û min ji xwe re dike mal. Nasik çû ba mişk û jê re got: Tuyê bi vê cariyê re bibî hevjin? Wî got: Çawa ezê wê bibim û mala min teng e?! Lê mişk qayîl bû ku bi mişkê re bizewicin; wê hîngê nêsik lave ji Xwedayê xwe kir, ku bi razîbûna cariyê wê mîna berê vegerîne û bike mişk! Xwedê jî ew vegerand regeza<sup>1</sup> wê a berê û herwiha bi mişk re çû.

Ev nimûna te ye, ey fêlbaz! Lê qeralê kundan guh ne da wê gotinê, û ji qirikê re dilovan û pir camêr ma. Dema ku jiyana qirikê baş bû, per pê hatin û tiştê ku dixwast nas bike dît û nas kir; wê dibarek kir, firî, hate ba hevalên xwe û çî tiştê ku dîtî bû û bihîsti bû ji wan re hewal da. Wî ji qerêl re got: Tiştê ku min dixwast min kir, tenê tu bibihîse

---

<sup>1</sup>.Regez: Nijad, cins.

û bi ya min bike. Qerêl got: Ez û leşkerên xwe dibin fermana te de ne û wek tu dixwazî bike.

Qirikê got: Kund li filan derê ne, li ciyekî ku êzing lê pir in, li wê derê keriyek pez û şivanek hene, emê li wir agirekî dadin, bavêjin qulên kundan, ezingên hişk bavêjin ser, di ser re herin û werin û baskên xwe li hev xîna ta agir bi daran dikeve û wilo kî ji wan derkeve wê bişewite, yê dernekeve jî wê di cihê xwe de bi dûmanê bimire. Paşê, qirikan çû wilo kir, hemî kund kuştin û bi xweşî û ewlehî vegehrîn malên xwe.

Paşê, qeralê qirikan ji wê qirikê re got: Tu çawa li ser hevaltiya kundan sebirî, nemaze jî sebra çêxwazan li ser şerûdan ne tê û pir dijwar e jî?! Qirikê got: Qeralê min, tiştê te got pir rast e! Tê gotin ku şewata êgir ji dostaniya şerûdan û rûniştina bi wan re çêtir e. Lê belê, eger mirovê hişmend tiştên xirab û mezin bi ser wî û miletê wî de hatin û tirsî ku nikani be xwe li ber ragire<sup>1</sup> û li ser wî û miletê wî giran be, wê hîngê, ew ji giraniya sebrê natirse û li benda hêviyan dimîne ku sebra wî dawiyeye baş û bi xêr bi xwe re wine. Loma jî, ew bi êşeka wê hestewar nabe û kane têkeve bin fermana yekî ji wî kêmtir, da ku bigihê daxwaza xwe, bi dawiya karê xwe û çêsezaya sebra xwe jî şa bibe.

Qerêl got: Li ser hişên kundan ji min re hewalde. Qirikê got: Ji bilî ewê ku dixwast ez werim kuştin û gelek

---

<sup>1</sup>.Ragirtin: Tehmûlkinin التحمل

caran qeral dihevojte ser min, min di nav wan de hişmend ne dîtîn; nêrîna wan zor lawaz bû, wan li rewşa min ne nêrî û ne gotin ku ez di nav qirikan de xwedî paye bûm û xwedî nêrîn dihatim jimartin. Ew ji qelaşî û fêlbaziya min ne ditirsîn, ne jî gotina ew rawêjdarê wan ê hişmend pejirandin. Wan nehênên xwe ji min venediştartin. Zaniyaran gotiye: Gerek e qeral rewşa xwe ji fisûkan biparêze û kesekî bi nehênên xwe nede nasîn. Hatiye gotin jî: Gerek e mirov di her tiştêkî de haya xwe ji dijminê xwe bibe, ta di ava ku vedixwe û xwe pê dişo, nivînên ku tê de radize, cilên li xwe dike, dewarê ku lêdine, û ji bilî ew kesên bawerdar û dilsoz ku hundir û derveyê wan durust be, bila ji kesekî ewle nebe; digel wê gişî jî, gerek e dîsa jê haydar be; ji ber ku dijmin ji bilî di riya bawerpêkiran<sup>1</sup> re nikare bigihê wî, çinkî belkî kesek bi dijminê wî re dost be û dijmin di riya wî re bigihê armanca xwe!

Qerêl got: Ez dibêjim, tiştê ku kund têk birin, setemkarî û lawaziya nêrîna qerêl û erêkirina wî ji wezîrên bed re bû. Qirikê got: Te rast got qeralê min; çinkî kêmcaran kesek dewlemend bûye û setemkar ne bûye, hindikcaran yek pir dixwe û nexweş nabe, pir hindik mêrekî meraq li jinan kiriye û riswa ne bûye, kêmcaran jî yekî bawerî bi wezîrên bed kiriye û ji ketina tengahiyan ewle bûye.

Dihat gotin jî: Bila pozbilind li benda pesnê nemîne, xapînok li benda dostê rind nemîne, ne jî xwedî sinciyên

---

<sup>1</sup>.Bawerpêkir: Cihê baweriyê ye.

bed li benda şerefê be, miqris li benda kirina rindiyê be, kedxwar li benda gunehên hindik be, qeralê pozbilind ku guh nade karê xwe û wezîrên xwe jî lawaz bin li bendê be ku milkê wî jê re bimîne û xelkê wî durust bibe. Qerêl got: Te bi dijarî xwe di nav wan de ragirt û kanî xwe ji wan ve nêzîk bikira, te di wî warî de dijarîyên giran ji wan dîtin. Qirikê got: Ê ku hêvîxwaz be ku sûdê wergire, xwe li ber dijarîyan radigire, dest ji qîret û rûmetê bernade û ji bo sebrê bi biryar dibe. Tenê ew li bendê dimîne ku dawîya karê xwe bi encama baş bibîne; mîna çawa marê reş qeralê beqan li piştta xwe kir, lê sebirî, pê têr xwar û jiyana xwe berdewam kir. Qerêl got: Ma ew çawa bû?

### • Mînaka Marê Reş û Qeralê Beqan

Qirikê got: Dibêjin, marekî reş navsal<sup>1</sup> bû, roniya çavan kêr bû, nikarî nêçîr bikira û xwarin ji xwe re peyda bikira. Rojekê ew xuşî û li tiştêkî gerî da ku bixwe, ta gihîşt kaniyeke tijî beq, ew berê jî dihate wir û roziya xwe ji beqên wê dibir. Wî xwe li kêleka beqan dirêj kir û xwe xemgîn û melûl kir; beqekî jê pirsî: Marê reş! Tu çima melûl û xemgîn î? Got: Ma kî wê ji min xemgîntir be?! Piraniya jiyana min li ser nêçîra beqan bû, lê ez bi belakê ketime û ji ber wê ji beqan bêpar bûme; ra eger rastî wan jî werim, ez nikanim wan bigirim.

Beq bi lez çû ba qeralê beqan û mizgîna tiştê ku ji marê reş bihîst dayê. Qeralê beqan jî hate ba marê reş û jê re

---

<sup>1</sup>.Navsal: Temen mezin



got: Çi bi te re çêbûye? Got: Berî çend rojan, ez hêvarekê ji bo ku beqekî bigirim, derketim û min neçar kir ku beq derbas mala nasikekî bibe û ez jî di reşantiyê de li dû wî ketim malê; kurê nêsik jî li mal bû, min jî tiliya wî gez kir û got belkî beq e û ew ket û mir! Ez derketim û revîm, lê nasik li dû min hat, lave û nifir li min kirin û got: Mîna ku te lawê min ê bêguneh bi setemkarî û mebest kuşt, ez jî nifirê li te dikim ku tu payenizim bibî, bibî siwargeha qeralê beqan û nikani bî wan bigirî, ne jî yekî ji wan bixwî, ji bilî yê ku qeralê wan xêra xwe li te bike! Ez jî bi xwe û bi razîbûna xwe hatim da ku tu li min siwar bî. Qeralê beqan jî dil xwast ku li marê reş siwar be û bawer kir ku jê re rûmet, serbilindî û payedarî ye; rabû lê siwar bû û pir li xwaşiya wî hat. Marê reş jê re got: Qeralo! Mîna ku te nas kir, ez ji xwarinê bêpar mame, roziyekê ji min re peyda bike da ku jiyana xwe pê berdewam bikim. Qeralê beqan got: Bêguman! Eger tu bû siwargeha min, gerek e roziyeke te hebe da ku pê li ser xwe bimînî. Wî ferman da, rojê du beqan jê re wînin û bidinê, û wilo ew pê jiya, berdestkariya ew dijminê kê m kir û ew kara jê re ne bû asteng; na belê wî sûd jê dît, rozî û jiyana xwe pê vejî<sup>1</sup> û berdewam bû.

Herweha, ez li ser ew tiştê dijwar sebirîm. Ez bi hêvî bûm ku sûda mezin ji bo me qirikan tê de hebe û ewlehî û serketin be, û wilo kuştina dijmin û vehesa me jî pê pêk hat. Min dît jî ku nermî û hedarî ji bo tunekirina dijmin, ji

---

<sup>1</sup> .Vejî: Lêkera borî ji vejandin, nûkirin..

pozbilindî û serhişkiyê bileztir û bihêztir e. Çinkî, eger agir bi darekê ket, ew bi alaf û germa xwe, tenê beşê wê yê li ser rûyê zemînê dişewtîne; lê av bi sarbûn û nermiya xwe, beşê wê yê binê zemînê wêran dike.

Tê gotin: Çar tişt hene, hindikiya wan hindik ne tê dîtin: **Agir, nexweşî, neyar û wam**<sup>1</sup>. Qirikê got: Ew hemî jî ji nêrîn, rewîşt, dilşadî û bextewariya qeralê me ne. Berê jî dihat gotin: Eger diduyan tişteke xwast, ê qîretir bi dest dixwe; eger di qîretiyê de hemta bin, ê rikdartir bi dest dixwe, eger di rikdariyê de jî wek hev bin, ê bextewartir bi dest dixwe. Berê jî dihat gotin: Kî şerê qeralê xwedî biryar, jêhatî û xwedênas ku rewşa wî a baş wî har nake, tengahî jî wî bêçare nake, bike, wê hîngê ew bi xwe mirinê ji xwe re dixwaze, nemaze jî eger ew mîna te bi erk be, cihên guvaştin û sistkirinê, hêrs û razîbûnê, lezandin û hêdfîkirinê zani be, û li roj û siberoja xwe û encamên karên xwe miqyat be.

Qerêl bi qirikê re got: Lê belê ew kara bi nêrîn, hiş, şîret û bextewariya te bû. Çinkî nêrîna mirovekî hişmend û xwedî biryar di têkbirina dijmin de ji leşkerên pir, xwedî hêz, amadekarî, hejmar û pêdewîst<sup>2</sup> xurtir e. Tiştê te ê herî seyr li ba min ew e, ku tu ew dema dirêj li ba wan mayî, gotinên wan ên hişk dibihîstin û bi gotinekê bi wan re jî xwe şaş ne kir!

---

<sup>1</sup> .Wam: Dên.

<sup>2</sup>.Pêdewîst: Tiştên gerek, مستلزمات.

Qirikê got: Qeralê min! Ez hîn bi weseka<sup>1</sup> te dikim; ez dostaniyê bi ên dûr û nêzîk re bi nermî û dilxweşî û bi pesindan û erêkirinê dikim. Qerêl got: Min çavên xwe vekirin û min dît tu xwedî xebat î, wezîrên din jî xwedî şorên bê encam, vala û ne baş in. Xwedê rindiyêke mezin bi saya te gihande me; berî wê me tu xweşî ji xwarin û vexwarinê ne didît, ne jî ji xew û rawestanê. Dihat gotin: Mirovê nexweş xweşiya xwarin û xewê nabîne ta çak dibe, mirovê çavbirçî jî ku çavê wî li malekî û karekî be, ta wî bi dawî neke kêfxwaş nabe, mirovê ku neyarê wî li pê wî be û bi şev û rojê jê bitirs be, dilê xwe venahese ta jê xelas dibe. Kê barê giran ji piştta xwe danî, xwe vedihesîne; kî ji dijminê xwe bi ewle bibe, dilê xwe hênik dibe. Qirikê got: Ez ji Xwedayê xwe razî me ku dijminê te têk bir. Hêvîdar im te bi qeraltiya te şa bike, xelkê te bi xêr bike û bi qeraltiya te dilşa bibin. Çinkî, eger qeral ne cihê dilşahiya xelkê xwe be, ew dibe mîna giliyên<sup>2</sup> bizinê, karik dimije û ji wê tirê<sup>3</sup> guhan e û tu xêrê jî jê nabîne.

Qerêl got: Ey wezîrê durustkar! Ma reftara<sup>4</sup> kundan û qeralê wan di cengên wan de çawa bû, çi ji bo karûbarên wê dikirin? Qirikê got: Reftara wan reftara bitirîn, pozbilindî, bêkêrî û pesindanê bû, digel sinciyên din ên pîs jî! Hemî heval û wezîrên wî jî mîna wî bûn, tenê ew

---

<sup>1</sup>.Wesek: وصية.

<sup>2</sup>.Gilî, gulî: Du Gilîn e, li bin stuyê bizinê ne.

<sup>3</sup>.Ji wê tirê: Guman dike, hesab dike..

<sup>4</sup>

wezîrê ku şîreta kuştina min da, ew hişmend, jêhatî, feylesûf, xwedî biryar û zana bû; mîna wî di qîretiya bilind, hişdariya tekûz û nêrîna baş de pir ne tîn dîtin.

Qerêl got: Çi salixên hişdariyê ew şalyara cuda dikir? Got: Du sincî: Yek jê nêrîna wî di kuştina min de; a din jî, wî şîreta xwe ji hevalên xwe venediştart, ta ku ew pir biçûk biwa jî. Gotina wî jî ne hişk û tund bû, ew nerm û xwaşik bû; ta radekê, wî kêmaniyên qerêl jî jê re digotin, lê yekser ne digot, wî mînak jê re tanîn, li ser kêmaniyên bilî wî daxivî, û wilo qerêl kêmaniyên xwe nas dikirin, qerêl jî tu sedem ne didît ku jê bixeyide. Ji titştên ku min bihîst ji qeralê xwe re dibêje: Gerek e qeral ji karûbarên xwe xafil nebe; çinkî qeralî tiştêkî pir giring e, bi destê her mirovekî nakeve, ew tenê bi birdariyê mirov digihê armancên xwe. Qeralî jî tiştêkî pir mezin e, eger kete destê kê, gerek e wê baş biparêze û xurt bike. Ji ber ku hatiye gotin: Arzî di mayîna xwe a hindik û demkin de, mîna mandina siya çiloyê Nîloverê ye, di sivikbûna çûna xwe û lezbûna çûn û hatina wê de jî mîna bê ye, di mandinê de jî mîna mandina mirovê hişmend bi ê kêmhiş re ye, di windabûna bilez de jî mîna bulquka ava baranê ye.

Ev e mînaka dijmantiyê, gerek e mirov bi dijminan re ne tê xapandin, ta eger wan hezkirin û dilxwaşî jî da xuyakirin.

## Deriyê Req û Meymûn

Qeral Debşelîm bi Feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst. Mînaka mirovê ku tiştêkî dixwaze, û eger bi dest ket, winda dike, ji min re wîne.

Feylesûf got: Peydakirina pêdviyan ji parastina wan hêsantir e. Kê daxwaza xwe bi dest xist û nikarî biparasta, tiştê ku gihîşte req wê bigihê wî jî. Qerêl got: Ma ew çawa bû?

Beydeba got: Gotine ku meymûnek qeralê meymûnan bû, navê wî Jîr<sup>1</sup> bû. Temanê wî mezin bû, pîr bû, meymûnekî gênc ji mala qeraltiyê hêrişê kir, zora wî bir û li şûna wî rûnişt; wî jî serê xwe rakir û çû ta gihîşt ber peravekê, dareke hejîrê li wir dît, hilkişî ser û ji xwe re kire malik.

Dema ku wî rojekê hejîr dixwarin, hejîrek ji destê wî kete avê, deng û awaza ketina avê li guhê wî xweş hat û rabû hejîr xwarin û avêtin avê. Ew bi wê yekê pir kêfxwaş bû û her çû hejîr avêtin avê; reqekî jî her ku hejîrek dikete avê dibir û dixwar. Gava ku hejîr pir bûn, req guman kir ku meymûn ji bo wî wilo dike, xwast xwe jê ve nêzîk bike û ji xwe re bike dost. Herweha wî xwe jê ve nêzîk kir, pê re deng kir û wilo bi hev re bûn dost û heval.

Gava ku req dereng ma û venegerî mal, jina wî li ser wî tirsî, çû ba hemsîyeke xwe û jê re got: Ez tirsîme tiştêkî ne

---

<sup>1</sup>.Jîr: Nav di deqa bingehîn wiha hatiye.

baş bi serê mêrê min hati be û ji dest min here. Wê jê re got: Mêrê te li ber peravê ye, ew û meymûnekî bûne dostên hev, vê re dixwe û vedixwe, wî ew ji te dîr xistiye, dê nikani be li ba te rûne ta tu bikî meymûn bê kuştin. Got: Ma ezê çawa bikim? Hemsîya wê got: Eger mêrê te vegeirî, xwe nexweş bike û eger li rewşa te pirsî, bêje: Ez nexweş im, bijîşkan jî ji min re dilê meymûn, wek derman, salix daye.

Piştî demekê, req hat mala xwe û dît rewşa jina wî ne baş e û xemgîn bûye, wî jê re got: Çi bi te hatiye? Hemsîya wan bersiv da û got: Jina te reben û nexweş bûye! Bijîşkan jê re dilê meymûn salix daye, ji bilî wî derman jê re tune, req got: Ev tiştêkî dijwar e; emê dilê meymûn ji kûderê wînin û em di avê de dijîn? Wê hîngê ew şaş ma; paşê di dilê xwe de got: Ez vê daxwazê nikanîm bi cih wînim ji bilî ku ez xinaniyê bi dost û hogirê xwe bikim; gunehê wî karî jî li ba min giran e, lê belê ji wê girantir mirina jina min e! Çinkî tiştêk nabe hemtayê jina çêkar; ji ber ku ew ji bo karûbarên cîhanê û pişdawayê jî alîkar e! Paşê, ew bi xemgînî û melûlî vegeirî peravê û di dilê xwe de diramî û digot, ezê çawa bikim?!

Meymûn jê re got: Birayê min, çî kir ku tu dereng bimînî? Req got: Tiştê ku ez ji te dereng hîştin fedîbûna min ji te ye. Ji ber rindiya ku te bi min kir, min nizanî ezê te bi çî xelat bikim?! Ez dixwazim tu werî seredana mala min û rindiya xwe bi min re bi dawî bikî. Ez li giravekê rûniştîme, meyweyên wê pir xweş in; li piştî min siwar

be, ezê avceniyê bikim û te bibim wir; çinkî tiştê herî baş ku mirov ji dostê xwe dixwaze, seredana mala wî bike, bi xwarin û ava wî dan bibe û xwedan, zaro û cîranên wî jî nas bike. Te jî hîn pêle mala min ne kiriye, xwarin û vexwarina min bi devê te nebûye, ew jî ji bo min kêmanî û şerm e!

Meymûn jê re got: Tiştê ku mirov ji dostê xwe dixwaze, ew jê hez bike, dilê xwe jê re pak bike, ji bilî wan tiştan hemî tiştên din zêde ne. Req got: Rast e. Lê belê lihevciwîna li ser xwarin û vewaxrinê dostanî û hezikirinê diçespîne; em dibînin eger dewar bi hev re werin dankirin ji hev re kedî dibin. Lê tê gotin jî: Gerek e mirovê hişmend pir bi ser biraderên xwe de neke û jê nexwaze; çinkî eger golik pir guhanê diya xwe bimije, ew qoç wî dike. Paşê meymûn dil kir ku vê re here û got: Bi rêzdarî û hezkirin min vexwandina te pejirand. Ew daket, li pişta req siwar bû, wî jî avcenî kir û çûn. Lê gava ku req hinekî dûr ket, pîsîtî û xinaniya ku di dilê xwe de hilgirti bû hate bîra wî, serê xwe daxist, sekinî û di dilê xwe de got: Ezê çawa li ser gotina jineke nezan xinaniyê bi dostê xwe bikin?! Ez nizanim, belkî cîrana me di tiştê ku li ser zimanê bijîşkan goti be de ez xapandime û vir kiri be! Çinkî zêr bi êgir tê nas kirin, mêr bi dan û standinê, dewar bi barhilgirtin û bezê, lê kes nikare qelaşiya jinên şerûd taqe bike, ne jî bi dibare û nerindiyên wan kani be!

Meymûn jê re got: Ez dibînim tu xemgîn î? Req got: Xema min ew e, hate bîra min ku jina min pir nexweş e,

ew jî dihêle ku ez nikani bim gelek tiştên ku ez dixwazim û li gora camêrî û xweşgotina te ne, ji te re bikim. Meymûn got: Dilxwaşiya ku berê ji bo min di dilê te de heye, ji min re bes dike ku tu xwe newestînî. Req got: Rast e. Ew kateke din bi meymûn ve çû û careke din sekinî. Meymûn vê carê tê de kete gumanê û di dilê xwe de got, rawestan û xwegirankirina req ji bo tiştê ye! Ez ne bi ewle me ku dilê wî li ser min ne hati be guhertin, ji hezkirina min dûr ne keti be û bixwaze nerindiyê bi min bike; çinkî di veguhastinê<sup>1</sup> de ji dil siviktir û bileztir tiştek tune! Belkî were gotin: Gerek e hişmend di her gav û gotinê, her rabûn û rûniştinê û her rewşekê de, nas bike çî di henasa xwedan, zaro û birayên wî de heye û haya wî ji wan hebe; çinkî hemî tiştên di dilan de hene, di dema karkirinê de têne xuyakirin. Zaniyaran gotiye: Eger guman ji dostekî kete dilê dostekî, bila jê haydar be, xwe jê biparêze û di hemî gav û rewşên wî de haya xwe jê bibe. Eger tiştê ku pê guman dikir rast be, ewê jê ewle bibe, eger ne rast be jî, ew hişdariyê bi dest dixê û zîyan jî pê nabe.

Paşê ji req re got: Çî dihêle tu rawestî? Ez dibînin tu xemgîn î, wekî ku dîsa tu bi xwe re deng dikî?! Got: Ji bo min giring e, ku tu werî mala min, lê tu rewşa min wekî ku ez hez dikim, nikarî bibînî; çinkî jina min nexweş e. Meymûn got: Xemgîn mebe, xem ji te re tiştê çareser nake! Tuyê ji jina xwe re xwarin û dermanê ku pê çak

---

<sup>1</sup>.Veguhastin: Teqlêbûn, guhertin..



bibe peyda bikî. Çinkî tê gotin: Bila Xwedanê mêl, malê xwe di çar ciyan de mezax bike: Di sexdeyê de, li dema ku pêdvî pê hebe, li ser zaroyên xwe û li ser hevjinan; nemaze eger jinine durustkar bin.

Req got: Te rast got! Lê bijîşkan gotiye: Dermanê wê ji bilî dilê meymûn tune. Wê hîngê meymûn di dilê xwe de got: Ey tiştê xirab! Çavbirçîtî û çavtengî di mezinbûna temenê min de gihîştin min û kirim ev rewşa pir xirab! Ewê ku wiha got rast got: Ê bawerdar û bi jiyana xwe qayîl be, bi vehes û dilrihet dijî, ê çavbirçî û çavteng jî herdem bi westan û bêbextî dijî. Ez jî niha bi pêdviya hişê xwe me da ku kani be min ji vê rewşa ku ketimê derxe. Paşê ji req re got: Xwedê li te bibore, çima dema ku ez li ber mala me bûm te ji min re ne got da ku min dilê xwe bi xwe re baniya; çinkî li ba me gelî meymûnan sinnet e, eger yek ji me çû seredana dostekî xwe, dilê xwe li ba xwedanên xwe, yan jî li cihê xwe dihêle da ku gava me li jinên seredanî nihêrî, dilê me ne bi mere be û niyaza<sup>1</sup> me xirab nebe. Req got: Dilê te niha li kû ye? Got: Min li ser darê hîşt, eger tu bixwazî min vegefrîne ba darê da ku ji te re wînim.

Req bi wê yekê şa bû û got: Bê ku ez xinaniyê bi dostê xwe bikim, ew qayîl bû! Wî meymûn vegefrand cihê wî û gava nêzîk peravê bûn, meymûn xwe ji ser piştê wî avêt û hilkişî ser darê; gava dereng ma û ne hat, req gazî wî kir:

---

<sup>1</sup>.Niyaz: Nêt نية

Hogirê min, dilê xwe hilgire û dakeve, te em dereng hîştin. Meymûn got: Ji destê te çû! Ma tu guman dikî, ku ez bibim wek ew kerê ku çeqel li ser goti bû, ew bê dil û guh bû?! Req got: Ma ew çawa bû?

### • Mînaka Şêr, Kerê û Çeqel

Meymûn got: Gotine, ku şêrek di nav dareke mezin de dijî, çeqelek jî vê re bû û ji bermahî û xwarina wî dixwar. Rojekê ji rojan şêr bi guriyê<sup>1</sup> ket, pir jar bû, westiya û nikarî nêçîr bikira! Çeqel jê re got: Serwerê cinawiran, çima rewşa te hatiye guhertin? Got: Vê guriyê ez westandime, ji bilî dil û guhê kerê jî derman jê re tune. Çeqel got: Pir hêsan e! Li filan derê kerek bi cîlawciyekî<sup>2</sup> cilan re ye, cilên xwe lê bar dike, ezê herim û wî ji te re wînim. Çeqel çû ba kerê, silav lê kir û jê re got: Çima tu wilo jar bûyî? Got: Ji ber bedkariya xwedanê min ezwilo bûme! Ew min birçî dike û bêr li min giran dike; eger ew her du rewş li govdekî bigihên hev jî, bêguman dê wî jar û nexweş bikin!

Çeqel got: Tu çawa qayîl dibî di vê rewşê de li ba wî bimînî? Got: Rê tune ye ku ez jê birevim. Ez bi kû ve diçim, mirov ziyane digihînin min, min diwestînin û dêşînin. Çeqel got: Ezê ciyekî ku ji xelkê dûr e şanî te bidim, mirovek di wir re naçe, çêre lê pir e, keriyek ker jî li wir heye, bi ewle û bi rihet diçêrin û wek wan sibehî û

---

<sup>1</sup> .Gurî: Nexweşiyek e bi eyarê mirov dikeve.

<sup>2</sup> .Cîlawcî: Kesê ku cîlawê(boyê) dike. Cîlaw= cil+av.

qelew jî ne tîn dîtîn. Kerê got: Ma çima em naçin ba wan? Me bibe ba wan! Çeqel rabû, ew bi ser şêr de bir, çeqel di pêş wî de çû, kete nav daristanê û gihîşt ba şêr, cihê kerê jê re hewalda; şêr jî rabû bi ser wî de çû û xwast xwe bavêje ser kerê, lê ji ber jarbûnê nikarî xwe bavêta ser, herwiha kerê xwe jê xelas kir, ji tirsê re serê xwe rakir û bezî. Gava çeqel dît ku şêr bi kerê nikarî, jê re got: Serwerê cinawiran, ta vê radeyê tu bêgav bûyî? Şêr got: Eger tu careke din wî ji min re wînî, ewê hîç ji destê min rizgar nebe. Çeqel dîsa çû ba kerê û jê re got: Çi bi serê te hat? Kerekî dît ku tu xerîb î û hate pêşiya te da ku bixêrhatina te bike, eger tu maba wê tu tesele bikira û bibira ba hevalên xwe. Gava ku kerê wilo bihîst, wî berê jî şêr ne dîtî bûn, ji çeqel bawer kir û dîsa ketin rê û bi aliyê şêr de çûn. Dîsa çeqel berî wî çû ba şêr, cihê kerê jê re da nasîn û jê re got: Xwe jê re amade bike, min ew ji te re xapand, bila vê carê jî tu lawaz nebî; eger vê carê jî rizgar bibe, ew careke din bi min re ne tîn, derfet jî herdem bi destê mera nakevin.

Şêr ji ber gotina çeqel bi kelecana bû û çû cihê kerê; gava ku çavê xwe li kerê ket, xwe avêta ser, ew kuşt û ji çeqel re got: Bijîşkan gotiye, bê xweşustin û pakirinê ker ne tîn xwarin; tu wî biparêze ta ez xwe dişom, vedigerim û dil û guhên wî dixwim; ezê ê din jî ji bo xwarina te bihêlim. Gava ku şêr çû xwe bişo, çeqel çû ser kerê, û bi armanca ku dilê şêr jê sar bike da ku tiştêkî ji laşê kerê nexwe, rabû dil û guhên wî xwarin! Gava ku şêr vegeerî

cihê xwe, ji çeçel re got: Kanê dilê kerê û guhên wî?  
Çeçel got: Tu zanî, eger dilê wî heba wê pê hişdar biba,  
eger guh jî hebiwana wê pê bibihîsta û piştî ku rizgar bû û  
ji mirinê xelas bû, careke din li te venedigerî!

Min ev nimûna ji te re anî da tu zani bî, ku ez ne mîna  
wê kerê me ku çeçel li ser got ((dil û guhê wî tunebûn))!  
Te dibare li min kir û ez xapandim û min jî çawa te ez  
xapandim tu xapandî, û wilo meymûn xwe xelas kir.

Hatiye gotin jî: Tiştê ku hiş kavi<sup>1</sup> bike, tenê zanîn kane  
wî durust bike. Req got: Te rast got, lê mirovê çêkar li  
gnehê xwe mikur tê, eger gunehek jî kir, şerm nake ji ber  
gotin û karê xwe ê nerast ve were rexnekirin. Eger bikeve  
tengahiyekê û kani be bi çare û hişê xwe jê rizgar bibe, ew  
mîna mirovê ku li ser zemînê vedilukume, lê dîsa jî destê  
xwe datîne ser wê û radibe ser xwe.

Ev e mînaka mirovê ku tişteki dixwaze, eger bi dest ket  
jî, winda dike!

\*\*\*

\*\*\*

---

<sup>1</sup>.Kavil: Wêran, xerab..

## Deriyê Nêsik Û Fistekê

Debşelîmê Qeral ji Beydebayê feylesûf re got: Min ev mînaka bihîst. Ji min re mînaka mirovê ku di karê xwe de lezok be û bê ku di encam û dawiyên wî de birame, bêje.

Feylesûf got: Eger yek ji karê xwe ne bawer be, wê poşman bibe û rewşa wî dê bibe mîna rewşa ew nêsik ku fistek<sup>1</sup> kuşt digel ku pir jî jê hez dikir. Qerêl pirs kir: Ma ew çawa bû?

Feylesûf got: Gotine ku nasikek ji nasikan li welatê Curcanê dijiya û jineke wî ye sibehî hebû. Ew demeke dirêj bi hev re man û zarok jê re çênebûn. Lê piştî temenê kirasbirînê<sup>2</sup> jin bi ducana bû, ew û nasik bi wê yekê pir kêfxwaş bûn, spasiya Xwedê kirin û hêvî kirin ku barê<sup>3</sup> wê lawik be. Wî ji jina xwe re got: Dilxweş be; ez hêvî dikim ew kurik be û sûd û şahiya me tê de hebe. Bes bi silamet bibe, ezê ciwantirîn nav jê re vebjêrim û perwerdekarî jê re wînim. Jinê got: Tu çima li ser tiştê ku tu nizanî, deng dikî; ma hema wê bibe yan nebe?! Kî wilo bêje, wê bibe mîna ew nasikê ku rûn û hinguv bi ser serê xwe de rijandin! Wî jê re got: Ma ew çawa bû?.

---

<sup>1</sup>.Fistek: Lawirekî goştixwar û biçûk e.

<sup>2</sup>.Kirasbirîn: Xwînhatina wê a mehane hate birîn û bi dawî bû, angoyê wê pêncî sal derbas kir.

<sup>3</sup>.Barê wê: Bar û berê ku di zikê wê de.

## • Mînaka Nasikê Reben

Jinê got: Dibêjin, heroj rûn û hinguv ji mala mirovekî bazirgan ji nasikekî re dihat, wî jî pêdvî û xwarina xwe jê dixwar, yê dima jî radikir, dikir kûzekî û di nava malê de bi dîrakekî dixist û hiltanî, ta kûz tijî bû. Rojekê nêsik xwe li ser piştê dirêj kiri bû, çovek di destê wî de bû, kûzik jî di ser serê wî re bi dar ve bû; ew di buhaya rûn û hinguv de ramî û got: Tiştê ku di vî kûzî de heye ezê bi dînarekî bifiroşim û pê deh bizinan bikirim; ew jî wê her pênc mehan avis bibin û bizên; eger zarokên wan jî bizên, bizinine pir wê peyda bibin. Paşê bi wî rengî li salan xist û dît ku ewê bibe dora çar sed bizin. Got: Paşê ezê pê sed çêlî bikirim, bi her çar bizinan gakî yan çêlekê, ezê zeviyekî û tovê jî bikirim, cotkarekî jî bigirim û tovê bi gayan biçînim, ji çêlan jî sûda mêst û berhemên wan bigirim; herwiha pênc sal di ser min re derbas nabin, perene pir wê ji çandinê ji min re werin, ezê maleke xweşik pê ava bikim, carî û koleyan bikirim, jineke xweşik jî wînim, ewê avis bibe û kurekî bi rûmet û camêr wîne, ezê navekî xweşik jî jê re vebjêrim; eger ew mezin bû, ezê wî bi perwerdeyeke baş perwerde bikim û tê de lê bidin zorê; eger şîret ji min ne pejirand, ezê bi vî çovî lê bidim; gava ku wî çov rakir, li kûz ket û şikand û tiştê ku tê de hebû bi ser rûyê wî de rijî.

Min ev mînaka ji te re anî, da tu di tiştê gerek e ne tê gotin û tu nizanî wê bibe yan nebe de nelezînî û deng nekî? Lê belê, tenê lava ji Xwedayê xwe bike, hêviyan jê

bike û bitewkile wî; ji ber ku wêneya li ser dîwaran, ta dîwar heye dimînin, lê eger ket û hilewî ew jî dere. Wilo nêsik bi gotina jina qayîl<sup>1</sup> kir.

Paşê jinê zarokekî xweşik anî, bavê wî pê şa bû û piştî çend rojan, dema ku jinê xwast xwe bişo, ji nêsik re got: Ta diçim serşokê xwe dişom û tîm, li ba lawê xwe rûne, û mêrê xwe û kurik hîştin û çû serşokê. Pir ne çû, şandeyê qerêl hat û gazî wî kir, lê wî kesek ne dît li ber lawê xwe bihêle; fistekekî wî hebû, wî tîmar û kedî kiri bû û li ba wî mîna lawê wî bû, nêsik rabû ew li ba kurik hîşt, deriyê malê li ser wan girt û bi şandeyê qerêl re çû. Wê hîngê marekî reş ji nav kevirên malê derket û ji kurik ve nêzîk bû, fistek jî ew dît û rabû lêda, xwe avêt ser, kuşt û perçe kir û devê wî ji xwîna mar tijî bû.

Paşê dema ku nasik hat û derî vekir, fistek bervê hat û wekî nîşanê dide ku wî mar kuştiye! Lê gava nêsik dît ku devê wî bi xwîn e û bi tirs e, hişê wî ji serê wî firî û guman kir ku fistek kurê wî kuştiye, wî ew tişt ne çespond, ne sebirî ta rastiyê nas bike, li gora gumana xwe kir, pir lezand û bi coyê ku di destan de bû li serê fistekê da û kuşt.

Lê paşê, gava ku nasik derbas malê bû, dît kurikê wî xweş e û tişteke pê ne bûye, lê li kêleka wî marekî reş î perçekirî heye. Gava wî çêrok nas kir û çawa wî ew karê pîs di lezbûnê de kir, li serê xwe da û got: Xwazî ev lawa

---

<sup>1</sup> .Qayîlbûn: Razîbûn, bawerbûn, pejirandin.

ji min re nehata û min ev xinaniya bi fistekê nekira! Wê hîngê, jina wî jî derbas hundir bû, ew di wê rewşê de dît û jê re got: Çi pirsî te ye? Wî rabû ew karê rind ku fistekê kiri bû jê re hewalda, nerindiya ku wî jî pê kir jê re xuya kir. Wê got: Ev e encama lezbûnê; çinkî eger tiştek bû, ew mîna gotina ku ji devê mirov derdikeve û tîra ku hatî avêtine ku vegeer jî jê re tune ye!

Ev e mînakê ewê ku pirsan naçespîne û karên xwe bi lez dike.

\*\*\*

\*\*\*



## Deriyê Mişk û Pisîkê

Qeral Debşelîm ji Beydebayê feylesûf re got: Min ev mînaka bihîst. Ji min re mînakekê wîne bila xuya bike, çawa eger dijminên mirovekî pir bin, ji her aliyekî de lê bicivin û mirin jê ve nêzîk bibe, li wê demê, eger wî rizgarî û çareserî di dostanî û xwedaxistina bi hin dijminan re dît, nas bike jî ewê bi wê yekê ji tirsê rizgar û ewle bibe û paşê jî ji wan re dilsoz bibe; ji min re hewal bide, gerek e rewşa wê lihevhatinê çilo be û çawa pêk were?

Feylesûf got: Dostanî û dijminahî hîç li ser rewşekê namînin; eger lêhat û bêgavî çêbû, gengazî heye ku dostanî bibe dijmanî, dijmanî jî bibe hevaltî û dostanî; ji bo vê jî bûyer, eger<sup>1</sup> û taqê hene. Xwedanê nêrîna baş ji her tiştê ku dibe re helwestekê ava dike; cureya helwestê jî ji bo keftlefta bi dijminê bi hêzê re û dostaniyê bi hezkirinê jî pêk tê. Eger neyartî ji bo dijminekî di dilê mirovê hişmend de hebe, ew nabe kelem ku ji wî ve nêzîk bibe û ji bo têkbirina metirsiyekê, yan jî sûdekê wergire, alîkariya wî bixwaze; kî bi biryardarî wilo bike, ewê bigihê daxwaza xwe.

Mînaka wê di vê warî de, dema ku mişk û pisîkê ketin tengahiyê, ew bi lihevhatinê bi hev re ji tengahî û dijwariyê derketin. Qerêl got: Ma ew çawa bû?

---

<sup>1</sup>.Eger: Sedem, sebeb.

Beydeba got: Gotine ku dareke mezin hebû, mala pisîkekê jê re digotin Romî di koka wê de bû. Li nêzîk wî qula mişkekî jî hebû navê wî Ferîdon bû. Gelek caran nêçîrvan dihatin wê derê û lawir û tilûr nêçîr dikirin.

Rojekê nêçîrvanek hat, tora xwe li nêzîk cihê Romî vena û pir ne çû ew bi torê ket. Mişk jî derket meşî û li xwarina xwe gerî, lê haya xwe ji Romî biri bû. Gava ku ew digerî, wî dît ku Romî bi toreyê ketiye; ew bi wê yekê geş û şa bû. Lê belê wî li paş xwe nêrî, dît ku fistekek heye dixwaze wî bigire, kundek jî li ser darê bû dixwast wî birevîne. Ew di rewşa xwe de şaş ma û tirsî eger vegere fistek wî bibe, eger bi çep yan rast de jî here kund wî birevîne û eger pêşde jî biçe pisîk wî bixwe. Wî di dilê xwe de got: Belakê ez girtim, şer bi ser min de hatin û tengahiyan ez dorpêç kirim! Lê digel wê, hişê min bi min re ye, bila rewşa min min netirsîne û bêçare neke, matmayîn min destgirêdayî neke û dilê min ji tirsê nesekine; gava ku nêrîna hişmend rast be, ew natirse û ji hişdariya xwe nakeve; çinkî hiş mîna derya bê binî ye, kes nikare bigihê binê wê; bela jî nikare keda xwedî bawerî lawaz û tune bike. Lê belê pêkhatina hêviyan jî gerek e wî negihîne radekê ku har û serxoş bibe û rewşa xwe nas neke. Ez jî rizgariyê ji vê belê nabînim, ji bilî ku bi pisîkê re li hev werim. Çinkî bela ku bi ser wî de hatiye, mîna ya ku bi ser min de hatiye û belkî ji ya wî kêmtir e jî. Belkî şora ku dixwazim vê re bikim, bibhîse, rastiya gotina min nas bike, durustiya min ya ku guman li ser tune ye û dibare

jî vê re tuneşe, têbigihê, dilxwaziya xwe bi alîkariya min bike û wilo emê bi hev re rizgar bibin.

Paşê mişk xwe ji pisîkê ve nêzîk kir û jê re got: Tu çawa yî? Pisîkê got: Wek tu hez dikî ye; ez di dijwarî û tengahiyê de me. Got: Ez jî niha di belayê de mîna te bûme. Wekî ji bo xwe, ji bo te jî rizgariyê dixwazim. Vir û dibare di gotina min de tunene. Va ye fistek riya vegeê li min biriye, kund jî min dipê, ew her du jî ji min û ji te re dijmin in. Ez û te digel ku ji aliyê sinciyan de ji hev cuda ne, lê em niha di rewşê de wek hev bûne. Ewên ku rewşa wan yek be, eger sinciyên wan têvel bin jî, rewş wan digihîne hev. Eger tu ewlehiyê bidî min, ezê benên te bibirim û te ji vê tengahiyê derxim; eger wilo bû, heryek ji me wê bi saya hevalê xwe rizgar bibe; mîna gemî û siwarên di deryayê de, ew bi gemiyê rizgar dibin û gemî jî bi wan rizgar dibe.

Gava ku pisîkê gotina mişk bihîst û nas kir ku ew tê de rastgo ye, jê re got: Gotina te nêzîk rastiyê ye, ez dilxwaz û bi hêvî me ku tu û ez jî rizgar bibin. Eger te wilo kir, ta ez li jîyanê bimînîm ezê spasdare te bim. Mişk got ezê niha nêzîk te bibim, benên te bibirim, lê benekî bihêlim da ku pê ji te ewle bibim. Wî rabû dest pê kir û ben birîn. Wê çaxê, gava ku kund û fistekê dîtin ku mişk ji pisîkê ve nêzîk bû, ew jê bêhêvî bûn û çûn. Wê hîngê wî di birîna benên Romî de xwe giran kir, lê pisîkê jê re got: Ez

dibînim tu di birîna benên min de ne îjdidî<sup>1</sup> î?! Eger te daxwaza xwe bi dest xist û di pêkanîna daxwaza min de giran bûyî, ew ne ji karê çêxwazan e; çinkî ciwanmêr li ber mafê dostê xwe giran namînin. Te dît min çî kar û çî sûd li te kir, gerek e tu jî ji min re çêxwaz bî û bila dijmantiya di navbera me de ne tê bîra te. Ev lihevhatina di navbera min û te de, gerek e bike ku tu wê neyartiyê ji bîr bikî; tu zanî jî çiqas çêseza di dilsozî û rindiyê de heye, çî dawiya bedê a xinaniyê jî heye. Çinkî ciwanmêr herdem spasdar in û kîndar nabin, sinciyeke baş jî gelek sinciyê bedkar ji bîra mirov dibe. Belkî were gotin jî: Sezaya ku pir bi lez pêk tê sezaya xinaniyê ye. Ewê ku li ber hate gerîn, lêborîn jê hate xwastin û dilê xwe nerim ne bû û ne borî, ew xinaniyê dike.

Mişk got: Dost didu ne: Dilxwaz û neçar, ew her du jî sûdê dixwazin û xwe ji ziyane diparêzin: Ê dilxwaz, tu kanî pê bawer bibî û di her rewşan de ewlehî pê dibe; lê ê neçar, di hin rewşan de bawerî pê dibe, di hinan de jî gumanbar dibe, loma jî gava hişmend ji bo tiştina ji wî bi tirs be û da ku xwe jê biparêze, hin tiştên wî kesî li ba xwe digire, tu jî zanî ku mebesta danûstandina hemî danûstandêran xwastina sûda bi lez û gihîştina hêviyan e. Ez jî ji tiştê ku min ji te re soz kir dilsoz im; lê digel wê ez ji te haydar û bi tirs im jî. Lê belê tirs tiştê ku wê bi min biba ez neçar kirim xwe bavêjim te û tu jî ji min bipejrînî. Çinkî her karekî demeke xwe heye; eger tişteke di dema

---

<sup>1</sup> .Îjdidî: kar û tiştê ji dil de,

xwe de bê sûd be, dawiya wî bêkêr dibe, loma jî ezê hemî benên te bibirim, lê girêkekê bihêlim da tu pê bêçare bibî. Ez wê nabirim ta dema bibînim tu ji min mijûl bûyî, ew jî dema ku nêçîrvan were ye.

Paşê mişk rabû benên pisîkê birîn, hîn wilo dikir, nêçîrvan xuya bû û pisîkê jê re got: Niha dema karê rast a birîna benên min e, mişk xwe di birînê de westand û gava kuta kir, pisîk li ber çavê nêçîrvanê ku mat ma, hilkişî ser darê, mişk jî kete qulekê, nêçîrvan jî hat û benên xwe ên qetiyayî birin û destvala çû!

Paşê mişk derket û ne xwast ji pisîkê ve nêzîk bibe, lê pisîkê gazî wî kir û got: Dostê şîretkar û xwedî karê baş! Çima tu ji min ve nêzîk nabî, da ji bo tiştê te ji min re kir te baştir çêseza bikim?! Were ba min û biratiya min mebare; eger yekî dostek ji xwe re girt û paşê biratiya wî birî û dostaniya wî winda kir, ew ji berhema biratiya wî bêpar dimîne, dost û birader jî ji sûdgirtina wî bêhêvî dibin. Rindiya te li ba min ne tê jibîrkin, gerek e tu baxşîşekê ji min wergirî, ji dost û biraderên min û ji min metirse, bila tu zani bî, ku çi li ba min hebe ji te re serbest e, û li ser rastiya tiştê ku got sond xwar.

Wê hîngê, mişk deng lê kir û got: Belkî dostaniyeke di rû re, neyartiyek di hundirê wê de hebe; ew jî ji neyartiya diyar xirabtir e! Kî xwe jê neparêze, ew mîna ewê ku li diranê fîl siwar dibe, paşê xulmaş dibe û di bin pêyên fîl de şiyar dibe, fîl jî pê li wî dike û wî dikuje. Dost ji ber rastgoyî û sûdeweriya ku jê hêvî dibe bi dost hatiye

binavkirin, dijmin jî ji tirsî hêriş û ziyana ku jê tê, bi dijmin hatiye binavkirin. Eger hişmend hêviya sûdwergirtinê ji neyêr kir, ew dostaniyê jê re diyar dike, eger ji ziyana dost jî tirsî, dijmantiyê jê re xuya dike. Tu nabînî çawa dewar ji bo şîr bi dû dayîkên xwe dikevin, lê eger şîr tê de ne ma jê dûr dikevin. Belkî dostekî hin tiştên ku jê digihîşte dostê wî neke û ji dijîtiya wî netirse, ji ber ku ew yeka ji bingeha xwe de ne dijîtî bû. Lê ewa ku ji koka xwe de neyartiyêke bingehîn e û paşê ji bo pêdviyekê neçar bû û dostanî vê re danî, eger ew pêdviya ji meydanê rabû, ew dostaniya jî diçe, namîne û vedigere ser koka xwe; mîna ava ku bi êgir germ dibe, eger ji ser hate rakirin dîsa sar dibe. Di nav dijminên min de jî, dijminekî mîna te ziyandar ji min re tune. Pêdviyek hebû, em neçar kirin ku ez û te li hev bikin, lê ew karê ku ez pê gerekî te bûm û tu jî gerekî min bû, çû. Ez ditirsim bi çûna wî re dîsa dijmantî vegere. Sûda lawazekî jî di nêzîkbûna dijminekî xurt de tune, ne jî di nêzîkbûna kesekî payenizim ji dijminekî payebilind de heye! Ji berê de jî ji bilî dilxwaziya ku tu min bixwî tu pêdviya te bi min tunebû, ne jî pêdviya min bi te hebû û hîn jî baweriya min bi te tune. Wek min naskiriye, ew lawazê ku xwe ji neyarê xurt biparêze, ew ji ê xurt ku bi ê lawaz hate xapandin û xwe radestê kir bêtir ji ewlehiyê ve nêzîk dibe. Eger hişmend neçar bibe, ew bi dijminê xwe re li hev tê, hezkirin û rindiya xwe jê re diyar dike, xwe radestê jî dike, lê paşê gava ku rê tê re dibîne, zû ji ser vedigere.

Bila tu zani bî jî, yê ku xwe zû radest dike, eger ket, ji ketina xwe ranabe. Eger hişmend tişt bi dijmin re soz û biryar kir, bi cih tîne; lê belê baweriyeye tekûz pê nake, eger jê ve nêzîk jî bibe pê bi ewle nabe û gerek e ta kani be jê dûr bikeve. Ez jî ji dûr ve payedariya te rêz dikim, mandin û ewlehiyê ji te re hêvî dikim, tu zanî jî berê min ew ji te re hêvî ne dikir. Mîna rindiya ku ji te re dixwazim, tu jî mîna wê min çêseza bike, ji ber ku rê ji kombûna me bi hev re tune; li gel silavan.

\*\*\*

\*\*\*

## Deriyê

### Kurê Qerêl û Tilûr Fenze

Qeral Debşelîm ji feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst; mînakekê li ser kesên xwedî kîn, gava ku pêwîst dibe xwe ji hev biparêzin, ji min re wîne.

Beydeba got: Dibêjin, qeralekî ji qeralên Hindistanê jê re digotin Berîdon hebû, tilûrekî wî jî hebû jê re digotin Fenze û çêlikeke wî jî hebû; Fenze û çêlika xwe bi dengêkî pir ciwan dixwendin, qeral jî pir bi wan kêfxwaş bû. Qerêl ferman da, ku wan dînin ba jina wî da ku wan baş biparêze.

Wê hîngê, jina qerêl bi ducana bû, wê kurek anî, çêlika Fenze jî pir pê ve hat girêdan û bi hev re dilîstin. Fenze jî heroj diçû çiyê, meyweyên nenas tanîn, perçak dida kurê qerêl û yek dida kurê xwe; wê yekê kir ku ew zû mezin bibin û bibin xort; ew tişta li ba qerêl xuya dibû, dihate nasîn, hezkirina wî ji Fenze re pirtir dibû û ew rûmetdar û payebilintir dikir.

Ta rojekê ji rojan, dîsa Fenze ji bo anîna meyweyê derketi bû, çêlika wê jî di hembêza kurikê qerêl de bû, lê tiştek ji çêlikê derket, kurik bi hêrs kir û rabû ew rakir, li zemînê xist û kuşt! Dema ku Fenze vegeerî û dît çêlika wê hatiye kuştin, wê bang kir, xemgîn bû û got: Pîs in ev qeralên bê peyman û ne dilsoz! Yaman<sup>1</sup> ji ewên ku bûne

---

<sup>1</sup>.Yaman: peyva tirs û azarkirinê ye. Tiştekî pir xedar û bi tirs.



dostên qeralên bê wijdan û mirovahî û ji kesekî hez nakin. Eger çavê xwe ne li tiştên wan bin û ne bi gerekî zanîna wan bin, camêriyan li wan nakin; ew tenê ji bo wan tiştan wan rûmet dikin. Eger pêdviya xwe bi dest xistin, ne hezkirin, ne biratî, ne rindî, ne lêborîna ji ber gunehêkî, ne jî mafdarî dimîne. Ew in ku karûbarên wan li ser vir û vûtan hatiye avakirin; eger tişteke li tersê dilxwaziya wan be, gunehê mezin ku dikin, biçûk dibînin, ên hindik jî mezin dikin. Evê gawir, ne dilovan û xinan, çi bi heval û birayê xwe kir! Wê jî di hêrsa xwe de, xwe avêt ser rûyê kurik, çavekî wî rijand û çû li ser dareke bilind rawestî. Wê hîngê, nûçe gihîşte qerêl; ew pir bi hêrs bû û xwast Fenze bixapîne û bikuje. Qeral li hespê siwar bû, bi aliyê tilûr de çû ta gihîşt ba wî, li nêzîk wî rawestî, deng lêkir û got: Ey Fenze! Dakeve tu ewle yî. Wî jê re got: Qeralo! Xinan bi xinaniya xwe diçe. Eger sezaya pêşwext ne gihîştê, sezaya paşwext wî şaş nake; ta ew sezaya digihe neviyên paşê û paşiya paş wan jî! Kurê te xinanî bi kurê min kir û min jî ew zû seza kir.

Qerêl got: Rast e, kurê min xinanî bi kurê te kir û wilo em bûn hemtayên hev; ne toleke te li ba me û ne ya me li ba te ma; bi ewle vegere ba me û metirse. Fenze got: Ez hîç li te venagerim; ji ber ku hişmendana nêzîkbûn ji xwedanê tolê qedexe kiriye; şorxwaşiya kîndarekî, nermahiya wî û rûmetkirina wî te jê dûrtir dike û hîn gumanê li ser zêde dike. Tu li ba xwedî tol ewlehiyê nabînî, çêtir e tu jê bitirsî, ji dûrketina ji wî rastir tuneye,

xweparastina ji wî jî tiştê herî baş e. Berê dihat gotin: Mirovê hişmend dê û bavê xwe dost dibîne, berayên xwe heval, hevjin jî dosta nêzîk, law jî bîranîn, keç jî dijber, meriv jî rikber û xwe jî yekta û bêkes dibîne! Ez jî bê hemta<sup>1</sup>, bêkes, biyanî û dûdayî<sup>2</sup> me; min barekî giran ji ba we rakir ku kesek bi min re hilnagire. Ez î diçim, silav li te.

Qerêl vê re got: Eger ji bo tiştê ku me bi te kir te sezaya xwe ji me nebira, yan jî tiştê ku te bi me kir, xinanî ne ji me de biwa, ewê wek gotina te baya, lê ji ber ku me dest pê kir, ma gunehê te çi ye? Çi dihêle tu baweriyê bi me nekî? De vegere, tu ewle yî. Fenze got: Ez zanim kîn di dilan de cihên xurt û bi êş digirin! Ziman jî di dengkirina xwe de rastiya dilan nabêjin, lê dil di nêrevaniya xwe de ji zimên dadmendtir e pirtirî ku ziman li ser dil wilo be.

Dilê min jî bawer nake ku zimanê te rast dibêje, û ne jî dilê te ji zimanê min bawer dike! Qerêl got: Tu nizanî ku kîn û zikreşî di navbera gelek mirovan de heye, lê ê hişmend gerek e kînê kêmbike û pir neke. Fenze got: Rastî mîna tu dibêjî ye, lê digel wê, gerek e xwedî nêrîna rast, guman neke ku tolvedêrê<sup>3</sup> kîndar wê tola xwe ji bîr bike, yan jî jê bigere. Xwedî nêrîn ji qelaşî, dibare û pêlanan ditirse, ew zane jî ku gelek dijmin hene, mirov bi zorê û serhişkiyê pê nikare, lê bi nermî û dilxweşiyê tên

---

<sup>1</sup>.Bê hemta: Bê mînak, mîna wî tunene.

<sup>2</sup>.Dûdayî: Kesek dide dû ملاحق.

<sup>3</sup>.Tolvedêr: Kesê ku tola radike û heyfa xwe hiltîne.

girtin, mîna çawa fîlê hov bi fîlê kedî tê girtin. Qerêl got: Lê hişmendê camêr dostên xwe bernade, ne jî birayên xwe berdide, ta ku li ser xwe bi tirs be jî. Ev sinciya ra di dewarên herî astexirab de jî heye. Min bihîstiyê ku lîstikvan bi segan dilîzin, paşê wan şerjê dikin û dixwin, kûçikê wan jî wê yekê dibîne, lê dîsa jî dostaniyê bi wan re dike û ji wan naqete!

Fenze got: Kîn li kûderê bin bi tirs in, ya tirsdartir û girantir ya ku di henasa qeralan de be; qeral bi tolhildanê bawer dikin; ew dibînin pêkanîn û daxwaza tolhildanê rûmet û serbilindî ye, hişmend jî bi hêminbûna kînê ne tê xapandin, ra ku kîn rawestî jî. Kîna ku di dil de be û ne tê livandin, mîna kizotê veşartî ku ardû ne gihîştîyê dimîne. Kîn natebite, herdem li behaneyan digere, wekî ku çawa agir li ardû digere, eger sedemek dît, ew wek êgir hêgin dibe û wê hîngê ne şorên rind, ne nermî û dilxwaşî, ne berger û xwedanîn, ne xweguhertin û ne jî tişteke wê venamrînin, ta henas pê dimirin û giyan derin. Digel ku belkî tolvedêrek dixwaze here ba yê ku tol lê bûye, hêvî bike ku sûda pê kane lê bike û ji ber ve berevaniyê jî bike, lê ez pir lawaz im, ku kani bim tişteki ji te re bikim, û tişte ku di henasa te de heye jê derînim. Eger dilê te li ser min e, wek tu dibêjî, ew nikare sûdê li min bike; ez ji ber tişte ku di navbera me de bûye hîn ji te di tirs, di xem û bedgumanê de me. Loma jî, ji bilî cudabûnê di navbera min û te de tune; silav li te!

Qerêl got: Ez zanim kesek nikare zirarê yan karê li yekî bike. Tişt jî çi biçûk û çi mezin bin, bi qeda û felekê digihêne mirov. Afrandina ku tê afrandin, zayîna ku tê zandin û mandina tiştê ku dimîne, dîsa destê afrandeyan tê de tuneye; herweha wêrankirina tiştên ku tên wêrankirin, mirina tiştên dimirin jî wilo ye. Tiştê ku te bi kurê min kir, gunehê te tê de tuneye, ne jî di gunehê ku kurê min bi kurê te kir de heye; lê ew hemî qedereke biryarkirî bû, em her du jî jê re behane û sedem in, loma jî tiştê ku felekê bi ser me de anî, em li ser ne tên lomekirin.

Fenze got: Felek wekî tu dibêjî ye, lê ew nake ku hişmend xwe ji metirsiyan neparêze û haya xwe ji nerindiyan nebe; yan jî wê şaş biwa ku nexweş li dermên bigeriya, kesên ku belak gihîştinê jî li çareseriyê bigerin! Erê hajêkirin û xweparastina ji qedayê bê sûd e, lê hişmend li gel baweriya bi felekê hişyarî û hêzê bi kar tîne, çinkî belkî ew tiştê ku xwe radestê dike cihê pêkanîna mirov be!

Ez baş zanim, ku bi tiştê ku ne di dilê te de ye tu bi min re deng dikî; pirsê di navbera min û te de jî ne biçûk e, ji ber ku kurê te kurê min kuşt, min jî çavê kurê te rijand, tu jî dixwazî min bixapînî û dilê xwe bi kuştina min xweş bikî; lê henas jî mirinê naxwaze! Berê gotine: Xizanî bela ye, xem bela ye; nêzîkbûna ji dijmin, dûrketina ji hezkiriyên, nexweşî û pîrbûn hemî bela ne, serê hemî belan jî mirin e. Ji bilî ewê ku mîna wê bi serê wî hati be jî, kes nizane çi di dilê yê êşek gihîştîyê û xemgîn bûye de

heye. Ez ji tiştê ku di henasa min de heye zanim çî di henasa te de ye; ew jî ji ber ku ew mînaka li ba min bi xwe heye. Tu rindî ji min re di dostaniya te de tune; çinkî her carê tiştê ku te bi kurê min kir û min jî bi kurê te kir bibîra me were, bê guman ewê guhertinekê di dilê me de çêke.

Qerêl got: Ê ku nikare guh nede dilê xwe, tiştan ji bîr neke û nede aliyekî, ta ew tiştan ji bîrê neçe û cihê wî di dil de pak nebe, tu rindî jê ne tê.

Fenze got: Mirovê ku kulek di binê lingê wî de hebe, eger xwast bimeşe, bêguman kula wî dê dîsa vebe. Eger çavê mirov kul bû û berê xwe da bê, ewê bike ku bêtir kul bibe. Herweha eger xwedî tol ji xwdanê tolê ve nêzîk bû, wê hîngê ew bi xwe xwe dajo ser mirinê. Gerek e herkes xwe ji metirsî û xedariyan biparêze, tiştan baş bipîve û pala xwe pir nede ser hêz û qewetê, bi yê bê ewle re jî pir ne tê xapandin. Çinkî yê ku piştî xwe bide hêza xwe û di riya bi tirs de here, ew bi xwe xwe dajo ser mirinê.

Kî ji bo hêza xwe xwarin û vexwarinê bi cih neke û tiştê ne tê hilgirtin û pê nikare lê bar bike, ew henasa xwe dikuje. Kê tibaba pariyê xwe nas ne kir, ew mezin kir û di devê wî hilnehat, wê di ber de bimîne û pê bimire. Kê bi gotina dijminê xwe bawer kir, pê hate xapandin û haydariya xwe winda kir, ew ji dijminê xwe bêtir dijminê henasa xwe ye. Gerek e kesek li benda felekê nemîne; çinkî ew nizane dê çî jê were û çî jî ji ser bide alî. Lê gerek e ew bi hişyarî kar bike, bi hêz bixebite û li ser wê hesêb bi henasa xwe re bike. Mirovê hişmend ta kane

baweriyê bi kesekî nake û li ber tirseke ku rê tê re hebe ranaweste.

Ez jî pir digirim û hevî dikim bi kû ve herim tiştê ku min bi gerekî kesekî neke bi dest xwe bixim; çinkî pênc sincî hene, eger li ba kê hebin, li her derekê têra wî dikin, di xerîbiyê de alîkariya wî dikin, dûr jê re nêzik dikin û tiştê ku pê bijî û biraderan jî peyda dikin; ya yekê **ziyanê nekî**, ya diduyan **perwerda baş**, ya sisiyan ji **gumanê dûr bikeve**, ya çaran **sinciyên baş** û ya pêncan jî **di kar de dilpakî**. Eger mirov li ser henasa xwe ji tiştê tirsî, mal, xwedî, zaro û welat pê şerîn nabin, lê ji nav wan hemiyar ew mandinê hevî dike û ji mandina ji henasa xwe hêjatir nabîne. Malê bêkêrtir jî ewê ku jê ne tê mezaxkirin e, jina xirabtir jî ewa bi ya mêrê xwe nake, kurê bêkêrtir jî ewê ji dê û bavê xwe re bê sûd be, birayê xerabtir jî yê ku di tengahî û belan de li birayê xwe xwedî dernakeve, tiştên ne baş dibîne û ên baş jî nabîne. Qeralê xerabtir jî ewê ku kesên bêguneh jê ditirsin û xelkê qeraltiya xwe naporêze; welatê xerabtir jî ewê ku xêr û ewlehî tê de tune.

Tu ewlehiya min jî li ba te tune ey qeral! Li kêleka te jî dilê min venahese. Paşê xatirê xwe ji qerêl xwast û firî.

Ev e mînakê kesên xwedî tol, yê ku gerek e baweriyê bi hev nekin!

## Deriyê Şêr û Çeqelê Nasik

Qeral Debşelîm bi Beydebayê feylesûf re got: Min ev mînaka bihîst; mînaka qeralê ku kesekî bêguneh seza dike, yan bê sedem dilê xwe jê sar dibe û paşê li xwe vedigere û wî mafdar dike ji min re wîne.

Feylesûf got: Eger qeral ji bo yê ku dilê xwe bê sedem jê mabe, yan jî bê gunehkarî zulmandi be li xwe venegere, ew ziyane digihîne karûbarên qeraltiya xwe. Gerek e qeral li rewşa yê ku ziyane gihîştîyê binêre û nas bike çî sûd ji wî heye; eger ew bi nêrîn û dilsoziya xwe cihê baweriyê be, wê çaxê gerek e qeral li rewşa wî vegere. Çinkî qeralî bê kesên xwedî nêrîn, ew jî şalyar<sup>1</sup> û alîkar in, zep<sup>2</sup> nabe, ji şalyar û alîkaran jî tenê sûd bi dostanî û şorindiyê<sup>3</sup> tê wergiritin. Dostanî û şorindî jî tenê li ba xwedî nêrîn û despak<sup>4</sup> tê dîtin. Karên siltên jî pir in, karker û alîkarên ku jê re gerek dibin jî pir in, lê ên şîretkar û dawpak hindik in. Gerek e ew wezîrên xwe û xwedî nêrîn baş nas bike, bibîne çî nêrîn û karsazî li ba heryekî ji wan heye û çî di dilê wî de ye; eger ew li ba wî diyar bûn, dê heryekî ji wan tiştê ku kane li ser kar bike û durust bike bidê, ji bilî yê ku bawerî bi ol, dilsozî û despakiya wî dike jî, kesî nexwe nav

---

<sup>1</sup>.Şalyar: Wezîr.

<sup>2</sup>.Zepkirin: Tê girtin ضبط.

<sup>3</sup>.Şorindî: Şîret, nesîhet.

<sup>4</sup>.Destpak: Kesê ku xiş û gendelê nake. Destê xwe bi zilm û nerindiyê nake. نزيه.

karê xwe. Paşê gerek e yên ku baweriyê pê dike bişopîne, da karên wan bibîne û bi dizî û nehênî li karên wan binêre, da ku rindiya rindan û bedkariya bedkaran nas bibin û ne têt veşartin; eger wilo ne kir, kesê baş wê sist bibe, ê bed jî wê destdirêj bibe; di wê navberê de xelk wê were êşandin û qeraltî jî dê gendele<sup>1</sup> bibe. Nimûna li ser wê rewşê, nimûna şêr û çeçelê nasik e. Qerêl got: Ma ew çawa bû?!

Feylesûf got: Dibêjin çeçelek di berqefekê<sup>2</sup> de rûniştî bû, ew bi çeçel, gur û roviyan re dawpak û despak bû û tiştê ku wan dikir wî ne dikir; wî talanî ne dikir, xwîn ne dirijand, goşt ne dixwar û hêç setemkarî ne dikir. Loma jî, cinawiran dijîtiya wî dikir û digotin: Em karê te rast nabînin. Despakiya ku tu li ser î, nasiktiya te jî sûdê li te nakin û tu nikarî bibî wekî yekî ne ji me. Were bi me re bigere, wekî karê em dikin bike, û dîsa jî her tiştê ku te ji xwînê û xwarina goşt dîr dixê berde. Çeçel got: Eger ez bi xwe xwe gunekar nekim, hevaltiya min bi were min gunekar nake; çinkî guneh ne ji cih û hevalan tê, ew ji dil û karan tê. Eger çekarî bi cih û hevalan ve were girêdan, tê wê wateyê, ku eger xwedanê cih durustkar be, karê wî di wî cihê de durustkar e, û eger xwedanê cih pîs be, karê wî dê di wî cihê de jî pîs be; yanê ewê ku nêsik di perestgeha wî de bikuje, gunehê nake! Lê kê ew li meydana şer kuşt,

---

<sup>1</sup>.Gendele: Kufkîbûn, genîbûn, فساد

<sup>2</sup>.Berqef: Qulqewêr, quleke di tehtê de kolayî, şikeft an qula devê wê teng û hundirê wê fere.



wê hîngê dibe gunehkar. Ez jî bi henasa xwe bûme hevalê we, ne bi dil û karê xwe; lê ji ber ku ez encama karan zanim min xwe bi tenê kiriye, lê hevaltiya min ji we re ji ber hezkirina min ji we re ye. Eger hevaltiya min zîyanê bi we dike, cih û war pir in ku ez herimê! Herweha çeqel di rewşa xwe de ma, bi nasiktî û despakiya xwe navdar bû, navê wî ta gihîşt şêrekî ku qeralê wê deverê bû; û ji ber dawpakî, despakî, çavtêrî û dilsoziya ku li ser çeqel dihate gotin, şêr xwast wî bibîne û wesand dû; gava ku çeqel amade bû, qeral vê re axivî, pê dilşa bû û dît ew di hemî tiştên xwe de li gora daxwaza wî ye.

Piştî çend rojan, şêr dîsa çeqel vexwand ba xwe û jê re got: Tu zanî karkerên min pir in, alîkarên min jî bê hejmar in, digel wê jî, ez bi gerekî alîkara me. Li ser rawişt, hiş, ol û dawpakiya te ya ku gihaye min û min bi xwe jî tu ezmûn kirî û dîtî ku tu wilo yî, ez hîn bêtir li te dilxwaz bûme, ji lewre ezê karine xwe en mezin bi te hilpesêrim, te rakim asteke bi rûmet û te bikim ji alîkarên xwe.

Çeqel got: Qeral da ku kesine xwedî taqe ji nav ew kesên ku li karûbaran miqyat dibin ji xwe re bibînin di vebijartina alîkaran de mafdar in; lê gerek e tu kesekî ji bo wê yekê neçar nekî; çinkî yê bê dilê xwe bixebite, nikare pir kar bike. Ez jî ji karê siltên hez nakin, taqeya min jî tê de tune ye, ne jî hevaltiya min bi siltên re heye. Tu jî qeralê cinawira yî, li ba te ji regeza hovan pir hene, ji wan xwedî hiş û hêz jî hene ku ji kar hez dikin û ji siltên re dilsoz in,

eger tu wan bi kar bînî, ewê te vehesînin û ji bo asta ku ew bigihînê jî şa bibin.

Şêr got: Tu wî tiştî bihêle, ez ji bo vî karî li te naborim!  
Çeqel got: Yên ku bê tirs tên xizmeta siltên dikin du cure ne, ez jî ne ji wan im, ew jî: Yan wê melsokî<sup>1</sup> bin, tiştê ku dixwazin bi pîsîtiya xwe bi dest bixin û bi melsokiyê jî xwe xelas dikin; yan jî wê sivik û erzan bin ku dilê kesî pê namîne. Lê eger kê xwast bi îjdilî û rastî xizemeta siltên bike û bê ku xwe jê re bimelsîne kar bike, ewê pir bi ewle nebe, ji ber ku dijmin û dostên siltên wê bi çavtengî û dijîtiyê lê binêrin û lê rabin, dost jî wê ji qereza payedariya wî re dijîtiya wî bikin û bêbextiyan lê bikin. Eger bêbextiyê jî cihê xwe li ba qerêl girt, mirina wî dê di wê de be; neyarên siltên jî dê ji ber şîretkirina wî ji siltên re jê bi kîn bin, ji bo êşandina wî bixebitin û li mirina wî bigerin. Eger ev her du cureyên mirovan jî lê hatin hev, ewê tûşî mirinê bibe.

Şêr got: Bila zora dostên min li ser te, çavtengî û dijmantiya wan ji te henasa te neşkînin, çinkî tu bi min re yî, ezê te ji wan biparêzim û li gora qîreta te, te bigihînim pileyên bilind ji rûmet û serdaryê.

Çeqel got: Eger qeral ji min re rindiyê dixwaze, bila bihêle ez bi xema xwe a hindik li vê çolê bijîm û bi jiyana xwe ya ku bi av û geyayê diqedînim, qayîl bim. Min nas kiriye, ziyan û tirs ku di katekê de digihê siltên, ji ya ku li

---

<sup>1</sup>.Melsokî: Tirsok, bêvîn, li ber kesekî ranabe.

dirêjiya temenê mirovekî din digihê wî bêtir e û ew herdem jî di tirsê de ye; lê di gel wê jî, tenê li demeke kin sûd digihê siltên. Jiyaneke di ewle û dilvehesiyê de jî ji jiyaneke bi tirs û haydarî çêtir e.

Şêr got: Min gotina te bihîst, ji tiştê ku tu jê ditirsî, metirse û ez berdêlê ji alîkariya te ji min re nabînim. Çeqel got: Eger qeral ji min nagere, bila soz bide min, eger yekî ji dostên wî yên di ser min re ji bo tirsê li ser payedariya xwe, yan jî yên ji min kêmtir ji bo ku cihê min bibin, setem li min kirin, li ba qerêl bi zimanê xwe, yan jî li ser zimanê bilî xwe xwastin qerêl li min tûj bikin, bila wê çaxê ew di rewşa min de nelezîne, tiştê ku gihîştîyê û li ba wî tê gotin biçespîne, baş binêre û paşê çawa xwast bike. Wê hîngê, eger min bi gotina te bawer kir, ezê bi henasa xwe daxwaza te bi cih wînim, bi rastî û durustî di tiştê ku bi min hilpesêrî kar bikim û nehêlim tişteke di wan karan de hikariyê li min bike. Şêr got: Ez hemî tiştî ji te re soz dikim û ji wê bêtir jî!. Paşê şêr ji nav hemî dostên xwe çeqel kire berpîrsê kewarên xwe, radestî wî kirin û rûmetdariya wî jî bilind kir.

Gava ku dostên şêr ew yeka dîtin, ji çeqel dilteng û ne xweş bûn, xwe kirin yek û li hev kirin ku şêr bi ser wî de têvedin. Li wê çaxaê jî, şêr goştinê xweş bi dest xisti bû, wî hinek jê rakir û ferman da çeqel ku hilîne û têxe cihekî ewle û parastî ji cihê xwarinê da ku paşê bixwe.

Lê dostên şêr rabûn ew gošta ji cihê wî rakirin û birin mala çeqel û tê de veşartin, û haya wî jî jê tunebû; paşê

wan xwe amade kirin ku eger tiştekek bû çeçel virek derxînin. Wê çaxê, çeçel jî bi xizmeta şêr û karûbarên wî mijûl bû û nizanî çî feq<sup>1</sup> jê re tê venan. Dema ku sibe vevat, şêr xwarina xwe xwast, lê ew goştê ne hat dîtîn! Çeçel lê gerî û ne dît û ew wînda bû! Ewên ku xefik<sup>2</sup> jî çeçel re vena bûn jî hatin li ba şêr amade bûn û li encûmenê rûniştin. Şêr dîsa li goşt pîrsî û tê de lezand, wê çaxê wan li hev nêrî û yekî jî wan wekî ku nûçegihanekî çêkar e, got: Gerek e çî jî qerêl re kar û zîrar be em jê re hewal bidin, eger ew li kê giran tê jî bila were. Min bihîst ku çeçel goşt bire mala xwe da ku bixwe; ê din got: Ez dibêjim ew wîlo nake! Li goşt bigerin û bipelînin<sup>3</sup>, lê di gel wê jî naskirina afrandeyan pîr zor e. Yekî din got: Bi serê min be, pîr naçe û tiştên veşartî wê werin naskirin, ez guman dikim jî eger win lê bigerin winê wî goştî di mala çeçel de bibînin, her tiştê ku li ser kêmanî û xinaniya wî tê gotin jî gerek e em pê bawer bikin. Yekî dîtir got: Eger rast em goşt di mala wî de bibînin, ew kara wê ne tenê xinanî be, wê nankorî û destdirêjî be jî. Ê din got: Win xwediyên sinciyên baş in, ez nikanim we virek derînim, lê gava ku qeral kesekî bişîne û mala çeçel vejîne, rastî wê xuya bibe. Yekî din got: Eger qeral dike mala wî vejîne, bila bilezîne; çînkî çavdêr û sîxurên<sup>4</sup> çeçel li her derekê

---

<sup>1</sup>.Feq: Xefik, Bend, daf, dibare..

<sup>2</sup>.Xefik: Feq, bend..

<sup>3</sup>.Pelandin: Lêgerîn.

<sup>4</sup>.Sîxur: Casûs, ajan.

hene û wê alîkariya wî bikin. Herweha, wan bi gotinên wiha û yên mîna wan kirin ku guman têkeve henasa qerêl.

Wê hîngê qerêl wesand dû çeqel, ew hat û jê re got: Kanî ew goştê ku min got biparêze? Got: Min da xudanê xwarinê da ku bigihîne te, şêr xwedanê xwarinê anî, ew jî ji kesên ku bi wan re li dijî çeqel sekinî bû, wî got: Wî tiştê ne da min! Wê çaxê şêr rabû yekî dilsoz şande mala çeqel da ku vejîne, wî jî goşt di malê de dît û anî ba şêr. Li wê demê, gurekî ku di wê pirsê de deng ne dikir, ji şêr ve nêzîk bû, xwe xuya kir ku dilsoz e û ta rastî xuya nebe di tiştê ku nizane de napeyive! Got: Piştî ku qerêl xinaniya çeqel nas kir, gerek e lê nebore; çinkî eger lê borî, ewê careke din nikani be xinaniya xinanan nas bike, ne jî gunehê gunekarekî nas bike. Wê hîngê şêr Ferman da çeqel da ku ji ba wî derkeve û dest ji kar berde.

Li wê demê, rûniştvanekî qerêl got: Ez ji rewşa qerêl û naskirina wî ji tiştan re mat dibim, çawa tiştê wilo jê tê veşartin, zû tê xapandin û qelaşiya çeqel nas ne kir? Hîn ji wê matir, piştî ku ew yeka jê derhat, ez dinêrnim qeral dike lê bibore jî. Lê digel wan gotinan tevan, şêr wesand dû çeqel da ku poşmaniya xwe jê re xuya bike; lê şande çû, vergerî, nameke virek ji ba xwe çêkir û ji qerêl re anî û got ku çeqel dibêje ew ne tê. Wê hîngê, şêr hêrs bû û ferman da, ku çeqel were kuştin, lê diya şêr nas kir ku wî di fermana xwe de lezand, wê jî ferman ji yên ku fermanbar bû bûn ku çeqel bikujin re şand, da ku bicihanîna wê fermanê bi derengî bixin, ew derbas ba kurê

xwe bû û got: Kurê min! Bi çi gunehî te ferman kir ku çeçel were kuştin? Wî rabû pirs jê re hewal da. Wê got: Kurê min! Te lezand, hişmend bi nelezandin û çespendinê ji poşmaniyê tê parastin. Xwedanê lezê ji ber nêrîna xwe a lawaz herdem poşman dibe. Kî bi nêrîn û hişdarî li karê xwe nenihêre, ew dibe mîna nêrîna yê ku mîna perde li ser çava be, lê guman dike ku porek li pêş çavê wî ye; mîna mirovê ku dengê pêşiyekê bi şev dibihîse û ji ber xurtiya dengê wê guman dike ku ew tiştêkî pir mezin e, lê eger gihîşt ba wî, dibîne ne tutişt e. Kesek mîna qeralan pêwîstiya xwe bi bînferehî û çespendinê tune; çinkî jin bi mêrê xwe, zaro bi dê û bavê xwe, şargirt bi mamostê xwe, leşker bi rêberê xwe, nasik bi ola xwe, xelk bi qeralê xwe, qeral bi çêkariyê, çêkarî bi hiş, hiş jî bi çespendin û nelezandinê ye.

Serê birdariya qerêl naskirina dostan e û çawa payedariya wan li gora asta wan datîne û zane çawa ew hev gunehbar dikin. Ji ber ku eger hinek ji wan rêkê di kuştina hinên din de bibînin, dê bikin. Te jî çeçel taqe kir û nêrîn, dilsozî û qîretiya wî nas kir, pesna wî dida û jê razî jî bû; lê te ew bi tiştêkî gunehbar kir ku rastiya wê tune, tu hîn rastiya wî ji derewa wî nas nakî, belkî vir, dexsî û xinanî be jî ji hin wezîrên te de. Çinkî eger qerêl di karê wezîrên xwe de sist kir û ji wan re haydar ne bû, tiştê ku dawîya xwe ne baş be dê were serê wî. Qeral bi riya hişdariyê baş zane ku bedxwaz ji çêkaran dilteng dibin û herdem çavên xwe lê ne ku wan gêr bikin. Piştî ku qeral bi

çeşel qayîl bû û pê ewle bû, gerek e wî xinan dernexe. Jerkî ku çeşel hatiye û ta niha, ew herdem despak û şorind bû û me tu xinanî jê ne dîtin. Gerek e ji bo pariyek goşt qerêl wilo nelezanda! Qeralo! Gerek e tu careke din li rewşa çeşel binêrî, bila tu ji bîr nekî, ku ew berê jî nêzîk goşt ne dibû û ne dixwar, ma çawa ji bo goştê ku te spartê?! Belkî eger qeral wê yekê vekole, dê bibîne ku dijberên çeşel hene, wan ew pêlana gerandiye, goşt birine mala wî û tê de danîne. Çinkî eger pariyek goşt di lingê başîqekî de be, hemî tilûr lê dicivin, eger hestiyek bi kûçîkekî re be, kûçîk lê kom dibin; çeşel jî ta roja îro sûdar bû, ji bo ku sûdekê li te bike her westaneke ku vehesa te tê de hebû fikir, her ziyan û êşekek hildigirtin û tiştêk jî ji te venedîşart.

Gava diya şêr ev gotina ji lawê xwe re fikir, hin bawerdarên wî derbas ba wî bûn û ew bi bêgunehiya çeşel agahdar kirin. Wê hîngê diya şêr got: Piştî ku qerêl bêgunehiya çeşel nas kir, gerek e bi yê ku ew tiştê pê kirin re sivik derbas neke, da ku wêrek nebin, careke din tiştên wilo nekin, tiştên ji wê mezintir jî nekin û wan seza jî bike. Ew tiştê ku wan bi te re kir biçûk mebinê, çinkî digel ku geya bêhêz e, lê benê ku fîl pê tê girêdan jê çêdibe; gerek e hişmend li pîrsa yê ku rindiyê vedişêre, xinan, xedar, ne xêrxwaz e û baweriyê bi pişdawayî nake, gerek e ew bedsezaya karê xwe bibîne. Min hêrsbûna bi lez û şaşbûnên mezin nas kirine, lê kê guh ne da hindikî, nagihêje piraniya ku hevî dike jî. Li ser bedkariya ku te

gihand çeçel, wê baştir be ku tu wî veğerînî, bala xwe baş bidê û ji bo razîkirina wî bêhêvî nebî; çinkî kesin hene, gerek e di çi karûbarî de be, mirov wî bernede, ew jî ew kesên ku bi durustkarî, comerdî, sozparêzî, spasdarî, dilsozî, hezkirina ji xelkê, dilferehî, bêziyanî û giraniya dost û biraderan hildigirin têne nasîn, ra ku karûbarên wan li ser wan giran bin jî.

Lê yê ku gerek e bê dûrkerin, ên şerûd, ne sozdar, ne spasdar, ne dilsoz, ji dilovanî û tîrsa ji Xwedê dûr, çêsezaya pişdawiye û bedsezaya wê jî mandel<sup>1</sup> dîkin. Te jî çeçel nas kiriye û taçe kiriye û gerek e tu pê re berdewam bikî.

Şêr wesand dû çeçel û li ser tiştê ku pê kir mixabiniya xwe diyar kir, ew dilxwaş kir û got: Ez lêborînê ji te dixwazim û te vedigerînim payedariya te. Çeçel got: Tiştê ku ez li despêka hatina min li ba te jê tîrsîm ev bû; ewa ku min ji bo wê ne dipejirand ku bibim ji peyayên<sup>2</sup> te û xizmeta te bikim. Dostê her bed ew e, yê ku zîyanê digihîne birayê xwe da ku sûdê ji xwe re wergire, mîna li xwe dinêre li wî nanêre, ji bo daxwazên xwe dixwaze wî bi nemafdariyê qayîl bike, ew tiştê jî gelek caran di navbera dostan de çêdibe.

Qerêl nas kir ku çi bi min re çêbû, loma jî gerek e kesê ku qerêl sezayeke giran lê kiri be û ji kar dûr xisti be, yan

---

<sup>1</sup>.Mandel: Nakirin، رفض، إنكار .

<sup>2</sup> .Peya: Mirov, kesek ku ji mirovekî payebilind re kar dike, şer dike, wî diparêze...



jî ê bêguneh ku malê wî biri be, yan jî hêjayî rûmet bû û rêzdariya wê ne hati bû girtin û tiştê ku hêjayî wî bû ne dabûyê, yan jî hati be setemkirin û li pirsra wî ne nêrî be, yan jî çavbirçî be û tiştê ku dixwast bi dest ne keti be, yan di nav miletekê de be, bedkariyek kiri bin stûyê wî û ew jî bêguneh bû, pê hati be sezakirin û ên din jî hati bin berdan; gerek qeral bi wan hemiyana bawer neke, yêna mîna wan ji xwe re neke dost û ez jî ey qeral, yek ji wan im; çinkî belkî qeral bêje: Kêmaniya ku çeqel ji destê me dît ji bîr nake û dê tola xwe ji min vede. Ez jî -xwedê zan e-tiştê ji vê yekê di dilê min de tune, lê tirsra min ew e, ku ew careke din wê yekê bi min re bikin. Eger ez bêjim ez bi qerêl ne bawer im û gerek e ez ne li ba wî bim, bila li henasa qerêl giran ne tê. Gerek e qeral ên mîna min ji xwe ve nêzîk neke û hîç ji vê daxwaza min re nebêje na; bila tu zani bî jî, gava ku kesên xwedî destlat ji kar hatin dûrxistin û derkirin, gerek e ew werin rûmetkirin.

Lê şêr guh neda gotina wî û jê re got: Min xû û sinciyên te nas kirine, dilsozî û dilpakiya te jî taqê kiriye, derewa ku li te hat kirin jî nas kir, ezê te li ba xwe li payedariya vebjarte û rûmetdaran dînim, ji bo mirovê bi rûmet, bi sincî û çêkar jî gelek bedkarî tên ji bîrkirin. Emê vegerin ser baweriya me bi te û tu jî vegere û baweriyê bi me bike; çinkî di wê de xweşî û şahî ji me û ji te re jî heye.

Herweha, çeqel vegeî ser karê ku pê hati bû  
hilpesartin, şêr jî rûmtdariya wî ducarkî girt û roj bi roj ji  
siltên ve nêzîktir dibû.

\*\*\*

\*\*\*

## Deriyê Îlaze, Belaze û Îrexe

Qeral Debşelîm ji feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst. Mînakekê li ser tiştên ku gerek e qeral pê bigire, qeraltiya xwe pê biparêze û destlata xwe pê biçespîne ji min re wîne, da ku bibe serê karûbarên wî û arziya wî a sereke di destlata wî de; ma ew hişmendî, qîretî, wêrekî lê camêrî ye?

Beydeba got: Tiştê ku gerek e qeral pê qeraltiya xwe biparêze hişmendî ye. Destlat bi wê tê çespanandin. Hişdarî serê her tişteki, bingeha wê û ji baştirîn sinciyên qeralan e.

Wekî ku hatiye gotin, qeralek hebû jê re digotin Belaze, û wezîrekî wî jî hebû jê re digotin Îlaze ew perestvan û nasik bû. Şevêkê qerêl xew kir, heşt xewn dîtin, bitirs şiyar bû û ji mebesta wan pir tirsî. Wî Berahîme wesandin, ew jî nasik bûn, da ku xewnên wî şirove bikin. Gava ku ew li ber destê wî amade bûn, wî tiştên di xew de dîtî bûn ji wan re hewal da, wan jî tevan got: Qerêl tiştên seyr dîtine, eger qeral heft rojan li me bisebire, emê şiroveya xewnên wî jê re wînin. Qerêl got: Min dem da we. Ew rabûn ji ba wî derketin, li mala yekî ji wan kom bûn, pirs di nav hev de gerandin û gotin: Me zanîneke mezin bi dest xist, emê pê tola xwe ji dijminê xwe hildin. Win zanin wî berî vê dozdeh hezar kes ji me kuştin, niha jî wî nehêna xwe ji me re got û ji me xwast ku em xewna wî jê re şirove bikin. Emê gotinê lê giran bikin,

wî bitirsînin ta tirs bikeve dilê wî û tiştê ku em jê bixwazin bila bike.

Emê wî ferman bikin û bêjin: Me li pirtûkên xwe nêrî û me dît, ew tiştê ku te di xewa xwe de li ser xwe dît ji ser te naçe, ji bilî ku tu ew kesên em ji te re bi nav bikin, tu jî ji wan hez dikî û li ba te buha ne bidî me, da ku em wan bikujin; çinkî ta ew ne tîr kuştin, ew tiştê nerind ji ser te ranabe. Eger qerêl got: Win dixwazin kê bikujin ji min re bi nav bikin? Emê bêjin: Em baştirîn jinên te qerala Îrexe Diya Ciwîre a dilovan dixwazin; Ciwîre lawê te yê ku li ba te hezkirî û hêjatir e, lawê birayê te yê bi rûmet, Îlaze dost û fermandarê te dixwazin; em Kala nivîskarê nehênên te, şûrê te yê bê mînak, filê sipî yê ku hesp ji pare nagihênê, hespê ku di şer de siwargeha te ye, her du filên te ên gewre ku bi filê nêr re ne û hêştirê lezok ê hêzdar dixwazin; em Keberyon hişmendê çêxwaz ku bi tiştan zane jî dixwazin. Bi wê yekê, emê ji ber tiştê ku bi me kir tola xwe jê hilînin.

Paşê emê jê re bêjin: Ey qeral! Gerek e tu yên ku me ji te re bi nav kirin bikujî, xwîna wan têxî curnekî, jê tijî bikî û tê de rûnî; eger tu ji curn derketî jî, em Berahîme, emê ji her çar aliyan de werin, li dora te bigerin, te hilgirin û tif ser te bikin, xwîne ji te pak bikin û paşê te bi av û zêta xweş bişon. Piştî, tuyê herî mala xwe a xweşik û bi wê yekê Xwedê dê belaya ku em jê ditirsin ji ser te bide alî.

Ey qeral! Eger tu aram bûyî, henasa te ji bo hezkiriyên te yên ku me ji te re hewal dan vehesî û te ew ji xwe re

kirin qurban, tuyê ji belayê rizgar bibî, arzî û destlata te wê ji te re durust bibe û tu kê bixwazî jî tuyê li dû xwe bikî qeral. Eger tu wilo nekî, tirsas me li ser te ew e, ku milkê te here û belkî tu bi xwe jî bimirî. Di nav xwe de gotin jî, eger qerêl bi ya me kir, emê wî jî bi şêwekî pîs bikujin.

Dema li ser tiştê ku gotin li hev kirin, roja heştê çûn ba qerêl û jê re gotin: Qeralê me, em di pirtûkên xwe de li şiroveya xewnên ku te dîti bûn gerîn û me di nav xwe da li ser rewşa te danûstand. Lê belê, ey qeralê pak, durustkar û rûmetdar, eger tu bi me re bi tenê nemînî û me ewle nekî, em nikanin tiştê ku me dît ji te re hewaldin. Qerêl kesên ku li ba wî bûn derxistin, bi tenê bi wan re ma, wan jî tiştê ku pîlan kiri bû jê re gotin, wî jî ji wan re got: Eger ez ewên ku mîna henasa min in bikujim, mirin ji min re ji jiyanê çêtir e! Bêguman ezê jî bimirim, jiyan jî kin e, ez li dirêjîya demê jî namînim û nabim qeral, mirina min û jîdestdana hezkiriyên min jî hemtayî hev in, hîn ji bilî gunehê ku ezê di kuştina wan de bikim! Berahîmiyan jê re got: Eger tu hêrs nebî, emê jî baxivin. Wî rê da wan û wan got: Ey qeralo, ne rast e ku tu henasa bilî xwe ji ya xwe buhatir bibînî, henas û milkê xwe biparêze! Karê ku ji bo te hêviya bilind tê de heye bi rastî û bawerî bike, li hember xelkê qeraltiya xwe, ku tu bi wan serbilind û bi rûmet bûyî, bi milkê xwe şa bibe! Tiştê mezin bermede û bi tiştê biçûk megire! Yan jî tuyê ji ber hezkiriyên xwe ve xwe bikujî.

Qeralê me, bila tu zani bî, dema ku mirov ji henasa xwe hez dike, yanê ji jiyane hez dike; gava ew ji yarekî hez dike, ew tenê ji bo ku di jiyana xwe de pê kêfxwaş bibê ye. Mandina te jî, piştî vîna Xwedê, bi arziya te ye. Te jî ev arziya bi westan û dijwariyên li dirêjîya mehan û salan bi dest xistiye, gerek e tu wî biparêzî û li ba te ne sivik be. Tu guhdariya me bike, li daxwazên henasa xwe binêre û tiştê din berde, çinkî tu metirsî ji wan tune ye.

Gava qerêl dît ku Berahîmiyan di gotina xwe de giran kir, di axaftinê de jî fedî ne kirin, xem û melûliya wî bêtir bû, ji nav wan rabû, derbas oda xwe bû, bi rû çû zemînê û dagirî, û mîna çawa gava masî ji avê derkeve û zikepişt teqle dibe, ew jî wilo bû û bi xwe re got: Ez nizanim kîjan pîrsa di henasa min de mezin e: Qeraltî yan kuştina hezkiriyên min?! Eger ez wilo bikim, ta ez xweş im ez şabûnê bi dest naxim, milkê min jî ji min re hemdemî nabe, û ne durust e jî ku ez ji nav her du vebjêran<sup>1</sup> arziyê vebjêrim! Eger ez Îrexe û Ciwîre nebînim, ezê di jiyane de bibim bêdaxwaz<sup>2</sup>. Eger wezîrê min Îlaze bimire, ezê çawa kani bim qeraltîya xwe bi rê ve bibim? Eger fîlê min ê sipî û hespê min jî mirin, ezê çawa karûbarê xwe durust bikin? Eger kesên ku Berahîme ji min re destnîşan dîkin bikujim, ezê çawa wek qeral bimînim?! Piştî wan ezê bi jiyane çî bikim?!

---

<sup>1</sup>. Vebjêr: Tiştêk ji nav çend tiştan tê vebjartin, خيارات - خيار

<sup>2</sup>. Bêdaxwaz: Tergedunya زاهد

Paşê, şor li ser xem û melûliya qerêl li her derekê belav bû! Gava Îlaze dît, çiqasê qeral melûl û xemgîn bûye, ew bi hişdarî fikirî, li pirsê nihêrî û got: Gerek e bê ku qeral min bixwaze ez neçim ba wî û jê pirs nekim. Paşê çû ba Îrexe û got: Jerkî ku ez ketime xizmeta qerêl, wî bê nêrîn û rawêja min tu kar ne kirine. Ez dibînim ew tiştêkî ji min vedişêre, lê ez nizanim çi ye, ew jî tiştêkî xuya nake! Lê berî vê bi çend şevan, min dît ew bi komeke Berahîme re bi tenê rûniştî bû û ne xwast em hebin, ez ditirsim wî nehênine xwe ji wan re goti bin, ez jî bi wan ne bawer im ku nêrînên bi ziyar jê re ne goti bin û tiştê nerind jî ji wan ne derneketi be. Tu rabe têkeve ba wî, li rewş û karûbarên wî bipirse û min pê agahdar bike û bide nasîn; çinkî ez nikanim derbas ba wî bibim; belkî Berahîmiyan tiştêk jê re rind kiri be û ew ajoti be ser pêlaneke pîs. Ez zanim jî eger qeral bi hêrs bû, eger ew tiştta biçûk yan mezin be jî, ew ji kesekî napirse.

Îrexe got: Di navbera min û qerêl de hinek lome hebûn, ez jî di vê rewşê de derbas ba wî nabim! Îlaze jê re got: Di tiştên mîna vê de bila ne tê bîra te û jê bi kîn nebî, tu zanî jî ku kesek ji bilî te nikare têkeve ba wî. Min gelek caran bihîstiyê ew dibêje: Çiqas xema min giran be, eger Îrexe dikeve ba min, ew li min sivik dibe; rabe here ba wî, lê bibore, û bi tiştê tu zanî ku pê kêfxwaş dibe û xema wî direvîne jê re deng bike û bersiva wî bigihîne min; çinkî di wê yekê de, ji me û ji xelkê qeraltiyê re vehesiyek pir mezin heye.

Îrexe çû û derbas ba qerêl bû, li ber serê wî rûnişt û got: Çi bi te hatiye qeralê hêja? Te çi ji Berahîmiyan bihîstiye? Ez dibînim tu pir xemgîn î! Çi bi te hatiye ji min re hewal bide, belkî em jî bi te re xemgîn bibin û bala te vehesînin. Qerêl got: Jinê! Li ser rewşa min mepirse, min bêtir melûl û xemgîn meke! Ew tişte e, gerek e tu li ser wî ji min nepirsî. Got: Ma ez li ba te daketime payedariya ku ez hêjayê vê bersivê bim?! Mirovê herî hişmend, ewê eger barek bi ser de hat, pir xwe digire û bêtir guhdariya xwedî şîret dike, ta bi çareserî, hişdarî, lêkolîn û rawêjê ji wê belayê derkeve, û ra ji bo gunehên mezin jî mirov ji çareserkirinê bêhêvî nabin.

Tu xem û melûliyê mexe dilê xwe, çinkî tiştê ku bûye bi wan ne tê guhertin, ew hîn govde dihelînin û dilê dijmin li te xweş dikin. Li dema ku bela hat, hedarî dibe perestvanê mirov, tiştê rind ku tu di vê rewşê de bikî tu min agahdar bikî. Qerêl jê re got: Tişteki ji min pirs meke, te li min giran kir, tiştê ku tu ji min dipirsî çare lê tune; çinkî encama wê mirina min, te, gelek kesên qeraltiya min û yên ku di hemtaya henasa min de ne! Ew jî ji ber ku Berahîmî dibêjin, gerek e Ciwîre, ligel gelek kesên ku cihê hezkirina min in werin kuştin; wek win zanin jî, piştî we xêr di jiyana min de namîne, ma kesê ku vî tiştî bibihîse kane xemgîn nebe?!

Gava ku Îrexe ew tiştê bihîst, veciniqî, lê hişdariya wê ne hişt tirsê ji qerêl re xuya bike û got: Ey qeralo, metirse



em ji te re canbexş<sup>1</sup> in, cariyên mîna min û bilî min jî dê canbexşên dilxwaşiya te bin. Lê qeralê min, hezkirina min ji te re, wekî ku ez te li pêş her tiştêkî dibînim, dike ku ez tiştêkî ji te hêvî bikim, ew jî şîreta min ji te re ye. Qerêl got: Şîreta te çi ye? Wê got: Ez ji te dixwazim, tu piştî niha baweriya xwe bi kesekî ji Berahîmiyan nekî, ta pirsra xwe neçespînî bi wan ranewêjî, bila tu çendcarkî bi bawerdarên xwe rawêjî û paşê biryarê bidî, çinkî kuştin tiştêkî pir mezin e, kesê ku te kuşt jî tu nikarî ji nû ve zindî bikî. Di nava gotina de hatiye gotin: Eger cewherekî ku tu dibînî tu xêr tê de tune ye te dît, ji destê xwe mavêje ta tu pêşe yekî pê zane dikî. Qeralê min tu jî dijminên xwe nas nakî. Bila tu zani bî ku Berahîme ji te hez nakin; duh te dozde hezar ji wan kuştin, guman meke ku ev jî ne ji wan in! Gerek e hîç te ew bi xewna xwe agahdar nekirana û pê nedana zanîn. Tiştê ku wan bi te re got, ew ji ber kîna di navbera te û wan de ye ji te re got, belkî ew bi wê yekê kani bin te, hezkirî û wezîrên te bikujin û bi te re bigihên armanca xwe. Ez guman dikim, eger te ew tiştê ji wan pejirand û yên ku wan nîşan dane kuştin, wê hîngê wê bi te kani bin, qeraltiya te bi dest xwe xin û wê wekî berê li wan vegere. Çinkî eger hate xwastin ku darek were hilkirin, li despêkê tamar û tiştên ku pê bi zemînê ve tê cespandin tîr birîn, paşê hilkirina wê hêsan dibe û tê hilkirin. Zû here ba Keberyonê hişmend, ew jîr û zana ye;

---

<sup>1</sup>.Canbexş: Canfîda..

tiştê ku te di xewa xwe de dît jê re hewal bide û ji bo wate û mebesta wê jê bipirse.

Gava ku qerêl ew tiştê bihîst, xema ku li ser bû çû, hespê xwe xwast, zîn lê kir, lê siwar bû û çû ba Keberyonê hişmend. Gava ku gihîşte ba wî, ji hespê xwe peya bû, jê re çû ser çokan û stuxwar<sup>1</sup> li ber destan rawestî; wê hîngê Keberyonê hişmend jê re got: Ey qeral! Çi pirsê te heye, û çima wek ez dibînim benzê te hatiye guhertin? Qerêl got: Min heşt xewn dîtin û ji Berahîmiyan re hewal dan; li gora şiroveya xewnan ku min ji wan bihîst, ditirsim tiştê mezî bigihê min, milkê min ji destê min here, ez ji bo wî werim kuştin jî! Hişmend jê re got: Eger te xwast, tu wan xewnan ji min re hewal bide, eger te ne xwast ezê ji te re hewal bidim, tiştê ku te dît ji te re bêjim. Qerêl got: Na! Ji devê te be çêtir e. Hişmend got: Ey qeral! Bila ev tiştê te xemgîn neke, û jê metirse.

Ji bo her du masiyên sor, ewên te dîtin li ser dûvên xwe rawestîne; ew du şande ne, wê ji ba qeralê Heymûnê werin û du gerdenan bi xwe re tînin, ew bi durr û yaqûta sor ku buhaya wan çar hezar lîtir zêr in xemlandî ne û wê li ber destê te werin danîn.

Ew du ordeken te dîtin ku ji paş te firîn û ketin nav destê te, ew du hesp in, ji ba qeralê Belxê ji te re tînin, mîna wan li cîhanê tunene, ew jî wê li ber destê te bimînin.

---

<sup>1</sup>.Stuxwar: Melûl, Stuyê xwe xwar kir.

Ew marê te dît ku di ser lingê te ê çepê re diçe, ew şûrek e, ji hesinê sade ye, ewê ji ba qeralê Sicînê ji te re were û mîna wî tunene.

Ew xwîna te dît ku govdê te sor dike, ew ciline seyr in, ji ba qeralê Karzonê ji te re tîn, jê re cilên Urciwan dibêjin, ew di reşiyê de dibrûsin.

Tiştê te dît ku tu govdê xwe bi avê dişoyî, ew cilên kitanî ên qeralan e, dê ji ba qeralê Rêhzînê ji te re werin.

Dema te dît ku tu li ser çiyakî sipî yî, ew jî fîlekî sipî wê ji ba qeralê Keydorê ji te re were, tu hesp ji pare nagihênê.

Ewa te dît ku tişteki mîna êgir li ser serê te ye, ew gulbazekî ji zêr e, bi durr û yaqutê fodilkirî ye, wê ji ba qeralê Erzenê ji te re were û li ber destê te bê danîn.

Tilûrê te dît jî ku bi nikilê xwe li serê te dide, ez wê îro ji te re ravenakim, lê ew ji te re ne zîyan e, jê metirse, ew tenê hin lome û nerazîbûna ji kesên ku tu jê hez dikî ji bo te dide xuyan.

Ev e raveya xewna te ey qeral. Ev cil û şande jî, hemî wê piştî heft rojan ji te re werin û li ber destên te amade bibin.

Gava qerêl ew tiştina ji Keberyon bihîstin, jê re çû ser çokan û vegeirî mala xwe. Gava ku heft roj derbas bûn, mizgîniya hatina şandeyan hat, qeral jî derket li ser textê xwe rûnişt, destûr da kesên payedar da ku têkevin ba wî û wekî ku Keberyon jê re hewalda diyarî jê re hatin.

Gava ku qerêl wilo dît, bi zanîna Keberyon bêtir seyr û şa bû û got: Dema ku min xewna xwe ji Berahîmiyan re got, min şaş kir û tê de bi ser ne ketim. Wan bi daxwazên ku ji min dixwastin ez ferman dikirim daku xwe şaş bikim. Eger Xwedêyê gewre destê xwe di ser min re negirta, minê kesin bikuştana û ezê jî bihatama kuştin. Gerek e mirov tenê ji dostên xwe yê xwedî hiş bibihîse. Îrextêyê jî rindî xiste pêş min, min jî pejirand û pê bi ser ketim. Rabin diyariyê dînin ber destên wê û bila çî dixwaze jê bibe. Ji Îlaze re jî got: Gulbaz û cilan hilgire û li dû min were periya jinan. Qerêl rabû gazî Îrextê kir û Hûreqnah ku rûmtirîn jina wî bû, ew jî li ba wî amade bû, wî ji Îlaze re got: Cilan û gulbêz dîne ber destên Îrextê û kîjanê dixwaze bila bibe. Wî diyarî danîn pêş Îrextê, wê jî rabû gulbaz jê bir, Hûreqnah jî ciwantirîn û hêjatirîn cil birin.

Paşê qeral rabû û çû seredana Îrextê, wê jî rabû birinca bi şêrîniyê jê re çêkir û li gel çenaqa birincê derbas ba wî bû û gulbaz jî li ser serê wê bû. Wê hîngê Hûreqnah pê haydar bû, ji Îrextê dexts bû, wê jî rabû cil li xwe kirin û di pêş qerêl re çû û hat, cilên wê jî li ber ronahiya rûyê wê vedibrûsîn, mîna ku rojê ronahî didaye, û gava ku qerêl ew dît, pir xweşik dît û li Îrextê vegeerî û got: Dema ku te gulbaz bir, tu nezan bû û te cilên ku mîna wan di xezîneyên me de tunene ne birin. Gava ku Îrextê pesna qerêl ji Hûreqnahê re bihîst û çawa qerêl bi xweşî li ser wê deng kir, ew jî bi nezaniyê salix da û vebjartina wê baş ne

dît, ew hêrs û dexs bû, bi çenaqa birincê li serê qerêl da û birinc bi ser serê wî de rijî; ew tiştê jî raveya xewna ku Keberyon ji qerêl re rave ne kiri bû, bû.

Wê çaxê qeral ji cihê xwe rabû, gazî Îlaze kir û got: Tu nabînî vê nezanê çi nerindî bi min kir û ez jî qeralê vê cîhanê me?! Wê bibe bikuje û li ser dilovan mebe. Şalyar Îlaze rabû Îrexe ji ba qerêl bir û derket, lê di dilê xwe de got: Ta hêrsa qerêl danetê ez wê nakujim, çinkî ew jineke pir hişmend û xwedî nêrîna durust e, qeralên mîna wê di nav jinan de ne tîn dîtin, sebra qerêl jî bê wê ne tê, wê ew ji mirinê xelas kir, karine baş kirin û hêviya me tê de bilind e; ez bi ewle nabim jî eger ku qeral sibe ne bêje: Te çima kuştina wê dereng ne hîşt ta tu dîsa li min vedigeriya? Ez wê nakujim ta careke din nêrîna qerêl li ser nebihîsim, eger min dît ew li ser wê yekê xemgîn û poşman e, ezê wê jê re zindî vegehmim û wê hîngê wê xuya bibe ku min karekî mezin kir, min Îrexe ji mirinê rizgar kir, dilê qerêl jî şa kir û ezê jî li ba xelkê werim naskirin. Lê eger min dît ew şa û vehesî ye û nêrîn û karê xwe rast dîtiye, wê hîngê Îrexe wê bê kuştin. Wî rabû ew bire mala xwe, berdestekî dilsoz li ber wê danî û ew ferman kir ku xizmeta wê bike û wê bipê ta bibîne ku rewşa qerêl çawa dibe. Paşê wî şûrê xwe bi xwîn kir û mîna mirovekî melûl û xemgîn derbas ba qerêl bû û got: Qeralê min! Min fermana te li derbara Îrexe bi cih anî.

Ta wê hîngê, hêrsa qerêl daketi bû, sibehîti û rindiyên Îrexe li bîra wî hatin, li ser wê pir poşman bû û ji bo wê bi

xwe serê xwe xweş kir, lê wî xwe girt, li xwe xuya ne kir û fedî kir ku ji Îlaze bipirse û bêje: Ma wî rast fermana wî bi cih anî lê na?! Lê li gora ku wî hişmendiya Îlaze nas dikir, hevî kir ku wî dê Îrexe ne kuştî be! Îlaze jî lê nêrî û bi hişdariya xwe zanî çî di serê qerêl de digere û jê re got: Qeralê min! Xemgîn û melûl mebe, sûd di xem û melûliyê de tune, ew hîn govde jî jar û wêran dikin. Li ser tiştê ku tu pê nikarî bisebire, eger qeral bixwaze jî, ezê jê re axaftinekê bêjim û wî tesele bikim. Qerêl got: Baxive.

### • Mînaka Her Du Kevokan

Îlaze got: Gotine ku du kevok hebûn, yekî nêr û yeka mê, wan malika xwe tijî genim û cihe kirin û ê nêr ji a mê re got: Eger me tiştê ku pê bijîn li çolê dît, emê tiştêkî ji evê ku me civandiye nexwin; eger zivistan hat û tiştêkî li çolê ne ma, emê vegezin hêlîna xwe û jê bixwin. Kevoka mê jê re got: Nêrîna te pir baş e, û ê nêr firî û çû û demekê ma. Li dema ku wan tene xisti bû hêlîna xwe ew hîn ter<sup>1</sup> bû, lê dema ku havîn hat, tene ziwa bû û çelmisî. Gava ku ê nêr vegezî, dît ku tene hindik bûye. Wî ji kevoka mê re got: Ne me soz dabû hev ku em tiştêkî ji tene nexwin, ma çima te xwar?! A mê bergerî û sond xwar ku wê jê ne xwariye, lê wî jê bawer ne kir û rabû ew nikil kir ta kuşt! Lê gava ku zivistan hat û baran barî, tene şil bû, perçifî û dîsa hêlîn mîna berê tijî bû! Gava ku kevoka nêr ew tiştê dît, ew poşman bû, li kêleka kevoka mê xwe dirêj kir û

---

<sup>1</sup> .Ter: Nerm.

got: Eger min tu ne dîtî û mirazê xwe bi te re ne kir; eger ez di rewşa te de ramîm, min nas kir ku min setem li te kir û nikarî ew tiştê ku bû bişûnde vegeranda, ma tene û jiyana dê çi sûdê li min bikin?! Herweha ew di xemgînyia xwe de ma, ne xwar û ne vexwar û li kêleka wê ket û mir!

Mirovê hişmend di êşgihandin û sezayê de nalezîne, nemaze jî yê ku ji poşmaniya xwe ditirse, mîna çawa ku kevoka nêr poşman bû.

### • **Mînaka Meymûn û Nîskan**

Min bihîstiyê jî ku rojekê barek nîsk li ser serê mirovekî bû û kete nava çiyê, wî barê xwe danî da hinekî vehese, wê hîngê meymûnek ji darekê daket û tijî mista xwe nîsk ji birin û hilkiştî ser darê, lê tenak nîsk ji destê wî ket, ew jî rabû ji bo wê tenê ji darê daket û lê gerî, lê ne dît, lê belê ta wê gavê, hemî nîskên ku di dest wî de bûn rijîn û belav bûn. Qeralê min! Ya te jî, gelek jin li ba te hene, tu wan hemiyana berdidî û diçî ya ku tu nikarî bibînê dixwazî!

Gava qerêl ew gotina bihîst, tirsî ku Îxerte rast miri be, wî got: Ey Îlazewo! Tiştê ku min tu pê ferman kir te bi gotinekê û di wê katê de bicih anî; ma tu li benda gotineke min bû? Te ew gotina ne çespanî û pê kir! Îlaze got: Ewê ku gotina xwe yek e û ne tê guhertin Xwedê ye; gotinên wî ne tî guhertin û dunêrînî di gotina wî de tuneye. Qerêl got: Te rewşa min pir ne rind kir û bi kuştina Îrextê xema min giran kir. Îlaze got: Didu hene gerek e xemgîn

bibin, ewê ku heroj gunehan dike û yê ku hîç xêran nake; ji ber ku şabûna wan li cîhanê ye û kêfwaşiya wan hindik e, gava ku sezayê bibînin, poşmaniya wan jî bê encam dibe û ne tê pejrandin. Qerêl got: Eger ez Îrexe zindî bibînim, ezê hîç li ser tiştêkî xemgîn nebin. Îlaze got: Didu hene gerek e hîç xemgîn nebin, ewê ku heroj rindiyar dike û yê ku hîç guneh ne kirine. Qerêl got: Ezê ji vê bêtir li mijara Îrexe nenêrim. Îlaze got: Didu hene nanêrin, ê kor û ê bêhiş. Çawa kor li ezmên û stêrkên wê nanêre, li dûr û nêzîk jî nanêre, ê bê hiş jî rindî û pîsiyê ji hev dernaxe, ne jî çêkarî û bedkariyê ji hev derdixe. Qerêl got: Eger ez Îrexe zindî bibînim şabûna min wê pir mezin be. Îlaze got: Didu herdem şa ne, yê ku rast dibîne û zaniyar; mîna ku çawa rastbîn<sup>1</sup> tiştên cîhanê rast dibîne, çi zêdebûn û kêmanî tê de heye zane, dûr û nêzîk dibîne, herweha zaniyar jî xêr û gunehê dibîne, tiştên pişdawayê zane, riya felatê nas dike û doza rêya rast dike. Qerêl got: Ez ji nêrîna li Îrexe hîn têr ne bûme! Îlaze got: Du kes hene hîç têr nabin, yê ku xema wî komkirina peran û veşartina wan be, û yê ku tiştê pê nikare hêvî dike û doza tiştê ku nikare bibîne dike.

Qerêl got: Lo Îlazewo! Gerek e em ji te dûr bikevin, ji te haydar bin û xwe ji te biparêzin. Îlaze got: Didu hene gerek e ji hev dûr bikevin, ewê dibêje ku ne xêr, ne guneh, ne bedseza, ne çêseza û ne tiştêk ji bo min heye; û yê ku çavê xwe ji ser tiştê jê re ne hêlal e ranake, ne jî guhê xwe

---

<sup>1</sup>.Rastbîn: Ewê ku tiştan rast dibîne û pêzane.



ji ser bihîstina tiştên pîs, henasa xwe ji ser jinên bilî xwe û dilê xwe ji ser guneh û dilxwaziya ku henasa wî dixwaze radike. Qerêl got: Hêviya min di Îrextê de bû sifir(zîro). Îlaze got: Çar tişt sifir in! Çemê bê av, welatê bê qeral, jina bê mêr û nezanê ku rindiyê ji nerindiyê dernaxe. Qerêl got: Ya Îlaze, tu bersivan dibînî. Îlaze got: Sisê hene bersivê dibînin, qeralê ku ji kewara xwe derdixê dîke û dide xelkê, jina ku dane mêrê bi kokûbinyat û jê jî hez dîke û mêr jî zana û xêrxwaz be.

Qerêl got: Ya Îlaze, te Îrextê bi nemaftdarî kuşt. Îlaze got: Sisê ji mafdariyê dûr dikevin, ewê ku cilên sipî li xwe dîke, paşê diçe puf kûrikê dîke û cilên xwe bi kulxanê reş dîke; cîlawkarê ku goreyên nû pê dîke û lingên xwe jî hergav di avê de ne; yê ku hespê resen ji bo siwarbûnê dikire, paşê ji wî mijûl dibe, lê siwar nabe û hesp jî dibitire.

Qerêl got: Xwazî berî ku ji jiyane diçim, min li Îrextê binêriya. Îlaze got: Ên ku tiştên pê nikanin dixwazin sisê ne: Yê ku ji Xweda natirse û hêviya çêsezaya kesê xêrxwaz ji xwe re dixwaze, miqrisê ku dixwaze bi miqrisiya xwe bigihê payedariya camêran, ji rêderketiyê<sup>1</sup> ku xwîna xelkê dirijîne û hêvî dîke ku giyanê wî bibe ji pakrewanan.

Qerêl got: Min bi xwe bi serê xwe kir û bela jê re anî. Îlaze got: Di nav mirovan de yê wilo pênc in: Yê ku tûşî

---

<sup>1</sup>. Jirêderketî: Bêsincî, فاجر, الخارج عن الأصول المتعارفة عليها

şer dibe û destvala ye, miqrisê ku malê xwe di mala xwe de kom dike, kesek jî vê re tune ye, diz jî xwe lê digirin, wî dikujin û malê wî dibin; navsalê ku jina temen biçûk dixwaze; bêçûlê<sup>1</sup> ku sibehiyekê dixwaze; jina ku ji kurê xwe hez dike, ew jî qelaş û sûtar e û diya wî radibe li ser kiryarên wî dipeçine, vedişêre û paşê jî ew jê re dibe bela û wê diwestîne.

Qerêl got: Min bi kuştina Îrexe karekî ne durust kir! Îlaze got: Yên ku wilo dikin sisê ne, ew jî: Tilûrê ku lingê xwe bi ezmên de radike, ji tirsê ku bi ser de bikeve; leglega ku li ser lingekî disekine û ê din danîne, ji tirsê ku zemîn pê de dakeve; dewlemendê çekoz, eger xwar têr naxwe ji tirsê ku malê wî xelas bibe, ew mîna zovê<sup>2</sup> ku xwarina xwe ax e, lê dîsa jî hindik dixwe da ku xelas nebe, mîna segê ku bi zimanê xwe ji çem vedixwe û devê xwe jê danagire, ji tirsê ku çem bimiçiqe, û pêrçemoka ku bi şevê difire û bi rojê nafira ji tirsê ku xelk ji bo sibehîtiya wê wê bigire û ew jî tilûra herî bêçûl e!

Qerêl got: Wekî ku ez li ser Îrexe xeyidîme, ez tucarî wilo ne xeyidî me. Îlaze got: Pênc tişt di jinê de hene hêja ne ku mirov li ser bixeyide: Eger dawpak, xwedî kok û binyateke bi rûmet, hişmend, sibehî û li aqilê mêrê xwe be û jê hez bike.

---

1. Bêçûl: Ne ciwan, ne şêrîn.

2. Zov: Kurmê axê.

Qerêl got: Bi sedema Xemgîniya min li ser Îrexe, xew bi çavê min nakeve! Îlaze got: Didu hêmin nabin û venahesin: Xwedanê malê pir, ku parêzvanê kewara wî û dilsozekî wî tunebe, û mirovê pir nexweş ku bijîşk jê re tunebe!

Paşê, dema Îlaze dît ku qeral pir bêhteng bûye, ew rawestî, lê qerêl got: Çi bi te hat ey Îlaze tu rawestî?! Got: Qeralê min! Min zimanê xwe pir li ser te dirêj kir, ew jî ji bo ku ez te ezmûn bikim û zanibim nêrîna te li ser Îrextê çawa ye. Ez dibînim min di wê yekê de sînore xwe derbas kir û ji hişdarî û kûrfamiya ku ji te xuya bû ez şetmêt bûm; çinkî, digel ku ez bi te re pir wêrek bûm, lê hêrsbûn li te xuya ne bû û rewşa te ne hat guhertin. Ez jî li ser lêborîna te ji bo min te spas dikim, digel ku ew tişt ji aliyê min de ji qerêl re şîret bûn û ji bo naskirina rewşa wî bûn, lê eger te xwast li min bibore, yan jî bi tiştê ku tu dixwazî min seza bike, ji ber ku Îrexe li jiyanê ye!

Gava ku qerêl ew bihîst, pir şa bû û got: Ey Îlaze! Tiştê ku kir ez ji te hêrs nebim, ew e ku ez şîret û durustiya gotina te nas dikim, hêviya min bi zanebûna te hebû ku teyê Îrexe ne kuştî be, digel ku wê tiştêkî mezin kir û şor jî pir giran kirin, lê belê ew ne ji neyartiyê hat, ne jî ji bo ziyangihandinê bû, wê bi sedema dexsiyê wilo kir. Gerek e min guh ne daba wî tiştî û min xwe ragirta, lê ey Îlaze! Te xwast min ezmûn bikî û di pîrsa wê de min di gumanê de bihêlî. Lê tu li ba min bûyî kesê her payedar û

xizmetkar. Ez ji te re spasdar im. Zû here û wê ji min re wîne.

Wê hîngê, Îlaze ji ba qerêl derket, hat ba Îrexteyê û jê xwast ku xwe bixemlîne, wê jî wilo kir û bi xwe re bir û çû. Gava ku Îrextê derbas ba qerêl bû, jê re çû ser çokan û rabû li pêş wî sekinî û got: Mala Xwedê ava, paşê jî mala qerêl ava, wekî ku rindî bi min kir. Min gunehhekî mezin kir, piştî wê wî ez ne hêjayî jiyane bûm, lê dîlferehiya wî, sincî û xwezaya wî a comerd û dilê wî ê tenik ez li jiyane hîştim. Mala Îlaze jî ava, wekî ku kuştina min bi derengî xist û ez ji mirinê rizgar kirim; ji ber ku ew bi diltenikiya qerêl, dîlferehî û comerdiya wî, cewherê wî ê pak û sozmendî<sup>1</sup> û dilsoziya wî zane.

Qerêl bi Îlaze re got: Tu li ba min, li ba Îrextê û xelkê jî pir payebilind bûyî! Çinkî piştî ku min fermana kuştina wê da, te ew zindî hîşt. Te îro ew da min! Ez hîn bi şîret û karsaziya te a durust bawer im, tu îro li ba min pir bi rûmet û payebilind bûyî. Tu niha di milkê min de serbestî, wekî ku tu dixwazî tê de bike û çawa dixwazî wî bi rêve bibe. Min ew xiste stuyê te û bawerî bi te kir.

Îlaze got: Qeralê mino! Xwedê milk û şahiyê ji te re berdewam bike, ez ne barê wî tiştî me, tenê ez koleyê te me. Lê daxwaza min ew e, ku qeral di tiştên wilo mezin de nelezîne, nemaze jî ew karê ku wê paşê li ser poşman bibe û encama wî a dawîn jî wê xem û melûlî be, nemaze jî di

---

<sup>1</sup>.Sozmendî: Sozêa xwe diparêze.

rewşa ev jina şorind û diltenik de, ya ku mîna wê li cîhanê tunene.

Qerêl got: Ey Îlaze! Te rast got û min gotina te pejirand, ez careke din karekî wiha, ne biçûk û ne mezin nakim, ta wî baş neçêwrînim, lê nenêrim, nebim û nînim, rawêjê bi xwedî vîn û nêrîn nekim, bi taybetî jî eger mîna ev karê mezin be ku ez jê bi xweşî rizgar bûm, ez nakim.

Paşê, qerêl diyariya Îlaze jê re giran kir û rê dayê da bigihê Berahîmiyên ku şîreta lêkirin ku hezkiriyên xwe bikuje, wî jî şûr ji bo wan bi kar anî û ew kuştin. Herweha qeral û gewremêrên qeraltiyê kêfxwaş bûn, mala Xwedê ava kirin û ji bo zanîn û hişmendiya wî pesna Keberyon dan; çinkî wî bi zanîna xwe, qeral, wezîrê wî ê çêkar û jina wî a durustkar ji mirinê rizgar kirin!

\*\*\*

\*\*\*

## Deriyê Dêleşêr, Nêçîrvên û Çeqel

Qeral Debşelîm bi feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst; nimûnekê ji min re wîne, bila rewşa yê ku kane ziyane bigihîne bilî xwe, lê ji ber ziyana ku gihaye wî, wî karî nake û ji bo kirina setem û dijmantiyê jî dibe bend û nehêl<sup>1</sup>.

Feylesûf got: Tenê kesên xwedî nêrîna şaş li derbara rastiya cîhan û pişdawiye û kesên arode û nezan dikin ku ziyane bigihêjin xelkê; lê zanîna kêr jî dihêle ku neyartî, nakokî û encamên wan bi ser xelkê de werin û tiştê ne baş ku hiş têngahî jî bigihênjin wan. Eger hinek, berî ku ziyana tiştê kirine bigihê wan bi riya lihevkirinekê ji hev ewle bûn, ne tê wê wateyê ku ewê herdem ji hev ewle bin; çinkî eger yek di encamên tiştê de nerame, ew ji bela û buvehîyan ewle nabe. Belkî nezanek ji ziyana ku ji bilî xwe bibîne serpêhatiyê hilîne û bi wê sedemê, tiştên mîna setem û dijîtiyê bi kesekî din neke, karên bed neke û bi wî rengî belkî sûdê jî ji wê sinciyê wergire. Mînaka wê axaftina dêleşêr<sup>2</sup>, çeqel û nêçîrvanê tîravêj e. Qerêl got: Ma ew çawa bû?!

Feylesûf got: Gotine ku dêleşêrek li daristanekê hebû û du şepalên<sup>3</sup> wê hebûn. Rojekê ji rojan ew derket nêçîrê û her du şepalên xwe di şikeftê de hîştin; wê hîngê siwarekî

---

<sup>1</sup>.Nehêl: Nahêle tiştêkî bike مانع.

<sup>2</sup>.Dêleşêr: Şêra mê.

<sup>3</sup>.Şepal: Çêlkê şêr.

tîravêj di wir re derbas bû, bi ser wan de çû, avête wan, her du şepal kuştin, eyarê wan jî gura û li paş xwe girêdan û birin mala xwe. Gava ku dêleşêr vegeerî û dît ku çi xişma mezin bi ser wê de hatiye, ew zikepişt teqeke bû, qîrî û bang kir; çeqekek jî li nêzîkî wê bû, gava ku dengê wê bihîst jê re got: Ev çi ye tu dikî? Çi bi serê te hatiye ji min re bêje? Dêleşêrê got: Siwarek di vir re derbas bûye, her du şepalên min kuştine, eyarên wan jî gurane, li paş xwe girêdane û birine û ew jî avêtin çolê.

Çeqel jê re got: Ramekele<sup>1</sup>, bila dilê te bi te bişewite, bila tu zani bî jî ku cîhan warê seza û perûdanê<sup>2</sup> ye, tê de mala xêrxwazan ava dibe, şerkar jî sezaya xwe dibînin. Tiştê ku vî tîravêjî bi te kir, te jî mîna wê bi bilî xwe dikir, te jî ew tiştê ne bi yekî tenê ji yên ku mîna te ku ji hezkiriyên xwe hezdikirin û mîna çêlikên te li ba wan jî buha bûn, dikir. Li ser bilî xwe bisebire, wekî çawa bilî te li ser te sebirî. Çinkî hatiye gotin: Çawa tu wan seza dikî, tu jî seza dibî, her karekî jî çêseza û bedsezaya xwe heye, ew di pir û hindikiya xwe de jî li gora wan karan têne kirin; ew mîna çandinê ye, eger hate palekirin, li gora tova xwe berhemê dide.

Dêleşêrê got: Gotina xwe ji min re diyar bike û wateya wê xuya bike. Çeqel got: Temenê te çiqase ye? Dêleşêrê got: Ewqas û ewqas sal in. Çeqel got: Xwarina te tê de çi bû? Dêleşêrê got: Goştê cinawiran bû. Çeqel got: Kê ew

---

<sup>1</sup>.Ramekele: Mexeyide.

<sup>2</sup>.Perûdan: مكافأة، جزاء

dida te? Dêleşêrê got: Min cinawir nêçîr dikirin û dixwarin. Çeqel got: Ew cinawirên ku te dixwarin, dê û bavên wan tunebûn?! Got: Belê. Çeqel got: Ma çima mîna ku ez dengê te dibihîsim, ez dengê tirsê ji wan bav û dayîkan jî nabihîsim?! Tiştê ku bi ser te de hatiye, ew bi sedema ku te li encamên karên xwe ne dinêrî, û li ziyana ku dê ji wan tiştan bigihê te ne diramî, bi serê te hatiye.

Gava ku dêleşêrê ew gotina ji çeqel bihîst, nas kir ku wê bi xwe bi serê xwe kiriye û karê wê jî setem û zordarî bû. Herweha wê nêçîrvanî berda, xwarina goşt berda, çû berên daran xwar û perestî û nasiktî kir. Lê dema ku tilûr Werşan, ku xwedanê wê daristanê bû û xwarina wî berhemên daran bûn, ew yeka dît, ji Dêleşêrê re got: Min guman dikir ku ji ber kêmainya avê îsal daran ber ne girtiye, lê gava ku min dît tu wan dixwî, tu jî goşt xwarî û rozî û xwarina xwe û tiştê ku xwedê ji te re par kiriye berdaye û çûyî ser roziya bilî xwe û ew kê m kiriye, min nas kir ku îsal jî daran mîna salên berê ber girti bû, lê kêmbûna berhemên ji bin serê te de ye! Xwedê alîkariya dar, ber û herkesê ku jiyana xwe ji daran e, bike! Çinkî eger ewên ku roziya xwe ne li ser daran be, ne jî ji xwarin û para wan be derbas nava wan bibin, dar wê zû bimirin! Gava ku dêleşêrê gotina Werşan bihîst, xwarina berê daran berda û çû geya xwar û perestvanî kir!

Min ev nimûna ji te re anî, da tu zani bî ku belkî nezan ji ziyana ku dê bigihê wî fêr bibe da ku ziyane bi xelkê neke, mîna çawa piştî ku ew tiştê bi serê şepalên dêleşêrê



hat û wê xwarina goşt berda, li ser gotina tilûr Werşan  
berê daran jî berda û çû ser riya nasiktî û perestvaniyê!

Gerek e mirov baş li vê yekê binêre; çinkî hatiye gotin:  
Tiştê ku tu ji xwe re naxwazî, ji bilî xwe re jî mexwaze, ji  
ber ku dadmendî di wir de ye û razîbûna Xwedê û xelk jî  
di dadmendiya de ye.

\*\*\*

\*\*\*

## Deriyê Nask û Mîvên

Qeral Debşelîm ji feylesûf Beydeba re got: Min ew mînaka bihîst. Mînakekê li ser ewê ku karê wî li gora wî ye berdide û diçe karekî din dixwaze, lê ew bi dest nakeve ji min re, û paşê radibe li karê xwe ê berê vedigere, lê ew kara jî ji dest diçe, û wilo bêçare û dudilî dimîne!

Feylesûf got: Gotine ku li welatê Kerxê nasikekî perestvan û jîr hebû, rojekê mêvanekî wî hat, nêsik jî rabû xurme jê re danîn da ku pê tesele bibe û bi hev re jê xwarin. Mîvên got: Çiqas xurmene xweş û şêrîn in! Li welatê ku ez lê dijîm tunene, xwazî lê hebana. Paşê got: Ez dixwazim tu alîkariya min bikî, da ku jê bibim li welatê xwe biçînim; çinkî ez bi darûberên welatê we nizanim û nizanim jî li kûderê hene. Nêsik jê re got: Ji ber ku tu bi wê yekê nizanî, serê te dê bêşe û li te bibe giranî, belkî ew dara li xaka we şîn nebe jî. Berê welatê we bi darûber e; paşê çi pêdviya te bi xurmeyên ne pak û ne li gora govde mirov heye?! Mirovê ku tiştêkî bixwaze û bidest nexe kêfxwaş nabe. Eger her tiştê ku tu bibînî bixwazî û tiştê nabînî jî nexwazî, tu bextewer nabî.

Wî nasikî bi zimanê Îbranî jî zanî; rojekê mîvên dît ku ew pê daxive, wî ew denkirina baş dît, li xwaşiya wî hat û karê xwe kir ku fêrî wî zimanî bibe, ew bi rojan xwe pê de mijûl bû, nêsik jê re got: Ez ditirsim eger tu zimanê xwe berdî û herî zimanê Îbranî, mîna qirikê li te were! Mîvên got: Ma ew çawa bû?

## • Mînka Kêw Û Qirikê

Nêsik got: Hatiye gotin ku qirikekê dît kewek bi lez dimeşe, wê meşa wî ciwan dît û xwast jê fêr bibe, lê nikarî baş fêr biba, mîna wî bimeşiya û jê bê hêvî bû, û gava ku xwast vegere ser meşa xwe a berê, wê dît ku ew di meşa xwe de tevlihev dike û vedilukume, û bi wê yekê ew di meşê de bû tilûra herî pîs!

Min ev mînaka ji te re anî, ji ber ku min dît te zimanê xwe yê ku tu li ser mezin bûyî berda û tu hatî zimanê `Îbranî fêr dibî, ew jî li te ne tê, ez ditirsim tu fêr nebî, zimanê xwe jî ji bîr bikî û bi zimanekî pir xirab li xwediyên xwe vegeêr! Çinkî hatiyae gotin: Yê ku karekî ku lê ne tê û tiştên ku ne ji pergalên wî bin, bav û bapîrên wî ew li ser perwerde ne kiri bin û kesek ji xwedan û mirovên wî pê nizanin bike, ew nezan tê nasîn, çinkî mirovê hişmend sînorên xwe derbas nake.

Qeralê min, gerek e walî û karbidest, berî gişan, haya xwe ji vê yekê bibin, bila sinciya mîna ya wî mirovî di nav xelkê de belav nebe, çinkî ziyarî de heye, ewê bike ku destdirêjî li ser payedariya wan bibe û bike ku ew li hember biryarên wan rawestin; bi wê yekê jî, kesên payenizim wê çavên xwe berdin payedariya xwedî astên bilind, û dijîtiya bedxwazan ji comerdan re, nezanan ji zaniyaran re, qels ji zîrek re û kesê kêr ji rûmetdar re wê gur<sup>1</sup> û mezin bibe, pir tiştên xerab ku bihêle jiyar li hev

---

<sup>1</sup>.Gur: Hêgin û zêde bibe, wiha tê bilêvkirin (gurr).

bikeve jî dê bibin; wê hîngê qad wê bikevin nava hev, ast  
û paye jî wê winda bibin. Di vî warî de, hemî tişt li gora  
wê nimûnê diçin, li ser bingeha wê dê pirs û karûbar jî bi  
şêweyên giran û xedar<sup>1</sup> bidawî bibin û dijîtî jî li ser milkê  
qerêl wê peyda bibe!

\*\*\*

\*\*\*

---

<sup>1</sup>.Xedar: خطير.

## Deriyê Zêrker Û Geştevên

Qeral Debşelîm bi Beydebayê feylesûf re got: Min ev mînaka bihîst. Mînakekê li ser ewê ku rindiyê di cihê ne guncav<sup>1</sup> de dike û malavabûnê li ser dixwaze ji min re wîne.

Feylesûf got: Qeralê min, rindiya ku ji kesê ne spasdar re were kirin li ber bê diçe, xwedanê rindiyê jî pir poşman dibe, lê dîsa jî tov<sup>2</sup> ji tova rindiyê baştir tune ye ku di dilê spasdaran de zû şîn dibe, ne jî bazirganiyeke jê bikêrtir heye. Gerek e mirov rindiyê bi heryekî bike, çinkî eger rindî li ba xelkê winda bû, li ba Xwedê winda nabe. Nemaze jî kesên spasdar û dilsoz. Eger payedariya mirov çi be jî, belkî rojekê ji rojan mirov bigerekî wî bibe û di ber barê wî de rabe.

Eger qerêl û hişmendan xwastin rindiyê bi yekî bikin, gerek e wê rindiyê di cihê wê ê guncav de dînin, û ji ewê ku nikare di ber de rabe û ne spasdar be re, nekin. Berî ku qeral kesekî ji bo rindiyê vebjêrin, gerek e karûbarê wî, dilsozî, spasdarî û viyandariya wî baş nas bikin; eger mirovek bi durustî û dawpakîya xwe navdar be, û bê ku ezmûn û taqê bibe rindî vê re were kirin, qeral bi wê yekê xwe dixwe nava metirsiyê û xwe dide ber nerindî û mirinê jî. Tu nabînî ew bijîşkê hişmend ê dilovan, nexwêş bi

---

<sup>1</sup>.Guncav: Lêhatî, minasib.

<sup>2</sup>.Tov: Bidar بذار.

çavlêdanê tenê derman nake, berî dermankirinê ew rewşa wî nas dike, tamarên wî dipelîne<sup>1</sup>, xwezaya wî û sedema derdê wî nas dike, eger ew hemî nas kirin, wê hîngê radibe wî derman dike. Di wî warî de, ra eger mirovek ji ber mirovantiyê, yan kesek bi sedema rûmetbilindiyê nankor be jî, gerek bijîşk wî jî li wê pîvanê bibe, çinkî ew bi çakirina wan rûmetdar dibe. Bila ji bo dûrbûnê jî kesek ji rindiyan bêpar nemîne, ne jî qelsek ji bo qelsiya wî bêpar bibe, nemaze jî eger ew nas bike ku çi ji wî re tê kirin û ji bo wê rindiyê jî spasdar be.

Hatiye gotin: Gerek e hişmend, ta lawiran jî kêr nebînin, gerek e wan jî ezmûn û taqê bike, tiştê ku ji wan re bike jî bila bi qaserî tiştê ku ji wan tê be, çinkî belkî xêr li ba yê ku gumana şer jê dibe hebe, û şer jî li ba ewê ku xêr jê hevî dibe bê dîtin!

Qeralê min, sinciyên afrandeyan jî têvel in; ewên ku Xwedê afrandine û li ser çar lîngan, yan diduyan dimeşin, yan bi du baskan difirin, yan jî di avê de avceniye dikin, ji mirov ne rintir in, lê digel wê jî, belkî pêwîst be ku haya hişmend ji mirovzad<sup>2</sup> hebe û bi yekî ji wan jî ewle nebe; lê li bervajî wê, gangaz<sup>3</sup> e ku kani be fistekekî di devzendkeke<sup>4</sup> xwe re têxe û di ê din re derxe, yan jî bê tirs

---

<sup>1</sup>.Dipelîne: Vedijo يتلمس.

<sup>2</sup>.Mirovzad: Însan.

<sup>3</sup>.Gengazî: derfet heye ku were kirin û pêk were.

<sup>4</sup>.Devzendk: Serê piyê miltên (kurtik) ku dest tê re derdikeve كم القميص

tilûrekî birînker li ser destê xwe dîne û tenê eger nêçîrek girt tişteki jê re dihêle. Çinkî ji mirovan xêrxwaz jî û bedxwaz jî hene; belkî di nav hin lawir û cinawiran de yên ji mirov dilsoztir, li ser rûmeta xwe bi parêztir û ji bo rindiyê spasdartir jî hebin. Di wê derbarê de hin hişmendan mînakek gotine. Qerêl got: Ew mînaka çawa bû?

### • **Mînaka Şîp, Mar û Meymûn**

Feylesûf got: Hatiye gotin, ku hinekan bîrek li ber rêkekê kola bû û mirovekî zêrker, marek, meymûnek û pilingek têwer bûn. Mirovekî geştevan jî di wir re derbas bû, xwe bi ser bîrê de xwar kir û mirov, mar, meymûn û piling di binê wê de dîtin. Ew bi xwe re ramî û got: Ez ji bo çêsezaya pişdawiya xwe karekî ji bo derxistin û rizgarkirina vî mirovî ji nav van neyaran rintir nabînim! Çinkî hatiye gotin: Ji çêsezaya rizgarkirina mirovekî ji mirinê mezintir tune, ji bedsezaya kesê ku kane bike û neke- eger çiqas karekî dijwar be jî -ji bilî xwekuştinê- mezintir tune. Wî benek anî û berda bîrê, lê ji ber ku meymûn sivik bû, xwe pê ve girt û ji bîrê derket. Wî carek din ben berda bîrê, vê carê mar xwe lê aland û derket. Cara sisiyan ben berda binê bîrê, vê carê jî piling xwe pê girt û derket; wan her siyan ew spasdar kir û jê re gotin, vî mirovî ji bîrê dermexe, çinkî tişteki ji mirov nankortir tune! Paşê meymûn jê re got: Mala min li ciyekî nêzîk bajarekî ye jê re dibêjin Niwaderext. Piling jî got: Ez jî li kêleka wî bajarî di daristanekê de me. Mar jî got: Ez jî di

sûra wî bajarî de me, eger rojekê ji rojan tu di ba me re derbas bûyî û bi gerekî me bûyî, deng li me bike da ku em werin ba te û ji bin rindiya te derkevin. Lê ji ber kêmspasdariya mirov, geştevên pir guh ne da gotina wan û benê xwe berda binê bîrê û zêrker derxist; wê hîngê ew jî jê re daket serçokan û got: Te rindiyek bi min kir; eger rojekê ji rojan tu di bajarê Niwaderext re derbas bûyî, li mala min bipirse, ez zêrker im û navê min filan e, belkî ez kani bim rindiya ku te bi min kir li te vegeştînim. Paşê, zêrker çû bajarê xwe û geştevan jî bi riya xwe de çû.

Piştre, lê hat û karekî geştevên li wî bajarî derket; û dema ku ew çû bajêr, meymûn pêşwaziya wî kir, jê re dakete serçokan, lêborîn jê xwast û got: Tu zanî tu arziya meymûnan tune ye, lê li vir rûne ta ez bêm, wî çû meyweyên xweşik jê re anîn û li ber destên wî danîn, wî jî qaserî kanî jê xwar.

Paşê geştevan çû ta gihîşte ber deriyê bajêr, li wê derê piling pêşwaziya wî kir, li pêşiyê xwe berda ser zemînê, jê re daket serçokan û got: Te rindî bi min kir, katekê raweste ta ez vedigerim; piling çû derbas qonaqa qerêl bû, keça wî kuşt, xemla wê bir û bê geştevan zani be ji kû anî li pêşiyê danî.

Geştevên di dilê xwe de got: Eger van lawiran ev tişt ji min re kirin, ma çawa ku ez herim ba zêrker?! Eger ew desteng be û tişteki wî tunebe, ewê vê xemlê bifroşe, ew buhaya wê jî zane, û paşê dê buhaya wê bibe, hinekî bide min û hinekî jî ji xwe re bibe. Wî berê xwe da mala zêrker



û dema ku zêrker ew dît, bixêrhatina wî kir û derbas mala xwe kir. Lê gava çavê wî li xemla ku bi geştevên re bû ket, wî ew nas kir, ji ber ku wî ew ji keça qerêl re çêkiri bû. Zêrker got: Dilvehesî be ta ez ji te re xwarinê tînim, ez bi tiştê ku li mal heye qeyîl nabim, ew derket û bi xwe re digot: Fersenda min bi destê min ket. Ezê herim ba qerêl û jê re hewal bidim û payedariya min wê li ba wî bilind bibe. Ew çû ber deriyê qerêl, xeber jê re şand û got, ku yê keça te kuştiye û xemla wê biriye li ba min e. Qerêl leşker şandin û geştevan anîn, û gava li xemlê nihêrî fersend ne dayê ku baxive, û ferman da, da ku wî bêşînin, li bajêr bigerînin û paşê bi xaçkirinê bikujin.

Gava ku wergî<sup>1</sup> kirin, geştevên dagirî û bi dengê bilind got: Gava meymûn, mar û piling gotin ku mirov nankor û ne spasdar e û wî rizgar meke, eger min bi şîreta wan kiriba, ezê negihîştama vê belayê, û ev gotina dubare kir.

Wê hîngê mar gotina wî bihîst, ji qulika xwe derket, ew nas kir, rewşa wî lê pir giran hat û karê xwe kir ku wî rizgar bike. Ew xuşî û çû ta gihîşt ba kurê qerêl û pê dada. Wê gavê, qerêl zaniyar civandin da ku wî derman bikin, lê wan nikarî tiştê jê re bikira! Paşê, mar çû ba dosteke xwe ji pêriyan, û rindiya ku geştevên pê kiri bû jê re hewalda û jê re got jî ku niha ew ketiye çî deraqî, wê hîngê dilê wê pê şewitî û rabû çû ba kurê qerêl, lê diyar bû û jê re got:

---

<sup>1</sup>.Wergî: Wilo, wiha, bi wî rengî..

Ta ku ew mirovê we bi setemkarî seza kiriye te derman neke, tu çak nabî. Mar jî çû zîndanê ba geştevên û jê re got: Ev bû sedema ku me ne xwast tu rindiyê bi wî mirovî bikî û te jî guhdariya me ne kir. Wî rabû çilone<sup>1</sup> ku ji bo jehrikê sûd tê de hebû dayê û jê re got: Eger ji bo dermankirina kurê qerêl hatin ba te, ji ava vî çolyî bidê û ewê çak bibe; eger qerêl li ser rewşa te pirsî jî, jê re rastiye bêje û bi ya Xwedayê gewre tuyê rizgar bibî!

Wê hîngê, kurê qerêl ji bavê xwe re got, ku wî bihîst yek dibêje: Tu çak nabî ta ew geştevanê ku we bi setemî zîndankiriye te derman neke. Qerêl geştevan anî û jê xwast ku kurê wî derman bike. Wî got: Ez dermankirinê nizanim, lê ezê ji ava çiloyê vê darê bidim kurê te û bi ya Xwedê ewê çak bibe. Wî rabû av da kurik, ew çak bû, qeral jî pir şa bû û çêroka wî jê pirs kir, wî jê re hewalda, qerêl jî ew spas kir baxşîşeke baş dayê û ferman da, da ku ji ber derewa zêrker û sezakirina rindiya geştevên bi nerindiyê wî bi xaçkirinê bikujin.

Paşê feylesûf ji qerêl re got: Piştî ku geştevên zêrker rizgar kir, kiryara wî bi geştevên re, nankoriya wî vê re, spasdariya lawiran jê re û rizgarkirina wan ji wî re serborek<sup>2</sup> e ji dersxwazan re, ramanek e ji bo ramyaran û perwerde ye da ku rindî û tiştên baş bi kesên dilsoz û comerd re bêne kirin; çinkî ramana durust, anîna xêrê û têvedana belayan jî pê pêk tê, tê de tê dîtîn û zanîn.

---

<sup>1</sup>.Çilo: Pelên daran.

<sup>2</sup>.Serborîn: Serpêhatî, ders عبرة

## Deriyê Kurê Qerêl û Dostên Wî

Qeral Debşelîm ji feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst. Mîna ku tê gotin, eger mirov bi hiş, nêrîn û teqekirina xwe ji tiştan re xêr û serketinê werdigire, ma çima mirovê nezan jî digihê xêr û payedariyê, û li bervajî wê, belkî mirovê hişmend bela û zîyanê jî bibîne?!

Beydeba got: Mîna ku kor bi dilê xwe dibîne, bi palmistin, nelezbûn û sebrê dimeşe, gerek e mirov di karên xwe de bi hiş, rastnêrîn, zanîn, tekezekirin û sebrê bixebite; wê hîngê ew mirova zûzû nakeve! Lê di gel wê jî, belkî qeda û felek<sup>1</sup> zora wan tiştan bibe, mîna çawa carina yê ku pêşiya xwe dibîne dikeve û ê kor nakeve! Mînaka wê, mîna mînaka kurê qerêl û dostên wî ye. Qerêl got: Ma ew çawa bû?!

Feylesûf got: Gotine ku çar mirov bûn hevalên rêkekê, yek kurê qeralekî, ê duyem kurê bazirganekî, ê sêyem kurê rûmetdarekî, ew jî pir sibehî bû, ê çaran jî kurê cotkarekî bû. Ew hemî jî desteng û bi pêdvî<sup>2</sup> bûn, li warê biyaniyê keti bûn êş û westaneke mezin û ji bilî cilên ku li wan bûn tiştêkî wan ne ma bû. Rojekê dema ku ew dimeşîn, heryekî ji wan di rewşa xwe a berê de diramî û çî xêra ku jê didît tanî bîra xwe.

---

<sup>1</sup>.Felek:Qeder

<sup>2</sup>. Bi pêdvî: Bi pêdviya tiştêkî, motacî.

Kurê qerêl got: Rewşa cîhanê tev bi qeda û felekê ye; tiştê ku ji mirov re bûye felek, eger çawa be jî wê bibîne, ji bo qeda û felekê jî hedarî gerek e, tiştê her çêtir jî bendewariya wan e. Kurê bazirgên got: Hiş ji her tiştêkî çêtir e. Kurê rûmetdêr got: Sibehîtî ji tiştê ku we got çêtir e. Kurê cotkêr jî got: Tiştêk li cîhanê ji westana di kar de çêtir nîne.

Gava ku ew ji bajarekî bi navê Mîtron ve nêzîk bûn, li aliyekî rûniştin û bi hev rawêjîn. Ji kurê cotkêr re gotin: Here bi karê xwe nanê vê roja me derxe. Kurê çotkêr rabû û çû, li karekî pirsî ku xwarina çar mirovan pê derxîne, xelkê jê re got ku li vî bajarî ji êzingan nirxdartir tune; êzing jî li dûrî bajêr bi fersexekê bûn. Kurê çotkêr çû, tonek êzing kir û anî bajêr, bi derhemekê firot, pê xwarin kirî û li ser deriyê bajêr wiha nivîsand: Eger mirov di karê rojekê de bixebite û biweste, buhaya wê derhemek e. Paşê xwarin bir ba hevalên xwe û bi hev re xwarin.

Dema ku siberoj hat, gotin: Yê ku got, tiştêk ji sibehîtiyê rûmetir tune, gerek e dora wî be. Lawê rûmetdêr rabû da ku here bajêr, lê ew bi xwe re ramî û got: Ez ne hêjayê karekî me û nizanim bikim, ma ezê ji bo çî derbas nava bajêr bibim?! Fedî kir jî ku bê xwarin li hevalên xwe vegere, herweha niyaz<sup>1</sup> kir ku ji wan veqete û çû piştê xwe da dareke mezin, xulmaş bû û di xew ve çû. Wê çaxê, mirovekî wênekêş di wir re derbas bû, çavê xwe

---

<sup>1</sup>.Niyaz: Nêt, niyet النية

li wî ket, ciwaniya wî a xweşik dît û xwast wêneya wî bikîşîne; wî bi xwe re got, eger ez ji wêneya wî wênene din bigirim ezê sûtê jê wergirim, û rabû ew şiyar kir û bi xwe re bire mal da ku wêneya wî bikişîne. Gava ku hêvar dahat wî sed derhem dayê, ew jî derket û li ser deriyê bajêr nivîsand: Ciwaniya rojekê sed derhemî dîke û derhem anîn ba havalên xwe.

Gava ku ketin roja sisyan, ji lawê bazirgên re gotin: Tu îro here bi hiş û bazirganiya xwe tiştêkî ji me re wîne. Lawê bazirgên rabû, çû û gerî ta çavê wî di deryayê de li gemiyeke tijî kelûpel ket, gemî li ber kendêl rawestî bû û komek bazirgan li wir li hev civiya bûn, li aliyekî gemiyê rûnişti bûn û dixwastin tiştên di gemiyê de bûn bikin. Ew bi hev dişêwirîn û bi hev re digotin: Digel ku tişt bi me gerek e, lê emê îro vegerin û tiştêkî ji wan nakirin da ku kelûpelên wan bi ser wan de bimînine û ji me re erzan bikin, û dê erzan jî bikin.

Gava ku lawê bazirgên ew tiştê bihîst, wî li bervajî wan kir, çû ba xwedanê gemiyê, tiştê ku di gemiyê de bû bi sed hezar derhem kirî, dandina buhaya wê jî ta demekê hişt û xuya kir ku ew dixwaze tiştê xwe bibe bajaerekî din. Gava ku bazirganan ew yeka bihîst, tirsîyan ku kelûpel ji destê wan here, wan rabû hezar derhem kar dane lawê bazirgên û perên din jî qulabtin ser xwe, wî jî kara xwe bir ba hevalên xwe, li ser deriyê bajêr jî nivîsand: Hişê rojekê buhaya wî hezar derhem e.

Roja çarem bi lawê qerêl re gotin: Tu jî here bi qeda û feleka xwe tişteki ji me re wîne. Lawê qerêl rabû û çû ta gihîşt ber deriyê bajêr û li ser sewkiyekê<sup>1</sup> rûnişt. Wê hîngê û li gora felekê, ji nişkave û di wê katê de qeralê wê deverê mir û ne lawek, ne jî kesek ji mirovên wî li şûnê mabû. Hîn ew rûniştî bû, darebesta<sup>2</sup> qerêl di ber wî re derbas bû û xelk xemgîn bû, lê ew xemgîn ne bû, li wan ne nihêrî û guh jî ne da rewşa ku tê de bûn. Xelkê ew karê wî baş ne dît û dergevanê bajêr sixêf lê kirin û jê re got: Tu kî yî ey qelaş? Çima tu li ber deriyê bajêr rûniştî, tu ji bo mirina qerêl xemgîn ne bûyî û guh jî nadî me? Wî ji ber derî qewitand. Lê piştî ku darebest derbas bû û çû, ew dîsa vegeerî û li cihê xwe rûnişt, û dema ku qeral veşartin û vegeerî, dergevên dît ku dîsa ew li wir rûniştiye, wê hîngê ew pir hêrs bû û jê re got: Min ji te re ne got li vê derê rûmene! Ew bir û xiste zîndanê.

Gava sibe vevat, xelkê bajêr li hev civiyan da ku qeraleki ji xwe re vebjêrin. Dema ku ew di nav nakokiyên de bûn, dergevan derbas bû û got: Min duh kurek dît li ber dergehê rûniştî bû, ew ji xemgîniya me re xemgîn ne bû, wekî ku ew tiştê li ba wî ne mezin bû, pergalekê rûmet û payebilindiyê jî li ser xuya dibûn. Ez vê re axivîm lê wî bersiva min ne da, min jî ew ji ber derî qewitand, lê gava

---

<sup>1</sup>.Sewkî: Ciyekî piçekî bilin î avakirî ye, ji bo rûniştinê bi kar tê..

<sup>2</sup>.Darebest: Cinaze.

ku ez vegeŕîm, min dît dîsa li wî cihê rûniştiye û ji tirsî ku eger ew wek çavekê<sup>1</sup> be, min ew xiste zîndanê.

Wê hîngê rûmetdarên bajêr şandin dût kurik, anîn û li ser rewşa wî û çî hîştiye ku were bajarê wan jê pirsîn. Wî got: Ez kurê qeralê Fewêranê me; dema ku bavê min xweş bû, ez kiri bûm paşqeral, lê gava ku mir, birayê min destlat bi zorê ji min bir, li ser textê qeraltiyê rûnişt û ez jî ji tirsî wî re reviyam ta gihîştim vê derê. Gava ku kurik rewşa xwe hewalda, hinên ku diçûn welatê bavê wî ew nas kirin û bi rindî li ser bavê wî deng kirin. Paşê, rûmetdaran ew kurik vebjartin û pê qayîl bûn ku li ser wan bibe qeral. Sinciyeke xelkê wî bajarî jî hebû, gava ku yek li ser xwe dikirin qeral, ew li fîlekî sipî siwar dikirin û li dora bajêr digerandin! Gava jî wî re jî wergî kirin, ew di ber deriyê bajêr re jî birin, wî nivîs li ser dergehê dîtin û ferman da, ku wiha li ser dergehê binivîsin: Cefakêşî, sipehîtî, hiş û tiştê ku di vê cîhanê de dighê mirov, çî xêr û çî şer, ji qeda û feleka Xwedayê gewre ye. Ev post û payedariya jî Xwedê wek xêr û rûmet ji min re hinart<sup>2</sup>. Paşê çû encûmena xwe, li ser textê qeraltiyê rûnişt û şande dût hevalên xwe yên ku bi wan re bû, ew jî anîn û rabû ewê xwedan hiş li ba wezîran danî, kedkar jî tevlê xwedanên çandiniyê kir û xwediyê sibehîtiyê jî karûbarekî xwe pê hilpesart!

---

<sup>1</sup>.Çavek be: Acan û Sîxur be عميل.

<sup>2</sup>.Hinartin: Şandin.

Paşê wî zaniyarên welêt û xwedan nêrîn civandin û ji wan re got: Bi taybetî van hevalên min, wan bawer kir, roziya ku Xwedayê gewre daye wan ne bi qeda Xwedê û feleka wî ye. Ez dixwazim win jî wê zani bin û pê bawer bikin, ku ev payedariya ku Xwedê da min û ji min re amade kir, bi destê felekê ne bi sibehîtî, hişdarî û cefakêşiyê bû; gava ku birayê min ez qewitandim, min ji bilî ku xwarina jiyana xwe peyda bikim tiştêk hêvî ne fikir, ma çawa ku ez bigihêm vê payebilindiyê, hîç ne dihat bîra min jî ku bigihêmê; çinkî min li ser vê xakê, ên ji xwe ciwantir, sibehîtir, cefakêştir û vîndartir dîtin, lê belê ez bi feleka Xwedê payebilind bûm.

Di wê civakê de şêxek jî rûnişti bû, ew rabû lipê<sup>1</sup> sekinî û got: Te gotina hiş û hişmendiyê kir, lê belê ewa ku tu gihandî vê derê hişdariya te a zêde û nêrîna te a durust e; te bawerî û hêviya me di xwe de bi cih anîn, tiştê te got jî me nas kir û me bi salixdana te bawer kir. Milk û rûmeta ku Xwedê da te ji ber hiş û rastnêrîna ku Xwedê daye te û hêjayî te bû; mirovê herî dilşad li cîhan û pişdawiyê, yê ku Xwedê hiş û rastnêrîna didê ye, lê Xwedê bi qedaya xwe rindî bi me kir, wekî ku li dema mirina qeralê me tu ji me re şandî û em bi te rûmetdar kirin.

---

<sup>1</sup>.Li pê: Li ser lîngan, li ser pê, li şipê.??



## • Mînaka Geştevên

Paşê, şêxekî din jî rabû, malavabûna Xwedayê gewre kir û got: Pirsra qeda û felekê mîna te gotiye. Hatiye gotin jî, ku geştevanek li ser xwe axiviye û wiha gotiye:

Berî ku ez bibim geştevan û payebilind, ez kole bûm û min xizmeta mirovekî ji payebilindan dikir; dema ku min xwest bibim tergedunya<sup>1</sup>, min ew mirova berda û wî jî rabû du dînar ji kirêya min dane min. Min jî xwest ez bi dînarekî xêrê bikim û yekî ji xwe re bihêlim; ez rabûm çûm bazarê, min du pepûk li ba mirovekî nêçîrvan dîtin, min bi wî re da û stand da ku wan bikirim û berdim, lê nêçîrvên xwest wan bi du dînanan bifroşe û ji wê buhayê daneket, min jî xwest wan bi dînarekî bifroşe min, lê ne frot. Min bi xwe re got: Ezê yekî bikirim û ê din bihêlim. Paşê, min got: Belkî ew hevjinên hev bin: Nêr û mê? Wê hîngê ezê wan ji hev bikim. Paşê dilê min bi wan şewitî, ez tewkulî<sup>2</sup> Xwedê bûm û min her du bi du dînanan kirîn. Ez tirsîm eger ez wan li devereke bi avahî berdim, ew dîsa werin nêçîrkin, nemaze jî ji ber birçîbûna ku dîti bûn û jarbûna wan, ew nikarîn bifirîna. Ji lewre, min ew birin warekî ku çêre û dar lê pir bûn, ji xelkê û avahiyê jî dûr bû û ew berdan, ew jî firîn û li ser dareke bi ber venûştin. Gava ku gihîştin serê darê, wan spasiya min kir û min bihîst yek ji ê din re dibêje: Vî geştevanî em ji bela ku em

---

<sup>1</sup>.Tergedunya: Bêdaxwaz زاهد.

<sup>2</sup>.Tewkelfî: Tewekul توکل.

tê de bûn û ji mirinê rizgar kirin, gerek e em ji bo ew karê wî, wî çêseza bikin. Di koka vê darê de kûzek tijî dînar heye, çima em şanî wî nadin û bila ji xwe re bibe?!

Min ji wan re got: Winê çawa samanekî şanî min bidin ku bi çavan ne tê dîtin û we tora nêçîrvên ne dît?! Gotin: Ew qeda û feleka ku bi ser rojê û hêvê de tîn û wan digirin e û dihêle Balîne<sup>1</sup> di binê deryayê de were nêçîrkirin, eger ew feleka bi ser yekî de hat, çavan kor dike û dihêle tiştan nebînin! Erê qedayê çavên me ji toreyê kor kirin, lê ji ser samên ne birin da ku tu sûdê jê bibînî; paşê min xak kola, kûzê ku tijî dînar bû derxist, doza xweşiyê ji wan re lava kir û ji wan re got: Mala Xwedê ava wekî tiştê ku we nizanî raberî<sup>2</sup> we kir; û digel ku win li ezmên jî difirin, lê dîsa we tiştê binê zemînê pêş me kir; wan jî ji min re got: Hişmendo! Ma tu nizanî felek bi her tişteki kane û kesek nikare xwe jê rizgar bike?!

Bila xwedî nêrînên durust zani bin: Ku her tişt bi felek û qedaya Xwedê ye, tenê bi destûra Xwedayê gewre mirov kare xwe ji tiştên ku jê hez dike nêzîk bike, ji tiştê ku jê hez nake jî xwe dûr bixe. Bila Xwedî raman bi wê yekê bawer û ewle bibin, ji ber ku di wê de fehəsiya kesê ku tûşî belayan dibe heye, dihêle ewê ku felek bi wan re digire jî spasiya Xwedê bikin!

\* \* \*

---

<sup>1</sup>.Balîne: Hût.

<sup>2</sup>.Raberkirin: Pêşêkirin, danîn hember hev.

## Deriyê Rovî, Legleg Û Kevokê

Qeral Debşelîm ji feylesûf Beydeba re got: Min ev mînaka bihîst. Mînakekê ji min re li ser mirovê ku kane pirsên bilî xwe çareser bike, lê nikare ji xwe re bike, bêje. Feylesûf got: Mînaka wê, mînaka kevok, rovî û leglegê ye. Qerêl got: Mînaka wan çi ye?

Feylesûf got: Gotine ku kevokekê li ser dareke xurmê e pir bilind çêlikên xwe dikirin. Wê tiştê ji bo avakirina malika hildigirt û digihand serê darê, û ji ber dirêjî û bilindiya darê, ew di wî karî de pir diwestî û dijwarî didîtin. Gava ku ji avakirina hêlînê kuta dibû, wê hêk dikirin û li ser rûdinişt; û çaxa ku hêk vedibûn, çêlik derdiketin û mezin dibûn, roviyekî ku dema wê nas kiri bû û zanî kengî çêlikên wê mezin dibin, dihat, li koka darê disekinî, deng lê dikir, ew gef dikir û jê re digot, yan ewê çêlikên xwe jê re bavêje, yan jî wê hilkişe ba wê, wê çêlikên xwe jê re davêtin û wî jî dixwarin.

Carekê dema ku dîsa du çêlikên wê çêbûn, leglegek hat û li ser darê venûşt, û gava ku dît kevok melûl û pir xemgîn e?! Jê pirsî û got: Kevokê! Çima bala te mijûl e û rewşa te nebaş e? Wê jê re got: Leglego! Roviyekek heye ez pê de ketime, her ku du çêlikên min çêdibin, ew tê li koka darê radiweste, min gef dike, ez jî jê ditirsim û çêlikên xwe jê re davêjim! Leglegê jê re got: Eger dîsa hat û wilo kir, jê re bêje: Ez çêlikên xwe ji te re navêjim! Eger tu kanî, hilkişe ba min û xwe têx metirsiyê, eger te wilo kir û

çêlikên min xwarin, ezê bifirim û xwe rizgar bikim. Piştî ku leglegê ew çareya bi ber kevokê xist, firî û çû li ber kenarê çemekî daket.

Rovî jî di dema nas kiri bû ku çêlikên kevokê çêdibin de hat, li binê darê rawestî û wekî ku berê dikir, deng li kevokê kir, kevokê jî wekî ku leglegê raberê kiri bû bersiva wî dayê, wî jê re got: Ji min re hewal bide, kê ev ji te re got û tu fêrî kir? Got: Leglegê ez fêrî kirim. Wê hîngê rovî çû ta gihîşte ber kenarê çem ba leglegê û dît ku ew rawestiye. Rovî jê re got: Leglego! Eger ba ji aliyê rastê de hat, tuyê serê xwe bi kû ve bidî? Got: Bi çepê xwe de. Got: Eger ji çepê de hat tuyê serê xwe bi kû ve bidî? Got: Ezê bi rast yan bi paş xwe de bidim, rovî got: Lê eger ji her cih û aliyekî de hat tuyê bi kû ve bidî? Got: Ezê têxim bin baskê xwe. Got: Tuyê çawa kani bî têxî bin baskê xwe? Ez dibêjim tu nikarî. Got: Belê! Ez kanim. Got: Gelî tilûran! Xwedê win di ser me re girtine, tiştê ku win di katekê de fêrî dibin jî, bi qaserî ku em di salekê de fêrî dibine, win digihên tiştê ku em nagihinê, win ji ber sermê û bê jî serên xwe dixin bin baskên xwe, li we pîroz be; kanî pêş min bike tuyê çawa bikî? Tilûr rabû serê xwe kire bin baskê xwe, rovî jî xwe avêt ser, pê girt, hejand û stuyê wê quraft. Paşê got: Ey dijminê henasa xwe! Tu çareyê ji kevokê re dibînî, wê fêrî dibaran dikî, lê tu nikarî wê tiştî ji xwe re bikî û dijminê te jî te digire! Paşê ew kuşt û xwar.

## Dawiya Pirtûkê

Gava gotina feylesûf gihîşt vê derê, qeral bêdeng bû, feylesûf jî vê re got: Qeralo! Tu hezar salî bijî, heft herêman bi dest xwe bixî, ji her tiştekî bi dest te bikeve, tu bi şahî bigihê ew hêviyên ku tu ji cîhanê û pişdawayê hêvî dikî. Şahiya xelkê welatê te bi te bibe û alîkariya qeda û felekê ji te re hebe. Niha hişwerî<sup>1</sup> û zanîn di te de sergihayî<sup>2</sup> bûn, hiş û niyaza te baş bûn, comerdî û hêzdarî li ba te tekûz bûn, kar û gotin li ba te gihan hev û tu kêmanî di nêrîna te de ne man, ne jî sextkarî û kêmanî di gotina te de man, te qîretî û dilovanî jî li ba xwe gihandin hev; lewre, li dema pevçûnan tirsê te ne ma û ne di dema belayan de diltengbûn digihêje te.

Min di vê pirtûkê de hemî şiroveyên tiştan civandin, bersivên tiştên ku te ji min pirs kirin dan, ew jî ji bo ku tu razî bibî; min baştirîn şîretên xwe jî gihandin te, ez bi nêrîn, dîtin û zanebûna xwe di wan de xebitîm. Xwedayê gewre wê bi riya niyaza te a pak di xebat, raman û hişê te, û di şorindî û dersên ku min ji te re danîne de, wê mafê min bide min, digel ku şîretkar bi xwe, ne ji şîretkirî kêmtir bi pêdviya şîretê ye, ne jî ewê ku fermana xêrê dide, ji yê ku xêrê dike kêfxwaştir e. Bila tu zani bî jî ku hêz û hêzdarî tenê bi saya Xwedayê gewre ye.

---

<sup>1</sup>.Hişwerî: Hişdarî الحلم والعقل.

<sup>2</sup>.Sergihayî: Temambûyî, كامل.

## Naverok

<b>☒</b>	<b>Pêşkêşî</b>	<b>3</b>
<b>☒</b>	<b>Pêşgotin</b>	<b>5</b>
<b>☒</b>	<b>Deriyê pêşeka pirtûkê:</b>	<b>8</b>
	- Egera Danîna Pirtûkê.	9
	- Mînaka tîtî û fîl.	15
	- Rûmetkirina Beydeba.	23
	- Qeral ji Beydeba dixwaze pirtûkekê dîne, û bila ji welêt re bibe destûr.	25
	- Beydeba pirtûka Kelîle û Dîmne danî.	27
	- Beydeba pirtûkê ji qerêl re dide nasîn.	30
<b>☒</b>	<b>Deriyê şandina Kîsrayê Enûşêrwan kurê Qebad, bijîşk Berzewê bo Hindistanê:</b>	<b>32</b>
	- Çûna Berzewê ji bo kûpîkirina pirtûkê.	33
	- Vegera Berzewê li gel pirtûka Kelîle û mne.	38
<b>☒</b>	<b>Deriyê danasîna pirtûkê ji danîna wergêrê pirtûkê Ebdella kurê Muqefe':</b>	<b>43</b>
	- Mînaka mirov û samanê.	44
	- Mînaka xwende û pelika zer.	45
	- Mînaka diz û mirov.	45
	- Mînaka kor û bîner.	46
	• Mînaka diz û xizan.	47
	• Mînaka her du mirovên hevpar û çiwalan.	49
	• Mînaka diz û bazirgên.	50
	• Mînaka her sê biran.	51
	• Mînaka nêçîrvên û qabqabûşkê.	52
	- Mebestên vê pirtûkê û armancên wê.	

<b>☒ Deriyê Berzewê ji danîna Buzergumehir Kurê</b>	
<b>Bextikan:</b>	<b>55</b>
• Mînaka mirov û dizê xapandî.	58
• Nimûna mirov û berdest.	60
• Mînaka bazirgên û qulkerê cewherê.	61
• Minaka bîrê û mirov.	66
<b>☒ Deriyê şêr û gê, destpêka pirtûkê ye:</b>	<b>68</b>
• Mînaka şêx û her sê lawên wî.	68
• Mîna yê ku ji gur û diz revî.	69
• Hevpeyvîna Kelîle û Dîmne li derbara şêr.	70
• Mînaka darteraş û meymûn.	71
• Mînaka rovî û daholê.	77
• Mînaka diz û nêsik.	80
• Mînaka jina kascî û koşkêr.	80
• Mînaka qirikê û marê reş.	84
• Mînaka kêvcêl û têrikê masiyan.	84
• Mînaka şêr û kêvroşk.	86
• Mînaka her sê masiyan.	89
• Mînaka kêçê û sipiyê.	92
• Mînaka ordekê û ronîya hesareyê.	95
• Mînaka gur, çeçel û qirikê bi şêr û hêştir re.	98
• Tîtwê û berdevkê deryayê.	102
• Mînaka req û du ordekan.	102
• Mînaka mirov, tîlûr û meymûnan.	106
• Mînaka gêjik û xapînok.	107
• Mînaka mar, fistekê û têrikê avî.	108
• Mînaka bazirgên û mişkên hêsinxwar.	110

<b>☒ Deriyê naskirina pirsâ Dîmne:</b>	<b>13</b>
• Mînaka wênêkêş û xeznedarê ku nehêna xwe eşkere bû.	117
• Mînaka qerêl, nezan û bijîşk.	123
• Mînaka cotkar û her du jinên wî.	125
• Mînaka bazyar û jina Merzebên.	129
<b>☒ Deriyê kevoka Bigerden:</b>	<b>133</b>
• Mînaka mişk, qirik, xezal û kevoka Bigerden.	133
• Mînaka mişk û nêsik.	138
• Mînaka jinikê û kunciyan.	139
• Mînaka gur, mirov û benê tîrkevanê.	139
<b>☒ Deriyê kund û qirikan:</b>	<b>149</b>
• Mînaka dijminan.	149
• Mînaka kêvroşk û qeralê filan.	153
• Mînaka kew, pisîkê û kêvroşkê.	154
• Mînaka gîskê, nêsik û koma mirovan.	157
• Mînaka diz û bazirgên.	159
• Mînaka diz, nêsik û pelîd.	160
• Mînaka diz û mirov.	161
• Mînaka nêsik û mişkê.	163
• Mînaka marê reş û qeralê beqan.	166
<b>☒ Deriyê meymûn û req:</b>	<b>170</b>
• Mînaka şêr, kerê û çeqel.	173
<b>☒ Deriyê nêsik û fîstekê:</b>	<b>176</b>
• Mînaka nasikê reben.	176
<b>☒ Deriyê mişk û pisîkê.</b>	<b>179</b>
<b>☒ Deriyê kurê qerêl û Tilûr Fenze.</b>	<b>184</b>



☒ Deriyê şêr û çeqelê nasik.	190
☒ Deriyê Îlaze û Belaze û Îrexe:	199
• Mînaka her du kevokan.	207
• Mînaka meymûn û nîskan.	208
☒ Deriyê çeqel, dêleşêrê û nêçîrvên.	
213	
☒ Deriyê nask û mîvên:	216
• Mînka kew û qirikê.	216
☒ Deriyê geştevan û zêrker:	218
• Mînaka şîp, mar û meymûn.	219
☒ Deriyê kurê qerêl û dostên wî:	223
• Mînaka geştevên.	227
☒ Deriyê kevokê, çeqel û leglegê:	229
- Dawiya pirtûkê.	231

=====

Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024. Z –  
2636.K de, hate weşandin

[www.yek-dem.net](http://www.yek-dem.net)

[info@yek-dem.net](mailto:info@yek-dem.net)

# كليات ودهننة

ليديا الفيلسوف الهندي

ترجمته إلى العربية: عبد الرحمن المتفيع

